

Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

<https://rantey.org>

Yedek ve Duyuru Kanallarımız

Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

- Telegram: <https://t.me/birkitapbir>
- WhatsApp Kanalımız : <https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4lvMoc0Y>

Prof. Qanatê Kurdo

tarixa edebyeta kurdi



Özge

KÜRT EDEBİYATI TARİHİ

Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - <https://rantey.org>

Prof. Qanatê Kurdo

tarixa edebyeta kurdi

KÜRT EDEBİYATI TARİHİ



Öz-Ge Yayınları : 11

- Birinci Baskı** : Roja Nû Yay. İsveç
1.Cilt 1983.
2.Cilt 1985.
- İkinci Basım** : 1992
- Yönetim Yeri** : **Öz-Ge Yayınları**
Meşrutiyet Cd. 17/19
Kızılay - ANKARA
Tel: 418 22 96
- Baskı** : **Seçkin Ofset Matbaacılık**
Ziya Gökalp Cd. Sağlık Sk.
56/G ANKARA
Tel: 435 62 47
- Kapak** : Ümit Sarıaslan
- Kapak Resmi** : Ünlü Kürt Şairi Ahmedê Xani

© Qanatê Kurdo
ISBN 91 7672011x

Prof. Qanatê Kurdo

tarixa edebyeta kurdi



KÜRT EDEBİYATI TARİHİ

SERECEM

Pêşgotin.....	7
Tarîxa Lêgerîna Edebyeta Kurdî.....	13
Rola Kovar û Rojnamên Kurdî li Dîroka Edebyeta Kurdîda	23
Melûmetiyên Şerefexan Bîtlîsî û Evliya Çelebî Derheqa	
Şayîr û Zanyarên Kurdanda.....	31
Lêgerîna Tarîxa Edebyeta Kurdî li Iraqêda.....	43

ŞÊRBÊJ Û HELBESTBÊJÊN KURMANC

Elî Herîrî.....	57
Ehmed Mele Batê.....	65
Feqê Teyran.....	70
Meleyê Cizîrî.....	90
Selîm Sulêman.....	103
Ahmedê Xanî.....	105
Xaris Bîtlîsî.....	122
Pertew Begê Hekarî.....	128
Şêh Xalid.....	137
Seyahpûş.....	139
Cigêrxwîn (1903 - 1984).....	140
Osman Sebrî.....	166
Qadrîcan.....	177

ŞÊRBÊJ Û HELBESTBÊJÊN SORANÎ

Nalî (1791-1855).....	193
Kurdî (1809-1949).....	201
Hacî Qadir Koyî (1815-1910).....	211
Şêx Rîza Telebanî (1842-1910).....	211
Edeb Ebdîla Misbah (1852-1912).....	215
Mela Mihemed Koyî (1876-1945).....	220
Wefayî (1838-1902).....	229
Xerîq (1851-1957).....	239
Bêhûd (1878-1955).....	246
Zîver (1875-1948).....	252
Sebrî (1875-1944).....	261
Selam (1892-1959).....	264
Qane Muzher (1894-1960).....	281
Ahmed Muxtar Beg (1896-1935).....	291
Pîremêr (1868-1950).....	297
Ebdula Goran (1904-1962).....	310
Dîldar (1918-1948).....	324
Bêkes (1905-1949).....	336
Remzî Mela Marif (1902-).....	346
Hejar (1902-).....	350
Nav û Nîşanên Kitêb û Pertokên jê Hilçandî.....	365

PÊŞGOTIN

Hukmetên stemkar yên cîranên kurd her çar alîya dora kurdan girtine, Kurdistan kirine girtîxanê, kurd qeyd û cîdar kirine, bi sala û zemanan xwestine û dixwezin kurdan li nav xweda bifetisînin, bihelînin, ruh û canê kurdewerîyê ji dil û hinavê wan derînin, wan bêhiş û bêsewda bikin, wusan bikin, ku ew zmanê dayka xwe şîrin, zmanê xwe zikmakî biterkînin, ji bîr bikin, tarîxa xwe, tarîxa medeniyet û şaristanîya xwe nizan bin; Hukmetê stemkar bi vir û fistona kurda dixapînin, navê "Tirkên çiyayî", "Farsên çiyayî" û navê "Erebê paşketî û koçer" li wan kirine, ew bê maf kirîne, mal û canê wan dixun, welatê wan talan û tajan dikin. Lê eva yeka heta hetayê nakişîne. Niha zeman li dinyayê hatiye guhastinê, niha ne mîna berêye, niha zemanekî din hatîye, niha her millet hişyar bûye, gelek millet serbest bûne û bi azad û bi serbixwe dijîn. Milletê kurd jî hişyar bûye, rabûye ser xwe, dixweze ew jî serbest û azad bijî, Kurdan jî xwe nas kiriye, neteweyê kurd, çî kurmanç, çî soran, çî zaza, û çî guran, gişk bi xwe hesiyane, xwe nas kirine û bi zûva ew haj pê bûne, îda dizanin ew kîne, çî ji wanra lazime. Ew haj pê bûne, ku ji wanra lazime yekîtî, azadî û serxwebûn. Ku bigihijne vî merem û mebestî, milletê kurd niha dest bi rewşenbîrkerîyê kirîye. Di pîrsa rewşenbîrkerîyêda, di pîrsa xwendewerîyêda pîrsa here bi qîmet, hêja û nîrx ew pîrse, ku milletê kurd pê hesiyaye, baş dizane, ku ew miletekî serbixweye, ku zmanê kurdî zmanekî xwerûye, ku tarîxa kurda, medeniyet û şaristanîya wan xwerûne û serbixwene. Niha her mêrekî kurd, her jîneke kurd dixwezin tarîxa milletê xwe, ya edebyeta xwe bi zmanê dayka xwe şîrin bi xûnin. Li nav civîn û komên xweda gelek caran xort û keçên

kurd pirs diki: Ji kurdan kê, kengê û çî di tarîxêda kirîye: Kê bûye xemxur, şerker û têkuşerê milletê kurd ? Bersiva van pirsan li tarîxa edebiyetêda tê gotinê. Di tarîxa edebiyeta kurdîda tê ber çavan, ku li nav sing û berê çiyayên Kurdistanêda gelek mîrên çê, gelek camêr, zanyar, hozan û şêrbêj û helbestbêj derketine, ku di tarîxêda ji nav neteweyê kurd mîrên delîr, qehreman hebûne, tiştên wusa rind û hêja efirandine, ku merivên niha jê ecêb mayî dibe. Ku xwendkar û xwendevanên me delal haj wan hebin, divêt zanyar û ulmdarên kurdan di vê pîrsêda arîkarî wan bikin, di vê pîrsêda berpirsyarin edebiyenasên kurd, divêt ew vî îş û karî bidne ser milê xwe û tarîxa peyda bûn û pêşveçûna edebiyeta milletê kurd binivîsin, ku xort û keçên me bi başkirin û çaktirîn bixûnin, pê bihêsin û bizanbin li tarîxêda ji neteweyê kurd kê, li kîderê, kengê û çî kiriye, çî nivîsîye û gotiye bo xatirê azadî û serbestîya kurd û Kurdistanê bo xatirê yekiti û hevkarîya qebil û eşîrên kurdan, bo xatirê serbestî û serferazîya wan, bo xatirê hevdestî, hevkarî û aşîtiyê li nav neteweyên Rohilata Pêşin û Navînda. Gelek pîrsên tarîxa milletê kurd her di tarîxa edebiyeta kurdîda aşkera û e'yan dibin, sebeb vê yekê min biryar kir wê ke zanîna xwe, weke fêhmê xwe tarîxa edebiyeta kurdî binivîsim. Çaxê min kitêb û pertok û nivîstok derheqa vê pîrsêda xwendin, ez pê hesiyam, ku niha du form, du liqê edebiyeta kurdî hene: edebiyeta bi zaravê kurmancî, edebiyeta bi zaravê soranî. Min wusa jî fêhm kir, ku piranî kitêb, pertok li ser tarîxa edebiyeta kurdî bi zaravê soranî hatine nivîsandinê, ku heta niha bi kurmancî qet xebatek derheqa tarîxa edebiyeta kurdîda çap ne bûye, ku kitêbên çapkirî derheq wêda, gişk bi herfên erebî, soranî çapkirîne. Ew kitêb evin: Aladin Secadîn, Mêjûy edebî kurdî; Refîq Hîlmî, Edebî kurd; Kerem Sazeza, Koyî û şarekanî û çend kitêb û pertokên din. (Binêre, rûpêlê "Lêgerîna edebiyeta kurdî li Îraqêda"). Di van kitêb, pertok û nivîstokanda her bi tenê derheqa şêrbêj û helbestbêjên soranda hatiye gilîkirinê. Her di kitêba Aladin Sicadînda çend gilîyên kurt li ser Meleyê Cizîrî û Ahmede Xanî hatine nivîsandinê û çend perçên şêrên wan di kitêba wêda hene. Di kitêba Maruf Xeznedarda jî ya bi rûsî hatiye çapkirinê, her hine xeber li ser nivîsarê Cegerxûn û Qadrîcan hatine nivîsandinê. Herçend xort û keçên me derva zmanê rûsî nizanin, ew nikarin wê kitêbê jî bixûnin û faydeyê jê wergirin.

Di xwendina kitêb, pertokên derheqa edebyeta kurdîda, yên bi zaravê soranî hatine çapkirinê, meriv wusa tê fehmkirinê, ku her bi tenê edebyeta kurdî bi zaravê soranî dewlemende. Bi rastî gotî, eger em baş lê bigerin, emê pê bihesin, ku edebyeta kurdî bi zaravê kurmançî jî dewlemende, ku ew lîteraturê kurdî ya klasîkî bi zaravê kurmançî û guranî gelek dewlemend bûn, ku edebyeta niha bi kurmançî bere-bere bi gavên fire pêşda diçe, bere-bere ciyê xwe layq digire, mîna soranî pêşva diçe.

Sala 1980 li Bexdadê kitêbeke mezin zanyarê kurd Sadiq Behadin Amedî çap bûye. Navê wê kitêbê "Hozanê Kurdî" ye. Eva kitêbeke baş û gelek bi nirxe, bi zaravê Behdinanî, herfên erebî li ser şanzde şayirên kurd hatîye nivîsandinê. Têda jî nengariya wan û nimûnên şêrên wan çap bûne. Xên jî şayirên bi navdar û e'yan (Elî Herîrî, Feqê Teyran, Meleyê Cîzirî, Ahmedê Xanî, Pertewê Hekarî) Sadiq Behadin Amedî nav û nişanên jinengarî û nimûnên şêrên di kitêba xweda navê donzde şayirên nehîya Behdinanê nivîsîne. Navê wan evin: Mele Mensûr (1417-1490), Xalîd axa Zehar (905-974), Mela Husêyn Batêy (ji Hekariyê, 1417-1475), Bekir-beg Erzî (1867 hatîye dinyayê), Şêx Nuredîn Brîvkanî (1791 hatîye dinyayê), Şêx Tahayê Mayî (1844 hatîye dinyayê), Huseyn Bamernî (1868 hatîye dinyayê), Şêx Xeyatêdîn Neqşbendî (1890-1944) Mela Enver Mayî (1913 hatîye dinyayê), Taha Goş (1918 hatîye dinyayê), Ahmed Enver Neqşbendî (1891 hatîye dinyayê), Taha Ruşdî (1912 hatîye dinyayê). Jinengarî û parçên nimûnên şêrê wan di kitêba Sadiq Behadinda hatine çapkirinê, sebebê vê xort û keçên me niha, yên vî zemanî nikarin kitêba wî bixûnin û faydeyê jê hildin. Min li pêşîyê xwest matêriyalê kitêba wî jî bikme kurmançiya jorîn û bi herfên latînî binivîsim û çap kim. Lê paşê min dîna xwe dayê, ku xebata min bi tomerî wê gelek west bikişîne. Min dest jê kişand, eva xebata nekîr. Min wusan jî destê xwe ji nivîsandina xebata "Tarîxa Edebyeta Kurdî" bi tomerî kişand. Li şûna wê min biryar kir her bi tenê derheqa şêrbêj û helbestbêjên here mezin û bi navdar binivîsim, derheqa wan şêrbêjanda binivîsim, yên li gulistana şayirên kurdanda têne hesabkirinê mîna gula geş. Min ew gul ji se dan gulên gulistana şêrbêjan hilçandin û derheqa wan û efirandina wanda di vê xebata xweda nivîsandin. Ji ber vê min navê xebata xwe kiriye "Gulçîna gulistana şêrbêj û

helbestbêjên kurdan". Eva nava nişan dike, ku ji gulistana şayîrên kurdan gul hatine çinîne, gulê here geş, ku her şayîrek guleke geşe bî navdare, gişk bi tevayî baxê gulistanêne. Bî rastî gotî min hemû gul ji wî baxî çinîne; Dî wî baxîda sedan sed gulên bînxweş, gulgeş hene, min nikar bû derheqa wan gişkanda binivîsiya, nav û nişanê wan û nimûnên efirandinê wan binivîsiya û banîya ber çavên xwen dekar û xwendevanên delal. Ez lava ji wan dikim vê kêmasî ya min bibaxşîne min. Ez hîvîdarim, ku li paşî vê xebata min zanyar û hozanên kurda wê rabin û bi şarezetîya xwe gulistana hemû şayîr û helbestvanên kurd binivîsin û xezna şayîrên me nişan bikin.

Eva xebata min parçeke ji wê, dibe bibe hêlan û heyecan bona nivîsandina tarîxa edebyeta kurdî bi tomerî.

Eva xebata min pareve dibe ser sê paran (parçan): "Tarîxa edebyeta kurdî bi kurteberî". Eva parça pareve dibe ser : 1) Tarîxa lêgerîna edebyeta kurdî li nav kurdanda û li Rûsistanêda, 2) Rola (lîska) kovar û rojnameyên di tarîxa lêgerîna edebyeta kurdîda, 3) Melûmetiyên Şeref-xan Bitlîsî û Evlîya Çelebî derheqa zanyar, hozan û şayîrên kurdan da, 4) Lêgerîna edebyeta kurdî li Iraqêda.

Li dû vê xebat pareve dibe ser du parçên mezin : Şayîr û helbestvanên kurmançî, Şayîr û helbestvanên soranî. Di para yekêda her bi tenê gilî li ser jîngariya şayîr û helbestvanên kurmançî têne gotinê, yên li berê şêr û helbestên xwe bi herfên erebî nivîsîne. Min şêr û helbestên wan wergerandine ser herfên latîniya kurdî.

Di para duduwanda gilî li ser wan şayîr û helbestvanên soranî têne gotinê, yên efirandinê xwe bi herfên erebî û zaravê soranî nivîsîne. Min şêr û helbestên wan guhêrandine ser kurmançî û bi herfên latînî nivîsîne. Li vira di-vêt ez bêjim, ku ez xwe hesab nakim şayîr û helbestvan; Min şêr û helbestên şayîr û helbestvanên soranî weke (qasî) fehmê xwe, qasî zanîna xwe bi kurmançî li hev anîne, wusan guhêrîne, ku fikîra wan, mezmûn û naveroka wan mîna berê bimîne, neyê guhastinê, ew çawan hatine nivîsandinê, wusan bi herfên latînî bi kurmançî hatine nivîsandinê, ku xwendkar û xwendevanên me delal karibin wan bixûnin û haj efirandinên şayîr û helbestvanê soranê birê xwe bin, haj

dewlemendiya edebyeta neteweyê xwe bin. Ev bû merem û mebesta min, çaxê min dest bi nivîsandina wê xebatê kir, min dît; sazmaniya kevnejîyîna kurda civakî, nexwedewerî û paşvamayîna kurdan, dûberekîya qebîl û eşîrên wan. Dest û dol, çiya û banî û daristanên wane bi tirs û xof û xeter, reng û rûyê halê wanî hêşîrî û bindestî, rojên wane reşe tarî, şevên wane bê amin, mûftexûrî û zordariya derebegên kurdan (axa, bega, şêx û pîran), stemkarîya bûrjûwazîya hukmatên zevtkar, û rê û dirbên azadkirina pale, gûndî, rêncber û karkerên kurd ji bin nîrê kolonîyê eva gişk di şêr û helbestên şayirên meda bi xeber xweşî û xweşbêji ha tine nitirandnê û xemilandnê. Ew hemû di efirandinên wan-
da têne ber çavan û hergav nîşanî me dikin çi li nav sed-salîya 18-19^{da} û li nav sedsalîya bîstanda hatîye serê kurdan. Her şêreke şayirê kurd, her helbesteke wan, yên vê gûlçînê, şîretê, temiyê û wesîyeta li xort û keçên kurd dikin, ew gazî wan dikin bi xîret bin, nîrê azadkirîna kurdan û barê serxwebûna wan bidne ser milê xwe.

Eva mezmûn û naveroka efirandnên piranî şayirên vê gûlçîna min.

Li nav vê gulçîna Gulistana şêrbêj û helbestbêjen kurdda hine şêrbêj û helbestbêj hene, yên ku efirandinê xwe li ser evîna xwe, dildara xwe û dilketîya xwe nivîsîne. Mesele, Elî Herîrî, Pertew-beg Hekarî, Nalî, Edeb Misbah, We-fayî û çend kesên din di şêr helbestên xweda ji birîna evînê, dildarê, dilketîyê yan dikin ah û zar, yan ji xeman dikişînin, dibêjin ew dûrin ji evîna xwe, destê wan nagihîje wê, dildar û dilketîya wan haj derdê dilê wan nîne ew bêûmûd hiştine, gûh nadine. ah û zarê wan. Her li efirandinên Meleyê Cizîrîda, Xerîqda şêrên têkel (tev hev) yên dildariyê û sofîtîyê hene. Lê dîsan eger em bi kûr û dûr dîna xwe bidne ser efirandinên wan, emê di wanda rêzên sosîalî bibînin, rastî rêzên ayîn û jîyîna kurdan ya civakî bîn.

Barê xeberan (xeberbarîya) şêr û helbestên hemû şêrbêj û helbestbêjên vê gulçînê ne mîna hevîn. Piranî şêr û helbestên wan rehet û hêsa têne fehm kirinê. Her bi tenê şêrên çend kesan giran têne fehm kirinê. Ew jî ew şêrên, yên ku têda gelek xeberên erebî hatine xebitandinê, yan jî di bin bandûra zmanê beyanî hatine nivîsandinê. Di vî werêda

em dikarin bêjin hine şêr û helbestên Meleyê Cizîrî, Edeb Misbah, Nalî, Wefayî û çend kesên din bi vî cûreyîne.

Di kutabûna pêşgotîna xweda ez dixwezim bêjim, ku di gulçîna gulistana şêrbêj û helbestbêjên kurda min her melûmetîyên kurt derheqa sî û çar şêrbêj û helbestbêjanda nivîsîne, navê gelekên li vîra ne hatîye nivîsandîne. Şêrbêj û helbestbêjên me yên kilasîkî û zamanê niha gelek gelekin. Navê gelek şêrbêj û helbestbêjên kilasîkî (yên guranî û karmancî) aşkera ne bûye, em nizanin, lê navê çend şêrbêj û helbestbêjên niha em dizanin, me bihîstîye, mesele, Hêmin, Kamûran, Fayq Bêkes, Ebdûla Peşew û Sebrî Botanî gelekên din. Eger em navê wan tev navê din jî bi yeko yeko binivîsin, wê dirêj be û gelekî bikişîne, bi tomerî nivîsandina navê hemû şêrbêj û helbestbêjên kurd eger bi yeko-yeko bê nivîsandin, wê bibe kitebekê. Bira eva jî bi be îş û karê merivêkî din, merivê bi xîret, xîret bixebite, hemû melûmetîyan derheqa wanda kom bike, nav û nîşanên wan binivîse û bike kitêb, dilê xort û keçên kurd şad bike. Ez bawar dikim, ku ew rojê bê û wê wusa jî be.

Meha Avgûstê sala 1975 min dest bi nivîsandina vê xebatê kir, nav-navara, bere-bere û hêdî min ew dinivîsî. Sala 1981 meha îlûnê min ew temam kir.

Ez bi dil û can vê xebatê pêşkêşî rêdaksîona "Roja Nû" dikim, ku ew wê çap bikin bona xwendkarên kurd, bona karker gundî û rencberên kurd.

QANATÊ KURDO

25/VI/1982 - LENINGRAD

TARİXA LÊGERÎNA EDEBYETA KURDÎ LI NAV KURDANDA Û RÛSISTANÊDA

Berê pêşin sertacê lîteratûra kurdî, binyat û binaxedarê bîr û bawara kurdewerî, kurdperwerî û wetenperwerîya ser-xwebûna kurd û Kurdistanê, şayîrê kurd ê mezin û bi nav û deng Ahmedê Xanî di "Mem û Zîn"a xweda nivîsîye, ku berî wî şayîr û nivîskarên kurdan hebûne, lê navê wan hatiye ji bîr kirinê, çimkî kesek tune bûye navê wan ji bîr bîne û binivîse, ku kurd jî xudanê şayîr û nivîskaran bûne, ku şayîrên wan jî hebûne. Derheqa vê yekêda Ahmedê Xanî ev rêzên jêrîn di "Mem û Zîn"a xweda nivîsîne :

*"Ger dê hebûwa me ji xudane,
Ali keremek, letîf danek,
U'lm û huner û kemal û ezan,
Şêr û xezal û kitab û dîwan,
Ev cins biba li ba wî me'mûl,
Min dê elma kilamê mewzun
A'li bikira li banê gerdun,
Binave ruhê Melê Cizîrî,
Pê he bikira Elî Herîrî,
Keyfek wê bîda Feqê Teyran,
Heta ba ebed bîma heyran"*

Li paşê aşkera bû, ku bi rastî ev hersê şayîr (Mele Cizîrî, Elî Herîrî û Feqê Teyran) li berî Ahmedê Xanî hebûne, şêr û dîwan bi kurmanci nivîsîne. Lê sed car heyf, ku di wê demêda kes tune bûye, ku serhatîya wan û nivîsarên wan li nav xelqêda belav bikin. Lê divêt bêjin, ku li nav goveka xwendkar û xwendevanê silsilata derebegên kurdanda navê gelek şayîr û nivîskaran aşkera bû, ku di nav wanda bi nivîsar yan jî bi zargotin gilî dikirin, ku şêrbêj û helbestbêjên kurd hebûne. Sêya serê vê yekê em pê hesiyanê, haj pê hebûne, ku navê hinek şayîr û nivîskar, hozan û zaryarên kurdan hebûne, ku destnivîsarên hineka mane, goveka axa, bega û mîrên kurdan li cem xwe hiştine, xwe bi destnivîsar li cem xwe nivîsîne, xwedî kirine, hiştine yan jî dane heval û hevkarên xwe. Sêya serê vî edetî li nîvê sedsalîya nozdanda gelek xwendevanên kurd û gelek zanyar

pê hesîyan û navê heyşt şayîr û nivîskarên kurd li kitêbanda xwendin. Derheqa wanda berê pêşin malumatîyên ne aşkera bi arîkarîya kurdên xwendewar û rewşenbîr hatine nivîsandinê û çapkirinê.

Li nivê sedsalîya nozdanda Akadêmîya Rûsistanê sparte bay lozê xwe Alêksandir Jaba, yê ku li Erzurumê bû, mijûlî komkirina madeyên folklorî, tarîxî, êtnografî û lîteratûra kurdî bibe, destpêbike nivîsarên kurdî bigere, dest xe û bişîne Akadêmîya Rûsistanê.

Alêksandir Jaba zanînga Pêtêrbûrgê xilas kiribû, bûbû rohilatnas, ewî rind zimanê tirkî, farsî, inglîsî, fransî zanibû. Li Erzurumêda ew dibe nasê hine kurdên xwendewar û zana. Bi arîkarîya wan ew gelek destnivîsarên kurdî kom dike û dişîne Akadêmîya Rûsistanê li Pêtêrbûrgê. Li nav wan destnivîsaranda destnivîsarên rêzmana kurdî, yên folklorî, tarîxî, êtnografî û lîteratûrî hebûn. Xên ji wê ewî kitêbek bi navê serhatî û çîrokên kurd bi tercma xwe bi zmanê fransîzî nivîsî bû û şandibû Pêtêrbûrgê. Di sala 1960-da ew kitêb bi navê "Recueil de Notices et recits kurdes" li Pêtêrbûrgê çap bûye. Têda têkstên serhatî, çîrok û melûmetîyên li ser heyşt şayîr û nivîskarên kurd bi kurmancî herfên erebî û tercma bi zmanê fransî hatine çapkirinê. Lêgerîna zmanê wan têkstan û melûmetîyan nîşan dîkin, ku ew bi destê xwendewar û zanyarên kurd bona Alêksandir Jaba hatine nivîsandinê. Navê wan merivan eve: Taha Hacî Ebdal Ezîz, Mehemed Xerîb Sulêman, Şah Neze, Mela Mehemed, Hesên Hekîm Başî, Mela Mehmed Beyazêdî, Mehemed Moksî û yên din.

Di kitêba Alêksandir Jabada, ya ku li jorê min navê wê nivîsî, li rûya 13-19-da ev melûmetîyên jêrin li ser şayîr û nivîskar û zanyarên kurd nivîsîne:

ŞAYÎRÊ BERÊ Elî Herîrîye, dîwançeyek heye, "Şêr û qesayêd Herîrî" dibêjin. Ji gundê Herîrê, ji cih nehîya Şemzîdan di sincaqa Hekarîyanda ji daykê bûye. Şêr û ebyetê di wî jî di nêv Kurdistanê qewî zêde meşhure û merufe. Texmînan ku di tarîxa çar sedê hîcre peyda bûye û di çar sed û heftê û yekêda mehrûm bûye û di nêv Herîrêda medfûne".

ŞAYÎRÊ DIWÊ Melayê Cizîrîye, eslê wî ji Cizîra Bohtane, navê wî şêx Ahmede, di tarîxa pênsed û çilîda di nav Cizî

rêda peyda bûye, di wî wextîda mîr Onad Êdîn di Cizîrê mîr bû û xweheke mîr hebû; Ev şêx Ahmed jî li xweha mîr a şîq bûye, xezalyatne gotiye û dîwançeyek tertîb kiriye, dîwana Meleyê Cizîrî dibêjin; Qewî dîwanekî mestihe û li nik ekradan meqbule. Paşê mîr Onad Êdîn ew şêx Ahmed cêrbandîye, ku aşîqê heqîqîye û xweha xwe dayê. Şêx Ahmed qebûl ne kirîye. Ew şêx Ahmed jî di tarîxa pênsed û pêncî şeşê mehrûm bûye û di nêv Cizîrê medfune û zîyaretgaha xelqêye".

ŞAYÎRÊ SISÊ jî Feqê Teyrane, ku navê wî Mehemedê, eslê wî jî qeseba (bajêroka) Moksêye, ta'ba welatê Hekariyane, di tarîxa heft sed û dudya peyda bûye, hekyata "Şêx Sena'nî" gotiye û qisa "Ber Sîsayî" jî mewzun gotiye û "Qewlê Hes-pê reş" jî wusanê mewzun gotiye û zehf beyt û eşa'r jî qewî me'lum û rengîn gotiye û navê wî jî di şêrêda mîm û heye û muqdarî (nêzîke) heftê pênc salan emir kirîye û di tarîxa heft sed û heftêda merhûm bûye û li Mîksê jî medfûne.

ŞAYÎRÊ ÇARÊ jî Melayê Batêye, navê wî jî Mela Ahmedê, eslê wî jî Batêye. Batê navê gundeke jî gundê di Hekariyan, di tarîxa heşt sed û bîstî peyda bûye, zahf şêr edebeyat gotiye, dîwanekî mehsûs heye, qewî qenc û mewlûdekî kûrmancî gotiye, di Kurdistanê ew meqbûle û heştê sal emir kirîye û new sedê hicrê merhûm bûye, di nav gundê Bateyî jî medfûne.

ŞAYÎRÊ PÊNCÎ jî Ahmedê Xanîye, eslê wî jî tayfaye Hekariyane, jî eşîreta xanîyane. Bi xwe hatîye Bazîdê, di tarîxa hezarîda tewten kirîye, di zimanê kurmancîda "Mem û Zîn" navê kitebek aşoq û maşoqan gotiye û kitebet lûxet jî bi kurmancî û erebî gotiye, navê Nûbare û zarokê di Kurdistanê di piştî quranê dixûnin û zehf jî xezelyan û eşaran û bayt bi zimanê kurmancî gotiye û di zimanê erebî û farsî û tirkî jî dîsan xezalyat û eşaran û edebiyat zehf gotine, di ulmê fenûnan jî qewî maher û sahib erfane û şayrê di Kurdistanê hemûyan jî meşhûr û fayqe, belke jî hemû şeran meqbûle û di tarîxa di hezar şêst û sêda jî merhûm bûye, di nêv Bazîdêda mizgeftek jî bi navê xwe bi na kirîye û bi xwe jî li kenarê mizgeftê medfûne.

ŞAYÎRÊ ŞEŞÊ jî şayîrêd Kurdistanê xamile, nave wî jî Îsmayîlê, eslê wî jî Bazîdêye, jî şagirdê di Ahmed Xanîye, di

hezar şêst û pencê hîcrê peyda bûye, di hezar sed û bîst û yekêda merhûm bûye û kitebekî lûxetan jî "Gulzar" nav talîf kirîye, bi kurmançî û erebî û farsî zarû dixûnin û xeyr wê jî zehf xezalyan û eşaran û ebeyat bi zimanê kurmançî gotiye, di cîhda meşhûr û merûfe û di nêv Bazîdêda merhûm û medfûne.

ŞAYIRÊ HEFTÊ Şeref-xane, ji mîrêd Hekariyane û ji nislê Ebasî, di hezar û sed û yekêda jî li Culamerkê ku cihê hukmeta Hekariyane, peyda bûye, eşar û beyat bi kurmançî û farsî gotiye, di hezar sed û şêst û yekêda merhûm bûye, di nêv Culamerkêda medfûne.

ŞAYIRÊ HEYŞTÊ Murad-xane, ku di Bazîdêda di tarîxa hezar û sed pencêda li Bazîdê peyda bûye; Ew jî muqadarêkê xezalyat û eşaran bi zimanê kurmançî gotiye û di hezar û sed û newêd û nehêda merhûm bûye û di Bazîdêda medfûne û paşî wî ji kurmancan êdî şayir peyda ne bûye hetî niha.

ELÎ TEREMOXÎ

Li paşî melumetîyên li ser şayirên kurd di kitêba Alêksan dir Jabada hinek melumetî derheqa ulmdar û zanyarên kurd da hatine nivîsandinê û derheqa Elî Teremoxî ewî nivîsîye: "Elî Teremox ji gundê Teremoxîye, merivekî gelek zana bûye, gelek ulm zanibûye, zimanê erebî, farsî, tirkî û kurdî rind zanibûye, gelek gerîyaye, çûye Bexdayê, Musulê Behdînanê û Soran, bi zimanê kurmançî "Qewlê yekane", "Kurêd weten", "Morîya yaqut", "Jiyîna heqîqet xewne" û serf û neha kurmançî nivîsîne".

Heta niha destnivîsarên wan nivîsarên Elî Teremoxî neketi ne ber destê zanyaran, ku mijûlî lêgerîna wan bibin, lê divêt bêjim, ku her bi tenê destnivîsarên Elî Teremoxî yên "rêzmana kurdî û erebî" e'yanin. Ew niha li kitêbxana bi navê Saltikov-Şêdrîndanin li Leningradêda. Derheqa wan Marûf Xeznedar di pêşgotîna xweda ya "Destûrî zimanê erebî bi kurdî" da gili dîke û dinivîse, ku "Elî Teremoxî li sedey şanzde-hefdeh demî zayîn jiye û sereta destûre "Serfe zimanê erebî bi zimanê kurdî bona qutaban" nivîsîye" (rûê 22).

İSMAYL BAYZÊDÎ (XVII-XVIII)

Bî melûmetîyêd A.Jaba Îsmayl Bayezêdî şagirtê Ahmed Xanî bûye, li sala hezar şêst û pêncî hîcrê (1654-55) li Beyzê dê ji daykê bûye, li sala hezar sed bîst û yekêda hîcrê (1709-10) çûye rehmetê. Kitêbek bi navê "Gulzar" ya ferhengê kurmançî, erebî û farsî bona zarûwan çêkiriye, zarû wê dixûnin. Xên ji wê ewî gelek xezal, şêr û beyt nivîsîne bi kurmançî, li welatê xweda gelek meşhur û marifet bûye. Li Bazîdêda mirîye û wêderda jî çal kirine. Heta van salêd paşin qet li cîkî destnivîsarêd wî dest nexistine û çap nekirine. Dibe wextekî edebyetnasêd me kurd li Kurdis tanê bigerin, destnivîsarêd şêr, beyt û xezalên wî dest xin, çap kin.

ŞEREF-XAN (XVII-XVIII)

A.Jaba e'lam dike, ku Şeref-xan jî mîrêd Hekarîyan bûye, ji nesla Ebasîyan, di sala hezar sed û yekêda (1689-90), li Culamêrkêda, ku cîyê Hekaryane, ji daykê bûye, şêr û beyt bi zimanê kurmançî û farsî gotine, di sala hezar sed û şêst û yekêda (1748) mirîye û li Culamêrkêda çal kirine

Sed car heyf û mixabin, ku heta niha qet şêrek û beykete vî şayrî (helbestvanî) ne hatine çapkirinê, dibe wexteke edebyetnasêd kurd wan li cîkî dest xin û çap bikin, çavê xwendevanêd me delal lê keve, ew bi serbest bixûnin.

MÛRAD-XAN BEYAZÊDÎ (XVIII)

A.Jaba di kitêba xweda dinivîse, ku Mûrad-xan di sala hezar sed û pencîda ji daykê bûye û di sala hezar newêd nehêda mirîye û li Bazîdê çal kirine. Ewî jî gelek xezal, şêr bi zimanê kurmançî gotine. M.B.Rûdênko li kitêba xweda ya "Nivîsandîna ser û berê destnivîsarêd kurdî"-da nivîsiye, ku li kitêbxana Lêningradêda ya bi navê Saltîkov-Şêdrînda destnivîsarêd çend xezalêd Mûrad-xan hene.

J.S.Mûsaêlyan li avtorêfêrata xweda ya bi navê "Kurdskaya Narodnaya poêma "Zembilfiroş" i yêyo lîteratûrna vêrsîya" dinivîse, ku bi melumetîyêd edebyetnasêd kurd beyta "Zembilfiroş" Mûrad-xan nivîsiye.

Ev melumetîyên li kitêba Alêksandir Jabada nivîsandî bi herfên erebî çapkirîne, tercîma wan bi zimanê firansîzî têda çap kirîne û ew kitêb di nivê sedsalîya XIX-da li pê têrbûrge hatîye çapkirîne, lê bi rastî berî şûrsa Aktyabî rê kesek haj wan melumetîyan tune bûye. Eger kesekî ew melumetî bixwenda, zanibûya, wê ji zûva derheqa wanda di kitêbekêda, pertokekêda ew melûmet bi zimanê rûsî, kurdî binivîsîyana, bigotana, ku lîteratûra kurdî ya bi nivîsan dî heye. Lê kesekî guh ne da bû ser wê, nenivîsî bû, ku ew melumetî bi hewasdarin. Eva yeka hate nivîsandin her di welatê Sovetêda li paşî hazirkirina kadrê kurdnas. Her li paşî hazirkirina kurdnasan li Sovêtistanêda çar û mîkan peyda bûn bibîne nasê wan melumetîyê Alêksandir Jaba û li ser lêgerîna tarîxa peydabûna lîteratûra kurdî bixebitin û isbat bikin, ku lîteratûra mîletê kurd hebûye, heye û gelek dewlemende. Lê divêt bêjin, ku berî me li derva rew şenbîkerên kurda bi xwe xereqî lêgerîna tarîxa peyda bûn û pêşketina lîteratûra mîletê xwe bûne.

Mesele, berê pêşin li nav salên 1932-1945-da çapkerê kovara "Hewarê" Celadet Elî Bedirxan melumetîyên baş li ser nivîskar şayîr û hozanên kurdan di kovara xweda çap dikirin. Li hejmara 33-da ewî nivîsareke mexsûs derheqa klasîkên kurdanda çap kirîye. Navê wê nivîsarê "Klasîkên meye" têda melumetîyên Alêksandir Jaba bi zimanê kurmancî çap kirine û serda zêde navê hine şayîr û hozanê kurd hatîye nivîsandinê.

Li paşî vê li Sovêtistanêda, xasma li Lênîngradêda, li nav salên 1958-1967-da bi xwestin û arikarîya min şagirta min rehmîti Margarîta Barisova Rudenko mijûlî hazirkirin û çapkirina destnîvisarên kurdî dibû. Li nav wan salanda ewê çar-pênc xebatên heja û bi hewasdar li ser edebiyeta kurdan çapkirine. Navê wan xebata ewe: "Mem û Zîna Ahmedê Xanî" (Moskva-1962), "Şêx sena'n a Feqê Teyran" (Moskva, 1965), "Nivîsara Mele Mehmûdê Beyzêdî, Jîyîn û ayîna kurdan" (1963), "Leyl û Mecnûna Xarîs Bitlîsî" (1963), "Nivîsandin li nav û nîşanên destnîvisarên kurdî" (Moskva, 1961) û yên din. Li nav wan salanda Maruf Xeznedar ji Iraqê hatibû Lênîngradê, li ber destê min li ser tarîxa lêgerîna lîteratûra kurdî bixebitê.

Saya serê xebatên Aleksandir Jaba, M.B.Rudenko her niha

li welatê Sovetîstanêda û li serva pê hesîyane ku milletê kurd jî xudanê bîrewera bi hêja û efirandinên bi qîmet û giranbihaye, ku wî jî gelek tiştên hêja xuliqandine. Bi rastî gotî berî aşkerabûna desnivîsarên kurdî yên Aleksan dir kom kiribûn, û berî nivîsandina M.B.Rûdenko derheqê wanda li Rûsistanê hela hê nivê sedsalîya nozdanda ulmdarekî rûsan bi navê Dittel di xebata xweda "Rêbarî li Rohîlatêda (-ya ku li "Jûrnala mînîstêrstva prosvêşênîyada (SPB.-1848, i otdêl VI, belge 1-30) çap bubû nivîsîye."Zi manê eşîrên kurdan kêr hatine lêgerînê, litêratûra wanê zar gotin gelek dewlemende, xên ji wê litêratûrê, litêratûra wane nivîsandî jî gelege, rohilatzan dikaribûn mijûlî wê litêratûrê bibin, litêratûra wan dewlemende, nivê wê ya wan bi eslî serbixweye, nivê din ji zimanê farsî tercimekirîye, navên gelek merivên kurd yên şêrnivîs û tarîx nivîs yên bi nav û deng eşkerane". Sed car mixabin û heyf ku Dittel navê wan di nivîsara xweda nenivîsîye, ewî navê wan di destnivîsara xweda hiştîye û desnivîsara wî li ser kurdan, qebîlên wan û kûltûra kurdan niha li arxîva Akadêmîya zanîntîyêdaye.

Li welatên Evropayêda kesek haj van gotinên Dittêl û melû metîyên di kitêba Alêksandirda nivîsandî nî bû û sebeb wê yekê E.M.Katremer (binêre: E.M.Quatremere: Notice extraite des manuscrits de la Biblithequs du roi et autres Biblitheques, Paris, 1836) û G.R.Drever (binêre: 1-The Dis-pertion of the kurds in ancient times, JRAS, 1921, IV, 2- The name "Kurde" and its philological connection, JRAS, 1923, III, 3- Studies in kurdes History, BSOS, 1922, T.II) di xebatê xweda nivîsîne, ku litêratûra kurdî tune. û eva gotina li xebatên êtnograf, rêbar û zanyarên Evropayêda dû hev dihate gotinê û nivîsandinê. Her di kutabûna sedsalîya nozda û destpêka sedsalîya bîstanda dinya pê hesîya, ku litêratûra kurdan ya nivîsandî hebûye, heye û gelek dewlemende. Eva yeka hate gotin û nivîsandinê saya se-rê wê yekê, ku kurd bi xwe di wî wextîda mijûlî tarîxa peydabûn û pêşveçûna litêratûra milletê xweva bûn. Ew melûmetî nîşan dîkin, ku eger li nav kurdanda, xasma li nav goveka xwendkar û xwendewarên wanda nav û dengê gelek sayir, nivîskar û zanyarên kurd aşkera ne bûya. Eger wana derheqê wanda ne zaninbûya, bi zar li nav wanda negotina, gilî nekirina, yanê jî bi nivîsar nav û nîşanên wan li

cem xwe nenivîsandîna, nehiştîna, kesekî nikar bûya ew melûmetî ji Alêksandir Jabara bigota, yan jî binivîsîya. Ew melûmetî nîşan dikin, ku li nav xelqê kurda berê edet bû serhatiyên şayîr û nivîskarên xwe zanişin, û gili bikin, li nav hevda belav bikin. Saya serê vî edetî kurdên Erzurumê, yê arîkarî Aleksandir Jaba kiri bûn, haj dîroka lîteratûra kurdî hebûn û zanîbûn û karîbûn derheqa wêda gili bikin yan jî binivîsin. Eger ew haj pê ne bûna, nav û nîşanên Elî Herîrî, Feqê Teyran, Meleyê Cizîrî û yê din ji Aleksandir Jabara gili nekirina, nenivîsandîna ewê ji kiderê karî bûya ew melûmetî derheqa edebyeta kurdîda di kitêba xweda çap bikira, xerêqî lêgerîna tarîxa edebyeta kurdî bibûya.

Li sala 1967-da Marûf Xeznedar kitêba xwe "Oçerkî îstorî sovremennoy kûrds koy lîteratûrî" (yanê qurt nivîsandîna tarîxa edebyeta kurdî ya niha) çap bû. Li paşî çapkirina kitêbên M.B.Rûdênko û Kitêba Marûf Xeznedar li Sovetîstanêda pê hesîyan, ku edebyeta kurdan hebûye, heye û gelek dewlemende, ku mîletê kurd jî mîna mîletên din xudanê bîrewara hêja pêşkevî û efirandinên bi qîmet û giranbihaye ku kurdan jî tiştên bi nîrx xuliqandine.

Derheqa lêgerîna edebyeta kurdîda di wextê xweda li Iraqêda li paşî şûrşa Aktyabirê kitêb, pertokên bi qîmet hatîne çapkirinê (binêre "Lêgerîna lîteratûra kurdî li Iraqêda" di vê nivîsara minda). Lê herçend xebatên wan bi zîmanê kurdî hatibûn çapkirinê, kesekî kurdnasên Evropayê heta van salên paşin haj pê nîn bûn. Wusan jî kesek ji kurdnasên Sovetê û Evropayê haj nivîsarên Aleksandir Jaba û Dittel nîn bûn. Sebeb vê yekê Katrêmêr E.M, Dravêr G.R. di nivîsarên xweda nivîsî bûn, ku "Lîteratûra kurdî tune" Eva gotina li paşê di xebatên etnograf, rêbar û zanyarên Evropayêda li dû hev dihate gotinê û nivîsandinê. Her li kutabûna sedsalîya nozdan, xasma li despêka sedsalîya bîstanda bi saya serê xebatên zanyarên kurd li Iraqêda û saye serê kitêb û pertokên M.B.Rûdênko û kitêba Marûf Xeznedar dinya pê hesîya, ku lîteratûra kurdî ya serbixwe heyê û gelek dewlemende, ku navê gelek şayîr û helbestvanên kurd di tarîxêda e'yanin, ku di wê edebyetêda tiştên hêja bi nîrx û giranbiha hene û layqê mijûlî lêgerîna wê bin.

Li vira jî lazime çend gilîyan derheqa hevbendîya edebet û zargotina kurdî bêjim.

Eşkeraye, ku edebyet û zargotina her milletî bi hevra girêdaye, hevbendîya wan bi hevra heye. Zanyarên kurd û kurdnas di xebatên xweda dinivîsin, ku di tarîxa peydabûn û pêşveçûna edebyeta kurdîda zargotina cimaetê (çîrok, hekayatên tarîxî, serhatî û serpêhatîya merivan, beyt, kilam) kanîya edebyeta kurdî bûye. Mesele, Aladîn Sîcadin, Givî Mukarîyanî, Maruf Xeznedar di nivîsarêd xweda (Aladîn Secadî, Mejuy edebyetî kurdî, Bexdad, sala 1950) Maruf Xeznedar, Oçêrkî sovremenoy kurdskey lîteratûrî, Moskva, 1965) nivîsîne, ku zargotina kurdî berepêşin kanîya peydabûn û pêşveçûna edebyeta neteweyê kurd bûye. Kurdnasa Sovêtîstane M.B. Rûdênko di kitêbên xweda Meselan tîne ber çavên xwendevanan, ku Ahmedê Xanî "Mem û Zîn" a xwe ji "Mem û Zîn" a zargotin, ji "Memê Alanê" zargotin wergirtiye, nivîsîye, ku Xaris Bitlisî "Leyl û Mecnuna" xwe ji "Leyl û Mecnuna" zargotin wergirtiye, ku Feqê Teyran beyta xwe "Şêxê Sêda'na" ji beyta zargotina "Şêrê sîsebanê" yan jî ji beyta "Doda gurca" wergirtiye. M.B. Rûdenko wusan jî nivîsîye, ku gelek tiştên baş yên edebyetî ketine nav cimaetê, bûne beytên zargotinê. Dengbêj, çirokbêjên kurdî gelek cara bi ezberî hînfî stran, gotin û gilîkirina serhatîya, qeremanên beytên zargotin bûne û li nav cimaetê bi qeydê xwe, bi tertîb û sazmaniya xwe belav kirne. Ev gilîrastin. Mesele, em hîldin beyta "Dimdimê", serhatiya "Siyabend û Xecê" ya "Memê û Eysê", ya "Sêva Hacî" beyta "Elî Şêr" serhatiyên "Şêrê Sîsebanê" "Mem û Zîn" yan jî serhatiya "Zembilfiroş" û gelek tiştên din him li zargotin hene, him jî bi şaxê edebyetî. Eva yeka nîşan dike, ku şaxên edebyetê û yên zargotinê gelekî bi hevra girêdayîne ku hevbendîya wan bi hevra heye. Ew nîşan dîkin ku, arîka rîya hostatîya nivîskar, şayîr û çîroknivîs gelek beyt, serhatiyên dildaran, çîrok û hekyatên tarîxî bûne beyt (destan), serhatî û cirokên nivîsandî, bûne şaxên edebyetiyê. Mesele, bi arîkariya aqil û ferasetî û hostatîya Ahmedê Xanî "Mem û Zîn" e "Meme Alan" yên zargotinê bûne şaxê nivîsandî yê edebyetiyê. Bi arîkariya nivîsara Erebe Şemo beyta "Dimdimê" ("Xanê Cengzerin") bûye remana nivîsandî, bi arîkariya Semendê Siyabendov şaxê serhatiya "Xecê û Siyabend" bûye poêma nivîsandî. Ev şaxên nivîsandî

bi tertiba xweva, bi sazmaniya xweva, bi rengê nivîsara xweva, bi xemla xweva li gelek ciya guhastîne, ne mîna şaxên zargotinê ne. Lê naveroka wan, nêt û meremê wan navê qeremanên wan kêr û zêde mîna hevin. Eva yeka ji dîsan nîşan dike, ku edebiyet û zargotina kurdî bi hevra giredayîne, ku hevbendîya wan bi hevra heye.

ROLA KOVAR Û ROJNAMÊN KURDAN LI DÎROKA EDEBYETA KURDÎDA

Kovar û rojnamên kurdî li tarîxa peydebûn, pêşveçûn û lêgerîna lîteratûra kurdan cîkî hêja û layq girtîne, çimkî peydebûn û pêşveçûn û lêgerîna lîteratûrê wê bi peydebûn û pêşveçûna kovar û rojnamên kurdîva girêdaye. Di sirîya xweda peydebûn û pêşveçûn û lêgerîna lîteratûra milletê kurdî bi peydebûn û pêşveçûna şerê serxwebûna melitê kurd va girêdaye û hevbendîya wan li hemû alîyava bi hevra heye.

Di tarîxêda aşkeraye, ku bernamên kovar û rojnamê xelqê ew bûne, ku propaganda hişyarbûna milletê xwe bikin, ku millet xwe nas bike, û qîmetê ziman, kûltûra xwe zaniye, pêşketîyên efrandkerên lîteratûra xwe nas bike, qedirê wan zaniye, hêz û qewatên xwe pêşketî bike yek, bi tevayî û hevkar şer bikin bo xatirê azadî û serxwebûna millet.

Eger em baş mijûlî tarîxa peydebûn û pêşketina kovar û rojnamên kurdî bibin, emê bêne ser wê fikirê, ku nêt, mehem û mebestê kovar û rojnamê kurdî jî ew pîrs bûne, ku bernama wan jî hema ew pîrs û daxwaz bûne.

Kovar û rojname wusan jî li cîyê xweda bûne meydan û bînga çakirî û belav kirina çîrok, serhatî, şêr, helbest, beyt û dastana. Kovar û rojnameyan melûmetîyên kurt derheqa şayîr, nivîskar û zanyarên milletê lamî xwendevanên xwe dikirin, ew wusan jî bûbûne meydana gelek şayîr, nivîskaran. Wana şêr, xezel, helbestên xwe têda car-caran çap dikirin. Eger kovar û rojname çap nebûna, nivîsarên helbestvanan, çîrokvanan, dîroknasan, û zanyaran têda çap ne bûna, ew nivîsar, ew helbest wê wunda bibûna, wusa pûç bibûna û ji paşketîyanra ne mana. Hema saya serê kovar û rojnameyan em dikarin tarîxa peydebûn û pêşveçûna lîteratûra milletê bînin ber çavê xwe û binivîsin.

Rojname kurdî ya berê pêşin ku çap bûye û di vê rêda rola xwe lîstîye, gazêta "Kurdistan" (1898-1899) bûye. Eva rojname bi destî kurên Bedirxan-Abdurehman-paşa û Midhat-paşa çap dibû. Hukmeta siltanê Romê çapkirîna wê li Tirkîyê qedexeyê kiribû. Sebebeke wê yekê ew mecbûr bûn wê li Qaherê, Londonê, Folkstonê û li cîyê din çap bikin.

Berê pêşin di vê rojnama kurdîda hine gilî-gotin li ser lêgerîna dîroka lîteratûra kurdî nivîsîne. Mesele, li hejmara wê ya sisîyanda ewê di danezana xweda nivîsiye: "Zanyarekî almanî navê wî Fon Hartmane, hatiye Kurdistanê, mijûlî hinbûna zimanê kurdî dibe, têkstên folklor û lîteratûra kurdî kom dike bona lêgerîne". Li paşî vê melûmetîyê çapkerê rojnama "Kurdistan" t'emîya li xwendevanên kurdan dike û dibêje wan, ku ew jî "têkstên folklorê û lîteratûra kurdî k'om bikin, li ser zimanê xwe û li ser neteweyê xwe kurd tişteki binivîsin" (binêre, "Kurdistan", Hejm. N3) Çapkerê vê rojnamê bi xwe li dû hev parçe-parçe têkstên ji dastana Ahmedê Xanî "Mem û Zîn" çap kirine û derheqa Ahmedê Xanî û "Mem û Zîn" a wîda ev gilîyên jêrin nivîsîne: "Sala 1650-da Ahmedê Xanî kitêbek nivîsiye, navê wê "Mem û Zîn" e, li ser aşoq û maşoqên cahil hatiye nivîsandinê, têda melûmetîyên bi hewas yên tarîxî û kûltûrî li ser dîroka kurdan jî nivîsîne, têda wusan jî gelek t'emî, nesîhet, metelok û gotinên nesteqî nivîsîne, ji ber wê pêvîste wê kitêbê bixûnin, ezber zanibin. Em wê bir bi bir çap dikin bona xwendevanên xwe. Ew kitêb du sed sal berê hatiye nivîsandinê, hine belgên wê nayêne xwendinê, dibe wextekê ez karibim wan belgan bixûnim, berpa bikim. Eger li cem merivekî destnivîsara wê heye, ez lava dikim bo min binêrin (bişînin), ku ez wê hember bikim, rast bikim; meremê min heye wê başçe çap bikim. Min hine cî ji wê ter cime kirine ser zimanê tirkî, erebî û ji zanyaranra xwend wan bi dengekî digot: Ji vê kitêbê baştir û çaktir ne dîtîye û nexwendîye" (Kurdistan, hejmara 3. rûyê 3). Disan di wê hejmarêda çapkerê wê rojnamê hine melûmetî derheqa Qadîr Koyîda e'lamî xwendevanên xwe kirine. Ewê têda nivîsiye: "Di nav soranda zanyarek hebû, ew par mir, rehma xwedê lê be. Navê wî Hacı Qadîr Koyî. Di emirê xweda ew gelek xebitîye, kû miletê kurd xwendewer be, xudan ulm û zanîne be. Ewî gelek şêr bi kurmancî nivîsîne, şêrên xwe dişande welatê xwe. Ew xwe bi zaravê soran dipeyve (xeber dide), lema kurd zaravê wî fehîm nakin. Li ser rûpelê "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî Qadîr Qoyî bi destê xwe şêrek nivîsiye, têda ew dibêje merivê mîna Ahmedê Xanî û nivîsara mîna nivîsara wî "Mem û Zîn" tu nene, ku Ahmedê Xanî û Qadîr Koyî bînge û binaxa edebiyeta kurdî danîne". Li paşî van gilîyan kovare "Kurdistan" şêra Qadîr Qoyî li jêrê çap kirine. Ew şêr awa tê gotinê :

Zemanê resmî caran ne mawe,
 Çiraxî nizam û menşî kujawe,
 Le dewrî ême zûwan û cirîde
 Eger çe meqsedî zanîn bawe,
 Eman qedrî bizane em kitêbe
 Le dinya êsta ke hemsay ne mawe
 Lê aynam heyat şêx Xanî
 Le ser nîsxeta xetaw nûsrawe,
 Le lay erbab xoy bi qedir û qîmet,
 Xezîneyî wefhere û kîsî dirawe,
 Le encam mecmûe dul soran û bohtan,
 Le saye em kitebe nûsrawe.
 Le kûrdan xeyrî Hacî û şêx Xanî
 Esase nizame kurdî da ne nawe".

Di vê şêrêda Qadir Qoy dibêje :

Zemanê resmî caran ne maye,
 Çîra nizam û neşrê kujawe hatiyê vekuştîne
 Li vê dewra ziman û çiridê,
 Eger çi meqsedê zanînê heye,
 Hema qedrê vê kitêbê bizane,
 Li dinya niha hevtayê wê ne maye,
 Li ayna heyata şêx Xanî,
 Eva t'ev bi qedir û qîmet
 Xezna cewahîr û kîsê giranî,
 Li cemeka soran û botan
 Eva kitêba hatîye nûsînî (nivîsandîne)
 Ji kurdan xencî Hacî û şêx Xanî,
 K'esekî binaxe nizama kurdî danonî.

Heta van salê paşîn kesek haj vê şêrê ne bû, di dîwana wî da ya sala 1945 çapkirdîda ew şêr tune. Saya serê gazêta "Kurdistan" niha em pê hesîyane, ku Qadir Koy "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî xwendîye, qedir û qîmetê nivîsarên wî zanîbûye û lêma jî nivîsiye "Ji kurdan xencî Hacî û şêx Xanî, kesekî binaxa zimanê kurdî dananî".

Berê kesek haj pê nî bû kengê Qadir Koy çûye rehmetê. Niha saya serê melumetîyên gazêta "Kurdistan" em haj pê bûne, ku ew kî bûye, çi nivîsîne û kengê kiriye, bi gotina wê Qadir Koyî sala 1889-da mirîye.

Li paşî Rojname "Kurdistan" her li destpêka sedsalîya bîs ta li pey hev dest pê dîkin têne çapkirinê gelek rojname û kovarên kurdî. Navê wana li kitêba Cemal Xeznedar "Rojname û kovarên" kurdîda hatine nivîsandinê. Ez jî wan her navê çend heban tînime bîra xwendevanên me delal : "Roj Kurd (1911-1919), "Bangî kurd" (1913-1919), "Pêşkewtin" (1918-1919), "Jîn" (1919-1922) li nav salên 1932-1945 kovarên "Hewar", "Ronahî", "Stêr", "Roj Nû" (li Sûrîyêda), "Gêlavêj", "Dengê gîtî teze", "Jîn" (li Îraqêda) çap dibûn. Niha li gelek cîya bi dizî û aşkera gele kovar û rojname bi zimanê kurdî çap dibin.

Di van kovar û rojnamên kurdîda gelek şêr, helbest û nivîsarê nivîskar, zanyar û edebiyetnasên kurdan hatine çapkirinê, mesele, li kovarên "Hewar" û "Ronahîda", yên li Sûrîye çap dibûn, gelek şêr, helbest, çîrok yên şayîr, nivîskarên kurdên Sûrîye û Tirkîye dihatine çapkirinê. Mesele, şêrên Cegerxûn, yên Osman Sebrî, Qadrîcan, Huşyar dî wanda çap bûne. Mesele, di kovara "Hewarêda" ev şêr û helbestên Cegerxûn çap kirine : "Gotîna welat" (H.N.4), "Jî bona Hewarê" (H.N.6), "Pesnê Dêrdike"; jî birayê nazdar û ciwan Qadrîcanra (H.N.5) "Gula dil" (H.N.9), "Jî mele û şêxanra" (H.N.10), "Berdilk" (H.N.10), "Zarînek" (H.N.11), "Zaru dibûn" (H.N.13), "Şêr, pîlîng û rûvî" (H.N.15), "Du bend" (H.N.16), "Ez û dilber" (H.N.25), "Pendname (H.N.24) "Welatê min" (H.N.26), "Dêrdê Cegerxûn" (H.N.27), "Marşa rêçenasan" (H.N.26), "Ala rengîn" (H.N.29), "Em Arîne" (H.N.28), "Ke bi ya min dike" (H.N.29), "Divê em bibin yek" (H.N.30), "Berhemê gur" (H.N.30), "Serxwebûna murîyan" (H.N.39), "Marşa keyanî" (H.N.52), "Xanima Ciwan" (H.N.52), "Pêş kevin" (H.N.53), "Ya reb" (H.N.57).

Lê di kovara "Ronahîda" ev şêr û helbestên Cegerxûn çap bûne: "Şahînsaha cihan" (R.N.21), "Leylê" (R.N.20), "Xanim tu dizanî" (R.N.29), "Keç" (R.N.19), "Hey kurd" (R.N.18), "Pîra Torê" (R.N.18), "Ew maldarên birçî" (R.N.14), "Jîyîna min" (R.N.28), "Dilber" (R.N.19), "Ey keça kurd" (R.N.15), "Ger nexunin" (R.N.15), "Canan" (R.N.20), "Berdêlk" (R.N.10), "Pesnê Dilberê" (R.N.29) û yên din.

Saya serê kovara Hewarê ev şêr û helbestên Osman Sebrî hatine çapkirinê: "Dongiya Ceqel" (H.N.27), "Marşa Xortan" (H.N.277), "Rûvî û dîk" (H.N.31), "Agrî" (H.N.36), "Marşa

canbêzaran" (H.N.49), "Şêhrên zarokan" (H.N.49), "Marşa Felatê" (H.N.50), "Gelo dem ji zêre" (H.N.52), "Ruvîyê ke" (H.N.52), "Evîn" (H.N.53), Di kovara "Roja Nû" da jî ev şêrên Osman Sebrî hatine çap kirinê: "Xweşxana Çîyayekî" (R.N.14), "Berdêlîya Mihokê" (R.N.19), "Gurê pîr" (R.N.12) Di herdu kovaranda wusa jî şîrok û serhatîyên êtnografî, tarîxî yên Osman Sebrî çapkirîne.

Di herdu kovaranda (Hewarê û Ronahîyê) gelek şêr û helbestên Qadrîcan, Huşyar, Mehmed Emin Botî, Celadê Bedirxan, Kamûran Bedirxan hatine çapkirinê; Eger ez li vira navê wan yeko-yeko binivîsim, wê dirêj be.

Di van herdu kovaranda wusan jî efirandinên şayîr û nivîskarên kurdan yên kîlasîkî çap dikirin, her gav di hejmarên wanda perçe-perçe "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî û şêr û helbestên Meleyê Cizîrî çap dikirin. Xên ji wê di wanda nivîsarên kurd li ser dîroka peyda bûn lîteratûra kurdî çap dikirin, mesele di hejmara 33-da ya kovara "Hewar"êda nivîsarek bi sernavê "Kîlasîkên me" nav û nîşanên gelek şêrbêj û helbestbêj, çîroknivîs, tarîxnivîs û zanyaran kurd e'lamî xwendevanê xwe kirine. Di vê nivîsarêda nivîsîne kê, kengê jîye û çi nivîsîye.

Xên ji wê di kovaranda carna melumetîyên mexsûs li ser cuda-cuda şayîr û hozanên kurd çap dikirin. Mesele di hejmara 54-da ya kovara "Hewar"êda nivîsarek ser navê "Mela Ahmed" çapkirine. Têda nivîsîne: "Mela Ahmed şayîrekî ji Heyderane, dîwaneke wî ya şêr û qesîdan heye, niha li cem kurê wî M.Emîne. Ew jî li gundê Xalitda Nehîya Amûdê dersê şerîyetê dixûne". Li paşî van gîlîya nivîsvanê vê gotarê perçe şêra Mela Ahmed tîne ber çavê xwendevanên xwe. Ez sê-çar rêzan ji wî parçeyî werdigirim û li jêrê bona xwendevanên me delal çap dikim :

.....
*Elaye ey yuhes saqî ji te zati recakarim,
 Werîn camek meya safî ji hicrê mest û guzarim,
 Melulim bê qeder saqî mifere-reh bim bi camêra,
 Mirada min ji destê te badeya sor û gulgone,
 Belê wextê seher fro xiyale firqetê xwarim"*

..... (Hewar, N. 56)

Wusa jî di kovara "Ronahî"da sala 1961 ya ku li Bexdadê bi herfên erebî melumetîyên mexsûs li ser şayirên kurdin yên sedsalîya navîn çap kirine. Mesele, di hejmara duduwanda derheqa Ebdal Samed Babekda Enver Mayî nivîsîye: "Di sala 1932 ez li nav guliya, li gundê Şîlanda feqe bûm, li wêra kevne feqek hebû, navê wî Feqe Mehemed Dirêj bû, keş kuleke wî ya şêrê kurdî hebû; gelek şêrê vîjvanê kurd têda hebûn, wek şêrê Melayê Cizîrî, Remezanê Cezîrî, mîr Amadînê Hekarî, Feqê Teyra, şah Pertew-beg Hekarî û gelekê di ji vîjvanê kurdî yê kevî". Li paşê Enver Mayî di nivîse, ku ewî ew di keşkula hine şêrê kurdîda dîtin, li ser nivîsî bû: "Evdal Samed Babek fermayed (Yanê Samed di bêje). Li dû vê Enver Mayî dinivîse: "Min kitêba tarîxnasê ereban Ibin Xelkan û kitêba "Keşaf alzenûn" xwend û pê hesîyam, ku bi rastî Evdal Samed Babek şayirê kurde, ji Hekarîyê, sala 1020, bi gotina Ibin Xelkan, çûye rehme. Şêrên wî bi erebî û kurdîne. "Li paşî van giliya Enver Mayî du parça şêrên Evdal Samed Babek di nivîsara xweda tîne ber çavan. Şêrek bi zimanê erebî, yek jî bi zimanê kurdî. Li jêrê ez çend rêzan ji şera wî kurdî bi herfên latînî çap dikim, ku xwendevanên me haj pê hebin :

*Dilo şabe, çi xweş dem hat bihare,
Reşemeh çû, terazan bûn diyare,
Nihal der bûn, xîşa hat av û cebare,
Berf ker ker bûbû keftî nizare,
Kulilk û gul bi kem der çûn li kajan,
Sivik hat nergîza mest kofî xware.
..... (Ronahî, Bexdad,
sala 1961, hejm. 5,6 rûpelê 62-66).*

Eger em hemû hejmarên kovar û rojnamayên kurdî bixûnin, yên ku berê li cî-cîyan, welat û welatan, bajar û bajaran çap bûne, emê esse di wanda rastî melumetîyên bi vî cûreyî bîn, pê bihesin, ku di tarîxêda navê gelek şayir û hozanên kurd heta niha li nivîstok, pertok û kitêbên tarîxa lîteratûra kurdîda ne hatîye nivîsandinê. Eva xebata gelek mezine, wê gelek wext bikişîne, bona wê lazime nek bi tenê zanyarek, lê komeke zanyaran bi vê pirsêva mijûl bin ji hemû kovar û rojnaman melumetîyên mexsûs derheqa şayir û hozanên ne e'yan hilçînin, bikne berevokekê û çap bikin

Wusan jî kovar û rojnamên kurdî yên li Iraqêda çap dibûn, li perên xweda melumetîyên çapkirin, lêgerîna edebyeta kurdên li Iraqê û Îranê çap dikirin. Mesele rojname "Jîn" Kovarên "Gêlavêj", "Dengê gîtî teze" û yên din nivîsar û nivîştokên xwe bi hewasdar li ser şayîr, helbestvan, tarîxnivîs û zanyarên kurd çap dikirin, şêr û helbestên Guran, Bêkes, dildar û yên din li perên xweda herdem çap dikirin û bi vî teherî wana bînge û binaxa (hîmê) lêgerîna lîteratûra kurdî kilasîkî û lîteratûra kurdî ya herdemê xwe bere-bere da danîn, gîrsa mîletê xwe pê didane naskirinê, ku ew xwe bihesin, xwe nas bikin û haj kelepura kûltûra xwe hebin, qedirê efirandinên şayîr, helbestvan tarîxnivîs û zanyarên xwe zanîbin, xwe ber bi rîya rewşenbîrîyê bigirin, bi zîmanê dayka xwe şîrin li dabistananda bixûnin, xwendkar û xwendevan bin, şareza û pispor bin, bona roja oxirmê giran yek bin, bibin hevkar û hevdest, ka ribin bi tevayî şêr bikin bo xatirê azadîya kurd û Kurdîstanê ji bin zulmê û stemkarîyê derkevin û bi azadî, serxwebûn û bextewarî bijîn. Hemû rojname û kovarên kurdî, yên berê çap dibûn û yên niha çap dibin di van pirsanda roleke mezin lîstine û dilîzin û merem û mebestê wan ew bûye, ku kurd ber bi rîya rewşenbîrîyê serxwebûn û bextewarîyê herin.

Lê lazîme bêjin, ku kovar û rojnamên kurdî cuda mijûlî nîvîsandina tarîxa peydabûn û pêşketina lîteratûra kurdî ne bûne û nabin, cuda mijûlî analîza (jihevderanîna) janrên (şovên) wê ne bûne û nabin, mijûlî lêgerîna bêş û qafîya helbest û şêran ne bûne û nabin, ew cuda mijûlî rola wê li terbiyetkirina gîrsa mîletda nebûne û nabin, li ser van pirsan xebatên serbixwe tîorêtîkî nenivîsîne û nanivîsîn.

Rojname û kovar her bi tenê şemîkin, gava pêşînin di çapkirin û lêgerîna lîteratûra neteweda. Ew meydana çapkîrîna serhatî, çîrok, beyt, şêr û helbestanin, lê meydana tengin, ne firevanin, di wanda her bi tenê bi kurteberî nivîştok û nivîsarên danezanînî li ser lêgerîn û mijûl bûna lîteratûrê, tarîxê, êtnografî û folklorê carnan çap di kin. Bona lêgerîna tarîxa peydabûn û pêşveçûn lîteratûrê, bona lêgerîna janrên wê û yên folklorê netewe, bona lêgerîna kêş û qafîya şêr, helbestan, kilam û stranên netewe û bona lêgerîna rola lîteratûrê di terbetkirin û ronahî

kirina girsê netewe divêt xebetên cuda serbixwe başqe bê-
ne nivîsandinê. Bi van pirsanva merivên zana û edebyetnas
mijûl dibin, kitêb û pertokên lêgerîna lîteratûrê dinivî-
sin. Bi van pirsanva li hemû parçên Kurdistanê dabeşkirî-
da (parçe-parçe kirîda) li herî şerê împêrîalîstîyê û şûr
şa Aktyabirê kesek mijûl ne bûye, her bi tenê li Iraqê sa-
ya serê wê yekê ku kurdên Iraqê mafê xwendin û çapkirina
kitêban bi zimanê xwe standibûn, zanyar û edebîyetnasên
kurd karibûn dest pê bikin xebatên mexsûs li ser lêgerîna
tarîxa lîteratûra milletê kurd binivîsin û çap bikin. Mese-
le, li destpêka nivê sedsalîya bîstanda çend kitêb, pertok
û nivîştok li ser tarîxa lîteratûra kurdan çapkirine. Çend
sal berê bi zimanê rûsî min nivîştokê li ser wan xebatan
nivîstîye û çapkiriye. Navê wê nivîştokê awaye: Îzûçenîyê
kurdskoy lîteratûrê vî Iraqê (Binere "Narodî Azî î Afrîkî
1975) yanê "Lêgerîna lîteratûra kurdî li Iraqêda). Li jêrê
ez naveroka wê ji xwendevanên me delalra dinivîsim, ku ew
haj tarîxa lêgerîna lîteratûra milletê xwe hebin.

MELÛMETIYÊN ŞEREFXAN BITLÎSÎ Û EVLIYA ÇELEBÎ DERHEQA ZANYAR Û ŞAYIRÊN KURDANDA

Hine melumetîyên hêja, nirx û bi hewasdar derheqa zanyar, şêrbêj û helbestbêjên kurdanda' di nivîsarên Şeref-xan Bitlîsî û Evliya Celebîda hene. Lê divêt bêjim, ku pîranîya melumetîyên wan derheqa îş û karên mîr, xan, beg û serokên kurdanda bûn, lema jî di nivîsarên wanda her bi tenê hatiye nivîsandinê kîjan mîr, kîjan xan, beg û serokê welatê kurdan û eşîrên kurdan xwendewer bûye, zanyar bûye, aqilmend bûye, şêrbêj û helbestbêj bûye.

Hewasdare, ez li vira bêjim, ku wextê Şeref-xan Bitlîsî derheq îş û karê mîr, xan û serokên welatê kurdan û eşîrên kurdên serbixwe dinivîse, gîlî dike, ew bi ferx û ku bar e'lam dike, ku di nav wanda merivên xwendewer, ulmdar zana, şêrbêj û helbestbêj hebûn, ku hineka ji wan pêşrev û pêşkevî bûn, di welatê xweda mizgeft, medrese û mekteb çêkiribûn.

Mesele: ewî nivîsiye: "Mîr Dawud kurê mîr Melîk li Xezanê medrese çekirîye, navê Dawudîyê lêkirîye, niha di wê medresêda şagirt hîn dibin, mêrên zana ders didin"(rûyê 216)

Şeref-xan dinivîse, ku melikdarekî kurd ji binemala Saladdîn li Misirê hukumdarî dikir, navê wî melîk Efzal bû. Di nivîsara Yafîda ya bi navê tarîxêda derheqa wîda hatiye nivîsandinê: "Melîk Efzal zanyarekî mezin bû, zanîn û alîmê wî gelek kamil bûn, ew li cem ulmdarên navdar di zemanê xweda hînî xedîsê bûbû, di nivîsarên xweda ewî tiştên eceb bi aqilî nivîsîne, di îş û karê xweda ewî gelek qedir û qîmetê merivên zana û pispor digirt, herdem dikir, ku qenciya, xêrxwezîya rasteqîn'bê kirinê, ku li dinyayêda edlayî, aşîtî û rehmdarî hebe, bi xwe tiştên xerab, ne heqî ne dikir, zanayekî bi kemal bû, nivîsarên zanyarî di nivîsîn, şêr û beytên xweggo dinivîsîn. Wextê kurapê wî Melîk Ezîz û mamê wî Ebû Bekir welatê Şamê jê standin, ewî ev rêzên jêrin nivîsîn :

Axayê min Ebo Bekir û payman girê wî "Osman"
 Bi zora şûr mafê Elî jê standin
 Lê bavê destlat jê stand, destê wî da ser wan,
 Heta destlat li destê wîda bû,
 Îş û karê welat gişk bi tivdir bû. (rûyê 134-135)

"Wezîrê Melîk Efzal kurê Nasrêdîn bîn Ebîl Kerem Zîyaadîn Muhemed bin Ebdalkerîm Eş-Şeybanîyê Cizîrê bû. Mîna birê xwe Îzzedîn Elî û Mecaddîn Ebu-Sedet nav lê kiribûn, jêra digotin: "Ibo Esîra Cizîri. Ibin Asîra di wextê xweda di hemû ulm û zanînan da li ser hemû kesana bû. Di şirovekirina xeber û bêjeyanda, di li hev anîn, nivîsandin û tertîbkirina nivîsarên zanyarîda ewî hunerwerîya bi ecêb diyar dikir û meriva tirê mîna wî kesek tune. Ew li Cizîrê Botan ji dayka xwe bûye, di zarutîya xweda bêhesab zêndar û bîrewer bû, hemû dîwanên Ebo Temam, Buhturî û Mutannabî bi ezber dizanî bû" (rûyê 135).

Şerefxan Bitlîsî dinivîse "Ev nivîsarê jêrin yê Ibin Asîrîne û ewî ew bi zîmanê erebî nivîsîne". Şerefxan Bitlîsî dinivîse: "Dî vê nivîsrêda derheqa wan qanûn, sazmanî û tertîba nivîsandina şêr û helbestanda nivîsiye, yê ku es se lazîmin bona şêrbêj û helbestbêjan". Şerefxan dinivîse ku kiteba "al-vasî", "al-markum fi xall al-menzum" û kiteba "al-ma'ni al-muxtarat fi sana'at al-înşa" ji yê Ibin Asîrîn (Rûye 136).

Derheqa Melîk Kamil Mehemed bin Melik Adil, yê ku ji bine mala Saladîn bû, Şerefxan van giliyên jêrin dinivîse: "Heş şevên rojên îniyê, diwana Melik Kamil tijî alîm û zanyar dibûn, ew tevî wan bi pirsên zanyarêva mijûl dibû, bi wana hemû pirs e'ne'ne dikirin, bi hevra diketne berevanîyê". Di wextê desthilatdariya xweda ewî li Qehrê medrese çêkir, li ser tirba imamê Şa'fî qubeke bilind danî" (rûyê 139).

Wextê Şerefxan derheqa serek û serkarên Îmadîyê (Amadîyê) Akre, Zaxo û Dehokêda dinivîse, ew dibêje: "Di wê derê Serkarên Amadîyê mizgeft û medrese çekirine, di wanda ulm dar û mîrên zana û rewşenbîrên Kurdistanê mijûlî zanbûna dîn û dîyaneta dinyayê dibûn û di zanîn, fehmkirin û nas-kirina wêda kamiil dibûn" (rûye 168) "û di wandera gelek merivê zana, ulmdarên mezin derketine" (rûye 169). Şerefxan derheqa walîyê Amadîyêda, Siltan Huseynda dinivîse:

"Ew merivekî gelek zana bû, qanûn û zakonên destlatdarîyê rind dizan bû, bêhed û bêsed arîkarî merivên zanyar, xêrxwez û camêr dikir, neheqî li xelqê ne dikir, merivên welatê wî, mezin û biçuk, dewlemend û belengaz gelekî qedrê wî digirtin û hergav hazir bûn jêra xulamtiyê bikin, biryarên wî biqedînin". (rûyê 170). Şerefexan wextê derheqa mirên Cizîra Botanda dinivîse, dibêje: "Mîrê Cizîrê Bedir beg hemû qanûnên edetê ayîna dîn û diyanetê diqedandin, danîn serî, ji rîya dîn û dewletê dervediket, guhê wî li ser merivên zana û ulmdaran bû, miqatî li wan dikir, lema jî di zîmanê wîda gelek merivên zana, ulmdarên bi kamil li Cizîrê kom dibûn û qet zemanekîda hozan û zanyarên mîna yên Cizîrê li tu cîyan tune bûn. Ji wan hozan û zanyaran yên here mezin û bi navdar Mewlena Mehemed Berkela bû Mewlena Ebo Bekir bû, Mewlena Hesên Surçî bû, Mewlena Zeynedîn Babî bû, Mewlena Şehîd Elî bû û yên din bûn. Nivîsarên wan e'yanin û zanyar haj pê hene. Ji van Mewlena, Mewlana Zeynedîn Babî bi zanîna û ulmê xwe ser gişkarane û se rekê ulmdarane, mezine şêxê zemanê xweye" (rûyê 181).

Şerefexan Bitlîsî dinivîse, ku dewrêşek hebû, navê wî Dewreş Mehemedê Qelecarî bû, ew ji eşîra rojkan bû, di dîwana Rostempaşayê wezîrê siltan Silemenda serkarî li îş û karê dîwanê dikir, ewî şêr û beytên rind nivîsîne û bi reng û rûyê nivîsandina şêr û helbestvana diyar dibe, ku ew şagirtê Mewlana Îrdîrîsîye" (rûyê 191). Derheqa mîrê Xizanê mîr -Dawudda Şerefexan dinivîse: "Di Xizanêda ewî medrese çekir, navê Dawudîyê lê kir, Niha (yanê zemanê Şerefexan -K.K) di medresêda gelek hozan û zanyar mijûlî hînbûna ulman dibin û di zanîna xweda kamil dibin". (rûyê 266).

Şerefexan derheqa Yaqub-beg mîrê Dêrzenîyêda van xeberên jêrîn dinivîse: "Ew di zanîna dîn û diyanetda kamil bû, sirûştê (tebîyetê) hemû hiş û aqîl dabû wî, ew şîrînbêj û xweşgo bû, gotinên merivên xêrxwez, camêr û dewreşan hez dikirin, mîna sofîyan şîretên yekitî û rehmanîya xwedê di kirin, bi hunurê xweva şêrbêj û helbestbêj bû. Ewî şêr û helbestên filosofîyê û xwedênasîyê nivîsîne. Piranîya şêr û helbestên wî bi zîmanê kurdîne. Dîwaneke şêr û helbestên wî heye" (rûyê 292-293).

Şerefexan derheqa bajarê Bitlîsêda nivîsîye: "Ji bajarê Bit

lîsa bi nav û deng gelek mîrên navdar û zanyar derketine û derdikevin. Yek ji wan Mewlana Ebdurehman Bitlîsiye, ku nivîsara Motele paravêj kiriye, şîro kirîye û mentiq û ma'ni wan ve dike; yek ji Mewlana Mehemed Berqelaye, ji wî rindtir û baştir kesek fikihê û xedîsê nizane, ew serokê ulmdar û şêxên hozanane û sertacê qanunzanîname, paravêj û şirovekirina û li ser Xebîsî û Hindî nivîsîne û ew terxanî mîrê Bitlîsê şeref kirine.

Şêx Emerê Yasîrî mezî, serekê lêgerîna rastîyê û rasteqînê, perestar û pawanê dîn, ayîn, qayde û qanûnê xwedêna siyê ji ji Bitlîsêye; ew şêx Ebo Necîmeddîn Suhraverdî ye û temîdar û nesihetdarê şêx Necîmedîn Qubaye" (rûyê 387) Mewlana Husamedînê Bitlîsî xizna zanîna kûre bêhed, aqilmendê mezî ji ji Bitlîsêye, di sofîyêda ew peyketîye şêx Emer Yasîre. Ewî nivîsara paravêj û şirovekirina ulmê sofîyan li dû xwe hiştiye" (rûyê 388).

Mewlana Îdrîs Hekîm ji ji Bitlîsêye, ew kurê Mewlana Husamedîne, di wextekî dirêjda ew katibê siltanên Ak-Koyunla bû, li paşê li nav gire-girê siltan Selîmda qulixa siltan dikir. Ewî şêrbêj bû, bi şêrbêjî tarîxa jîyîna îş û karê siltanê osmanan nivîsiye. Navê nivîsara wî "Heyşt bu huştê", bi zimanê farsî nivîsiye, têda ewî hezar beyt nivîsîne û hemû zakon û qanûnên wan niqil kirine" (rûyê 389)

Şayir Şukrî ji ji Bitlîsêye, ewî bi şêrbêjî tarîxa bûyerên zemanê xwe nivîsiye, navê nivîsara xwe danîye "Salname". Letîf Rom di antolojîya şayrên tirkanda wî hesab dike şayrê tirkan. Hostatîya nivîsandina şêrên Şukrî nişan dike, ku tu şayr li ser wîra tunene, ku şêrên wî nimûnên hostatîya nivîsandina şêrbêjî û helbestbêjiyane" (rûyê 391)

Şerefxan Bitlîsî dinivîse: "Bi gilişkî Bitlîs cî û warê ko mên mîrên şareza, pispor, zana û zanyaran bûye. Hostayê nîvîsandina şêr û beytan Mewlana Musa, yê ku li Medresa Şukrîyêda talimdar û nesihetdar bû, bi gotina kalikê (bavpîrê) xwe ji minra gilî kir, ku kalkê wîy sed bîst salî Mewlana şêx Huseyn jêra gilî kiribû, ku nav Behrem-begê serokê Adilcewazê, Erdîşê û Bargirê û Şerefxanê kalkê mînda pevçûn û berevanî peyda bûbû. Hingê Şerefxan (kalke min) tevî wî (Mewlana Musa) şex Emîr Bitîsî û weke pêncsed şagirt û hozan û zanyarên Bitlîsî tîr û kevanên xwe hildan tevî şêx Emîr çûne Erdîşê şêr. (rûyê 393).

Li Paşê Şerefîxan Bitlîsî melumetîyên bi nîrx û hêja derheqa dem û dezge, sazmanîya xan û manê Bitlîsêda dinîvîse. Ewî nivîsîye: "Hukumdarên vê derê gelek xan -manên bi xêr û baş çêkirine, wana mizgeft, medrese, xanckên derwêşan, şûr, pîra, hemam çêkirine. Di nav bajarda heta bîst pîrê bi kevirên şimşat çêkirine, li ser wan piranra her roj meriv tîn û diçin, di bajarda şanzde tax heng, heyşt hemam û çar mizgeftên mezin hene. Mizgeftek zûda meçîta ermenîyan bû, niha navê wê mizgeftê "Sor mizgefte". Mizgefta din di zemanê selcukanda hatiye çêkirinê, navê wê "Mizgefta kevne", li ser diwarê wê sala çêkirina wê bi herfên qufî nivîsîne. Mizgefta sêyemîn ya Şemsîye, mîr Şemsedîn ew li meydana Gek-meydan çêkirîye. Mizgefta çarûm li taxa Merdî nê hatiye çêkirinê li rex mêvanaxana rêbaran û rêwîya, navê wê mizgeftê Şerefîye, çimkî Şerefîxan ew çêkirîye. Îmam û mezinê van mizgefta hene, ew li ber wanin, miqatîyê lê dîkin. (rûyê 393-394)

"Li bajarda pênc medrese hene: Xatîbîye, Hacibêkîye, Şukrîye, Îdrîsîye û İhlasîye. Ya paşîn li rex mizgefta Şemsîyêye, min ew dirust kiriye, niha di wêda tije şagirt hîn dibin.

Mamostayên zana, hunermendên şêrbêj û helbestbêjên xweşgo di medresanda ders didin, mesele di medresa Şemsîyêda Mewlana Xidir Babî ders dide, ji wî rindtir û baştir kesek qanûnên dadgarîyê, hedîsên Quranê û serhatîyê pexember nîzane.

Di Medresa İhlasîyêda Mewlana Muhemedê Şîranşî ders dide, ewî li nav ulmdarên Kurdistanêda bi navdare, bi hiş û aqilê xweva gelekî bi kamile, zanîna wî, pisporîya wî di peravêj û şirovekirina quranêda, di stêrnasîyêda, mentîqêda û alxîmîyêda.

Di medresa Hacibekîyêda dersdayîn spartine Mewlana Mehemmed Zirakî Sofî; mîna wî kesek qanûnên dîn û dîyanetê nîzane û mîrên mîna wî qencker, camêr, xwedênas û xêrxwez tunene.

Di medresa İdrîsîyêda qulixa talîmdarîyê û nesîhetdarîyê spartine Mewlana Ebdîla Reşk. Ew ji zanîn û pisporîyêda hozanekî bi kamile.

Di bajarê Bitlîsêda hostayên hunermend û pêşekdar û pêşezanê bi navdar gelekin, di bajarda heta heşt sed dikan hene, gelek xan-manê diwanê bi xêrker hene.

Cuda lazime çend giliya derheqa mîrê Wanê Xosrov-paşada bêjim. Ew mêrekî bi camêr, rehmdar û xêrker bû, cî warê wî bûne cî û warên merivên hunermend, pispor û ulmdaran. Ewî du hemamên bi kevîrên mermer çêkirine, du kervansêra çêkirine, heta sed dikanên du derge çêkirine, du çermxane çêkirine, û gelek xan-man û tiştên din çêkirine. Ewî eva gişka mîna waqtê daye mêvanxanên rêbaran, yên li rêvedanin. Xanmanê ewî çêkirine reng û rûyê bajarê Bitlîsê xemilandine. Li ser diwarên van xanmana Mehmed-can Efendî qazîyê wederê sala çêkirina wan nivîsiye. Xên ji wan xanmana ewî li Rehva li nav gundê Tatvanê û bajarê Bitlîsê du kervanserayên mezin çêkirine, li rex wan hemameke baştirîn û çaktirîn, mizgeft û deh hostaxane çêkirine, ji kanîya bîst kilometir dûr karêz kişand, av anî wê wêderê, gişk avedan û şên kir, heta sî malên filan û musulmanan li wira cî kirne, û ew erd û xaliya Siltan Muradxan dabûne Xosrov paşa, dane wan mîna erdê waqfê yê mêvanxana rêbaran. Li wê derê bona rêbarên tirk, fars, ereb û file nan û xurek hazîr bû; kî şevê li wê derê disekînî, axa bûya, belengaz bûya, merivê xerîb bûya, ne xerîb bûya, yek bû, cî didanê, jêra ezet û îkrâm dikirin" (rûyê 394-395).

Xosrov-paşa wusa jî li Wanê mizgefteke mezin, medrese çêkirin, li rex goristanê mêvanxana rêbaran çêkir. Xafîzê dengzîz û xweşgo û xetîbê bi edeb û rûspî, muezin, axûndê quranxwên û mucewirê maqul û bi terbiyet nîşankirin, ku qulixê wêderê bikin, maşê wan nîşan kir. Li paşî xwendina dua'yê, ew pênc şûrê (birên) quranê dixunin û dua'î dikin bona ruhê wî. Êvarê roja îniyê û duşembe dua'î li gora wî dikin" (rûyê 396).

Melumetîyên bi vî cureyî Şerefîxan derheqa hukmdaran Exlatê, Mûşê û bajarên din dinivîse. Hozan û ulmdarên bi navdar ji Exlatêne, mesele, şêx Sehîd Huseyn Exlatî serokê ulmdarên zanbûna dinya derva û hundurê bû. Ew pisporekî zanbûna cefera camê bû. Bi cadûgerîyê ewî tê derdixist li paşrojê cî wê bibe, biqewîme (rûyê 397). Ji hozan û zanyarên Exlatê yek jî Mewlana Muheddîn Exlatî bû. Ew pisporê zanîna rast û rasteqîn û zanîna stêrnasîyê bû. Wextê Na-

siraddîn Tusî bi fermana Xulagu-xan dest pê kir xaniyê stêrnasîyê çêke û tablîsa stêrnasîyê binivîse, ewî gazî Mewlana Muheddîn Exlatî kir. Û ewî tevî Muyeddadîn Aruzî û Necemedin Debîranê Kezvinî ew îş qedand". (rûyê 397)

Ev melumetîyên Şerefexan Bitlîsî nîşan dîkin, ku li paşî sedsalên navînda (li zemanê sedsalîyên 15-16-da) kûltûra neteweyê kurd anegorî pêşkevî û pêşrev bû, ku bajarên kurdan bi dem û dezge, bi sazman û tundurust bûn, ku di wanda mizgeft, medrese, mekteb, xan-manên baş û diwanxanên hukumdariyê hebûn, ku di wanda hozan, zanyar, pîspor, hosta û pêşekarên bi rêbirina îş û karê bajar û gunda hebûn. Ew melûmetî îsbat dîkin, ku neteweyê kurd, rûniştvanên gund û bajaran bûn, ku ew di jîyîn, ayîn û edebê xweda bi serbest û serbixwe dijîn.

Eger em bala xwe bidne ser nivîsarên tarîxî, yê li paşî nivîsara Şerefexan Bitlîsî hatine nivîsandinê, û eger em wana bixûnin, emê bibînin, ku li paşê jî neteweyê kurd ser edetê xwe, ser ayîna xwe, dem û dezgê xwe maye, jîye û dijî. Di tarîxêda aşkeraye, ku her melumetîyên hêja û bi hewasdar derheqa jîyîna neteweyê kurda di rêbaranda Evlîya Çelebîyê tirkda hene.

Li vira pêvîste bê gotinê, ku Evlîya Çêlêbî melumetîyê baş li ser mizgeft, medrese, mekteb, şagirt, hozan, zanyarên bajarê Diyarbekirê, Wanê, Bitlîsê û çend bajarên din e'lam kirine û di rêbarnama xweda nivîsîne. Mesele, ewî nivîsîye, di Bitlîsêda sêzde mizgeftên biçûk û du mizgeftên mezin (-Mizgefta Şerefexan û mizgefta Xosrov-paşa) hebûn (rûyê 109), têda wusa jî medrese, hucre û haneke hebûn. Di medresên Siltan Şerîfda, Kotek Meydanêda, Warsing Hacı Begêda û medresa Xetibêda xerêqî hînbûna hedîs û tefsîra quranê dibin, di her Mizgeftêda û Medresêda mamosta û dersdarê ulmê civakî hene (rûyê 110), li Bitlîsêda heta heftê mekteb hene, mekteba here baş ya Şerefexane, ya Xosrov-paşaye, ya Xatunîyêye, ya Bazarêye û ya Beşart axaye" (rûyê 110). Ew dinivîse: "Wextê ez li wira bûm, ez bûme nasê heft sayran: Yek Katib Çelebî bû, ew nivîskarê dîwana Xan bû, yek Mele Remezanê Çelebî bû, yek Cenebî Çelebî bû, yek Gencî Çelebî bû. Dîwanê şêrên wan hene, dîwanê şêrên Cenebî Çelebî, Gencî Çelebî mîna dîwana Xemse Nizamîne" (rûyê 113).

Evlîya Çelebî wusa jî melumetîyên baş derheqa Mizgeft, medrese û mektebûn bajarê Wanêda nivîsîne. Ewî nivîsiye, ku Wanêda Mizgeft, medrese û Hucra hene: mizgefta Dawud Pêxember, mizgefta Sulêman-xan, medresa Olî, medresa Xorxor medresa Xosrov paşa, mizgefta Tewrêzî, mizgefta Dervazî, mizgefta Eskiçep, di mizgeftanda û medreseda dersê ulmê ci vakî dixûnin, mele muslîm û buxarî di wanda gelckin, hedi sê ezber dizanin.

Di Wanêda hetâ bîst mekteb hene, têda zaru rind û baş bi farsî dixûnin, têda wusa jî nivîsakar û şayr hene; şayr Efendî, ew li behra zanyarêda mewlaneye û şahê şayrane yên din Wanî Çelebî û mîr-Supehrîne. Herdu jî li nav şayranda bi navdarin". (rûyê 217-218).

Evlîya Çelebî bi vî cûreyî jî derheqa mizgeft, medrese, mekteb, mamosta, hozan, zana, pispor û ulmdarên Diyarbekirêda nivîsiye. Ew navê heft-heyst mizgefta hildide, dibêje: Mizgefta Pêxember, mizgefta Îskender, ya Naram-paşa ya Reş ya Îparhîyê, ya şêx Ezîz Romî, ya Şems Efendî, ya Kurê Sîn ya Bêqlî Mehemed-paşa, ya Xalîd kurê Welîd. Di wan mezgeftanda fêrge û dersxane hene (fêrge şêxê Romî, ya tefsîrîyê, ya xwendina heqisan).

Di hemû fêrge û dersxananda mele, zana, pisporê pir zan hene. Di mizgeftanda şêxê xwendina quranê hene, quranê ezber dizanin, wusan jî hedîsbêj di wanda hene, di hemû mizgeftanda xurbê dixûnin, îmamê mizgeftê heye, ew melayê mezine, ulmê hedîsê dizane. Hedîsbêj Remezan Efendî hemû kitebên Muslîm û Buxarî ezber kirine. Li ber her mizgeftê hedîsbêjek heye". (rûyê 42-45).

Li paşê Evlîya Çelebî dinivîse: "Di Diyarbekirêda çend şayrên xweşgo, zimanşîrin hene. Yek jî wan Fuzulîye, yê din rûhîye.

Ji van hilçanokên jorin, yê min jî nivîsara Şerefexan Bitlîsî û Evlîya Çelebî hilçandine û ji ber girtine, ez tême ser vê berhevîyê:

1- Di sedsalîyên XV-XVI-XVII -da li Kurdîstanêda li bajarên mezinda (xasma di Diyarbekirêda, Bitlîsêda, Merdînêda Wanêda û di cî û warên dinda) jîyîn, ayîn, edet, dem û dezge sazmanî û tundurustîya birêbirin û serkarîya îş û karê

rûniştvanên gund û bajarên mîna hev bûn, gişk di zemanê derebegîya here pêşketî û pêşrevda bû.

2- Di vî zemanîda, di vê dewranêda şaristanî û kûltûra neteweyê kurd bi gavne mezin pêşketî bû, pêşda çû bûn. Di bajarên xan, mîrên welatê kurdanda, xasma di bajarên Bitlîsêda, Diyarbekirêda, Wanêda, Exlatêda û yên dinda mizgeft, medrese, mekteb, fêrge û dersxane hebûn.

3- Di wan mizgeft û medresanda merivên zana, ulmdar, pisporên hemû zanîna dinyayê hebûn; ew mijûlî lêgerîna hemû ulman dibûn, kitêb, pertokên hêja û giranbiha yê xwedêna siyê, stêrnasîyê, dinyanasîyê, edebyetnasîyê û zimanzanîniyê dinivîsîn, tefsîr û hedîsê quranê dinivîsîn û dixwen din, peravêj û şirovedikirin, di medresanda, mektebanda ders didan, mele û feqî hazir dikirin.

4- Melumetîyên Şerefxan Bitlîsî û Evlîya Çelebî nîşan dîkin, ku di zemanê derebegîyêda pîranîya hozan, zanyar, pisporên îş û karên dîn û diyanetê û civakê mîr, xan û serokên bajar, welat û eşîrên kurdan bûn. Melumetîyên wan nîşan dîkin, ku hineka ji wan nivîsarên xwe bi zimanê farsî nivîsîbûn, hinka jî bi zimanê erebî nivîsî bûn, ku li nav wan xan, mîr û serokên bajar û welatên kurdanda şayîr hebûn, yê şêr û helbestên xwe bi kurdî jî nivîsî bûn û diwanên wan bi zimanê kurdî hebûn.

Ev melumetîyên Şerefxan Bitlîsî û Evlîya Çelebî wê gotinê û nivîsarê îsbat dîkin, ya ku li pêşgotina kitêba A. Jabadî "Recueil de notis et recits kourdes" (yanê Cimayî risalîyan û hekyatyan bi zimanê Kurmancî, Peterburg, sala 1860) da hitîye nivîsandinê. Di wê pêşgotinêda nivîsîne: "Berê zaf muderis di welatê Kurdistanêda hebûn û şuhreta eliman jî gelek hebû. Di kafa bajêr, qeza û qesaba û gundîda ehlê îslamêd Kurdistanêda elbete file bit, medrese yek, dû sê, belku êdî zêde hebûn. Û bela derece diqet û ehteman ji kenarêd walî û ehlîyan derheq emrêd muderis û eliman hebûn. Li nik mezin û biçûkêd Kurdistanê qedir û refeta ulm û eliman hebû, melayêd qewî zû fenan di Cizîr, Emadî û Soran û Sêrt û etrefanda zaf bûn. Telebeyêd Kurdistanê he tî Bexda û Besra û Musulê diçûn û dihatin, Tehsîla ulman dikirin û muhtedêt ekradan ji îbtîda hece quranî dixûnin, paşê "Mewlûda Kurmancî", paşê "Nu behar" û "Pendê Etarî", paşê jî "Şeriyetê İcaz" û "Mehr û Enverî" dixûnin. İcarê

"İbaretê tesrîfê û Zuruf û Terkîba Mela Yûnisê Helqetanî dixûnin, ku ewê hersêna bi zimanê kûrmancîne. Paşê jî Serf Se'dine û Se'de'lla ji mentîqa Hesankatî û qewlê Ehmed û Şêrê şemîyê û xelasê bi tertîbê donzde ulman dixûnin û mintehî û mazun dibin" (A.Jaba, Recueil de notices et recits kourdes, rûyê 18-19).

Eva gotina û nivîsarên Şerefxan Bitlîsî û Evlîya Çelebî li hev tînin û nîşan dîkin, ku bi rastî û rasteqîn şaristanî û kûltûra neteweyê kurd li zemanê serxwebûna xan û mirên derebegên kurdanda ne paş ketîbû, û niha kesek nikare mîna şovînistên tirk û farsan bêje, ku kurd berê-berêda hovî bûn, li serê çîya diman, bi zimanê xwe nenivîsîne, ne xwendine û hîn nekirine. Ew mesele (berge) nîşan dîkin, ku di zemanê derebegîya navînda kûltûra neteweyê kurd ji ya tirkî, farsan kêmtir nî bû, ku di wê dewranêda hozan, mamosta, ulmdar û zanyarên kurd, şayr û helbestbêjên kurdan gelek bûn, ku wana jî mîna şayr, mele û ulmdarên tirkî û farsan nivîsarên xwe bi zimanê kurdî û bi zimanê erebî nivîsîne, ku nivîsarên gelek ji wan ji nivîsarên tirkî û farsan danaxûn. Mesele, nivîsarên İbnî Asîrî, Mela İdrîsî, Şerefxan Bitlîsî û gelekên din, yê nivîsarên xwe bi farsî û erebî nivîsîne, bi eslê xwe kurd bûne. Nivîsarên wan mane, dinya haj wan heye, lê sed car hef û mixabin nivîsarên gelekên din, yê bi kurdî, erebî û farsî nivîsîbûn, ne mane; ne mane, çimkî zulmkarên tirkî û farsan bi talan birine, li kitêbxanêd xweda veşartine, çap na kin, naxwezin dinya pê bihesê ku mele, hozan, ulmdar û zanyarên kurd berê hebûn û çî nivîsîne. Merem û mebesta wan ewe, ku kurd û Kurdistanê di tarî û taristanêda bihêlin, bi zorê wan li nav xweda bihêlinin, pûç bikin, mal û dewleta wan yê welatê wan talan û tajan bikin.

Evlîya Çelebî di rêbarnama xweda nivîsiye, ku wextê serê kerê tirkî Melik Ehmed-paşa li ser Bitlîsêda girt, şerekî giran bi xanê Bitlîsêra Ebdulle xanra kir û li paşî şikes tîna eskerê Ebdulle xan ewî barê heft hestiran (devan) bi hezaran kitêb, pertok, nivîsar û gelek hûr-mûrê (kel-pelê) hêja, xişirê zêr zîv û sifir, çek û silih û hacetên bi nîrx ji koşk û sera Ebdulê bi talan birin. Evlîya Çelebî nivîsiye, "Di nav wanda gelek nivîsar û dîwanên merivên bi nav û deng hebûn". Heta niha kesek nizane çî anîne se-

rê wan kitêb, nivîsar û dîwanên bi nîrx, hêja û bê hevta. Dibe li nav xweda bela kirine, pêpes kirine, sotandine. Bi piranî wana kitêb, pertok, nivîsarên bi zimanê kurdî dişewitandin û çapkirina wan bi zimanê kurdî qedexê dikirin. Sebeb vê yekê çapkerên rojnama "Kurdistan" (sala 1898) mec bur bûn rojnama xwe li welatê der çap bikin, di sala 1920 da wextê rewşenbîrkerên kurdan "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî çap kir, zulmkarên tirk ew kitêb şewitandin, nehiştin be la bikin, bi aşkera bifiroşin. Şovenistên tirk wusan jî nehiştin wê nivîsara Ahmedê Xanî bi tercima Mehemed Emin Boz Erslan çapkirî bû, bê belav kirin, wana ew kitêb qede xe kir. Lê divêt bi aşkera bê gotinê, ku zulmkarên tirk û farsan zanibin, ku çiqas ew bikin, nekin, bi talankirin sotandin û qedexê kirina çapkirina kitêb, pertok, rojname bi zimanê kurdî, ew nikarin bigihîjne meremê xwe. Ji dest pêka sedsalîya XVI heta destpêka sedsalîya XX siltanê rûmê û şahê Îranê eva dikirin, danîne serê neteweyê kurd, lê wana nikarbû bigihîjne merem û mebestê xwe. Niha jî, li zemanê hilşandin û şikestina sistêma kalontîyê, li dewrana azadbûn neteweyan û qewînkirina hevkarî û dostîya neteweyan li dinyayêda ne şovenîstê romê, ne jî şovenîstên mîna Ayatola û meytolayên Îranê nikarin bigihîjne wî meremî û wî armancî, kurd nemirine û namirin û kok û reha wan pûç ne bûye û pûç nabe, her roj her sal digihîjin, çiqas ew ber didin, dibişkivin, dibin gul, her digirin, toximê xwe rûya xwe li deşt û çiyayên Kurdistanê direşînin û dîsan digihîjin, dibişkivin, berê xwe digirin û wê rojekê tevî rêncber, xebatkarên tirk, fars û ereb zulmkar û şovênîstan bikine gorê, gor bo gor bikin, û tertîba hevkarî, dostîyê û aşitiyê li nav xweda li welatê xweda saz bikin. Ez bawar dikim, ew zemanê bê, û rewşenbîrkerên kurd tevî rewşenbîrkerên tirk û fars û ereb bi serbestî û serefrazî bê tirs û bêxof li welatê xwe bigerin destnivîsar, kitêb û pertokên bi zimanê kurdî û dîwanên şayir û helbestvanên xwe kom bikin, çap bikin û mijûlî lêgerîna wan bibin, dewlemendîya zimanê xwe û kûltûra milletê nîşan kin. Li jorê saya serê melumetîyên Şerefxan Bitlîsî û Evlîya Çelebî em pê hasîyan ku li sedsalîyên navînda hozan, mele, alîm û zanyarên kurd hebûn, wana navê çend kesan e'lam kirine. Gelek alîm, zana, ulmdar û zanyarên kurd berê hebûne, lê sed car heyf em hela hê haj pê nîn. Her bi saya serê ko-

var, rojnamên kurd yê nî zimanî em pê hesîyane, me navê çend heba jî wan bihistîye û şêr û helbestên wan xwendine. Derheqa Pertew Beg Hekarîda cara pêşîn li kovara "Dengê Gîtî Tezede" hate beyankirinê, derheqa Ahmedê Xanîda û "Mem û Zîn"a wîda û derheqa Meleyê Cizîrîda û dîwana wîda li kovara "Hewar"êda hate beyan kirinê. Saya serê kovarên "Hewarê", "Ronahî" û rojnamên "Roja Nu" û "Stêr" yê nî nav salên 1932 û 1945-da çap dibûn, me cara pêşîn nav û dengê Cegerxûn, Osman Sebrî, Celadet Bedirxan, Kamuran Bedirxan, Mele Enver, Qadrîcanê şêrbêj û helbestbêj bihist û nivîsar û efirandinên wan xwendin. Eger ew kovar û rojnama çap nebûna, şêr û helbestên wan çap nekirina, em tu cara haj pê ne dibûn, ku şayr û helbestbêj û hozanên kurd wusan hêja hene. Şerefxan Bitlîsî û Evlîya Çelebî navê çend şayîr û helbestbêj gotine û nivîsîne, ku dîwanên wan hene. Lê sed car heyf em nizanin dîwanên wan mane yan na, niha li Kurdistanê parçe-parçe kirîda hene yan na. Dibe wunda bûne, hatine talankirinê yan jî hatine sotandinê, yan jî dibe mane, li cem melan, şêxan, feqîyan û bîreweran mane, ew xwedî dikin, jî tirsan nîşanî kesekî nakin, yan jî dibe nivîsarên hozan û ulmdarên û dîwanên şayîr û helbestbêjên li cem kur, nevî û neviçîrkên wan mane, û ew wan xwedî dikin wek (mîna) bîranîna kalbav û bavpîrên xwe û jî tirsê zulmîkarên hukmetê veşartine.

LÊGERÎNA TARÎXA EDEBYETA KURDÎ LI ÎRAQÊDA

Wextê meriv bi xwe îş û karê mala xwe nake, berhevî û hatubera mala wî ne risqê wîye, bi zimanê kurdên Sovêtîstanê vê metelokê dibêjin: "Bêdera bi destê malxwê malê nê hatbe kutanê, xirmanê wê bêderê ne risqê malxwê malêye".

Li vira ji wextê em dixwezin çend gilîyan li ser lêgerîna edebyata kurdî bêjin: Eger mîrê kurdê camêr û milethez bi xwe ne fikire, nexebite, mijûlî lêgerîna tarîxa edebyeta miletê xwe ne be, ew haj pê nabe, pê nahese, ku bi zimanê dayîka wî şîrin edebyeta kurdî heye û ew qet tu caran sîddê û karê ji wê edebetê nastîne, bi ferx kubar, bi serbilind û serferaz ji cînar û merivên ejnebîra nikare bêje edebyeta kurdî bedewî heye, ku nivîsarên tarîxî, fîlosofî dîn û dîyanetê hene, miletê kurd jî efirandinên bi qîmet û hêja efirandine.

Di vê pîrsêda divêt em bêjin: berî şurşa Aktyabîrê parçekî Kurdistanê di bin hukmeta sîltanê tirkda bû, parçê din di bin destê şahê Îranêda bû. Hûkmeta tirkan û hukmeta farsan kurd hesab dikirin mîna xulam û dardestê xwe, xwendin û çapkirin bi zimanê kurdî qedexe kirbûn, gelek mîr, axa, beg û şêxên kurd bûbûne dardesdê wan herdu hukmetan. Milet di tarî û tengîyêda dihiştin, rewşenbîrî û ronakbîrîya miletva mijûl ne dibûn û hela li serda jî digotin "xwendin û nivîsandin bi zimanê farsî û tirkî edete, bi kurdî xwendin nabe û guneye". Lê dîsan divêt em bêjin: wexta em dîna xwe didinî tarîxê, dîsan em dibînin, ku li nav sîng û berên jinên kurd, ji nav berpala û şaxên çîya û daristanên Kurdistanêda mîfên xiretkêş, camêr û milithez radibûn, derdiketne meydana ronakbîrê, bi zimanê kurdî şêr, çîrok, serhatî dinivîsin, îsbat dikirin, ku zimanê kurdî ji zimanê cînarên kurdan danaxwe, ku bi kurdî jî tiştên baş û giranbiha tîne efirandinê. û bi rastî ji wusane. Eger em baş lê binihêrin, temaşe bikin, emê pê bihesin, ku bo xatîrê xwenaskirin û pêşveçûna neteweyê kurd li nivê sedsalîya XX hema xut li paşî şurşa Aktyabîrê mîrên camêr û xiretkêş û milethez peyda bûne. dest pêkirine mijûlî lêgerîna tarîxa lîteratûra kurdî bûne. Bi kitêb û nivîsarên çapkirî em pê dihesin, ku mîrên wusan berê pêşîn li Kurdistanê Iraqê rabûne û dest pê kirine dîroka lî

têratûra kurdî nivîsîne. Ji wan mêran yên bi navdar û ê-
yan Aladîn Sicadîne, Refîq Nîlmiye, Kerim Şarezaye û çend
merivên din bûne, ku bi xwe her yekî ji aliyê xwe dest pê
kirîye dîroka lîteratûra kurdî nivîsîye.

Li vîra ezê her derheqa xebata wan camêranda kurt binivî-
sim. Lê berê pêşin divêt bêjim ku di Iraqêda lêgerîna lî-
têratûra kurdî bi çapkirin û derketina kovar û rojnamên
kurdîra giredayîye.

Derheqa vê yekêda ezê li jêrê di cîyê lazimda bêjim :

Em dikarin wextê lêgerîna lîteratûra kurdî li Iraqêda pa-
revekin ser sê zemanan: zemanê pêşin dest pê dike li Kuta
yîya sedsalîya XIX û destpêka sedsalîya bîstanda, berî şur-
şa Aktyabirê. Li nav van salanda kovar û rojnamên kurdî
"Kurdistan" (1898-1899), "Rojî kurd" (1911-1913), "Bangî
kurd" (1913-1919), "Peşkewtin" (1917-1921) çap dibûn, di
wanda şêr û nivîsarên nivîskaran û helbestvanan çap diki-
rin, ronakbîr û xwendkarên kurd pê didine naskirinê. Di wî
zemanîda her bi tenê di rojnama "Kurdistanêda" bi kurtebe-
rî hine melumetî derheqa Ahmedê Xanî, "Mem û Zîn" a wîda û
Qadir Qoyîda nivîsîne (binêre "Kurdistan" N.3). Rojname û
kovarên din her bi tenê şêrên helbestvanên kurd çap diki-
rin, di wanda pîrsa tarîxa lîteratûra kurdî ne dihate da-
nînê.

Zemanê duduwan (duwemîn) yê çapkirin û lêgerîna lîteratû-
ra kurdî li paşî şurşa Aktyabirê dest pê kir û heta sîsa-
liya sedsalîyê kişand. Hema xût li nav van salanda tevge-
ra (livîn û bizutina) şerê azadî û serxwebûna kurdan dest
pê dike û çiqas diçe, ewqas bi hêz û qewat dibe. Hema di
vî zemanîda ruh û hestê wetenperwerîyê û welathezîyê li
nav neteweyê kurda belav dibe. Ew ruh û hest di wexte hu-
kumdarîya Kurdistanê Jêrin tê danînê (çaxê li nav salên
1919-1921-da şêx Mehmedê hukumdarê Kurdistanê bû.) Hema di
wî çaxîda ronakbîrên kurd dest pê dikin nîmûnên efirandi-
nên kurdî kom dikin û li kovar û rojnamên kurdîda çap di-
kin, mesele, kovarên "Rojî kurd" (1922), "Dengî Heq" (19-
23), "Jiyane" (1924), "Jîn" (1923), "Dengî Kurdistan"
(1922-1926), "Diyarî Kurdistan" (1926), "Zarî kurmanç" (19-
26-1932), "Ronahî" (1927).

Di pêşgotina dîwana wan şayiranda bi kurtberî serhatî, jî-

yîn û kirna wan her yekî nivîsîne, di pêra ji derheqa xey setê hunurê nivîsarên wan bi gişteberî nivîsîne. Lê bi te herê zanistî heta niha efirandinên wan analîz nekirine, jî hev dernexistine.

Li kutabûna salên 1930 du berhevokên şêrên şayirên kurd hatne çapkirinê. Di sala 1938-da Ebdula Kerim Hezaz berevokê şêrên şayirên kurd çap kir. Lê di sala 1939-da Elî Kemal Bapir Gulçîna Gulistana şêrên şayirên hevdemê xwe çap kir (şêrên Ahmed Muxtar, yên Bêxûd Mela Mehmed, yên Piremêrd, Tewfîk Sahibqiran Ahmed, Nûrî Şêx Salih).

Zemanê sisiyan yê lêgerîna edebyeta kurdî ji salên 1940-î dest pê kir. Li sala 1941-da çend berhevokên komelatî û siyâsî û edebî di Bexdadêda nivîskarê bi navdar Refîq Hilmî berhevokê bi navê "Edebî kurdî" (şêr û edebiyatî kurdî) çap kir, di wê kitebêda ewî bi tomerî şêrên şayirên hevdemê xwe çap kirine, û lêgerîna wanva mijûl bûye, nîşan kiriye, ku nivîsarên wan raberî derebeg û çewsenkerên millet hatine nivîsandinê.

Refîq Hilmî di kitêba xweda mijûlî lêgerîna şêrên van şayiran bûye: Hemdûn, Bêxûd Mehmed, Mehmed Xakî, Xeste, Eb dulxaliq Esîrî, Hemdî Saybqiran, Ahmed Muxtar Caf, Fayq Bêkes, Piremêrd, Xerîq, Hacî Qadir Qoyî.

Li nay salên 1940-1941-da gelek nivîsar û gotar li ser nivîskarên kurdan çap dikirin, mesele, Refîq Hilmî li kovara "Gelevêjda" hejmara 1,2 -da yên sala 1944-da derheqa şayirê kurd Salimda çap kirîye. Rojbeyanê nivîskar derheqa kêş û qafiya edebyeta kurdîda (şêrên şayirên kurdan) gotarekê bi hewasdar li kovara "Gelavêjda, hejmara 2 -da sala 1944 çap kirîye, ûisan di wê kovarêda û wê hejmarêda Cemîl Bendî Rojbeyanî gotarek li ser edebyeta kurdî çap kirîye, lê Givî Muqrîyanî gotara xwe û derheqa şayirê klasîkê kurd Muhemed Reşîd Dizêy li kovara "Dengê Gitî Teze" da , hejmara 1-da çap kirîye, li kovara "Nizarda" hejmara 19-da ya sala 1948 -da nivîsarek derheqa şayirê kurd Bêkesê cahil-da çap kirne.

Wusa jî hine gotar û nivîsarên din bi navê "Edebîyeta kurd û rabikirina sedsalîye li ser wêda" çap dikirin, di pêncî salîya vê sedsalîyêda çend berevokên mezin bi rengêkî fi-riwan lêgerîna tomerîva hatne çapkirinê: kitêba Aladîn Si

cadîn, ya Refîq Hilmî, ya Maruf Xeznedar û kitêba Kerîm Şareza. Sala 1952-da li Bexdadêda Tarîxnas û edebyetnasê bi navdar Aladîn bi cara pêşin bi zimanê kurdî bi navê "Mêjûy edebî kurdî ji zemanê berê kevn heta kutabûna nivê sedşalîya bîsta" çap kirîye. Li nivîsara xweda Aladîn Sicadîn dewlemendî, xwerûya efirandinên helbestvanên kurd tîne ber çavên xwendekarên, nişanî wan dike, ku ew bixûnin haj pê hebin. Di kitêba xweda ewî anîye ber çava çawa milletê kurd mîna milletên din pêşda çûye, rabûye ser xwe, bi tevî milletên dinyayê bûyê hevkarê efirandina kûltûra dinyayê. Ewî di xebata xweda, di komkirin û lêgerîna cûrecûre zaravada zehmetekî gelek mezin kirîye û baş bi hûr û kûr mijûlî lêgerîna peydabûn û peşveçûna edebyetê bûye. Berî wî kesek bi vê pîrsêva mijûl ne dibû, melûmetîyên baş yên serhatî, îş û karên nivîskar û helbestvanên kurd gişk ne eyan bûn, Aladîn Sicadîn ev gişk hildan, dane ser milê xwe û bi camêrî û serferazî nivîsara xwe wek monografîya binaxe û wek xebatên zemanê xwe çap kir. Bona nivîsandina wê ewî gelek çavkanî bi zimanê kurdî, farsî, erebî dawe xebitandinê.

Aladîn Sicadîn di vî îş û karên xweda tîne ber çavan, ku berê-berêda peyvendiya edebiyeta kurdî bi edebiyeta gelek kevnra hebûye, ew basa edebiyeta Misrê (belgê 559-582), edebiyeta farsî (belgê 572-580), edebiyeta çînî (581-583), edebiyeta yahûdî (597-605), edebiyeta yûnanî (605-618), edebiyeta romanî (618-624), dike lê ewî mesele ne anîne, ku gotîna xwe îsbat bike. Ew pêvandîya edebiyeta kurdî û edebiyeta van milletên kevn bi arîkarîya yeksanî û yek rengîya folklorê kurdî û edebiyeta van milletan îsbat dike: dinya zordarî û şerê qewat û hezên pak û xirab, parêzgarî ya destûr, edet û nerêkiya li nav milletê kurdda, parêzgarîya wê desturê, wî edetî û nerêkiyê, yên, ku li nav destur, edet û ayîna milletên kevnêda, milletên rojhilata navîn da tîne gilî kirinê û gotinê.

Bona nivîsandina kitêba xwe hêja û bi qîmet Aladîn Sicadîn şûdî ji nivîsarên nivîskar û lêgerînkerên Evropayê û rojhilatê wer girtîye, hemû matêriyalê bi qîmet û nîrx jê hilçandîye, anye ber çavên xwendewerên xwe. Kêmasîyên nivîsara wî ewe, ku ewî ew matêriyal bê kritik daye xebitandinê û lêgerîna kûltûra milletê kurd bi abûr û jîyîna civakê (cîmaetê) ra girênedayê.

Di sala 1956-da kitêba Refîq Hilmî "Şêr û edebyeta kurdî" derheqa şayirên kurd yê hevdemê xwe li bexdadêda çap kir. Di kitêbêda ew bi dûr û dirêj basa komeke şayran dike û mijûlî lêgerîna efirandinê wan dibe, kê û zêde rama na wetenperwerîya wan tîne ber çavên xwendeweran, xasna efirandinên Dildar (1917-1948), Remzî mela Maruf (1912-1956), Ziwer (1879-1948). Ewrehman begê Salim (1905-1959), Selam (1892-1959), Elî Kemal Bapîr (1887-1975), Goran (1904-1962), Nûrî şêx Salih (1896-1958) ji hev der dixe, bîr û bawara wan wetenperwerî, kurdewerî, milethezî bi nîşan kirina perçên şêrên wan tîne ber çavên xwendeweran. Li sala 1961-da Kerîm Şareza Kitêba xwe bi navê "Koye û şayirên wê" çap kir, di we kitêbêda ewî derheqa şayîr û ronakbîrên bajarê Koyêda nivîsiye. Ewî li ser wan şayrên Koyêda fikir û ramana xwe nivîsiye, yê ku li kitêba Aladîn Sicadînda derheqa wanda tiştek ne hatibû gotine, xencî Hacı Qadir Koyî. Ew wusan ji derheqa hine şayira bas dike, yê ku bi kurdî nenivîsiye, bi zimanê ciranê xwe şêr nivîsiye, mesele, Menfî (Husêyne mela Resûl), Hesêyn Seydî Ahmed, Şêx Muheydîn Nihanî. Wana bi zimanê farsî şêrên xwe nivîsiye, lê me le Xafizê Mexzûn, kak Mustefa Safî şêrên xwe bi erebî, kurdî û farsî nivîsiye.

Li nav wan salanda ji kitêba Maruf Xeznedar ya bi navê "Axanê Kurdistan" bi zimanê erebî çap bûye, têda basa şayirên Kurdistanê kirîye, ku milletê ereb bibe nasê kurdan û edebyeta wan. Di pêşgotinêda doktor Ebdulganî Neccar nivîsiye, "Miletê kurd milletêkî mezine, gelek şayir, nivîskar, zanyar û karkerên hukmeta ereba ya pêşînda îş kirîne". Ew basa rola milletê kurdî li tarîx û rewşenbîrkerîna neteweyê rojhilata Nêzîkda dike û dibêje, ku Saladinê Eyûbî dewletêk li Misire saz kirbû, xaçparêz ji nav weletên Rojhilatê derxistibûn û kûltûra wan parastibû ji zeftkaran.

Maruf Xeznedar kurt qedir û qîmete şayirên kurd yê bi nav û deng gilî dike û gelê ereb dike nasê dewlemendiya lîteraturê kurdî. Di kitêba xweda kê û zêde derheqa formê şêrên milletê kurd dinivîse, ji wan navê van çarrêzan, beytanstranan (Guranî, heyran, stran) li rex şêran datîne û basakêş û qafiya wan dike. Bi kurteberî serhatî û naveroka deh şayrên kurd bi zimanê erebî nivîsiye, navê wan şayiran jî li berê di monografiya Aladîn Sicadînda hatibû nivîsandinê.

Maruf Xeznedar navê van şayîrên jêrin tînê ber çavan :

Di kurmancîda : Ahmedê Xanî û Mihreban Xatûn.

Di soranîda : Piremêrd, Dildar, Bêkes, Nalî, Bexûd, Goran Mirza Şafî, Baba Tahîr û Welî Dîwane.

Di vira ew guh dide ser nivîsarên du şayrên kurd, şêrên wan bi tercîma erebî tîne ber çavan û derheqa wanda gilî dike mîna şayîrên nenas. Xênc wê nimûnê çend çarrêzan bi ser dialêktan çap kirîye. Li kutayêda ewî gotareke kurt ya zanyarê kurd bi navbang Taufîq Wehbî çap kirîye, di wê gotarêda -ewî bîranîna xwe li ser tarîxnivîsê mezin Muhammed Emîn Zekî nivîsîye.

Xwedînivîsên van lêgerîna heta niha her bi tenê bi kurteberî li ser nav nîşanên şayîran û naveroka efirandinên wan anîne ber çavên xwendewana û çend nimûnên şêrên wan nîşanî wan kirine. Wana guh ne daye ser rêç û rêbazîya nivîsarên wan. Nivîsandina efirandinên wan bi tarîxêra bî girêdan lê neniherîne, mijûlî berepêşçûna cîmaeta kurd ne bûne û nivîsandina şêrên xwe bi tevgera kurdanva girê ne dane. Eva gotina her tê li ser legêrînen Kerîm Şareza û Maruf Xeznedar. Eve kêmasîyê wan herduwa.

Li nav salên 1950-da çend nivîsar û lêgerînên baş li ser edebiyetê hatine çap kirinê, ew nivîsar û lêgerîn jî li ser efirandinên çend şêrên kurd edebyetnasên kurd di kovar û rojnamên kurdîda çap dikirin. Mesele, li kovara "Hîvî"da ya sala 1958-da li hejmara 2-da Muhemed mela Kerîm nivîsarek bi navê "Mesela edebiyeta kurdî" çap kirîye. Refîq Hilmî di hejmarên 5 û 6-da yên kovara "Şefaq"da ya sala 1958-da gotara nivîsara xwe "Neteweyê kurd û şer" çap kirine.

Refîq Hilmî nivîsîye: "Eger di zemanê bihirîda şayîrên kurd mîla xwe didana ser hezkirin û dildariyê, siruşt û ayînê, niha ew wusan nîne, şayîrên niha ne mîna yê bîrêne ew niha bûne hîva mîlet û mîlet hîvîdarê wane bo xatirê bextê xwe pêşwextîyê.

Li kovara "Şefeq" hejmara 1-da ya sala 1961 Osman Sebrî gotara xwe "Şakarê Şayranê kurdî" çap kirîye, têda ewî hi ne nivîsarên şayrên hevdemê xwe anîne ber çavên xwendewaran û bi kirîtîkî li nihêrîye, mijûlî lêgerîna wan bûye.

Li gotareke xwe dinda, ya ku hejmara duduwanda ya kovara "Şefeq" sala 1961 çap kirîye, navê wê gotarê "Rola edeb" (yan rola helbestvan) li vejîyandina ruh û bîra millet li rewşenbîrkirina neteweyê kurdda, çap kirîye.

Navê wan gotar û nivîsarên jorê nivîsandî nîşan dike, kî komeke nivîsarên wan hatine terxan kirinê bona lêgerîna şêr û helbestên şayîrên kurd, hinek gotar û nivîsar ji ha tina çapkirinê, ku haj edebiyatê bin, xwendeweran kurd bik ne nasê edebiyata milletê kurd. Lê eger em baş lê binêrin, emê bikarbin meselan bînin û nîşan bikin, ku li nav salên 1960-da çend lêgerîn, kitêb û portokên cuda yên lêgerîna monografî li ser lêgerîna tarîxa edebiyata kurdî û çend têbinên din li ser efirandinên helbestvanan û nivîskaran têne çapkirinê. Di wan xebatanda bi gotina firiwan lîtêra tûr, folklor û kûltûra neteweyê kurd têne ji hev derxistin, bişkavtin û verisandinê. Xebatek ji wan xebatan xebata Muhemed mele Kerîm tê hesab kirinê, navê wê xebatê evê: "Hacî Qadir Koyî şayîrê qonaxa nûye li jîyîna neteweyê kurdda". Eva pertoka sala 1960-da li Bexdadê çap bûye. Di wê kitêbêda derheqa jîyîn, îş kar û naveroka nivîsarên Qadir Koyîda tê gilîkirinê, Mela Kerîm bi hûrgilî bîr û bawara pêşkevtin, ruh û hestê niştimanperwerîya Qadir Koyî nîşan dike, şêr û xebata wî pêşberî derebeg û siltanê romê, şahê Îranê gilî dike, şiro dike, ku Qadir Koyî paşrevê Ahmedê Xanî bûye, mîna wî xelq şîret kirîye, ku yek bin, ber bi rewşenbîrîyê herin, şer bikin bo xatirê serxwebûna kurd û Kurdistanê.

Li paşê sala 1968 Muhemed melê Kerîm kitêbeke din bi navê "Gencina folklorê kurdî" (komek lawuk, heyranok) li Bexdadê çap kirîye. Di vê kitêba xweda çend kilamên mêrenîye û hezkirinê bi zaravê kurmancî hatine çap kirinê.

Di sala 1968-da Muhemed Emîn li Pertoka Xweda "Goranî û Jîyan" (yanê kilam û stran û jîyîn) çap kir, têda ew rola folklorê kurdî di jîyîn û tarîxa milletda tîne ber çavan.

Di kitêba xweda "Ferhenga şayîrên kurdan" ya ku li sala 1968-da li Bexdadê çap bûye, hunurê edebiyatê di perwerdekirina qîz û xortan nîşan dike. Di kitêba xweda ya bi navê "Ferhenga wîjeyê şayîran" -da Ahmed Reşwanî bi van pîr sên jêrînva mijûl dibe: dilxwezî, xweşî, hîvîdarî, ronakî

behar, hozkîrîn, dildarî, rindî û bedewîya jinan nîşan di ke; kî ew gîşk li edebyeta kurdîda hene.

Di sala 1970-da Muhemed Resul Hawar li Bexdadêda kitebêke mezin li ser şakaranê şayîrên kurd yên bi navdar Pîrimêrdê bi navdar) çap kirîye. Ew li alîyê ramana hunerîyêva mijûlî lêgerîna şêr û helbestên Pîremêrd dibe.

Li sala 1962 Ebdula Bîmar kitêbeke monografî li ser lêgerîna şêr û helbest çap kirîye ew têda mijûlî lêgerîna pêvendiya folklorê millî û hostatîya şayîranva dibe û nîşan dike, ku Pîremêrd di efirandina xwedê çîrok, efsene, serhatî û pendên pêşinan dane xebitandinê û nîşan dike. Pîremêrd şêr û helbestên xwe bi kêşa sîlabî (rêzebenda bangan) nivîsîne.

Di salên 1970 (li Bexdadê) 1971 (li Hewlêrê) kongresên nîvîskarên kurd hatine gazîkirinê, di wan kongresêda pîrs danîn bona pêşxistina edebyeta yekîtî ya kurdî. Di wan kongresêda biryar kirin, ku edebyeta kurdî biparêzin, hemû çar û mîkana dest xîr bona pêşketin û lêgerîna edebyeta kurdî, guh bidine ser kel û pure netewê, gencîna wê bi parêzin. Li paşî çend kitêb û pertokên din li ser edebet û folklorê kurdî hatine çap kirinê, mesele, kitêba Sadiq Bahadîn, "Şayîrên navçê Amedîyê", berevoka kovara "Nûserê Kurd" (sala 1970, hejmara 2), Ezîz Gerdî, "belgên dîroka edebyeta neteweyê kurdî", gotara Mela Xidir Deştî "Birayetî" -da hejmara 8-da ya sala 1970 çap bû, Şêx Mehemed Xalî "Reza Talebanî" deftera "Kurdewerî" hejmara 1-3 li Bexdadêda sala 1970-da çapkirin, Kak Feleh hînek şêrên Mehwhî li rojnama "Birayetî"da hejmara 8-9 da yên sala 1970 çap kirine. Mehmed Yusif mîqala "Edebyeta kurdî" li rojnama "Birayetîda" hejmara 8-da ya sala 1970-da çap kirine.

Li paşî şurşa sala 1958 dest pê dikin gelek lêgerîn li ser edebyeta kurdî Iraqê çap dikin. Lê bi rengekî rastî her li paşî derketina "Beyannama martê sala 1970, wextê mafê avtonomîya Kurdistanê li Iraqêda dan, zemanekî nû li edebetnasîya kurdêda dest pê dike. Li nav salên 1960-1970 da Edebyetnas û zimanzanan dest pê dikin destnîvîsarên kurdî çap dikin, mesele, çend dîwanên şayîrên kurd yên sedsalîya navîn çap kirin. Navenda çapkirina dîwanên şayîran Baxdad, Sulemanî, Hewlêr û Kerkûk bun. Ji sala 1958 heta sala 1970 li Baxdadêda 26 dîwan çap kirine, li Sulê-

manyêda -32 dîwan çap kirine. li Hewlêrêda 15 dîwan çap kirine, li Kerkûkêda 7 dîwan çap kirine. Xêncî wê di kovara û rojnamanda gelek gotar û nivîsarên kirîtkî (rexnegirî) li ser şêrên şayîran û li ser pîrsên zanyarî lêgerîna edebyeta kurdîva mijûl bûne, çap kirine. Mesele, Kaķ Mem derheqa bîrânîna Şêx Selemê Nemirîda nivîsarek li kovara "Hîwa"da hejmara 23-da, sala 1961 çap kirîye, Ebdul Rezaq Mehemed derheqa Şêx Riza Talebanî li hejmara 31 -da ya kovara "Hîwa"da çap kirîye. Ebdulxaliq Aladîn li hejmara 32-da ya sala 1961 miqala xwe "Li goşeye edebyetda" çap kirîye.

Li du wan komên rêxistina pîrsên lêgerîna ziman, edebyeta kurdî û bona efirandina zimanê edebyeta kurdî yekîtî pîrs hatine danînê.

Dîsan di wî çaxîda Muhemed mela Kerîm di kovara "Hîwa"yêda li hejmara 9-10 ya sala 1959 miqala xwe bi navê "Şakarê şêrê Edebyetî" çap kir bû, têda mijûlî lêgerîna efirandîna şayîrên kurdî kilasîkî bûbû.

Li dû wê van zanyarên jorin her yekî bi serbixwe û cuda bi lêgerîna edebyeta kurdîva mijûl bûn, ew zanyar ev kes bûn: Maruf Xeznedar, Êzzedîn Mustefa Resûl û Îhsan Fuad bûn. Herse kes jî li Sovetîstanêda bawername xwe ya navê doktorîyê standîne.

Maruf Xeznedar du kitêb çap kirin, ya pêşin navê wê "Kêş û qafî li şêrên kurdîda". Ewî ew kitêb li Lênîngradêda nivîsî, lê li Baxdadêda çapkirîye. Ew di wê kitêbêda îsbat dike, ku sazmaniya şêr û helbestên kurdî yên berê bi rengê bangane bû, ku kêş û qafîya şêr û helbestên kurdî yên zemanê niha mina hevin, ku şayîrên niha di vê pîrsêda ser edetê berê diçin, şêran bi bangane dinivîsin. Ew dinivîse ku di şêrên wanda heft bangirî, sêzdeheng zedetir jî dibin. Kitêba Maruf Xeznedar disêrtasiya wî bû, navê we "Lê niherînek di tarîxa edebyeta kurdîda" bû, ew sala 1967 li Moskvayêda çap bûye. Di wê kitêbêda ew tarîxa edebyeta kurdî ji sala 1890 heta sala 1960 rewşen dike, tîne ber ronahîyê. Di wê xebatêde Maruf Xeznedar rola rojname û kovarên kurdî li pêşketin û pêşveçûna lîteratûra kurdî ya niha tîne ber çavên xwendewaran, nîşan dike çawa hal û wextê siyasetyê tîm û raberîya lîteratûrê û guhastîne

diguhêzin. Ew mêla xwe dide ber qanunê lîtêratûrê, nîşan dike, ku efirandinên şayîrên nivê sedsalîya nozdan û şayîrê nivê sedsalîya bîsta di lîtêratûra kurdîda cîyên pêşîn digirin. Ew şayîrên nivê sedsalîya nozdan yên here mezin hesab dike Şêx Rîza Talabanî (1842-....), Xerîq (1865-1904), Adîb (1859-1916), ew zemanê nav salên 1918 û 1945 he sab dike zemanekî nû yê pêşveçûna lîtêratûra kurdî. Di xebata wîda xwendevan pê dihesin, ku Ahmed Muxtar (1897-1944), Hemdî (1878-1936), Ebdal Nurî (1809-1944), Zîwer (1875-1948), Bêkes (1903-1948), Dildar (1918-1948) di efirandinên xweda guh dabûne ser pirsên sosîalîyê û ser mesela hal û wexte miletê kurd.

Li kutayîya xebata Maruf Xeznedar qise dike, ku li paşî şerê dinyayê duwemînda di rêveçûna lîtêratûra kurdîda rîya rêalîstîyê peyda dibe, şayîr di şer û helbestên xweda derheqa tevgera (lipata) şerê azadkirina miletêda derheqa şerê çînanda dinivîsin, şayîr li şûna hûnandin û tindirust kirina bi edetê eruzî dest pê dikir efirandinên bi sîlabî (bangebendî) dinivîsin. Ew dinivîse, kî wî rengî (bi curê bangebendî) Pîremêrd, Selam, Goran, Cegerxûn, Dîlzar, Hejar, Îbrahîm Ahmed û Maruf Berzencî şer û helbestên xwe nivîsîne.

Li sala 1966-da li Bêrûtê kitêba Êzêdîn Mistefa Resûl derheqa "Realîzm li lîtêratûra kurdîda çap bû. Ew xebat di sêrtasîya wî doktorî bû. Ewî li Bakuyê nivîsî bû û pawan kiri bû. Di wê xebatêda nimûnên rêalîzm di folklorê û şêrên şayîrên kurdî yên klasîkîda tîne ber çavan û nîşan di de, ku wîne û şiklê jîyîna milet, çewsandîna neteweyê kurd şerê çînan, şerê azadîxweza kurdan û neteweyên Rojhelat di efirandinên şayîrên kurdanda cîkî mezin girtine. Êzêdîn Mustefa xeysetê rêalîzm û bînga wî di lîtêratûra kurdîda nîşan dike û wan li rêza lîtêratûra dinyayê pêşveçûnda da tîne û dinivîse, ku raman û bîr û bawara wêda gilîyên azadî, dostî, hevkarîya miletan tîne gotinê, pirsên bextyarî serbestî û wekhevîya hemû miletan li nav neteweyên dinyayêda tîne danînê û gotinê.

Li sala 1966-da li Moskvayêda Îhsan Fuad kurteberîya bawernama dîsêrtasîya xwe derheqa "Şêrên Hacî Qadir Koy"da çapkir. Ew jî kurdê Iraqê bû û xebata wî jî gîredayîye bi lêgerîna lîtêratûra kurdîva li Iraqêda. Li berî wî derhe-

qa Qadir Koyîda li xebatêd xweda Aladîn Sicadîn, Gîvî Mukrîyan nivîsîbûn, Mehemed mela Kerîm jî xebateke başqe bi hurgilî li ser naveroka efirandinên wî, bîr û bawara wî çap kiribû, lê Îhsan Fuad diha bi firevan û kûr mijûlî lê gerîna efirandîna wî bû û diha baş û rindtir qedir û qîmê tê kirna Qadir Koyî û efirandinên wî rêzber kir. Eva kirîna baş û lazîm bû, çimkî ewê xebatêva xelqê rûs dibe nasê efirandinên Qadir Koyîyê helbestvan û şayîrên mezin.

Li pêşîyê Îhsan Fuad basa zeftkirîna Kurdistanê dike û di nivîse, ku li 1514-da Rome û Îranê Kurdistan li nav xweda parevekirin û jî wî wextî heta niha miletê kurd li bin hukmeta herdu dewletanda maye, çend caran mîr û serokên kurdan rabûne, nikar bûne serkevin, çimkî li nav kurdanda li nav axa û begên wanda xayîn û xwefiroş gelek hebûne, di roja oxirmê giranda çûne piştê neyar û dijminên miletê kurd.

Ew elam dike, ku Hacı Qadir Koyî şayîrê Kurdistana jêrîn bûye, li du Nalî (1787-1855) Salim (1800-1866), Kurdî (1879-1849), derketîye meydana nivîsandîna şêran û mîna wan şêrên xwe bi zaravê soranî nivîsîne, Îhsan Fuad nîşan dike, ku xezalên Nalî li bin bandûra nivîsarên Ahmedê Xanîda bûne, ku Qadir Koyî jî di bin bandûra bîr û bawara Ahmed Xanîda (sedsalîya Hevdeh) bûye, ku ew di bin bîrbawara Ebûdulrezzaq û Bedirxanda bûye, ji ber vê yekê ewî li şêrên xweda li ser yekîtiyê û hevkarîya hemû kurdan nivîsîne, bang û gazîya van kirîye, ku yek bin. Xwendin li nav miletê belav bikin. Çapxana vekin, bi kurdî biçûkan hîn bikin, mîna Evropa hîn bin, pêşa hîn bin bo xatirê azadî û serketîna kurdan, bo xatirê Kurdistanê. gazî milet dikir, ku zimanî kurdî hez bikin û biparêzin, mafê xwe siyasetî û parasî tîna ayîna gelê kurd biparêzin. Ev merem û mebestên şêr û helbestên Hacı yê rewşenbîrkerên Tenzîmatê li Tirkîyêda bûn.

Di vê nivîsarêda min bi kurt û sere berra nîşan kir, ku cara pêşîn kurd bi xwe mijûlî lêgerîna tarîxa edebiyeta kurdî bûne, ku eva kirîna rewşenbîrkerên kurd, şayîr û edebiyetnas û zanyarên kurdên Iraqê bi vî îş û karîva mijûl bûne. Bi nivîsar û rêzber kirîna nivîsara wan ez tîme ser wê nêtê û gotinê, ku gotîna zanyarê rûs Dîttel raste: edebiyeta kurdî dewlemend heye, ku heta niha xwendkar, zana û

rojhelatnas heta niha haj pê tune bûn. Sêya sere xebatên kurdên Iraqê zana niha em bi serferaz dikarin bêjin, ku lî têratûra kurdan gelek dewlemende, ji zûva kurdan bi zimanê xwe şêr, beyt, destan û nivîsarên tarîxî, filosofî, a-yînê, dîn û dîyanetê nivîsîne, ku di tarîxêda berepêşîn wana bi zaravê kurmançîya jorin û bi guranî nivîsîne (ji destpeka sedsalîya X heta sedsalîya XVII-XVIII), Paşê ji destpeka sedsalîya hîjdeha heta niha lî têratûra bi zaravê kurmançîya jêrin tê nivîsandinê.

Lêgerîna wê lî têratûre her li destpeka sedsalîya XX-da destpê bûye. Lê divêt bêjim çî heta niha di vê pirsêda ha tîye kirinê, kême, ne kûr û ne firivane, niha pêvîste lî lêgerîna wê lî têratûrêda van pirsên jêrinva mijûl bin :

- 1- Lêgerîna edebyeta kurdî bi tomerî.
- 2- Veresandin, ji hev derxistina şêr û helbestên şayîran başqe-başqe,
- 3- Lêgerîna dîwanên şayrên kurd yên soranî, kurmançî, goranî,
- 4- Lêgerîna jîyîn û kirina şayîrên kurd şên mezin li Iraqêda, Îranêda û tirkîyêda.
- 5- Wergerandina şêr û helbestên şayîrên kurd bi zimanê rûsî, evropî, erebî, farsî û tirkî,
- 6- Lêgerîna bîrûbawara wetenperwerîyê di lî têratûra kurdî da (kurmançî, soranî û goranî).
- 7- Nivîsandin û çapkirina ferhengok û ferhengên zimanên şayrên kurdî yên klasîkî.

Şêrbêj û Helbestbêjên Kurmanc

ELÎ HERÎRÎ (X-XI)

Kurdnasê Rûsîstanê Aleksandir Jaba di kitêba xweda ya bi navê "Recuîl de notices et recits kurdes" da nivîsîye: "Şa şîrê kurdan yê pêşîn Elî Herîrî bûye. Ew li gundê Herîrê nehîya Şemdînan sincaqa Hekarîyêda sala 400 hîcrê (yanê sala 1009-1010) ji dayka xwe bûye û sala 470 hîcrê (yanê 1078) çûye rehmêtê û hema li wêderê jî hatîye çal kirinê"

A. Jaba nivîsîye, ku "Dîwaneke Elî Herîrî ya şêran û beytan li Kurdistanêda meşûr û merufe". Lê sed car heyf û mîxabin, ku heta niha ez haj pê nînim dîwana wî li kîdêrêye li cem kêye û li kîjan cîyî destnîsara wî dest dikeve. Li kitêbên tarîxa edebiyeta kurdîda û li berevokêd edebiyeta kurdîda qet şêreke Elî Herîrî û qet beyteke wî çap nekirine. Kamuran Bedirxanê Rehmêtî di nivîsara xweda ya bi sernavê "ferbûna xwendina kurdî" da (Parîs, sala 1968, rûyê 42) nivîsîye giva "Elî Herîrî soran bûye", lê Bedirxan qet şêreke Elî Herîrî ne bi zaravê soranî, ne jî bi kurmancîya jorin di kitêba xweda çap nekirîye, ne anîye ber çavê xwendevanên xwe.

Li kovar û rojnamên kurdîda carnana melumetîyên cî-war û wextê bûyîna wî ji daykê e'lam kirine, lê melumetîyên din derheqa Elî Herîrîda min li kitêb û nivîskarên kurdîda he ta van salên paşîn ne dîtine, her bi tenê berê pêşîn Albert Sosin li berhevoka xweda ya bi navê "Kurdische Sammlungen (Peterburg, sala 1887, rûyê 278)" şerek bi sernavê Elî Herîrî çap kirîye. Ez li vîra wê şêrê çap dikim. Bi fikra min ew bi rastî nivîsara Elî Herîrîye, çimkî bi kêş û qafîya xweva bi hev anîna rêz û bendên xweva mîna şêrhelbesta şayîrane, ne mîna strana zargotinêye. Bona xwendevanên me delal haj wê hebin, ez wê şêrê li jêrê bi herfên latînîya kurdî çap dikim :

*Ger hûn bibînin nalê eşq,
Tenê li bom zarî dikin,
Her kes bizanêt halê eşq
Bi hîle dijarî dikin.*

Bi halê eşq bexîl bûbûm
Her dem di dem zelîl dibûm,
Bê rêh û bê delîl dibûm
Her kes bi xemxwarî dîkin.

Hûn bar mekin xemên di zor,
Le hesreta vardên di sor
Çavê di rêş bisk tene dor,
E'niya bi nûr tarî dîkin.

E'niya bi nûr zilf tene ser,
Rengîn dibin şems û qemer,
Reşmar ji perdanê neder,
Li e're'ra yarî dîkin.

Hoş û e're'ra şimşa diket,
Teşmîn reva sebir û xîret,
Qahu medet, ahu medet
Çeşman çî xubarî dîkin.

Çavê li rojê bine kom,
Came mey anî ji bom
E'mîr kir lazîm vexom,
Mestî ji min jarî dîkin.

Mest û şerab qendavê,
Êsîr û bendêt vê şevê
Ger vesfê yarê ez bibêm
Hûn terkî huşyarî dîkin.

(A.Sosin, Kurdische Samlingen 278-279).

Li sala 1972 li Lênîngradêda berhevoka rojhilatê hejmara sisiyan bi zimanê rûsî çap bûye. Kurdnasa Sovêtîstanê M. B.Rudenko li wê berhevokêda mîqala xwe ya bi navê "Nêopûb lîkovannîyê stîxî kurdsîx poêtov" (yanê şêr û helbestên şayîrên kurd yên çapnekirî) çend şêr -xezalên Elî Herîrî çapkirine. Ewê ew şêr li nav destnivîsarên kurdîda li kî-têbxana Saltîkov-Şêdrînda dîtibûn. Şêr bi herfên erebî çapkirîne, lê ez wan li vira bona xwendevanên me delal bi herfên kurdî çap dikim. Sernavê şêrê bi vî cûreyî hatîye nivîsandnê: "Elî Herîrî fermayed" (yanê Elî Herîrî dibêje) :

Xelqno, werin bibînin,
 Çi husneke bi kêmale,
 Heyran ji dil bibînin,
 Ji sene' zewal celale.

Sene' xwedê ku danî,
 Sifhe ji nûrê danaye,
 Enber li ser kêşaye,
 Enber xet di xale.

Xalên di şibê enberî,
 Dêm her wek gemerî,
 Ez t'êr nabim ji munzerê,
 Min naçit ji xeyalê.

Min get naçî ji birê
 Zilfê şibê herfirê,
 Wê li ser be di mûnirê,
 Dagirt bûn helale.

Ebrû helala eyde,
 Dêm her wek xurşîde,
 Eblek şibê Nahîde,
 Cibhet meha bi kemale.

Cibhet meha tevave,
 Rû sor gula bi xunave,
 Reyhan hatne hindave,
 Nesrînyan da û pale.

Nesrînyan çû wext beste,
 Min nêrî pê hoste,
 Eqlê min çû ji destê,
 Heyran kirim der hale.

Heyran bûm ez ji dinê,
 Sohtim ji dest evinê,
 Ji xwe nakim hîvya jînê,
 Li-m kêr bûn mah û sale.

Li-m kêr bûn mah û salan,
 Metne ji lam û dalan,
 Ji ber zehmet û eşkelan,
 Ez t'êr dikim miqale.

Çavê min xûn jê dibarî,
 Ji ber eblqêt xumari,
 Wekî ava di carî,
 Bê wext û bê macale.

Gerden şûşa nebatê,
 Lêvê şerbeta heyatê,
 Ji hisna bit welatî,
 Bi min cahî helale.

Methê di nazeninan
 Û sefê di xûn şîrinan,
 Wekî dûr û yasînan
 Ez her dikim emale.

Baxê ku sed bihar lê,
 Bilbilê lalezar lê,
 Ku sed gulê bi xar lê,
 Bilbilî nala-nale.

Ji Hindê bînin taracî,
 Ji Mermerî bînin xeracî,
 Ji Romê bistînin bace,
 Ji bo xemla şepale.

Dêma xalê di hûr lê,
 Eyna zilfê stûr lê,
 Rû nîva guhê tûr lê,
 Mehbûbe bê misale.

Hisna te ya hebîbe,
 Dilekî min jê xerabe,
 E'îlî tu bîkî nesîbe,
 Dest bidit wesale.

Hisna te ya dilxahe,
 Dilber lebsî sîyahe,
 Bi min kaa'be Ella,
 Tewaf dikim her sâle.

Ji Hind bînin talanî,
 Bikin gîlî sibhanî,
 Ji bo çavê şa - siltanî,
 Dema bêtin ser sale.

Çend bibêje Elî sadiq
 Ji esrar û di qayq,
 Ji wan wesfê di layq,
 Ji Hisna ya delale. (rûyê 113-124)

Di kiteba xweda ya bi navê "Hozanê kurd" ya li sala 1980 da li Bexdadê Çapbûye, zanyarê kurd Sadiq Behadîn Amedî çend parçên şêrên E'î Herîrî çap kirine, ez hine parçan ji wê kitêbê li vira çap dikim bona xwendkarên me delal. Bi fikra min bi teher û rengê nivîsara xweva ew şêr yên E'î Herîrîne :

Disan ji nu eşqa berê,
 Pir anderûnim ateşe,
 Zulfa muzeyen enberî,
 D'wa d gel xala reşe.

Xala li deme dil reva,
 Sed ruh û canim bin veda,
 Sotim gelo çû di min nema,
 Terkim kirin aqil û hişe.

Aqil û hişim bûne esîr,
 Dinya ku geh geh tene bîr,
 Dem suhbetê bedra munîr,
 Zulfa ji werdê bîn xoşe.

Werdan ji nêv zulfa derên
 Şula binefşê tê werin,
 Bala û qed e'rêrim,
 Hejiyan ser marê reşe.

Disan hey têt û tiçit,
 Ehiya emvatan dibêt,
 Wê cihan mufam nûr jê diçit,
 Dêm şuhbete şe'ma geşe.

Şema' şebistanê eve,
 Werda gulistanê eve,
 Sirî tebistanê eve,
 Şoxa Herîrî dil geşe.

Ecêb, letif û cindiye,
 Ezman nezan û romiye,
 Ageh ji eşqbazan niye,
 Mest û xumar û serxoşe.

Serxoşî cama şerbete,
 Horî tu baxê cenetê,
 Dêm şuhî de'ma zulmetê,
 Serdaê çendîn mehweşê.

Mehweş ku westan sef bi sef
 Ew hate der Misrî di kef,
 Wan got: "E'Liyo latxef
 Mi bi mirdin qewi xoşe".

.....

Didara te ez zîn kem,
 Heta kengê ruh te teng kem,
 Keser bûm carekê bîn kem,
 Xudana têt û destmala.

Xudana têt û cebhet bê,
 Xerac û erd û qîmet bê,
 Didara te bi qîmet bê,
 Li Eyd û cejn û sersala.

Evel kar û kesê min tuy,
 Yeqîn firna dersê min tuy,
 Kesê min û besê min tuy,
 Li zer û mal û pîr nala.

Li zer û mal û pîr rencim,
 Kesaqîm, şahîbîm, gencîm,
 Li bajêra guhêr sencîm,
 Sefer diwere heta mala.

Sefer di werê şebê tarî,
 Ey E'lfî û tu pîr ray,
 Da bikeyn zikir cebarî,
 Belki li me xoş bêt sala. (235)

.....

Gulustana xuda riste,
Li etraf dîlan xweste,
Binefş û nêrgîza meste,
Cinsirî lee'l û reyhan têt.

Reyhan sosin û werdin,
Li şêx E'lfî xerib ferdin,
Weristin ehmer û zerdin,
Her ro sed car efxan têt.

Ji efxanan ne maym têt,
Dua'goyê te ez bê fêr,
Bibete ser du esleh dêr,
Heta vê qasde can têt.

Bibîne rewşê malîne,
Were hindava balîne,
Ji dest ahan û nalîne,
Çi reng firyad ji esman têt.

Bi firyad û heware,
Ji dest ahan min ew kare,
Melazim bendeyê jare,
Ji seydayê çî ferman têt.

Seyda heq nezer vêra,
Di îqlîman gêra,
Fitara gewheran vêra,
Ji nêv kana Bedexşan têt. (237)

.....

Ger hûn bibînin narê eşq,
Tenî li bom zar diken,
Er kes dîzanêt halî eşq,
Bexil û dijvarî diken.

Bi halê eşq bexil dibim,
Her dem bi dem zelîl dibim,
Bê rah û bê delîl dibim,
Her kes bi xem xwarî diken.

Hûn yar meken xemên di zor,
 Ji hezreta derdên di mor,
 Çavên te reşin bisk tên li dor,
 Eniya ji nûr tarî diken.

Eniya şerif bisk tên li ser,
 Rengîn dibbin şems û qemer,
 Reşmal ji hebisan tênê der,
 Li ereraye yari diken.

Xoş e're'ra û şemsa du qed,
 Ji min revand sebir û xîred,
 Dad û meded, dad û meded,
 Çeşman çî xemare diken.

Cot xumaran kirme def,
 Tefsîr diken sune'y sedef,
 Roj xemilîn her çar teref,
 Bi miskê tar tarî diken.

Biskan li rûyê lê bûne kom,
 Camê mey êna bom,
 Hukmî dikir lazîm vexum,
 Mestî li min carî diken.

Huşîm çû bûn, mabûm di hom,
 Her dem bi demlew ten bî coş,
 Mera gewî zewq û xuroş,
 Bi şahî xundkarî diken.

Bi şahî wan dan û kerem,
 Xizmet diken turk û ecem,
 Miridê eşqê dem li dem,
 Li neqşê ceharê diken.

Neqş û nigarê navşan,
 Diwan û wesfet şawşan,
 Hey hey li cotê padşan,
 Ecêb xoş serdarî diken.

Serdarî şaha rewnege,
 Mue'ciza remzet eblege,
 E'îlî û mebêje ehmege,
 Li bazarê inkar diken. (239-240)

EHMED MELE BATÊ (1417-1491)

Bi melûmetîyêd A.Jaba Ehmed mele Batê li gundê Batê welatê Hekarîyê sala 820 hîcrê (1417) ji dayka xwe bûye û sala 900 hîcrê (1491) çûye rehmete. M.B.Rûdenko li xebata xweda dinivîse, ku bi gotîna A.Jaba diwanekê mezin ya Mele Batê ya şêrêd evîndarîyê heye, aşkeraye, ku her em hajdu destanêd wîne, ew destan jî evin: "Zembîlfiroş" û "Mewlûd" (yan jî Mewlûda pexember yan jî Mewluda şerîf). Destnivîsara "Mewlûdê" niha li nav destnivîsara A.Jabadaye, li kitêbxana Saltîkov-Şêdrînda li Lêningradêdaye, têda heta 576 xaşxan hene, gîşk perevedibin ser 17 sernavan.

Li sala 1978 folklorîsta kurdnasa sovêtê Jakêlin Şûrênovna Mûsaelyan dîsêrtasîya xweda ya bi navê "Kurds kaya poêma "Zembîlfiroş" î yê folklornîyê vêrsîî (yanê "Dastana kurdî" "Zembîlfiroş" û şovêd wê folklorî" pawan kir. Ew li vê xebata xweda mijûlî lêgerîna destana Ehmed mele Batê û şovêd wê zargirtîne bûye. Ewê li xebata xweda nivîsîye, ku xên ji destnivîsara Ehmed mele Batê li nav destnivîsarêd kurdîda li kitêbxana Saltîkov-Şêdrînada destnivîsareke din jî heye, ew destnivîsar bi destê Mûrad xan Bayzêdî hatîye nivîsandinê û bi reng û rû û naveroka xweva mîna destnivîsara Ehmed mele Batêye, lê li sedsalîya XVIII-da bi nûva hatîye vejîyandin û tezekirinê. J.S.Mûsaelyan xên ji tercîma kirin û şirovekirina şovêd nivîsarêd Ehmed mele Batê, Murad-xan Bayzêdî wusan jî mijûlî lêgerîna naverok û kêş û qaffîya li hev anîna rêz û bendêd deh-dozde şovêd zargotin yê "Zembîlfiroş" dibe, wan raberî hev dike û pevgerîdana wan nîşan dike û tîne ber çavan. Lê sed mîxabin heta niha xebata wê ne hatîye çapkirinê, eva çend sale li çapxanêdaye, her avtorêfêrata wê "Kurds kaya poêma "Zembîlfiroş" î êyê folklornîyê vêrsîî, (Moskva 1978) sebeb wê yekê ez mecburim li jêrê çend perçan jî destnivîsara xwe ya şova folklorî li sala 1935 li şêherê Tîblîsê ji zarê Zîna Qeroyê Fero ji qebîla şerqîya gundê Korbilaxê nebîya Abaranê hatîye nivîsandinê, eva şaxa mîna şexê li berhevoka A.Sosinda hatîye çapkirinêye.

ÇEND PARÇE JI ŞOVÊD "ZEMBILFIROŞ"

JI BEREVOKA A.SOSIN

Ey dil werin dîsan bicoş,
Carek ji caran mey binûş,
Bikin qiseta Zembilfiroş,
Da seh bikin hikayetê.

Zembilfiroş lawkê rewal bû,
Bi kilfet û ehl û eyal bû,
Musneki Usif li bal bû,
Heq rizaqê qismetê.

Qewin ew lawê feqîr bû,
Dayme xwedê debîr bû,
Pêşê xweda jêr bû,
Ew bi dest hebû sene'ete.

Şixulê wî selik û tebeq bû,
Qîmeta selkan wereq bû,
Dayma ew rast heq bû,
Pê debirî kilfetê.

Ew bi dest zembîl bi dest,
Dibirê bazarê bi gesd,
Xwarin nan dihat bi dest,
Razî dibû qismetê.

Her dema selkan ku tîne,
Xatûnek jorê dibîne,
Bi dil û can dihebîne,
Dil kete pêla muhbetê.

Muhbetê keç muhtela kir,
Sur li carîya aşkerâ kir,
Lawukî qelbim cuda kir,
Min ji eşqa xew ne tê.

Law rast bû bi xwedêra,
Pîr ji wê qenca dikêra,
Go min ji te navê tu zêra,
Tu min xilaskî ji zehmetê.

Xatûn dibê ev xeber tunîne,
 Şerm meke, were nav nivîne,
 Min bi te day evîne,
 Da em bibînin heşmetê.

Taw dibê tirsîm ji xebere,
 Dev hereme, têne riyare,
 Agirek bi wanda dibare,
 Narî cama şerbetê".

Xatûn dibê tu lawê beyanî,
 Lew dibem da tu bizanî,
 Min tu ji bo dilê xwe anî,
 Da em bikin misilhetê.

Law bi xatûnêra debetê,
 Tu mixaziya dil devete,
 Daym ji heq nekin vehetê,
 Rû spiyin d axretê.

Xatûn dibêje bavêje xeyalan,
 Were ser doşek û palan,
 Bihn ke zulf û xalan,
 Law dibe zilfê herîre.

Pîroz be lawê mîre,
 Çi hede lawê feqîre,
 Tev bide vê misilhetê,
 Xatûn dibê lawê verêvan.

Were nav reyhan û sêvan,
 Tu şekir bimêj bi her du lêvan,
 Şibhe cama şerbetê,
 Law bidê tu genca temamî.

Her wekî şekir di camê,
 Bi ser û p'eyan tu li min heramî,
 Tirsîm ji roja axretê.

JI DESTNIVÎSARA MIN FOLKLOR

Zembilfiroş selikan dibe-tîne,
 Mal bi mal digerîne,
 Bejn û bala vî nûrîne,
 Jin û bûkan ji îmanê der tîne,

Rojek hat, roja bi xûr,
 Zembilfiroş kire tivdir,
 Selik hildan, selikê di hejir,
 Birin, gerîya li nav bajêr.

K'ûçe-k'ûçe dizviri,
 Ber xanîkîra bihîrî,
 Jina mîr lê nihêrî,
 Huba wê serda firî.

Ewê gazî carîya kir,
 Sur li e'niye aşkera kir,
 Got: "Hûn carîngê mine delal
 Zû-zû bikin, herin ji mal,
 Lawek li jêre, herne li bal,
 Bêjnê mîr te dixweze dîndar"

Ew carîngê k'eleşin,
 Zû-zû ber jêr dimeşin,
 Şîrin-şîrin dibêjin :
 "Zembilfiroş, lewkê delal,
 Te sene'eta selkê di al,
 Hinek husnê Usib li bal,

.....
 -Hûn carîngê husn û cemal,
 Min bihistîye mîrî ne li mal,
 Selika bi k'êra bikim bazar ?"

Zembilfiroş çû bi derda,
 Gul xatûn rabû li berda,
 Şekir barî ji dev û lêva,
 Zembilfiroş got: "Way xatûna, gerden zêr"
 Carîya ez anîme vê derê,
 Selika bifiroşim naz û nederê.

Gul xatûnê got: "Tu ser sera herdu çava,
 Bazar bazara min û teva,
 Motaca teme bi dil û çava.

-Xatûna delal, zende bazin,
 Tu li min meke gazin,
 Jin ne layqe bike bazar,
 Xeber rastin têne ser zar,
 Selika bi kêra bikim bazar ?

-Ya bi xêr te kir, lawkê nezan,
Ez rast bêjim, tu bizan,
Te xweş kir, tu hati vir,
Tu hem şayî, hem şevbihêr,
Eve ji tera bazar û xêr.

-Wey xatûna gerden zer tê,
Em xeberdin ji cimaetê,
Ew xeber ji estê minra bê qeyde tê.

-Zembilfiroş lawkê feqîr,
Tevî bide zilf û herîr,
Rabe, rûnê li doşeka mîr,
Gotina min ji tera toq û zincîr.

-Xatûnê, li min meke van henekan,
Ew pê kenînê qîz û bûkan,
Min berde, herme sûkan,
Bîfiroşim van selikan,
Pê bîkîrin nanê zarokan.

-Lawko bese bîkî van gîlîyan,
Ezê bidme te memkê xumrîyan,
Li te wer kîm çeka cîndîyan,
Te derxim ji tar û tengîyan,
Guh mede sofi û sunîyan.

Gul xatûnê vekîr bişkokê di pêşîrê,
Memkan sipî kir ne ji minra,
Ew çavkanî bûn bona mîran,
Ew ne risqê me feqîran.

.....
Zembilfiroş çûn reng û rûva,
Lê şkestin ejmû û gave,
Tevîzê da dil û hingave,
Got: "Li eslê mînda eva nave".

-Lawkê nezan, tu çima şermînî ?
Silav bike van memkêd zêrînî,
Tuê ji wan xêrê ji xwera bibînî,
Te ez bi dil canva birim,
Te nebînim, ez dimirim,

*Rojê şayî diçin, derbas dibin,
Gul digihfjin, diçilmisin,
Tu kêf bike, kêfa mezin.*

Bira gunê te ji min bixwezin.

*- Lawko, were ser şekir û sêvan,
Wan bimije bi dev û lêvan,
Sing û berê min ji tera meydan,
Li ser swar be, baje heyran.*

*-Wey xatûna aqil temam,
Tu şerbet bî av li cam,
Bedena te li min heram.*

FEQÊ TEYRAN

Nav û dengê Feqê Teyran şayir û dengbêjê kurd mezin zûya li nav xelqê kurdda e'yan û aşkeraye. Gelek şêr, beyt, xwaşxan û stranên wî li nav cîmaetêda belav bûne, hatine gotinê, stranê û nivîsandinê. Beyt, şêr, xwaşxan û stranên wî nek bi tenê derheqa hezkirinê û evînêda hatine gotinê û nivîsandinê, lê ew wusan jî derheqa siruşt û fîlosîfîyêda hatine nivîsandinê û lûlandinê. Şêr û beyt û lûlanên wusan li nav xelqê kurd belav bûne, ku bi pîranîya xweva bi zargotina cîmaetêra hatine girêdanê, li nav wanda gelek caran xwaşxan, malîk û bendên şêran, beytan ji folklorê ketine nav nivîsara wî, û wusan jî gelek şêr û beytên wî ketine nav zargotina cîmaeta kurdan û têne hesabkirinê hu nurê zargotina cîmaetê. Bi nihêrîn û nezera xelqê kurd Feqê Teyran şayir û dengbêjê batinîye, ewî zimanê teyr û terewulan dizanbû, dengê siruşt zêndî û nezêndîta xeber di da, sebeb wê yekê xelqê kurd navê "Feqê Teyran" li wî kirine. Navê wî bi rastî "Mehemed Feqî bûye", yan jî Mehemed Feqê Teyran bûye, ewî bi xwe li ser nivîsarên xwe navê xwe kurt dinivîsî: Mîn-Mihê". Alêksandîr Jaba dinivîse "Şayrê din Mîm Mihêye", Mehemed Feqî Teyran, ew ji Muqsê welatê Hekarîyê li sala 702 hîcrê (1375-76) hatîye dinya-

yê, beytên "Şêxê Senan", "Hespê reş" û "Ber Sîs" nivîsarên wîne". Ebdulreqîb Yûsûb li nivîsara xweda "Destnûsa Ber Sîs li berhevîya Feqê Teyranda" dinivîse: "Feqê Teyran yeke ji şayrên kurdan, yê ku binaxa edebîyeta kurdî danîye. Teyran şayrekî paybilind bûye, gelek berhevî li dû xwe hiştîye, berhevên nivîsarên wî gelek sade û sazrevanin û nêzîkî şopa qisekirina camêrîya xelqêne. Em dikarin bêjin, ku berhevîya nivîsarên Feqê Teyran parevedibin ser dû cûran: a-) Şêr, helbest û qesîdên belav - belav, b-) çend çîrok û dastanên aynê û netewetî. Feqê Teyran yeke ji wan kesan bûye, ku çîrok bi kurdî nivîsîye. Şêr û helbestên Feqê Teyran gelek li nav xelqê belav bûne û çend pertok û kitêbên wî, yên ku em navê wan dizanin, eve jêrînin :

1. "Şêxê Senan" yan jî "Şêxê Senanyan" li sala 1030-da nivîsîye. Eva çîroka 720 rêzên şêrîne, bi tevî wê li destnîvîsarêda sê heb destnîvîsar hene: a) Hespê reş, b) Sîseban c) Ber sîsê Abid, û d) Dimdim.

Hinek dibêjin , ku çîroka "Ferx û Sîtî" jî ya Feqê Teyrane".

Bi fikira min jî van beytan, yeku Ebdulreqîb Yûsûb çîrokan lê kirîye, her beyta "Dimdimê" ne nivîsara Feqê Teyrane, beyta "Dimdim" li sedsalîya XVI û destpêka XVII -da peyda bûye, têda derheqa xanê kurdan, xanê çengzerînda tê gilî kirinê, dibe, ku beyta "Dimdim" dengbêj yan şayrekî kurdî li hev anîye, jî ber xwe derxistîye û ew li axa Behdînan yan jî li axa Cizîra Botan belav bûye û bi ser navê Feqê Teyran hatîye nivîsandinê.

Ebdulreqîb Yûsûb li nivîsara xweda, ya li jorê min navê wê got, dinivîse: "Destnîvîsara ku "Ber Sîs Abid" têda hatîye nivîsandinê, ji 28 belgane, her belgîda 23 rêzên şêrîne, her tenê li du-sê belganda du-sê malikin, destnîvîsar bi hubra reş li sala 1969 li gundê Barmîyê li rojava Cizîra Bohtan bi destî kurê Hacî Reşîd Keîşanî hatîye nivîsandinê". Li folklorê me kurdîda navên beytên "Şêrê Sîsebanê", "Hespê reş", "Ferx û Sîtî" têne gotin û gilî kirinê mîna beytên zargotinê. Mesele, navê wan li berhevoka folklorê kurdîda ya Albêrt Sosin li sala 1880 li Petêrbûrgêda çap bûye, hatîye nivîsandinê û gilîkirinê. Wusan jî

navên gelek şêr û helbestên Feqê Teyran li folklorê zar-gotinêda têne gotinê, mesele "Feqê Teyran û av", "Feqê Teyran û roj", "Dilberê" û yên din. Li van salêd paşin çend şayir û nivîskarên kurd helbest û şêrên xwe bi navê Feqê Teyran nivîsîne, kitêbokê xwe biçûk bi navê Feqê Teyran çapkirine, mesele Etarê Şero, Du dunya, Êrêvan, sala 1953, rûyê 40-58, A.Çaçan, Gulbihar, Êrêvan, s.1957, rûyê 7-46; Egîtê Ahmed, dizîka Feqê Teyran; Êrêvan, 1970, O.Ce-lîl, Celîlê Celîl, Zargotina kurdî, Moskva, 1978, I, rûyê 53-78.

M.B.Rûdenko li xebata xweda ya bi navê "Opîsanîyê kûrds-kîx rûkopîsêy Lënîgradskîx sobranîî, Moskva, sala 1961" (yanê "ser û ber nivîsandina destnivîsarêd kurdî yên li Lënîgradêda komkirî") dinivîse, ku A.Jaba nivîsîye ku "Beyta newala Sîsebanê" nivîsara Feqê Teyrane(67), lê "Qew la "Hespê reş" hikyata Elî Herîrîye" (72). Li paşê M.B. Rûdênko dinivîse: li dema ez mijûlî lêgerîna efirandinêd Feqê Teyran dibûm, ez hatme ser wê fikirê, ku "Hekyata şe rê serhatîya Dimdimê di gel qizilbaşan" ne nivîsarên Feqê Teyranin.

Bi gilîkî edebyetnasên kurd têne ser wê fikirê, ku her bi tenê beytên "Hespê reş", "Şêxê Sanan" (yan jî "Doda gurcan), "Ber Sîs" û şêr û helbestên derheqa siruşt, fîloso-fîyê û evîndarîyê, yên ku li nav xelqê kurdda zefîn û bel-lavin, nivîsarên Feqê Teyranin.

Naveroka beytên "Şerê Sîsebane" (yanê jî "Newala Sîseba-ne"), "Hespê reş" û "Dimdimê" zûva aşkera û e'yane, ew li berhevokêd folkloranda hatine çapkirin û tercime kirinê (binêre A.Sosin, Kurdishe Samlungen SPT. 1880; Hacî Cindî Emînê Avdel, Folklorê kurmancî, Êrêvan, sala 1936, Kurds-kîyê pesnî-skazî, Moskva, 1960). Naveroka destana "Şêxê Sanan" ya nivîsara Feqê Teyran nêzîkî naveroka beyta "Do-da gurcane", lê ew bi rengê bedewî, bi qeyde, form û kêş û qafîya edebetî hatîye hûnandinê û xemilandinê (binêre, Feqê Teyran, Şêxê Sanan, Moskva, sala 1965, bi pêşgotin, tekstên nivîsandina Feqê Teyran, tekstên folklorî û terci ma wan bi rûsî, ya M.B.Rûdênko). Heta van salên paşin na-veroka beyta "Ber Sîs" ne aşkera bû. Dinivîsin û digotin, ku ew destnivîsara Feqê Teyrane, lê mezmûna wê, naveroka wê me nizan bû. Ebdulreqîb Yûsûf li nivîsara xweda ya ku

li jorê min navê wê got, bi kurt naveroka beyta "Ber Sîsê" nivîsîye. Ewî nivîsîye: "Padşakî cinan bi navê Ber sîs gelekî xwedêtirs li welatê Şamê hebûye, ew li şikevtada tevî pezkûvîya dima, şev û roj tevî wan li çolê diçêrîya, xwerina wî av û gîha bû, ew gelekî jar dibe, li e'mrê xwe da digihîje dereca Ewliyên xwedê, xwedenasî, siphîtî û qencîya wî li nav xelqêda belav dibin, xelq tîn cem wî, jêra xêr û bêrê tînin, ew du'a li wan dike. Bi xwe ne şêxê wî hebûne, ne jî rêberên wî.

Şeytan gelekî zorê didine xwe, ku Bersîs ji ser rîya rast derxin. Şeytanekî biçûk, nevê wî Wesîs bûye, dibêje bavê xwe şeytan: "Xema mekişîne, ezê Ber Sîs ji ser rîya rast derxim". Ew cil û bergên merivan li xwe dike û diçe cîkî li nêzîkî Bersîs dimîne, gelekî ecêb dimîne, ku ew merivekî gelek salih û qence. Bersîs tê cem wî û ew dibîne hevalên hev, bi tevayî nivêj û du'a dîkin, basa pexemberan û merivên sipîhê û qenc dîkin. Bersîs 69 salî bû ebadetî xwedê dikir. Rojekê hevalê wî (kurê şeytan) jêra dibêje: "Divêt şêx rêberê te hebe". Ew jî dibêje: "Rêberê min Xidir Eylase". Kurê şeytan dibêje: "Eger min bikî şêxê te rêberê te, ezê te têxme ser binçenga xwe, emê bifirin, herin li cîyê xwedê bilind". Li ser derîya firîn, îblîs firî hat, bû teyrekî û Bersîs li ser perê wî suwar bû, firî ser derîya Osmanê, li paş vê Bersîs bawarîya xwe li kurê şeytan anî û ew kire şêxê xwe.

Mîrek û desthiltadarek dewlemend hebû, qîza wî gelekî şox û şeng bû, gelek rind, bedew û dilrevîn bû, şeytan hatibû xewna keçikê mîna dev, lêv û çavên beraz lê bû, wek kabûs zîmanekî cehneme lê bû, li cîda dibe sehê tajî û li guhê wêda dike qîrîn, li axirîyê eva li keçikê dibe ta û lîrîzîn û bedewîya keçikê namîne, bavkê wê çend stêrnas û remildaran kom dike, wekî bizanbe nexweşîya qîza wî çîye. Lê ew çiqas li kitêb û defteran dinêrin, dîkin nakin tê derxistin, nav û nîşanê nexweşîyê lê nabînin, hinek dibêjin: "Belkî çav lê ketine", li paş vê bê hevî dimînin. Îblîs diçe xewna dayka keçikê, dibêje: "Eger hez dîkin qîza wê sax bibe, qenc bibe, bixemilînin, bibîne cem Bersîs, bira şev û rojan li cem wî bimîne". Bavkê keçikê ji wezîrê xwe pirs dike, lê wezîr pêra-pêra razî xewna wî nabe, dibêje: "Eva îşa herame". Mîr bi qîsa wezîr nake, keçikê bi ciwan

tirîn dixemilîne, dibe cem Bersîs, ku wê qenc bike. Lê Bersîs temaşa bedwîya keçikê nake, naçe cem wê, îblîs diçe cem keçikê, digirî, perdê ji ser rûyê wê dide alîkî, dawa ji Bersîs dike, ku wê qenc bike. Çaxê çavê Bersîs li keçikê dikevin, teyrê dilê wê difire ser keçikê, li niqumî rindî û bedewîya wêda dibe, xwe nagire, îşê xerab pêra dike, lê paşê pojman dibe, dibêje îblîs: "Wî hesab dike şêxe xwe, ev guneha pêra kirîye, Ew ji dibêje: "Tobekirin he mû gunehî dibe", lê ditirsîm qîza min hemle bibe". Got wê baş dibe, tu keçikê bikujî, ku destê me jê xilas be, em rastî şermezariyê nebin".

Bersîs keçik kuşt û li cikî çal kir. Şeytan dîsan hatîye xewna bavê keçikê û jêra gotîye, ku Bersîs qîza wî kuştîye û li filan cîyî çal kirtîye. Bavê keçikê diçe Bersîs digire û qîza xwe ji çalê derdixe, ferman dike Bersîs li sêdarê xin. Çaxê xerêx dibin Bersîs sêdar bikin, şeytan li ber Bersîs disekine, Bersîs lava lê dike, ku wî azad bike Ew jî dibêje: "Eger sûcê min bibî ser xwe, ezê te rizgar bikim". Ew sûcê wî dibe ser xwe û ji dîn dîyanet der dike ve. Hingê şeytan xwe pê dide naskirinê, Bersîs jî li sêdarê dardakirî dimîne û heftê salê ebadetkirina wî badîhewa diçin.

Bi vî cûreyî serhatîya Bersîs li destnivîsara Feqê Teyran da kuta dibe".

Li kutayîya nivîsara xweda Eldulreqîb Yûsûf dinivîse, ku "serhatîya "Bersîs" berê pêşin li nav yahûdîyanda bûye, paşê ketîye nav ayîna îslamê. Navê "Bersîs" jî du xeberan çêbûye: ber û Sîs. Ber bi zîmanê yahudî yanê kur, bersîs yanê kurê Sîs. Dibe ew li kitêb û pertokanda hatîye nivîsandinê û Feqê Teyran ew ji ber kitêban wergirtîye, bi şova helbestî gelek rind li hev anîye, geş kirîye û rengê dastanê yanê jî beytê nivîsandîye bi kurmancî".

Dibe bi rastî wusan ji bûye, lê bona vê gotinê pêvîste edebetnasên kurd baş mijûlî lêgerîna dastana helbestî ya Feqê Teyran "Bersîs" û "Bersîsa" çîrokî bin, li hemû alîyanva hev bikin û qedir û qîmetê "Bersîsa" wî nîşan bikin

Li jorê min got, ku gelek şêr û helbestên bi navê Feqê Teyran li nav xelqê kurdd a hene, çend heb ji wan li destnivîsarên A. Jabada hene. M. B. Rûdênko li xebata xweda, ya

ku min navê wê li jorê nivîsî, her navê du helbestan di-
nivîse, ew dibêje: "Li destnivîsara A. Jabada helbestên
"Ey av û av" û "Ji rengê Dilbera horî" helbestên Feqê Tey-
ranin" (88).

Çend helbestên Feqê Teyran li kovar û rojnamên kurdîda û
berhevokêd folklora kurdîda hatine çapkirinê. Xwendevanên
me delal derheqa wanda dizanin. Min bi xwe li nav salên
1934-35 -da çend heb ji zarê kurdên nehîya Abaranê ya
Ermenîstana Sovêtê nivîsîne û ez wan li jêrê çap dikim.

DÎLBER

Êy Dilbera gerden zeri
Way nazika dêm qemerî,
Qamet ji mûma fenerî,
Wêran ezim, malim xirab.

Êy Dilbera gerden letîf,
Way nazika qamet elif,
Qamet ji reyhana xefîf,
Wêran ezim, malim xirab.

Êy Dilbera gerden zuzac,
Way nazika mislî zuzac,
Qamet ji reyhana qirac,
Wêran ezim, malim xirab.

Êy Dilbera qamet misal,
Way nazika dilî hejar,
Te ji xandinê kirim betal,
Wêran ezim, malim xirab.

Êy Dilberê, way Dilberê,
Feryad ji destê k'eserê,
Avik ji ava K'ewserê,
Wêran ezim, malim xirab.

Êy Dilbera gerden zirav,
Dêm şûseye, t'ijî gulav,
Êy duxtera bejna zirav,
Wêran ezim, malim xirab.

Çavan ku hiltinî bi meste,
 Ew çend ya misrî bi destê,
 Li kuştina min te bi qeste,
 Wêran ezim, malim xirab.

Tu bi qesta min dikuji,
 Tu bi k'ifra dil nasoji,
 Gelek sotim, kirim riji,
 Wêran ezim, malim xirab.

Gelek sotim, kirim k'ibab,
 Kirye bi min sed reng xirab,
 Ya leytenî kunrû turab,
 Wêran ezim, malim xirab.

Ya leytenî kunrû ve xar,
 Wey nazika min te ji dûr,
 Bêhiş kirim zîlfê di hûr,
 Wêran ezim, malim xirab.

Bêhiş kirim zîlfê di reş,
 Biskê siyah, bîhnê di xweş,
 Ew duxterê, çapik bimeş,
 Wêran ezim, malim xirab.

Bêk'êf kirim zîlfê di reş,
 Biskê siyah, zîlfêd qemêr,
 Eşq û muhbeta min li ser,
 Wêran ezim, malim xirab.

Sotim, berşatim bê hesab,
 Lê pîrsî bo kirme k'ebab,
 Kirye bi min sed reng ezab,
 Wêran ezim, malim xirab.

Sibhan ji şahe bi t'enê,
 Xalik li xala gerdenê,
 Ez dîn kirim, berdan dinê,
 Wêran ezim, malim xirab.

Eşqa mezac p'eyda bûye,
 Îro li min dijvar bûye,
 Hivî dikim heqîqîye,
 Wêran ezim, malim xirab,

Eva helbesta Feqê Teyran "Dîlber" berê pêşin li k'itêba S.Movsêyanda ya li navê Zimanama kurmancî (kin) li sala 1935 li Êrêvanê çap bûye, min ew ji wê k'itêbê wergirtiye çimkî bi fikira min ew eslî ji destnivîsara Feqê Teyran hatîye wergirtinê. Min her li wêda rêzên benda 8 guhastinê, di kitêba S.Movsêyanda ew rêz bi vî cûreyî hati bûne çapkirine :

*Ew be qesta min bikujf,
Ew k'afira dil nasojf,
Gelek sotim, kirim rijf,
Wêran ezim, malim xirab.*

Li sala 1935-da ez çûbûme nehîya Abaranê, li wêderê kurd sêd hazirkirna mamostayên mektêbê kurdan vebûbû. Min li wêderê, li gundê Camuşvana mezinda dersê zimanê kurdî û lîtêratûra kurdî dida dersdarêd kurd.

Hema li wî çaxî min çend helbest ji zarê Qaçaxê Kokil, 28 salî, ji qebîla rojkan, li gundê Sengerê, nehîya Abaranê ser Ermenîstana Sovetê nivîsîn. Ji wan helbestan min ev helbest nivîsîne: "Hey av, hey av", "Feqê Teyran û quling" "Feqê Teyran û roj", "Feqê Teyran û evîna dîl", "Feqê Teyran ji dîlra", "Feqê Teyran û bilbil", "Feqê Teyran û dîlber". Bi fikira min bi hev anîna xweva, bi k'êş û qafîya xweva bi li hev hatina rêz û bendê xweva ev helbestana nê zîkî eslî nivîsara Feqê Teyranin. Lema jî ez wan li vîra çap dikim, ku xwendevanên me delal haj wan jî hebin.

HEY AV

*Her av, mal xirab, bi bez,
Qewî bi fûr dik'işî her lez,
Şewata tu li ser, wusa jî ez,
Herê avê, tu maşoqa dilê xweyî,
Ne şivêta gelpê mayî,
Metlûbekî dilê te jî hebî.*

*Avê got: "Hey malxirab, li me çûn qelem zeman,
Eh dixulxulin bê qeyas û deman
Hatin dunyayê gelek pêxember,
Ewan ji me ne kir pîrs û hewal,
Pêxemberan aqil hebûn,
Ew hewcê pîrsan ne bûn,
Ewan ji zor metleb hebûn.*

Feqî got: Her av û her av, her av û her av,
 Qewî têyf bi şev û roj li ser hev,
 Tu sewt didî bê qelp û dev.
 Ez motacim, tu hewasî,
 Ji ulmdaran naqim qelsî,
 Gotin ji minra serfinazî.

FEQÊ TEYRAN Û EVÎNA DILA

Nero dilo, dilê bazî,
 Çi ji halê min dixwezî,
 Bese biki hewar û gazî,
 Te ez kirme belengazî.

Îro siveke ji her sivane,
 Ez xiyala dilda mame,
 Nizanim, Şerqê hatme Şame.

Nero dilo tu bi tifiq,
 Tu rêwîyî heta mifriq,
 Hero dilo, çira wusa dik'ewgiri ?

Bese, biki şin û girî,
 Hesab bite -qet ne li virî.
 Çira ji evna zor digirî ?
 Birîna dilê min sax û silî,
 Ji kezevê da dixilî,
 Her dil bike şin û girî.

Dilê min însanê bê ziman,
 Li min dike hewar û ferman,
 Gelo ji bo çi ez li vir na mam ?
 Sed û pênc salê min bûn temam.

Vê sejadê li min da bû,
 Li min behra mezin rabû,
 Hero dilo ji xewê rabe,
 Xema dil wê belav be,

Ji Belqizayê nayê cabe,
 Kofiya hilkev xemilî serda,
 Keçik hat, rabûm berda,
 Gelo kê ji dilê min xeber da,

Şerbeta lewz û k'ilaman
 Da dest xas û aman,
 Dilê min insanê bê ziman,
 Li min dike hewar û ferman.

Bû payîz li van deran,
 Xezan zer bûn serê daran,
 Sefa nabe li wan deran.

Dilo çima tu ha xwarî,
 Tu ji minra bê itbarî,
 Gelo heye insanê ne mirî ?

FEQÊ TEYRAN Û DILBER

Way Dilbera dêm bi şemal
 Bo te digirim war bi war,
 Her bo te bûm xirab mal.

Tu Dilbera esil zade,
 Te ji min birîye çax û wede,
 Qinyat dilda bûye bê sewde.

Tu dilbera mine E'nela,
 Îro gewî ji min bûyî cuda,
 Ez mame bêhiş û bê sewda.

Tu dilbera derê bê qeyayê,
 Bi husul cemal tifiqî rû dunyayê.

Qewî iro min ced kirîye,
 Dirhem li xelqê zef kirîye,
 Sê sed şest beyt hazir kirîye,
 Li nav xelqê belav kirîye,
 Havekî rind li xwe kirîye.

FEQÊ TEYRAN Û QULING

Hey qulîngo xwe newestîne,
 P'er û baskan her hilîne,
 Here, ji tebîyetê ji minra giliya bîne,
 Îro li ser rîyan ez rêwîme,
 Tu li hewa xweş cibâr be,
 Ser gaz û gêdûka bilind xwar be,
 Hema ji derdê dilê min hişyar be.

Hey mal xirab, tu gudarî ke,
 P'er û baskan li ser min sî ke,
 Min jî di gel xwê rêwî ke.
 Çend giliyan li min saffî ke.

Malxirab bike li min qirîn,
 Dil û cegera min tev biwarîn,
 Ezim iro bê sewda serîn.

Gelek refêd mîna te li min dabiherîn,
 Hey qulîngo tu difirî li dunyayê,
 Here cihabê bide E'ynelayê,
 Bêje Feqê Teyran niha nayê.

FEQÊ TEYRAN Û ROJ

Roj hilat û ava bû,
 Erş û ezman cîkî rawesta bû,
 Dunya bi tebîyetê şên û ava bû.

Hey roja sor bi rengê xweva,
 Bê te hêşîn nabî gul û gîha,
 Te nîn be rêwî get rê nabet,
 Tu rojeke amin û taqet,
 Bê te najîn însan û muxulqet,
 Bi te dibin hergav firêqet.

Tu bilindî, hergav perwazê,
 Erd jî te hergav dizê,
 Tu mîna pêlêt agir li ezman,
 Germê didî deşt û zozan,
 Tu germ dikî ser û bine,
 Teva û re'wur bi te dibin xinc.

Pêvîste li vira çend xeberan derheqa dastana Feqê Teyran "Şêxê Sena'anda" bêjim.

Dastana Feqê Teyran "Şêxê Sena'n" berê pêşîn li welatê Sovetîstanêda hatiye çapkirinê. Li sala 1965-da M.B. Rûden ko têksta nivîsara Feqê Teyran "Şêxê Sanan" bi tercîma rûsî û pêşgotîna xweva bi lênihêrîn û serdarîya min çap kir.

Ji ber ku heta niha dastana "Şêxê Sena'an" ne hatiye çap-

kirinê bi herfên latîni, min li vira biryar kir, ku her bi tenê çend parçên wê çap bikim bona xwendevanên me delal, ku ew haj bi teher û qeydê nivîsara wê bin. Min li jorê got, ku naveroka dastana "Şêxê Sena'n" mîna naveroka beytê "Doda Gurca"ne, ya ku li berhevoka "Folklora Kurmancî" da çap bûye. Yê dixweze vê yekê bizanbe, dikare wan beramberî hev bike.

ŞÊXÊ SANA'N

Sena'niyan şêxêk hebû,
Ew aşiqê bi xwe xwe bû,
Qet mêlê di dinyayê ne bû,
Dûr bû ji vê mişulxetê.

Dûr bû ji ev dinya fanî,
P'ir digirî, kêr dikenî,
Kul bû ji ber sicde anî,
Di kar û zewada axiretê.

Wî her zewade kar dikir,
Zikrekî bê hejmar dikir,
Ji dinyayê îftixar dikir,
Dûr bû ji her çi şibhetê.

Dûr bû ji efalê bi şek,
Ji emir û bekir xûşk,
Ma kes nakit li nik,
Nakit qebûl vê xeybetê.

Nakit qebûl van xeberan,
Medhê civan û dilberan,
Ma kes xeber nakit pêra,
Behs û qisê mihnetê.

Dûr bû ji ber minahiyan,
Ne dihate eyd û şahîyan,
Ji şerma selwat û çêyan,
Şîrîn dihate taetê.

Taet dikir daym medam,
Ge ji qewd, ge ji qiyam,
Heftê û heft salê temam,
Xalî ne bû ji xizmetê.

Her xizmeta bi xwe dîkir,
Zikirê mezin ji pê dîkir,
Bi çêhiyan xelq çê dîkir,
Danî rêya hedayetê.

Her çê li şêx guhdar dibû,
Dinya ji çavan ser dibû,
Axret bi wîra yar dibû,
Ji wez û pend û şîretê.

Şîret û penda hekîman,
Xeberê pîrê ezîman,
Dilberî ehlê helîman,
Kes ne dîkit qîmetê.

.....

Emrê wî bi hed cema bû,
Yek mûyek reş tê ne bû,
Horîk di û tima bû,
Rohniya fendê ketê.

Rohîniya fendê ketê
Horîya bekîra gihîştê,
Di li ser banê kenîştê,
Di ku keç ban dîketê.

Bi tenê keç vexwendî,
Perdê ji ber xwe hiltîfî,
Şêx di xûnêda dibîfî,
Cam û tasek mey didînê.

Xemir û şerab pîr dike,
Şêx di xûnêda fir dike,
Nezer li ya dêm dur dike,
Dîn bû di nîva xelvetê.

Di nîva xelvetê ew dîn dibû,
Tijî demax xûn dibû,
Şihba sipî rengîn dibû,
Ew hal û reng get jê netê.

Nayêt li şêx ev hal û reng,
Eybe li wî ew nav û deng,
Pîr coş dibû ji dest zilfêd şeng,
Îtber bi dinyayê xetê.

Ji zîlfêd reş dîn bûn gelek,
 Kezema kevan reş helek,
 Firyardê şêx çûne felek,
 Ah û fixan jê ne tê.

Ah û fixan der bûn hezar,
 Hingê hebû derwêş û yar,
 Hemîyan li şêx kir pirsyar,
 Bajar û ehlê hêşetê.

.....

Şêx gote wan qîr qîr mekin,
 Zikirê xwe fro pir mekin,
 Kêfê li min bê ser mekin.
 Xweş nine sewta ji we tê.

.....

Şêx li xwe nekit stran,
 Aşkera xwe gote yaran,
 Ah ji destê dohta kafiran,
 Birme dînê şerketê.

Bê mezheb û bê dîn kirin,
 Bê xwendin û yasîn kirim,
 Ji yar û biran şermin kirim,
 Wardek xêla min ne tê,
 Lê neşem werdan bixunim,
 Bijengê nazik dibînim,
 Dîn dibim wir dîminim,
 Dil ji min bir qametê.

Qameta sekran û mestan,
 Horîya lolo di destan,
 Birme dêra xaç perestan
 Xelviya xem xanetê.

Hem nû kirim, hem bad kirim,
 Ku wê ez isaykîrim
 Ji vê terîqetê der kirim,
 Kafir kirim bê mirwetê.

.....

Husna keçê bû mezhere,
 Ew horiya dêm qemere,
 Şêr di bû, cihan çû ber,
 Şerm û edeb qet jê ne tê.

Şerm û edet çû wê demê,
 Nalî ji tîra şermê tê,
 Bûye kenîni alemetê,
 Avit kirasê rûmetê.

Li nav komên destnivîsarêd kurdîda yên kitêbxana Saltîkov
 Şêdrînda destnivîsarek heye, bi herfên erebîye, jêra di-
 bêjin "Heza" (yanê eva) beytê Feqê Teyran bi avêra xeber
 daye. Eva têksta ji destnivîsara herfên erebî J.S.Musael-
 yan hatiye wergerandine ser herfên latînîya kurdî.

HEZA

Beyta min pir xweşe, guh bidin, xudan kemal

Ey av û av, hey av û av,
 Ma tu bi eşq û muhbetî,
 Mewcê pêlan davê pêlan,
 Bê sekunî û bê rehetî.

Bê rehetî û bê sekinetî,
 Yane eşqa ya xwe xwenetî,
 Yan şihbeta qelbê minî,
 Ji eşqa na tebitî,

Ji eşqa tu têyî hey,
 Hetî bi k'u kengê hey bêy,
 Ji minra bibê, heyrana te bim,
 Da ez bizanim qise'tê.

Da ez bizanim vê sirê,
 Ji hindiki heta pirê,
 Ji me'nîya vê gur-gurê,
 Ji k'êra diki vê tae'tê.

Ji k'êra diki zikrê bi hal,
 Qet K'işkişê nakî betal,
 Teşbiye min rehet û e'mal,
 Qet bi şev û rojan xew ne tî.

Lo şev û rojan bê xewî,
 Ji mihnetê li yek ditewî,
 Şev tariyan qet nehewî,
 Ji emrî bi lez ketî.

Ji emrekî tu têy bi lez,
 Sewda serê teşbiye ez.

Tu weha diherî vê xizmetê,
 Xizmet diki bê p'ê û dest,
 Çendî diki çûna guhest,
 Xudê ne go gavek qewest.

Dayîm diçî, dengê te tê,
 Dengê te tê bi roj û şev,
 Tae't diki bê qelb û dev,
 P'êl ra dibin ji mewcê k'ef,
 Seyrane ji rengê qudretê.

Geh-geh sipî teşbiye şîr,
 Mislî te qet naçin çu şîr,
 Avê ha diherî yar tê te bîr,
 Mêla hebîbê bi çûna te tê.

Lazim te mehbûbek heye,
 Yan mêl û metlûbek heye,
 Yan dost û meqsûdek heye,
 Yan sire' û mermozek heye,
 Lo bê libas û kesotî,
 Lo bê libas û taziî,
 Di sêr û reqs û gaziî,
 Ji k'êra diki esqê baziî,
 Remzan û xweş eşaret.

Van teşbihan ji k'êra diki ?
 Remz û sewadan vêkra diki,
 Hemîyan ji bal xwe ra diki,
 Digerî ji mehela xurbetê.

Digerî devê pire dinê,
 Qet nanivî, nasekinî,
 Reh şibhete qelbê minî,
 Ji mihneta new zehmetê.

Bê fem û qıl û qala bi sirî,
 Ji minra bi lefzê hal bibêj,
 Her mimo ha û dal bibêj,
 Minnet û beyana k'axetê.

Vê k'axetê esbat bike,
 Qeyd û sir extyar bike,
 Qenc vê sirê binyad bike,
 Da em bizanin rebê benî.

Dinya û eslê ser temê,
 Avê birî vê a'lemê,
 Tu hadîsî yan qudsî,
 Yan tu nîzanî hikmetê.

Ger çi ne meşruh av sûxenî,
 Rojekê ji binyada mezin,
 Bihena qedem jî hate min,
 Yanê ji binyada delal.

Avingê dibêje ava zelal,
 Borî, li min ku çend sal,
 Qet kes ne kir ev reng sewal,
 Heta niha vê sehetê.

Hetî niha nê vê demê,
 Cayek ne bû ji vê a'lemê,
 E'bdêk ji pişta ademî,
 Bifikir da hewalê şetî.

Gava vizîna şet zû diçê,
 Hingê xudê danî cinî,
 Adem ne kir pîrsek ji min,
 Ji enbiya û ometê,
 Feqî dibêt ava şetê.

P'êxemberan aqil hebû
 Qet hewce pîrsê ne bû,
 Wan dest giha bû mîhbetê,
 Ji sihbeta sir ve ketê,
 P'êxemberan zanî şîxal,
 E'ybe li bal ehlê aqil,
 Tiftîş bikin me'rifetê.

Me'rifetê tev bikin,
 Firsê ji bona pêş bikin,
 Qenc vê qisê tiştîş bikin,
 Ji a'rifan kirahetê.

Xelqê xudê aqil kirî,
 Hem a'rif û kemal kirî,
 Nûrek di dilda hilkirî,
 Eslê qisa wî pê ketê.

Ey misilman elm û xet,
 Mecnûnekî heywan sifet,
 Tiftîşa pirsan ew diket,
 Lo maku lêpe li omete.

Pirsa Feqî bo çî ne bû,
 Lara di firgetê hebû,
 Erşe xudê li ser avê ve bû,
 Avê gelo di bîra te tê.

Avê cewab daye sûxanê,
 Ba ziman hâl wî gotê min,
 Min remz û şîr ji şahê mezin,
 Sibhan ji wî siltenetê.

Sibhan ji me'budê li ber,
 K'ê di ji xudê kit xeber,
 Em carekê inane der,
 Genc bûn di kinêza qudretê,
 Genc bûn kinêza eqdemê,
 Genc bûn di kenêza eqdemê,
 Ba xwe ji eşqa ademê,
 Inane karê a'lemê,
 Zahir kirin vê sûretê,
 Zahir kirin em çar bakire,
 Av û hewa ax agirê,
 Hewan hemî jê çêkire,
 Dar û nebat û dê qîmetê,
 Dar û nebat û le'al dûre,
 Heywan û esnaf di pire,
 Teyr û tewir behrî û ber,
 Terkîb kirin ji netefetê,
 Teşbiye me na qericîn,
 İnsan ji tinê xaricîn,

Lo çin ji narê mar çin,
 Rojek ji min yek tebiyetê,
 Em çar tebe'tan vêkra xelidîn,
 Hin ateşin, hin bardîn,
 Ji behra hewa pê walidîn,
 Melbus kirin bi vê û cihetê,
 Bi çar cihan em la bin,
 Qedîm niye, em xadisin,
 Loma ji tîna babisin,

Hindî dixwazin refe'tê,
 Hindî mela efraz dîkin,
 Hindî dişên gazî dîkin,
 Em carek binin rewyetê,
 Carek binin em car xehetê,
 Bê misilhet nageretê,
 Ji xuşyetî naleretê,
 Cuda kirin ji wesletê.

Ji wesletê cuda kirin,
 Hetî qeyam sewda kirin,
 Ser kişte bûn di hezretê,
 Raste qewî ev mela,
 Eslê qisê zanî mela,
 Hêna ku bû qal û bela,
 Ma bûn nebûn di hizmetê,
 Di hizreta me hûn ne bûn,
 Le latîfî pê destê bûn
 Di xizmeta ba xewê xwe bûn,
 Hetan roja xîretê.

Ey hûn werin, lêzim werin,
 Cînar û xelqê hêşetê,
 Hûn ra yekê li min çar bikin,
 Îro qewî girîna min tê,
 Îro qewî me tên girîn,
 Sosin dergan xeyrîn,
 Sed heyf li lêvê şekirîn,
 Îro venaxun şerbetê.

Lêvêd le'l û şekir,
 Kêm bûn ji wan dur û xeber,
 Sed ax û kovan û keser,
 Heyf e'yn lam çûn ji hicretê,
 Heyf e'yn û lam ji yek ne bûn cuda,
 Hezin û girîn dîsan te da,
 Em razîn ji e'mrê xuda,
 Her çê ji dergê te tê,
 Her çi dike, ew mîr dike
 Daxan di gelban bir dike,
 Xêr û şeran teqdir dike,
 Sotim bi narê firgetê.

MELEYÊ CIZÎRÎ

Li cara pêşin me'lûmetî derheqa Meleyê Cizîrî di k'itêba Alêksandir Jabada "Recueil de notices et récits kurdes" (11-12) li dereca derheqa nivîsk'ar û şayîrêd kurdanda hatîye nivîsandinê. Alêksandir Jaba nivîsîye: "Şayîrê duyî Melayê Cizîrîye, eslê wî ji Cizîrêye, Cizîra Botan, navê wî Şêx Ehmedê, di tarîxa pêncsed û çilîda (1145-6) di nîva Cizîrêda p'eyda bûye. Ew Şêx Ehmed jî li xoha mîr aşîq bû ye, xezaletnê zehf gotine û dîwançeyek tertîb kirîye "Dîwana Meleyê Cizîrî dibêjin".

Di tarîxa pêncsed û pêncî şeş merhum bûye (1160 - 1161). Bi van me'lumêtîyan aşkera dibe, ku giva kêr û zêde Meleyê Cizîrî şanzde sal jîye. Helbet ne wusane. Sebeb vê yekê zanyar û edebyetnas her yek ji wan derheq salêd bûyîn û mirina Meleyê Cizîrî fikirekê dibêje.

Edebyetnasê kurd Aladîn Sicadî li kitêba xwe "Mejûy edebê kurd" da dinivîse, ku "Meleyê Cizîrî di sala 1407-da hatî ye dunyayê, di sala 1481-da mirîye". Inglîsê kurdnas D.N. Makkênzî dinivîse, ku Meleyê Cizîrî li nav salêd 1570-1640-da jîye (binêre, D.N. Makkenzîe, Mala-ê Cizîrî and Faqî Teyran, Yad-name-ye Iran-ye Minorskî, Tehran, 1969). M.B. Rûdenko di pêşgotîna xweda ya "Ahmed Xanî, Mem û Zîn" (Moskva, sala 1962) dinivîse, ku Meleyê Cizîrî li sedsalîya XII-da jîye. Di miqala xweda "Me'lumetîyêd teze derheqa şayîrê kurd yê sedsalîya navîn Meleyê Cizîrîda" Wezîrê Nadîrî dinivîse, ku Meleyê Cizîrî di sala 1101 hatîye dunyayê, di sala 1169 mirîye.

Ev gotinêd jorin yêd zanyar û edebyetnasêd kurd derheqa salêd bûyîn û mirina Meleyê Cizîrî li hev nayên, çimkî her yek ji wan mesele û berge îsbatkirina fikira xwe tîne. Aladîn Sicadî û li dû wî D.N. Makkênzî dibêjin, ku Meleyê Cizîrî hevdemê Xafîzê Şîrazîye (qurna XIV), çimkî Mele li şêreke xweda nivîsîye :

*Ger leleya mensûrê ji nazimê tu dixwezî,
Der şêrê Mele bin, te bi Şîrazî çî hacet.*

Wezîrê Nadîrî di miqala xweda ya li jorê min navê wê got, dinivîse, "Herdû rêzêd şêrê ne yêd Melene, ew li paşî mi-

rîna mele ketne nav dîwana mele, gelek mesele û berge din hene, ku îsbat dikin, ku Meleyê Cizîrî di sedsalîya donzanda jîye. Ew mesele evin: Melê li şêrêd' xweda navêd ereb, tirk û firingêd zeftkar hiltîne, li şêrêd xweda gilî dike, ku di wextê wîda çi qewimîye, çi hatîye serê kurdan ku çaxê ew bû şayîrê koşk û sera mîr, ew çil salî bû, ku mîrê Cizîra Botan Omed-dîn bûye, ku ewî li sedsalîya XII-da mîrtî li Cizîrê kirîye". Wezîrê Nadîrî dinivîse, ku "Çaxê Selçûqan li ser kurdanda girtin, Cizîr û Hekkarî zewt kirin, xelqê kurd revî, çû topraxa Musulê, ku Meleyê Cizîrî êrîşa aguzan li ser Cizîrê bi çavê xwe dîtîye, ku ewî diye çawan tirk kurdêd Xezbanîyê li sala 1038-da qirkirin". Wezîrê Nadîrî li kutayê dibêje: "Meleyê Cizîrî derheqa wan merivanda û wan qewîmandinanda li şêrêd xweda dibêje û dinivîse, yêd li nav salêd 1160-da qewimîne, bûne û ewî bi çavê xwe ew dîtine": Bi ser hîm û binyata vê gotinê û bi ser hesabê xwe Wazîrê Nadîrî dibêje "Bi texmîna min Ahmedê Cizîrî li sala 1101 hatîye dunyayê û li sala 1169 mirîye".

Bi fikira min eva gotina nêzikî rastîyêye. Meleyê Cizîrî nivê sedsalîya XII-da jîye.

Heta van salêd paşin kesek mijûlî lêgerîna efirandina Meleyê Cizîrî ne bûye. Li welatê Sovetêda li nav salêd 1945-1947 her wezîrê Nadîrî mijûlî lêgerîna dîwana Meleyê Cizîrî dibû. Lê sed car heyf mirîna wî ecel hat, sala 1946 ew mir û pêra ne gihîşt destnivîsara xwe hazir bike bona çap kirinê. Ew her pêra gihîşt miqaleke biçûk bi navê "Me'lûmetîyêd teze derheqa şayîrê kurd Meleye Cizîrî yê qurna navîn" nivîsî. Nûra Polatova jiîna Wazîrê Nadîrî ew miqalê da min, ku ez wê hazirkim bona çapkirinê. Min li cî-cînan miqale ser rast kir, li ser maşînkê xist û ji koma kurdna sêd Erêvanêra şand, ku ew li berhevoka xweda çap bikin. He ta niha, sed car mixabin, çap nekirne. Min paşê reşekî çapkirina wê li ser maşînkê ji nivîskarê me Elî Ebdûrehmanra şand, ku ew li gazêta Rîya Tezêda çap bike. Ewî jî heta niha çap ne kirîye. Dibe, jî wîra çetîne ji rûsî wergerîne ser kurmançî. Dibe jî çap nekirîye, çimkî di miqalêda her tercîma şêrêd Meleyê Cizîrî bi rûsî bû, têkêstê kurdî di miqalêda tune bûn. Niha reşekî miqala Wazîrê Nadîrî li cem min maye, ez sûdmendîyê jê wer digirim, çi ewî

derheqa Meleyê Cizîrî, derheqa şêrêd wî û bîr û bawara wî da gotîye û nivîsîye, ezê wan ji jêrê binivîsim. Wazîrê Nâdîrî dinivîse: "Meleyê Cizîrî ji eşîreta hesenîyê êzdîyanê, dengbêj û şayîrê mîr Omed-dîn bûye, ew mîr kurê Eksan qere ji eşîra bohtan bûye. Xelqê ji Melera digot "Şêxê Cîzîrê", "Reys el -şuara" yanê serokê şayîran". "Li pêşîyê ew şayîrê azad bû, ewî bona lezeta xwe, k'êfa xwe straye, lûvandîye û şêrêd derheqa reng û rûyê tebîyetê, evîniyê û şerabêda nivîsîne, paşê, çaxê dilê wî k'etîye qîza Omed-dîn, ewî şêrêd hezkirina xwe û wê nivîsîne. Mîr Omed -dîn pê hesîyaye, ku dilê mele ketîye qîza wî, mîr dixweze bizanbe bi rastî ew qîza wî hiz dike ew dibêje "Ez qîza xwe didime te". Mele dibêje: "Ez xulamê teme , ez naxwezim". Mîr dibêje: "Şêx Ahmed dersdarê meye". Wazîrê Nadîrî şîro dike çima Meleyê Cizîrî nexwestîye qîza mîr Omed-dîn bistîne. Ew dibêje: "Eşîra Botan çûbû ser dînê musulmana, lema Meleyê Cizîrî nexwest qîza Omed-dîn bistîne". Ew ji qîza wîra dibêje: "Tirkên te ruh û dilê min talan dikin". Wazîrê Nadîrî dinivîse "Di wextê Meleyê Cizîrîda yek pêncanîke para kurdan dînê êzdîyan dihebandin, li wextê wîda şêx û pîrêd kurdêd musulman qedexe kiribûn, ku xelqê rêat kitêbêd dîn nexûnin û mijûlî xwendin û nivîsandinê nebin"

Wazîrê Nadîrî dinivîse, ku Meleyê Cizîrî merivekî gelek xwendewer bûye, şareza û zana bûye, pisporê edebiyeta ereban, farsan bûye, ewî li Bexdadê xendibû, nivîsarên nivîs karên ereban, farsan yên dînnasîyê, fîlosofîyê, stêrnasîyê û tebîyenasîyê xwendibûn. Li wextê Meleyê Cizîrî navê sūfîyê li tevgera cimaetêda belav kiribûn. Sofîtiyê e'tae 'teke (bandûreke) mezin kiribû li ser pêşveçûna edebiyeta kurdî. Sūfîtiya berê pêşin ne mîna sūfîtiya paşê bûye, su fîya berê fikir û bîra bawara hemû xelqê bela dikir, lî piştî wan digirt, pêşberî çînen derebeg û axa began şer dikir". Ev gotinêd Wazîrê Nadîrî derheqa Meleyê Cizîrî û nivîsarêd wîda li ser hîm û binyata xwendina destnivîsara dîwana Meleyê Cizîrî hatine nivîsandinê ya ku niha li hej mara 54 li kitêbxana dewletê ya Êrêvanêda li dereca kitêbêd kêmânîdaye. Wazîrê Nadîrî dinivîse: "Di wê destnivîsa rêda xên ji şêrêd Meleyê Cizîrî, şêrêd Mela Batê, Feqê Tey ran û şayîrê farsa Xafiz jî hene".

Ev bûn fikir û nêtêd Wazîrê Nadîrî derheqa Meleyê Cizîrî

û nivîsarêd wîda. Bona îsbatkirina wan ew li miqala xweda li cî-cîyan çend rêzêd tercimêd şêrêd Meleyê Cizîrî bi rûsî anî bûn ber çavê xwendevanan.

Sala 1978 li Bexdadê zanyarê kurd Sadiq Bahadîn Amedî têksta rexalgirî ya dîwana Meleyê Cizîrî çap kir. Ewî ew têkst li ser hîm û binaxa beramberkirin û hemberkirina he mû têkstêd dîwanê yêd berê çapkirî hazîrkirîye û çap kirî ye. Lê berê têkstê dîwana Meleyê Cizîrî li Stembolê (1924 da), Erbîlê (1964-da), li Bêrlînê (1904-da), li kovara Hewarêda (hejmared 35-58 nav salêd 1941-1943-da) hatibûne çapkirinê. Sadiq Bahadîn xên ji van dîwanan çend destnivî sarêd wê dîwanê dest xistibûn :

- 1- Dîwana bi fotokopî Fon Hartman sala 1904 li Bêrlînê çapkiribû.
- 2- Dîwana li Stembolê sala 1924 çapkiribû.
- 3- Dîwana li sala 1964 li Hewlêrê Gîvî Muqrîanî çap kiri bû.
- 4- Dîwana li rûpêlê kovara Hewarêda (NN 35-58) li Şamê, sala (1941-1943) çapkiribû.
- 5- Dîwana destnivîsara Mele Tabî Bekir Elî Wanî ji Zaxo.
- 6- Dîwana destnivîsara Enver Mam Zaxoyî.
- 7- Dîwana destnivîsara Mehemed Ewnî.
- 8- Dîwana destnivîsara Mele Mehemed Botî Bizêvkî.

Sadiq Bahadîn li îş û karê xweda li ser beramber kirina van dîwanêd çapkirî û destnivîsarda gelekî xebitîye, hemû xeber û şêrêd wan hemberî hev kirine û gihandîye têksta dîwanê ya eslî.

Cudatîya xeberan û rêzêd şêran li dîwananda nîşan kirîye û li peravêjanda nivîsîye. Ewî li çapkirina xweda navê he mû berhevokêd nivîsîye û nîşan kirîye li kîjan berhevokê da û li kîjan miqalêda derheqa Meleyê Cizîrîda nivîsîne. (binêre belgêd 1-30). Li pêşgotîna xweda Sadiq Badîn gîlî dike çawan ewî li kîdere çî destnivîsara dîwana Meleyê Cizîrî û dîwanêd wî çapkirî dest xistine; ew fikira xwe bîr û raya xwe derheqa xebat û miqalêd çapkirî dibêje, he mû melûmetîyêd di wanda derheqa Meleyê Cizîrîda çapkirî di pêşgotîna xweda dinivîse û fikira xwe derheqa salêd bû yîn û mirina Meleyê Cizîrîda, dibêje, derheqa kakilî nîvîsara wîda dinivîse. Ewî nivîsîye "Meleyê Cizîrî li nîvê

sedşaliya panzdanda jiye, li mala şexan hatiye terbiyetkirinê, li xortaniya xweda li cem şex û mirîdêd xwendewer hîn bûye, şayîr û dengbêjê mîrê Bohtan Omed-dîn bûye, li wextê şayrêd farşanda Xafîz Şîrazî sala 1389), Canî(1492) şêrêd xwe sofîyê û evînîyê nivîsîne, nav û dengê wî, qedirê wî li nav xelqê kurdda gelek bilind bûye, ew li wextê xweda merivekî gelek zana û xwendewer bûye, nav û dengê wî ji topraxa Bohtan der belav bûbû".

Li kutayê pêvîste ez bêjim, ku Sadiq Bahadîn mijûlî lêgerîna şêrêd dîwana Meleyê Cizîrî ne bûye. Merem û mebesta wî ew bûye, ku hemû dîwanêd wî çapkirî û hemû destnivîsarêd dîwana wî kom bike, wana li kitêbekêda beramberî hev bike û bide çapkirinê. Pêvîste bêjim, ku ewî bi serfirazî û serbestî eva îş û kara bi cî anîye û baş qedandîye.

Çapkirina dîwana Meleyê Cizîrî bi têkstêd rexnegirî ne îşekî rehet û hesa bûye, bona wê divêt meriv zana be, xwe terxan bike. Bi rastî jî gotî Sadiq Bahadîn bi vê xebata xwe zanîna xwe baş nîşan kirîye û gelek hiş û qewata xwe terxan kurîye, ku xebata xwe bi camêrî bîne serî. Bi xebata xweva Sadiq Bahadîn hemû çar û mikan bona lêgerîna dîwana Meleyê Cizîrî peyda kirine. Eva çapkirina wî li paşwextîyê wê bibe binyat û binaxa lêgerîna zanîstî ya dîwana Meleyê Cizîrî.

Berê piranîya zanyar û edebîyatnasêd kurd, Evropê dinivîsin, ku şêrêd Meleyê Cizîrî şêrêd sufîyêne, derheqa dînperestîya sufîyanda hatine nivîsandinê. Her bi tenê Wazîrê Nadîrî û Sadiq Bahadîn nivîsîne, ku dîwana Melê Cizîrî bi fikir û kakilê xweva pare ve dibe ser du koman: Şêrêd evînîyê û şêrêd sufîyê. Lê bi fikira min şêrêd Meleyê Cizîrî bi piranîya xweva şêrêd evînîyêne, her nivê şêrêd wî yê sufîyêne. Li şêrêd wî sufîyêda gelek xeber û cumlêd e rebî hene, ew baş nayêne fehmkirinê (binêre, Dîwana Meleyê Cizîrî, çapkirina Sadiq Bahadîn, belgê 1 heta 80), lê şêrêd evînîyê gişk bi piranîya xweva bi kurmançîya xas, zarê şîrin hatine gotinê û baş û rind têne fehmkirinê, xwe rûya wan şêran ewe, ku di wanda gelek caran rêzêd derheqê jîyîn, ayîn, halê xelqê kurdda gotîye û lûvandîye. Di gelek şêrêd wîda ew nek bi tenê derheqa derdê dilê xweda, hezkir û evîna xweda dilûvîne, dibêje, ew wusan jî li gelek şêrêd xwe dildarîyêda durêz û sêrêz û çarêz navra di-

ke û dibêje, ne mîr, ne axa, ne jî beg guh nedane û nadne ser xelqê belengaz, ku ew çewsenkerêd rêncber, gavan şivanin. Li hinek şêrêd wîda wetenperwerî û neteweperwerîya wî têne ber çavêd xwendewaran. Bona nimûnê ez çend parçêd şêrêd Meleyê Cizîrî ji dîwana wî, ya ku Sadiq Bahadîn li Bexdadê sala 1977-da çapkirîye, tînim ber çavan.

Sef sef turk û moxol du k'eş û hindî li kemin,
 Bi eceb hatne cengê hebeş û rom û fireng,
 Mîr û kurmanç li holan qederek westane,
 Lê di nivê bi sef û tipê ereb hatne ceng. (283)

Zorbe wê têtin ereb têk çivandin geseb,
 Qenci bi çevan me dê ceng û cidala cemel,
 Şûr û rîman vêkra pence biran têkra,
 Lew me dîkin jêkra qimê dîkin dil di gel. (288)

.....
 Turîm bi dil û peyrevê Mûsayîm ez,
 Ateşperes û nûrê tecelayîm ez,
 Barê ji weelem ku xebêrdarî kirîm,
 Iro tu bizan ademê esmayîm ez.

Înşayê ulmê li dinê çunke mi zanî,
 Zanî bi heqîqet ku çî îşame ez,
 Herfên reqemê lewhîê wicûda me, bixûn,
 Da genci bibînî ku çî îmlayîme ez. (216)

.....
 Mihnet û halê esîran kê li mîran erze kit,
 Dê bitin pîrsê li min lew pur bi rehm û şefqeye,
 Ger bipîrsit carekê xatûn li halê sixteye,
 Bend û zincîr dê vebî, cerhên di gul dê xweş bikî,
 Le kû navê dîlberê dermaneê derdê bendeye. (355-6)

.....
 Geh dil geh can dibên terkê te tîn,
 Nikarin yexma û talanê xalet,
 Meşrebê tîrkan furat û nîle kir,
 Teşne leb çû terefê Osmanî xelet. (257)

.....

Rom û ecem ji her teref,
 Ceng û suwase wan bi xef,
 Hindî û zengî sef bi sef,
 Hatne ber liwayê zulf. (263)

Sef sef me din hindî û zeng,
 Cêngîz hat, Teymûrî leng,
 Xef wan reşandin dil xedeng,
 Teşbihê tirên xan şeref,
 Tirek ji qewsê mal zirav,
 Bi dil wê bavêje nav,
 Xûn tê pur teşbihî av,
 Feryad û efxan sed esef. (267)

Mûyekî ez ji te nadim bi sed Zîn û Şîrînan,
 Çi dibit ger tu hesabkî mi bi Ferhad û Memê,
 Te Fireng û Erebestan û Mecer têkî standin,
 Celebê xweş vegerîn hatiye newba ecem. (232)

Dil geşte, min ji dêrê naçim kenişteê,
 Mehrabe wê bi minra wer da biçine Laliş,
 Mehbûbe wek stêre, govend û işqbazî,
 Têkel biçin semayê, hişyar û mest û serxoş. (234)

Pir e'mrê min çû bi suxtey,
 Lê şikir xwezim ji bextî (361)

Lazime li sultan û miran
 Pirskirin li halê êsîran,
 Em kirin armancê tîran,
 Suxteye dermandeye,
 Hêj nîzanim mîr dê bîrin,
 Zanist em sî sal êsîrin,
 Çavnerî pursek emîrin. (366)

iro ji nû pur atêşim,
 Dîsan ji remza dilberê,
 Mecrûhî qewsî pur weşim,
 Tîr dane nîva cegerê.

Tîr dan ji qewsê ewsede,
 Şahzade edya şîrin qede,
 Kuştine wek min çend sede,
 Wê padşahê û beglerê.
 Xeşmê li feqîran meke zu padşahê min,
 Purse bike carek li xeta û gunahê min,
 Teftîşê bi mûmê bike, er em bi xetayîn,
 Hınca nêbêtin di welatî, di cehê min,
 Cewra te bihêtin, û cefaya te peritin,
 Qurbana te bim, guh bide carek gilehê min,
 Zani ku ji ber cur û cefayan elemin dil,
 Rehrê bi gedayê xwe ke, sultan û şahê min,
 Sê sale ji derd û belayê te hlakim. (309-310)

.....
 Çîn girtiye ser ban û serser bi kef kef,
 Xunê wê dirêjin kul şîran cemidî kef,
 Dunya bûye leylan ji lixavan diwerit kef,
 Rom û ecem girtiye ew xilme sef bi sef,
 Cohte moxolan hatne cengê hebeşê. (427)

.....
 Vewestaym di fervarê,
 Li ebdê xwe ke fermanê,
 Di fermanê vewestaym ,
 Di benda xîdmetê daym,
 Wekî go bê ser û paym.
 Heman lê di tu çewganê,
 Li ber çewgan û kaşoyan,
 Ji derba turk û hindoyan,
 Dibezim her wekî goyan,
 Dema ew, têne meydanê.
 Dema ew tîn bi bazi tîn,
 Di gel qewsê şîrazi tîn,
 Çi mukarin di tazi tîn,
 Bi de'wa têne lêk danê.

Bi de'wa tîn me yexma kin,
Di a'mê sur qewxa kin.

Wê beglerê pur kuştine,
Engûşt bi xwûnê riştine,
Ma ehlê dîl qet hiştine,
Sohtine mislê mecmerê. (447)

.....
Ma Cizirî şibhedarî textê heft iqlîm bit,
Hem bi hukim û seltenet Eskender û Fexfur bit,
Misli cem cama zerin xalî nebê te ji badayê,
Da ji xemra şadmanî "dayma" mexmûr bêt.

Ma di baxê îş û nûşê her bi saz û erxewan,
Kamran û kambexş û dîl xweş û mesrûr bêt,
Çendeke Şîrin puser derbendê dîwana te bêt,
Bendê şapûrê te bin ta Xosrow û Şapûr bêt. (423-4)

.....
Ney tenê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê elemdarê te bin,
Sed wekî şahê Xurusanê di ferwarê te bin,
Ger çî der iqlîmê rabe' hate textê sultanet,
Padşahê heft iqlîman selamkerê te bin.

Paşî newşîrwan dibêm dê hakimê adil tuyî,
Mîslî Hatem dê bidanê der cihan meşhûr bî,
Ma Cizirî şubhedarî textê heft iqlîm bî,
Hem bi hukim û sultanet Eskender û Fexfur be. (452)

.....
Rendî bi xwe qendî şîrin û şepalî,
Qencî û bi xencî û bi nazî û delalî,
Mehbûb bi textî, bi rextî, bi xwe bextî,
Umrê te mera bit sed û deh sal helalî. (525)

.....
Dilberê, serdare, xoban, ez nîzam agah heyê,
Di hebs û zîndanê êsîr û girtiyê dermandeyê,
Girtiyem, mam ez di hebsê, kî gelo meher bikî,
Carî me navê me bînit, pur sevabek zêdeyê,
Minnet û halê êsîran kê lî mîran erze kî. (335)

.....
 Siwaş û fîtneyan rakîn,
 Bi şîr ew têne talanê,
 Dû talanê meşûr tê,
 Ji mee'dana enî kafûr tê,
 Di têkel zulmet û nûr tê.

Me kufrê dê di îmanê,
 Ji şerqê zulmet û şam bê,
 Ji zulfan enberê xam bê,
 Kenarê xal û nîşanê,
 Du zulfê enber efşanîn,
 Du lelê şekeristanin,
 Dilê min wan xedeng danê,
 Dilê min wan xedeng lê da,
 Di burca zuz û şeb têda. (437-8)

.....
 Burca ku hakim lê du mîr,
 Min dît li textê keşwerî,
 Textê di mîr û begleran,
 Meydanê coqa gwêgeran,
 Eslan û cotê meyxuran,
 Mey dan şeraba saxerî.

.....
 Saxer bi dest serxoş û mest,
 Wextê sehergeh dest bi dest,
 Xeflet û begler meyperest,
 Kuştim bi derba xencerê,
 Kuştim bi derba xenceran.

Gezme û xedenga awuran,
 Remz û îşaret û soran,
 Dan dil ji nîva pencerê,
 Dan dil ji ber husna bî nûr,
 Berqa tecelliyê sedûr,
 Lew sohtime wek guhê tûr,
 Hub û evîna enverî. (450-1)

.....

Latu husnî û şahê xubanî,
 Bi xwe hem xanî û hem xaqanî,
 Yûsûfê sanî tu îro xanî,
 Ku bi husna xwe nedirî şanî,
 Bi sur û heybet û sehmê xwe perî,
 Bi te şîn li Bohtan sultanî,
 Bi teblxaney şahî, were text,
 Ku tu îro şahî Kurdistanî,
 Kagulê berde bi ser xal û xetan,
 Ku musilsil bi nimûnê reyhanî (456-7)

.....
 Tu mebê bê ser û bê samanim,
 Gulê baxê îremê Bohtanim,
 Şebçiraxê şebê Kurdistanî,
 Çi tebiyet beşer û insanî,
 Lîla-el hemd çi alî şanî,
 Di rîya yar li rêza saanî,
 Lew di îqlîmê suxen xaqanî,
 Sibahê eyd û ez pêzanî. (509)

DIL JI MIN BIR

Şoxê û şengê zuhre rengê,
 Dil ji min bir, dil ji min bir,
 Awurên heybet pilingê,
 Dil ji min bir, dil ji min.

Wê şepalê miskî xalî,
 Dêm dorê gerden şepalê,
 Cehbeta biskan semalê,
 Dil ji min bir, dil ji min.

Zulf û xalan nûn û dalan,
 Wan ji min dil bir bi talan,
 Goşeye qewse helelan,
 Dil ji min bir, dil ji min.

Dêm nedirê bo enbirê,
 Xemrî û giso herfirî,
 Sine kir armancê tirê,
 Dil ji min bir, dil ji min.

Sor qılîni nazenîni,
 Kuştim û nakit yeqîni,
 Wê bi çengela evîni,
 Dil ji min bir, dil ji min.

Fitil û taban da xuraban,
 Ebleq û cohtê şebaban,
 Dame ber pence û kulaban,
 Dil ji min bir, dil ji min.

Xoş xeramê, ez xulamê,
 Nazikê, şîrin kelamê,
 Tutiya eyvan megamê,
 Dil ji min bir, dil ji min. (324-326)

WERE BÎNAHIYA ÇAVAN

Were, binahiya çavan,
 Bibînim bejn û balayê,
 Zerîfê nazikî şengê,
 Sifet horîyê, perî rengê,
 Bî rojêra tu hevdengî,
 Du reştözên siyah rengî,
 Kişandin, lê ne wek caran,
 Xedengê qewsê nûbaran,
 Ji rengê şîr û mukaran,
 Weşand sine wek baran,
 Ji wê zerbê pîr êşanim,
 Sibah li xêr ya xanim,
 Were binahiya çavan,
 Bibînim bejn û balayê,
 Veke carek xet û xalan,
 Li ser van mesned û palan,
 Bixûne, lê me ebdelan,
 Bibînin eyd û sersalan,
 Îcazet de me destûrî,
 Perî rengê, sifet horî,
 Ji nîva zulmet û nûrî,
 Binûşin mey di ferfûrî,
 Ji dil talanê xalanîm,
 Sibah li xêr ya xanim,
 Were binahiya çavan, (476-478)
 Bibînim bejn û balayê.

SELİM SULÊMAN. (XVII)

Heta van salêd paşin edebyetnasêd kurd haj pê nîn bûn, ku li sedsalîya XVI-XVII helbestvanekî kurd bi navê Selîm Sulêman hebûye, bi kurmancî şêr, beyt û destan nivîsîne. Her li paşî çapkirina xebata M.B.Rûdênko "Nivîsandina ser û berê navnîşanê destnivîsarêd kurdî" aşkera bû, ku li kitêbxana Lënîngradêda ya bi navê Saltîkov-Şêdrînda bi melu metîyêd A.Jaba li nav nivîsarêd kurdîda, yêd ewî anîbûne. Pêtêrbûrgê, destnivîsarek bi sernavê "Ûsib û Zelîxe" heye ew destnivîsar ya Selîm Sulêmane. A.Jaba nivîsîye, ku Selîm Sulêman hevdemê Şeref-xan Bitlîsî bûye (XVI-XVII), şayir û dengbêjê mîr-Şeref mîrê Xizanê bûye.

Xên ji vê em tiştekî zêde derheqa wîda nizanin, ne e'yanê kîjan salê, li kîderê û ji kîjan neslê ew ji daykê bûye. Li axirîya dastana xweda ya "Ûsib û Zelîxe"da ewî her nivîsîye, ku ew hêsîrê mîrê Xizan bûye :

*Selîm dîl men Sulêmanim,
Êsîrê mîrê Xizanîm.*

Sala 1973 M.B.Rûdênko dîsêrtasîya xwe ya bi navê "Ûsib û Zelîxa" "Kûrdskaya lîteratûrnaya û folklornîyê vêrsîlî"(ya nê "Ûsib û Zelîxa kurdî ya edebyetî û şaxêd wê zargirtî-nê". Nivîsîne, ku A.Jaba berê nivîsîbû, ku Selîm Sulêman dastana xwe ji zimanê farsî ya "Ûsib û Zelîxa" Camî wer girtîye. M.B.Rûdênko raberî vê gotîne dinivîse û îsbat dike, ku Selîm Sulêman ne ji wê wergirtîye, ne jî ji serhatîya "Ûsib û Zelîxa" Ferdewusî. Ew dinivîse: "Em her dîkarin bêjin dastana Selîm Sulêman nivîşkanîye, li navbeyna nivîsara Camî, Ferdewusî û gelek şaxêd kurdî yêd zargo tinê hatîye tertîbkirinê, bi kovek û kêrta xweva ew jî dastanêd Camî û Ferdewusî cudatire, gelek qisekirina cîka rêd wê ji yêd wan herdu şayrêd farsî cudatirin, ne mîna wanin. "Ûsib û Zelîxa" Selîm Sulêman her li alîyê kompozî

sîyê û sûjêtêva mîna "Ûsib û Zelîxa" Camî û Ferdewusîye , têda çend êpîzod mîna yêd şaxê dastana Ferdewsîn mesele, qisekirina derheqa wêda, ku Ûsib li ser gora dayka xwe digirî, ku ew rastî hûtê binê behrê tê, ku birê wî tîrê ge nim bibin, mîna yêd şaxê Ferdewusîne. Wusan jî qisekirina êpîzodê: Bazik keçekê hez dike, Zelîxê xewnê dibîne, yêd ku li dastana Camîda tene gilkinê, li Ûsib Zelîxa Selîm Sulêmanda hene. Çend êpîzod jî di Ûsib û Zelîxa Selîm Sulêmanda hene, ku mîna êpîzodêd dastana tirkîne ya Elî Şeyad Xemzene. Berepêş gotî, li Ûsib û Zelîxa Selîm Sulêman da çend êpîzod hene, ku li şaxê Ûsib û Zelîxa Ferdewusî û Camî û Şeyad Hemzêda tunene. Mesele, di dastana Selîm Sulêmanda tê gotinê, ku Yaqub digirî, kurê wî wunda bûne, ku ew ji gura pîrs dike wana ew nedîtine, ku gur sond dixun goşt li welatê Yaqubda nexun.

Bi fikira min M.B.Rûdênko li berhevîya nivîsara xweda rast dinivîse, ku "Ev mesele nîşan dîkin, ku dastana Selîm Sulêman "Ûsib û Zelîxa" dastaneke kurdî serbixweye, ku ew li ser binyat û binaxa şaxêd here kevn çêbûye, li hev hatîye ku di wêda her çend êpîzodê şaxê farsî, tirkî û êpîzodêd kurdî zargotinê ketine nav wê. Eva gişk nîşan dike, ku edebiyeta kurdî li peydabûna xweda bi edebiyeta farsî, tirkî ra û folklorê kurdîra girêdaye". Li dû van gilîyan M.B. Rûdenko dinivîse, ku li nav destnivîsarêd kurdîda yê li kitêbxana Saltîkov-Şêdrindanin, wusan jî destnivîsareke din bi navê Ûsib û Zelîxe heye, bi gotina A.Jaba ew destnivîsar ya Xarîs Bitlisîye (8). Lê ew ne wusane M.B.Rûdenko îsbat dike, ku ew destnivîsar jî ya Selîm Sulêman hatî ye nivîsandinê, di wêda her cî-cîna hatine berdanê û li şûna xeberêd erebî, farsî yêd kurdî nivîsîne. Bi texmîna wê ew guhastin mîna wan guhastinanin, yêd destnivîsara Ûsib û Zelîxe, ku van salêd paşin ewê li Ermenîstanê li ma la Elî Ebdurexmanê nivîskar, xebatkarê gazêta Rîya Tezê dest xistîye.

Li paşî vê M.B.Rûdênko kurt naveroka şaxê destnivîsar ya Selîm Sulêman dinivîse. Li dû wê ew derheqa şaxêd zargotinê dinivîse. Ew e'lam dike, ku ew li nav kurdêd pişt Kavkazê û kurdêd Turkmenîyê wekê donzde şaxêd zargotinê kom kirine, wan jî mîna şaxê Selîm Sulêman bi tercîma rûsî hazir dike bona çapkîrinê.

AHMEDÊ XANÎ

Sala ji daykbûna Ahmedê Xanî ne aşkeraye. Her bi tenê aşkeraye çî wextî, kîjan salê ewî nivîsarên xwe dastana "Mem û Zîn" û "Nubar" nivîsîne. Bi gotina Aladîn Sicadîn Ahmedê Xanî "Sertacê nivîskar û şayirên kurdane" li tarîxa lî têratûra kurdanda dinivîsin, ku Ahmedê Xanî berî gişka ala xwerûya serxwebûna kurdan, ala yekîtî û hevkarîya eşîr û qebilên kurdan bilind kir bo xatirê azadkirina kurd û Kurdistanê, bo xatirê sazkirina dewleta kurdan.

Nav û dengê Ahmedê Xanî berî pêşin li Rûsistanêda belav bû. Aşkera bû, ku li nav salên 1860 û 1885-da qonsulê(bay lozê) rûsan li baylozxana rûsanda li Erzerumê dixebitî. Wî wextî akademîya Rûsistanê sparte wî, ku ew destnivîsarên zimanê kurdî yên tarîxî, êtnografî, lîtêratûrî û folklorî kom bike û bi rêbîke Pêtêrbûrgê. Bi arikarîya alîm û zanyarê kurd mele Bazîdî ewî gelek destnivîsarên dastan, çîrok, hikyat, beyt, şêr, kilam û stran û serhatîyên dîrokî şandine Pêtêrbûrgê. Di nav wan destnivîsaranda melûmetîyên kurt derheqa neh şayir û nivîskarên kurdan hebûn. Ew melûmetî di gel hikyat û serhatîyên tarîxî di kitêba A. Jaba bada ya bi navê Recueil de notices et recits kurde (sala 1860 li Pêtêrbûrgêda) hatine çapkirinê.

Piştî çapkirina vê kitêbê dunya pê hesîya, ku şayir, tarîx nivîs, alîm û zanyarên kurdan jî hebûne. Bi destî A. Jaba hate zanîn, ku miletê kurd jî xwedî edebiyete.

Aleksandir Jaba çend destnivîsrên "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî jî anî bûn bajarê Pêtêrbûrgê. Di kovara "Mêlanjê Asî-atîk" cildê 3-da naveroka "Mem û Zîn" a A. Xanî bi zimanê fransîzî hatîye çapkirinê. Li paşî vî îşî ulmdar û zanyarên kurd bi "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî mijûl bûn. Heta niha wan "Mem û Zîn" bi herfên erebî sê caran çap kirine. Cara pêşin li sala 1920-da "Mem û Zîn" li Stembolê çapkirin. Lê hukmeta tirkî kitêba wê çapkirinê şewitandin. Berî vê çapkirinê li sala 1898-da parçe-parçe "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî li kovara "Kurdistan"êda hatine çapkirinê.

Li paşê 1947-da li bajarê Helebê Hemze-axa "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî bi pêşgotina xwe çap kir. Dû wê sala 1953 li bajarê Hewlêrê edebiyetnas û tarîxnasê kurd Gîvî Mukrîyanî "Mem û Zîn" bi pêşgotina xwe bi zarê soranî çapkir.

Ya rast jimara van hemîyan ne gelek bûn û niha jî ew bi dest nakevin. Yekê ji ew çapkirin bi tenê ji nimûnekê an jî ji du nimûnan hatibûn çapkirinê û heta van salên paşin "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî bi zimanê Evropayî ne hatiye tercimekirinê.

Li nav salên 1932-1945 car-cara li kovara "Hewar"êda "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî bi herfên latînî dihatine çapkirinê. Li sala 1933 li Êrêvanê konferênsiya kurdnasan biryar kirin, ku nimûnê edebyeta kurdî ya klasikî çap bikin. Di wî biryarîda hatibû nivîsandinê, ku "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî bi herfên latînî bona kurdên Sovêtîstanê çap bikin. Lê ew qirar, ew merem heta van salên paşin ne hatibû qedandinê. Niha kurdnasîya Sovêtîstanê bi serbilindî û serferazî dikare bêje, ku ew dastana giranbiha û cewahir bi zimanê kurdî û terciya wê bi zimanê rûsî li rex û çap bûne. Bi çapkirina wê dastana Ahmedê Xanî heykela mezin ya medeniyeta milletê kurd tê ber çavên xwendkar û xwendevanên kurdan û goveka milletên dinyayê û aşkera dibe, ku kurd ji xwedî medeniyete, ew jî mîna milletên din hevkarê efirandina kûl tûra dinyayêye. Zûva qedir û qîmetê "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî li kitêb, pertok û kovaranda hatiye gotinê û nivîsandinê. Ulmdar û zanyarên kurd Ziya Xalîdî, Emin Zekî, Şêrkö, Celadet Bedirxan û Kamûran Bedirxan, Aladîn Sicadîn, Huznî û Gîvî Mukriyanî û yên din gelek gotinên bi qîmet û ferz derheqa Ahmedê Xanî û "Mem û Zîn" a wîda nivîsîne. Wusan jî rohilatnasên Evropayê A. Jaba, P. Lêrx, I. Orbêlî, A. Soun, V. Minorskiy, R. Lêsko û T. Bua li kitêb û miqalên xweda kêr û zêde pesne Ahmedê Xanî û "Mem û Zîn" a wî dane û nivîsandinê.

Lê dîsa lazime em bêjin ku ji gotin nivîsandina wan şikil û wineyê A. Xaniyê "Mem û Zîn" a wî baş nayên ber çavên çî ewî li "Mem û Zîn" a xweda nivîsîye. Yekê ji heta niha "Mem û Zîn" a wî qet tu caran nehatiye tercimekirinê ser zimanê Evropayê. Bona wê yekê min hazirkirina wê û terci-makirina wê sparte şagirt û hevkarê xwe jîna rûs M. B. Rûdênko. Ew gelekî ser hazirkirina û terci-makirina wê bona çapkirinê xebitîye. Berê ewil ewê hemû têkstên destnivîsar yên li kitêbxana Lêningradê ya bi navê Saltikov - Şêdrin û li înstîtûta rohilatnasîyêda hebûn, hemberî hev kirine û têkstên binyatî yê baş cuda kirine. Hemû xebat û

şaşîşê têda serrast kirine, paşê ewê ew têkst hemberî têkstê çapkirina Helebê û Hewlêrê kirine û bi wî teherî gihandîye têkste eslî. Li rex têksta bi zimanê kurdî M.B. Rûdenko tercima wê bi zimanê rûsî nivîsîye. Nivîsara M.B. Rûdenko di sala 1962-da li Moskvayê ji çapxanê derketîye.

Di pêşgotina vê kitêbêda ev pirsên jêrin hatine nivîsandinê:

"Ne e'yane kîjan sale A.Xanî ji dayka xwe bûye, lê eşkera ye, ku di qurna XVII-da ewî poêma xwe "Mem û Zîn" û ferhengeka xwe ya erebî-kurdî nivîsîne. Aladîn Sicadîn di ki têba xweda "Dîroka edebyeta kurdîda" nivîsîye, ku navê bâ vê wî Eylase, ew ji qebîla xaniyaye. Qebîla xaniya sala 1562 li erdê Bazîdê cîwar bûbû. Berî wî çaxî di sala 1514 da Kurdistan hatibû du parkirinê, parek ketibû bin destê siltanê Romê (Tirkîyê), para din ketibû bin destê şahê Îranê. Di nav herdu paranda mirtîyên serbixwe, yên derebeg û milkdarên kurdan hebû, lê mîr, xan, derebeg û milkdarên kurdan bêtifaq bûn, bi hevra şer dikirin, arîkarî hev ne dikirin, ku qewatên xwe bikin yek, qebilên kurdan kom bikin, yekbin, pêşberî dijmin tev şer bikin bona xatirê ser xwebûna kurd û Kurdistanê.

Ahmedê Xanî ew halê bindestî û hejariya milletê kurd baş zanibû û li erdê Bazîdê ewî bi çavên xwe belengaziya kurdan dîtibû û bûbû xemxur û xemkeşê derdê milletê xwe. A.Xanî di "Mem û Zîna" xweda pîrsa bindestîya kurdan, duberekîya wan, şerê wan di nav xweda û derd û kulên wan nivîsî û anî ber çavan, ku millet xwe bihese, qewata xwe bike yek bona azadkirina xwe. A.Xanî merivekî xwenderwer, bîrewer û zana bû. Ewî zimanê erebî, farsî û tirkî baş zanî bûn.

Kurdnasê navbang I.A.Orbêlî di pêşgotina xweda, ya ku li kitêba bi navê "Heykelên Zemanê Şayirê (gurca) Rûstalêlî" da hatiye çapkirinê, derheqa A.Xanîda ev xeberên jêrin nivîsîne: "Wextê em dibêjin şayîr nivîsara xweda nezîkî milete, bi millet û xelqra girêdayîye, hingê em bê hemdî xwe lazîme navê sê şayîrên mezin yê rohilatê wek hev bikin û beranber bikin, ew hersê şayîr evin: -yek Firdewusê Îranîye, yek Rustavêliyê gurce, yek jî A.Xanîye kurde. Hemû mileta A.Xanî ji bîr kirine. Bi rastî gotî kesekî ji milletê derva A.Xanî nas nake, lê her bi tenê kurdan ew ji bîr nekirine û li nav Kurdistanêda nav û bangê wî aşke

raye û hemû kurd bê gotin A.Xanî hesab dikin şayirê miletê xwe, navê wî dizanin û nas dikin".

Ev gotinên Orbêli rastin. Kurdan navê Ahmedê Xanî ji bîr nekirîye û qet tu caran ew navê wî ji bîr nakin. Binyata poêma A.Xanî "Mem û Zîn" çîroka milletê kurde. Em dikarin bê şik bêjin, ku hemû kurd, biçûk û mezin çîroka "Mem û Zîn", yanê ya "Memê Alan" dizanin û hez dikin. Wexta çîrokê jî û dengbêj "Mem û Zîn" dibêjin, distirên, her kurd bi dil û can û bi heyecan guhdariya wan dikin. Kurd vê çîrokê hez dikin û bi navê wê serferaz û serbilindin û ku-bar dibin, ku dastaneke wan wusa heye.

Ferdewîsî jî "Şah-nama" xwe ji çîrok û dastanên milletê îranî hildabû û bi şêrî nivîsîbû. Nizamî jî "Leyl û Mecnûn" a xwe "Ferhad û Şîrin" a xwe ji nav xelqê hîn bûbû û bi şêrî nivîsîbû. Van herdu şayiran pesnê şaha dabûn, fêrizî û qehremaniya mêra û evîniya mêr û jinan anî bûn ber çavan û pesnê dostiya helal dabûn û bedkarîya merivên xirab di nivîsarên xweda neqîşandibûn.

Di vê dercêda A.Xanî jî wusan reng û ruyên ferizê dastana xwe, şiklê qeremanên wê nitirandibûn û anî bûn ber çavan. Lê bi fikira min qedir û qîmeta "Mem û Zîn" a A.Xanî ji nivîsarên Ferdewîsî, Nizamî û Rûstavêlî bilindtirê, çimkî têda A.Xanî bîr û bawara kurdewariyê, bîr û bawara paşketin, peşvamayîna xelqê kurd nivîsîne û aşkera bername şerê serxwebûn û serbestiya milletê kurd Neqîşandîye. Se beşê yekê hemû kurdnas bi dengê dibêjin û dinivîsin: "Lazime navê A.Xanî li tenişt û rex navê Ferdewîsî, Nizamî û Rûstavêlî bê gotin û nivîsandinê.

Bi fikira min navê A.Xanî, qedir û qîmetê nivîsara wî li ser nav û nivîsara Ferdewîsî, Nizamî û Rûstavêlî dikeve, çimkî ewî di poêma xweda ne ku bi tenê qeremanî, dostî, biratî û evîniya rast û rasteqîn anîye ber çavan; ewî wusan jî pîrsa bindestî, belengazî û hêşîriya milletê xwe anîye ber çavan û rê û dirb nişan kirîne, bi çi teherî ji wî halî derkevin û azad bin. Poêma A.Xanî "Mem û Zîn" edebiyeta serbixweye, bi fikira xweva, bi tertîb û sazmayîna xweva ew ji "Mem û Zîna" bi zar gotin baştirê û hêjatirê. Di wê da A.Xanî şiklê jîyîna kurdan yek bi yek anîye ber çavan. Ewî bi rastî û rasteqîn hal û ehwalê milletê xwe yê belengaz, hejar û bindest û qeydkirî anîye ber çavên me. Wî di

poêma xweda bîr û bawara xwe, fikir û idêya xwe seysetî û sinifî (çinayetî) bi zelal nivîsîne. Pirsên binyatî yên ku A.Xanî di poêma xweda gotine û neqîşandine, ew pirs şî rovedikin, ku paşketin û paşdamayina medeniyeta kurdan jî tunebûna dewleta kurdane, jî parkirin û dabeşkirina erd û welatê wane, jî tunebûna dewleta wane, jî bêtifaqî û dube rekîya qebil û êşîrên kurdane. Derheq vê yekeda A.Xanî awa nivîsiye :

*Ger hebûya me îtfaqek,
Vêkra bikira me inqiyadek,
Rom û ereb û ecem temamî,
Hemîyan ji mera dikir xulamî,
Tekmîl dikir me dîn û dewlet,
Tehsîl dikir me hukmet,
Temir dibûn ji hev mîqalet,
Mumtaz dibûn xudan kemalet.*

Eva parça ji "Mem û Zîn" a A.Xanî xuyan dike, ku A. Xanî baş zanibû, ku neteweyê kurd gelekî lehemge, gelekî bi hêz û qewate, jî bo serketina wî yekîtiyê û pevgerîdanê û yekîtiyê eşîr û qebilên kurdan pêvîste...

Şerê kurdên Iraqê û şerê qeremanê kurdên Îranê pêşberî diktatorîya wan welatan nîşan dîkin, ku kurd bi hêzin, ger yekîtiya wan hebe, ger eşîr û qebilên wan pêşberî hev şer nekin, ewê serkevin, mafê xwe bistînin.

Kurd niha li Iraqê û Îranê şer dîkin, ne jî bona wê yeke, ku ereb û ecem jî wanra xulamîyê bikin, bona wê yeke, ku gelê kurd di gel (tevî) cîranên xwe ereb, ecem û tirk bi wekhevî bijî, partîyên kurdan niha şer dîkin, serwerîyê li pîrsa neteweyê xwe dîkin bona wê yekê, ku kurd û ereb, kurd û fars, kurd û tirk bi dostî, hevkarî, wekhevî û aşîtiyê di nav hevda bijîn, berbi rîya dîmoqratiya rastî û rasteqîn herin.

Li kutasiyê divêt ez kurt çend xeberan derheqa naveroka "Mem û Zîn" a A.Xanî bêjim. Bi temamî "Mem û Zîn" a wî ansîklopêdiya jîyîna milletê kurde. Ew dastana kurdewerîye, têda ayin, jîyîn, hal û negbetiya milletê kurd li navbeyna qurnen 16-17-da tîn ber çavên xwendeweran. Dastana "Mem û Zîn" ser çar binyat û binaxan hatiye nivîsandinê. Ew bin-

yat û binax evîn:

- 1- Evîniya camerî û bi camerî û maqulî hev hezkirina jin û mêran.
- 2- Bi qeremanî û fêrizî xwe terxan kirin bo xatirê destebirakîyê.
- 3- Nifir û nelet li wan merivên xêrnexwez, boxtanker kirin, yên bûne sebebê mirina mirazzwezan (aşoq û maşoqan).
- 4- Wetenperwerî û neteweperwerîya kûr û firewan.

Di dastana "Mem û Zîn" da kurdewerî bi teherekî kûr û fire hatiye nivîsandin û nitirandin, têda xwerû, xeyset û siruşt merivan, ayîn, edet û tarîxa medenyeta miletê kurd bi zarê şîrin, kurdîya xas, bi şarezayî rind û qeşeng hatine nitirandinê. Di wêda gelek şîret, nesîhet û pendên pêşinan bi aqilmendî bi kar anîye û daye xebitandinê; gelek gotubêjên şîrin yên dîyanetê û ferasetê di dastanêda hatine nivîsandinê. Ev gişk ziman, kakilê dastanê dixemilînin. Her kesê vê dastanê bixûne wê pê bihesse û bizanbe mezinîya Ahmedê Xanî, wê bizanbe qedir û qimetê Ahmedê Xanî di tarîxa edebyeta miletê kurda. Gelek sedsalî wê bîn û herin, gelek merivên xwendewer, bîrewer û camêr li vê dunyayê bîn û herin û bênav bin, bê ser berate bin. Lê Ahmedê Xanî, kirina wî qet tu caran nayên ji bîr kirin, çimkî bîr û bawara wî bûye fikir û bawariya gelek şayir û bi wêjên kurd yên xwe li ser rê û bîr û bawariya A.Xanî girtine, ji destpêka Qadir Qoy nemirî heta şayirên qurna bîst tan yên navdar wetenperwerî û neteweperwerîya Ahmedê Xanî têne gotinê. Gelek şayirên miletê me yên mezin û hêja ser bîr û bawariya A.Xanî diçûn, mesele, Qadir Qoy, Pîremêrd, Goran, Bêkes, Wursî, Qane, Cegerxûn, Osman Sebrî, Qadrîcan Hejar û geleke din. Heta navê van şayîran bimîne li nav miletê kurda, navê A.Xanî bimîne li dunyayê, çimkî ew bîr bawariya xweva, bi kurdewerîya xweva bi hevra girdayîne, çimkî wextê em gotubêjan derheqa Qadir Qoyda gillî dikin, em mecbûrin A.Xanî bînin bîra xwe, wusa jî çaxê em derheqa şayirên me din (Goran, Hejar, Cegerxûn û Osman Sebrî û geleke din) gillî dikin, xeber didin, yan jî dinivîsin, em esseyî navê A.Xanî tînin bîra xwe û bi navê wî serbilind û kubar û fexir dibin.

Neteweyê kurd niha bi navê gelek şayirên xwe navdar serbilind û ferxdare, ew şayir niha diruşma Ahmedê Xanî ya wetenperwerîyê ya neteweperwerîyê û kurdewerîyê berz û bilind kirine, bi serkariya partiyên xwe pêşketî, bi arîkarîya dêmokratên welatên Rojhelata naverast û pêşin û partiyên Kurdistanê bikin yek, azad û serbest bin û bi jîyîna bextewerî, aşîtî, dostî û hevkarî tev neteweyên ciranê xwe bijîn, bixebitin û ber bi rîya pêşkevî, dêmokratîya rast û sosyalizmê herin.

Ahmedê Xanî qedir û qîmetê zimanê kurdî baş zanibû. Ewî zanibû, ku bona pêşveçûn û pêşketina milletê kurd, bona qayim kirina yekîtiya qebîl û eşîrên kurdan, bona azadbûn û serxwebûna kurdan lazime her kurd biçûk û mezin zimanê dayîka xwe gelekî baş bizanin, pê çîrok, hikyat, beyt, şêr, tarîxa xwe binivîsin, ji ber vê yekê ewî bona zarokên kurdan medrese bi kîsî xwe vekir û bi xwe medresêda dersê zîmanê zikmakî dida zaruwên kurdan. Ewî ferhengoka xwe erebî-kurdî nivîsî bû bona ku zarû û mindalên kurdan bi zimanê xwe bixûnin û baş hînî zimanê erebî bibin, şareza bin û pêşkevin. Ewî nivîsiye :

*Ji paş hemd û selwetan,
Ew çend kilme ji luxetan,
Vêk êxistine Ahmedê Xanî,
Navê lê nûbara biçûkan danî,
Ne ji bo sahib rewecan,
Belki ji bo biçukêd kurmancan,
Ku ew ji quranê xilas bin,
Lazime sewad û çav nas bin.*

Ahmedê Xanî poêma xwe "Mem û Zîn" nivîsiye, ku xelk nebêjin bi zimanê kurdî nivîsar tune, nebêjin bi zimanê kurdî nanivîsin, kitêb û edebyeta kurdî tune, nebêjin, ku emûdînya xwedî kitêbin, xwedî edebin, direj ne kin û dor nekin nebêjin milletê kurd bê sewwad û bêarmance. Ewî ev rêzên jêrin derheq vê yekêda awa nivîsiye :

*Xanî ji kemala bê kemalî,
Meydana kemalê dît xalî,
Yenî ne ji qabil û xebirî,
Belkî bi tee'sub û eşirî,*

Hasil ji enad eger ji bîdad,
 Ev be'dete kir xelaf medad,
 Safî şînirand vexwer durdî,
 Manendî derî lisanê kurdî,
 Enaye nîzam entezamî,
 Kêşaye cefa ji bo a'mî,
 Da xelk nebêjin ku ekrad,
 Bê me'rîfetin bê esil û binad,
 Evna melil xudan kitêbin,
 Kurmanc tenê di bê nesîbin,
 Hem ehlê nezer nebên ku kurmanc
 Eşq nekirin ji bo xwe armanc.
 Têkda ne di talibin ne metlûb,
 Vêkra ne' muxibin û ne mehbub.
 Bê bêhreşe ew ji eşqbazî,
 Farix ji heqîqê û micasî.
 Kurmanc ne pîr di bê kemalin,
 Emma di êtim û bê mecalin,
 Fî-l cimle ne cahil û ne zanin,
 Belkî di sefil û bê xudanin.

Ji berî Ahmedê Xanî gelek şayîr û bivêjên kurdan hebûn, me
 sele Elî Herîrî, Mele Batê, Feqê Teyran, Xalis Bitlîsî, Me
 le Cizîrî û yên din. Lê kurd û Kurdistan hatibûn duparkî-
 rinê û ketî bûn bin destê dewleta romê û eceman, navê wan
 şayiran ji bîr kiribûn, qedir û qîmetê wan kesekî baştir
 nizan bû. Piştirî van camêr û delîran her Ahmedê Xanî te-
 nê ala serferazî û serxwebûn û serbixwe bilind û berz kir.
 kesek tune bûn bêjin em jî xwedî medenyetin, em jî milete
 kî serbixwene û dixwezîn bi zimanê xwe binivîsin, hîn bin
 û hîn bikin. Derheqa vê yekêda ewî awa nivîsîye :

Ger dê hebûya me jî xudanek,
 A'î keremek letife danek
 E'lm û huner û kemal û ezan,
 Şêr û xezal û kitêb û dîwan,
 Ev cîns biba li ba wî me'mul,
 Ev neqêd biba li nik wî meqbul,

*Min dê elma kilam mewzun
 Alf bikira li han gerdun
 Binave rehma mele Cizîrî,
 Pê hê bikira E'li Herîrî,
 Kêfek ve bida Feqê Teyran,
 Hetanê ebed bimay heyran.*

Pîrsên binaxê û binyatî yên A.Xanî di "Mem û Zîn" a xweda gotine û neqîşandine, ew pîrsin ku ew dibêje belengazî û hêsrîya kurdan ji parkirin û zevtkirina axa wane, ji tune bûna dewleta wane, ji bêtifaqî û bêyekîtîya kurdan û qebil û eşîrên wane. Derheq vê yekêda ewî ev rêzên jêrin nîvîsîne :

*Ger dê hebûya me itfaqek,
 Vêkra bikira me inqiyadek,
 Tekmîl dikir me dîn û dewlet,
 Tehsîl dikir me elm û hukmet,
 Te'mir dibûn ji hev mîqalet,
 Mumtaz dibûn xudan kemalet.*

Ahmedê Xanî zanibû, ku kurd azad bin lazime dewleta kurdî yekîtî hebe, zimanê wan edebiyatî hebe û hemû kurd xwendkar û xwendewer bin. Ewî ev gîlî, ev bîr û bawar di poêma xweda bi safî neqîşandine. Ji vê der ewî di poêma xweda evînîya bêhed, bê ser û binî, dostî û biratîya qeremane bi poêmê ya Qeretajdîn, Çekan, Erfan, Sitî, Memê û Zînê bi rengên gulgeş nivîsîne û xemilandine; navê Memê û Zînê, navê Qeretajdîn, yê Çekan, yê Erfan û Sitîyê di nav miletê kurda bûne nimûn û nişanên evnîya merivan ya îdîalî (rastî û rasteqîn), bûne nimûn û nişanên biratîya şîr helal û dostîya qereman û fêrizên sadiq yên ku di e'mir û jiyîna cimatîyêda hene, rastî hev tîn bê hed hev hez dîkin û ruhê xwe, mala xwe bona hev qurban dîkin. Her mêrê kurd, her jina kurd, her qîz û xortên kurd van qeremane bi poêmê "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî yan yên dastana "Mem û Zîn" a zargotin di dostî û hezkirina xweda, di îş û karê xweda ji xwera dîkin nimûn û mesele û hesab dîkin; jina kurd, qîza kurd dixwezin mîna Zînê û Sitîyê bin, her mêrê kurd, her xortê kurd dixwezin mîna Qeretajdîn, Çekan, Erfan û Memê Camêr û delîr bin û bi biratî û dostîya helal û sadiqda bin. Biha û nîrxê "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî û "Mem û Zîn" a zargotin di vî alîda yekin, mîna hevin, eve

yekîtiya herduwan. Lê "Mem û Zîn" a A.Xanî nivîsara şayîrî ye, ya bi vêja tendirustîye, bi xemla nivîsandina xweva ji ya zargotinê baştir û hêjatiye, bi raman û bîr û bawerî xweva nivîsara nemirîye, wê heta hetayê bijî, namirê wê bijî, navê wî dê bimîne heta hetayê, Kurd qet caran navê wî ji bîr nakin. Gelek bivêjên kurdan yên sedsalîya XIX (Qadir Qoy, Kurdî, Zîver û yên din) di rêç û şopa Ahmedê Xanîda diçûn. Niha jî di sedsalîya meda şayîrên kurdan yên bi nav û deng (Bêkes, Pîremêrd, Guran, Cegerxûn, Osman Sebrî, Celedê Bedirxan, Qadrican û yên din) mîna Ahmedê Xanî ala wetenperwerî, ala şerê serxwebûna kurd û Kurdistanê berz û bilind kirine bo xatirê azadbûna milletên Rojhilata Nêzik ji bin destê împêrîalistan, stemkaran û diktatora faşistî, bona xatirê wê yekê, her millet bi serbiyê bijî, bi hevra bi aşîtî, dostî, wekhevî, biratî bijîn bi hevkarî ber bi rîya sosîlalîzmê herin, bextewerî bijîn.

Parçên jêrin bona xwendinê ji "Mem û Zîn" a A.Xanî hatine jêder kirininê :

*Ez pilewerim, ne gewherîme,
Xudresteme, ez ne perwerîme,
Kurmancim û kuhi û kenarî,
Van çend xebatêd kurdewerî,
Emza biken ew bi hesen etlaf,
Eswa biken ew bi îsmê ensaf. (355)*

*Ev name helal û ne herame,
Bê perdeye, lê ne bê miqame,
Kurdi, erebî, derî û tazî,
Terkîb kirin bê hezil û bezî,
Hindik ji efsaneyêd Bohtan,
Hindik di bihane hin di bi ten,
Bohtî, Mehmûdî û Silivî,
Hin lel û hinek ji zêr û zivî,
Xirmehre û morik û mirarî,
Hindik d şîtaf û tarî,
Tersih kirin weku biçûkan,
Înane bi gesir û sûkan,
Hin qise û hin ji wan misalin,
Hindik d helal û hin heramin (186)*

Da bêne sere hikayata pêş,
 Xelqê ku ji derd eşqê dil rêş
 Herçend ku bê hedd qiyas bûn,
 A'mê xudan û hewas bûn,
 Lakin ji xwadamêd mumtaz,
 Sed law sehe qedd û serefraz,
 Heryek d miqam husin rojek,
 Heryek bi kelam sine sozek,
 Her yek bi kemal bi der mahek,
 Her yek bi cemal sedir şahek,
 Ev jê hemî aşiqin d talib,
 Ev jî hemî talibin d raxib,
 Bel-cumle di xidmeta emîr bûn,
 Fil-cumle ji sirrê hev xebîr bûn,
 Serhelgeye wan perî misalîn
 Sertacê ewan melek xusalîn.
 Tajdîn digotîne ciwanek,
 Guderz zîman pehlewaneke,
 Nesil û nesib û husb e'yan bû,
 Serdefter û serwerê kurdan bû,
 Babê wî digotîne Skender,
 Lakin ereban digot Xezênfer,
 Lewra bi şêr şîbê şêr bû,
 Roja şerrê ew hezar mêr bû,
 Tajdîn du bira hebûn d qellaş,
 Manendî du şahbaz cemmaz,
 Daym dil dijminan disotin
 Yek A'rîf û yek Çeko digotin,
 Emma wî ji cimle xas a'man,
 Ji ew çend bira û maman,
 Lawik kiribû bira ji bo xwe,
 Ney ez xultem cira ji bo xwe,
 Roja ku ewî bira nedîta,
 Teşbih şeva çira nedîta,
 Dinya li wî têk dibû tarî,
 Roj bû ku li wî fikir gewarî,
 Mem jî li wî aşîqek temam bû,
 Ne şîbhê bira û bab mam bû,
 Enbaz ferîh şîrik xem bû,
 Ser geştêye xem bi navê Mem bû,
 Herçend birayê axret bû,

Te digo d dinê û axret bû,
 Tajdin weledê debîr diwan,
 Mem ji xelte debîr diwan,
 Ew herdu ciwan li yek du aşiq,
 Ew her du bira û pêkva sadîq,
 Yek qyasê zemanê, û yek Leyla,
 Yek Wamiqe Eser û yek Ezra,
 Ew yar ji dil ne ser serî bûn,
 Bêh şibhetê mehir û muşterî bûn,
 Yar û birayî muwaxat,
 Nabit birayê meqalet,
 Yari ne hêsaye, cefaye,
 Meqsûd ji yari wefaye
 Axir te eger nekir wefayîş,
 Ji eveel mede ber xwe cafayê. (49-51)

Xelqê ku diditin ew kemer gah
 Hazir dîkirin ji xur dil gah,
 Zahir dîkirin ku zend û bazin,
 Êdî ne dima gilî û gazin
 Herçend ku herdu şibhê can bûn,
 Ew herdu bi husin tewamên bûn,
 Herçend Sîfî ve naznîn bû,
 Lê Zîn ji misal hor e'yn bû,
 Herçend stareweş bû,
 Lê Zîn berxan hîva geş bû,
 Ew herdu wekî şeb çiraxan,
 Gava dimeşîne bax û raxan,
 Nalan dîkirin cemad û heywan,
 Talan dîkirin nebat û insan,
 Kûvî ji ciwaharan mukellel
 Kotir ke ji netirka miselsel,
 Serbend qeseb didan cebinî,
 Aşiq dimirin ji derdê evinê,
 Ev zeynet û xemil û gest û xenbel
 Ew pêş û pis û yemin û qenbel,
 Gava dimeşin perî digel wan,
 Welê dîkirin welê di xelwan,
 Ger şêx û ger mela û miran,
 Derwêş û xênî û ger feqîran,
 Kes nine ne talibe cemalî,

*Kes nîne ne raxebe wesalî,
Hin raxeb û husin layzalin,
Hin talib qalib bi talibin,
Lakin hemîyan yek eqin dost,
Ferqa ku heye ji ferq ta post. (47-48)*

Van salên paşin li Iraqê hine xebatên baş hatine çapkirinê li ser lîteratûra kurdan. Mesele, dîwana Nalî, dîwana Bêkes, dîwana Mele Cizîrî, dîwana Pertew-beg Hekarî û "Nubar" a A.Xanî. Herdu dîwanên pêşin bi zaravê soranî çap bûne, zanyarê kurd mele Mehemed Kerîm ew çap kirine, lê herduwan paşin bi destî ulmdarê kurd Sadiq Behadîn Amedî hatine çapkirinê. Çapkirina dîwanê şayîrên kurdan yên klasiî gelekî ferze bona lêgerîna tarîxa pêşdaçûna lîteratûra kurdî. Dîwanên Mele Cizîrî û Pertew-beg Hekarî bi zaravê kurmancîne, li ciyê xweda min di vê xebatêda nivîsiye û nimûnên şêrên wan anîne ber çavên xwendkaran. Li vira ez dixwezim derheqa "Nubarêda" hine gilî bêjim.

Navê "Nubara" Ahmedê Xanî zûva li dîroka lîteratûra kurdî da aşkeraye. Gelek ulmdara: Ziya-Eddîn Xalidî, Aladîn Sicadî, Celadet Bedirxan, Gîvî Mukrîyanî û yên din derheqa wêda nivîsiye. Heta niha çar nivîsarên A.Xanî e'yanin. Navê wan evin: "Mem û Zîn", "Nubar", "Eqîda Îmamê" û "Şêrên filosofi. Ji wan her "Eqîda Îmamê" çap nebûye. Bi gotina zanyarê kurd Mehemed Emîn Boz Erslan "Eqîda Îmamê" niha li kitêbxana Stembolêdaye, sed car heyf heta niha nehatîye çapkirinê. Di sala 1979-da li Bexdadê Sadiq Behadîn Amedî "Nubara" A.Xanî çap kir di herfên erebî. Ewî navê wê danîye "Nohbehara Seydayê mezin Ehmedê Xanî". Ewî pênc şaxên destnivîsarî yên "Nubarê" hemberî hev kirine. Ew şax evin: Nubara Ebdulsalam, ya dest nivîsara çapnekirî, ya Ûsîfê kurê Ebdûle, ya Lekok (ya sala 1943 li Berlînê çapkirî). Sadiq Behadîn nûbara Ebdulsalam kiriye şaxê bîngeyê beramberkirina şaxan. Li kitêba xweda ewî nivîsiye, ku fotokopî ji du şaxên çapkirî hildane, her şaxek fotokopî belgek zêde nîne. Li pey wan ewî bîr û bawara xwe li ser nivîsarên A.Xanî wek zanîna xwe nivîsiye, pesnê "Mem û Zîn" a wî daye, li paşê ewî nivîsiye "Çavan û kengê dest bi tiwajindina "Nubara" Ahmedê Xanî" kiriye. Di virada ew gilî dike kîjan şax wî ji kîderê destxistîye û paşê xebat bi tomerî nivîsiye. Ew dinivîse: "Nûbar ne tenê ferheng-

ke ziman zanînêye, lê ew wusa jî nivîştuke perwerdekirinê (terbiyekirinê) ye. Bona îsbatkirina vê gotinê ewî her te nê ev rêzêd jêrin jî pêşgotina "Nûbarê" anîne ber çavan :

*"Ji paş hemd û selwetan,
Ev çend kelme ji luxetan,
Vêk êxistin Ahmedê Xanî,
Navê nûbar ji bo biçûkan danî,
Ne ji bo sahib rewecan,
Belkî ji bo biçûkêd kurmancan.*

*Wekî ji quranê xilaz bin,
Li van tebiyet melekân,
Derê zehne vebitin,
Her çi bixûnêt, zehmet nebitin,
Bed a'me bîr binin,
Fathe ji mera bixûnin (13)*

Ji hemû rêzên jorê çapkirî tê ber çavan, ku merem mebesta A.Xanî ew bûye, ku biçûkên kurmancan hînî xwendinê bike, ku ew bi zimanê dayka xwe bixûnin; di wan rêzanda wusan jî hatîye gotinê bi çi teherî, kengê û sebeb çi xwendinê hîn bin. Ku ew xwendewer bin, serferaz û serbest bin, lazîme ew "Bed a'mê ji bîr bikin, wextê betalîn fathe bixûnin", "Wekî ji quranê xilaz bin", lazîme "Li sewad çav nas bin".

Di ferhengêda li nav tercimên xeberên erebî bi kurdî, yê bi beytê kêş û qafiyê nivîsandî, Ahmedê Xanî li cî-cîna fikir û ramana xwe li ser hînbûnê, hînkirin û xwendinê ev rêzên jêrin nivîsîne :

*Heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesruf,
Di dîngayê tu nabî meşhur û ne jî me'ruf (31)*

*Perde ku rabbitin ji ber erzê dilistanê xoş,
Dil ji xeman bête der, bilbil gulistanê xoş. (34)*

*E'rfê ku bi qencî me'ruf bit, -
Dê helim û sebir û me'wqûf bit (39)*

*Ger dê te meqaudek hebî, lazîm divê lêkî bi lez,
Xasma te me'budek hebî, daym di emrê wî bibez (43).*

Her çî u'lme bi cahil kir mubdel,
Sifrê xwe wî kir bi zer mukelîl (47).

Yê ku te kir daym kiriye jî bo xwe murekeb,
Evel tu bo bikeye, paşê bikere merkeb (49).

Şêx û sofî keramet û hem xwendin û emel,
Xelwete hucret terîqa te şerîet be xelet (53)

Ger tu divêtin tu bibî mîr û ser mue'tber,
Kezeb û xulafî mebe'j, ger te bikin ker bi ker (60)

Her çî jî dinya berdaste da min bû,
Bê subhet diniv a'me efraşte gerden bû (67).

Ger tu divêtin ku beraber nebitin kes bi tera,
Ulm bixun hem emele tu bike sinet jî xwera (70)

Her çî kese elmekî qenc xwendiye,
Dewlete ger wî bi esil zaniye (74)

Di fesla nûbaharêda di gel dilber biçin geştê,
Ji ew xweştir nabit li min ew hal gewî xoş tê. (79)

Muelim bila dil wekî ber bitin,
Divêtin ku şagirt dilber bitin (84).

Di van rêzên jorê nivîsandîda pîrsên şîret û nesihetîya hînbûn û hînkirina hatine gotinê, di wanda gillîyê talim û terbiyetkirina biçûkên kurmancan nivîsîne, di wanda wusa jî gillîyê rewş û reftara wan di dersxanêda, di dersxanê der hatine gotinê. Bi gilîkî "Nubara Ahmedê Xanî nek ferhenga hînbûn û hînkirina zimanê erebîye", ew wusan jî şî retnama metoda xwendin hatiye gotinê. "Heta tu dewr û der san nekî tekrar û meruf, di dinêda tu nabî meşhûr, ne jî meruf", "Ger te divêtin ku beraber nebitin kes bi tera, ulm bixun, her emele tu bike sinet jî xwera". Ev rêz tev rêzên din nîşan dîkin, ku li tarîxa dersdayîna zimanê daykê û hînkirina biçûkên kurmancan" bere pêşîn Ahmedê Xanî destpêkirîye, ku li "Nûbara" xweda ewî qeydê, qanûn û prînsîpên hînbûn û hînkirina zimanê daykê û yê beyanî nivîsîne û binyat û binaxa metoda dersdayîna pêşkevtî û dîmoqratî li nivîsara xweda danîye, pêk anîye û bi xwe jî qedandîye (Li Bazîdêda ders daye, eve yeka e'yane). Celadêtê rehmet di nivîsara xweda "Kilasîkên me" (hewar, hejm:9) dibêje :

"Di pey mirina wîra şagirtê wî Smaîl bîst salên di wê dabanistanêda guhdar bû û dersê kurmançîyê têda gotin". Ew dîsan dibêje: "Li gora tiştê min bihîstîye, Xanî kitêbeke cografîyê jî çêkirîye û têda qala ezman û stêrkan kirîye. Herçend ez gelek lê gerîyam, ew kitêb neket destê min". Ahmedê Xanî herwekî bi xwe gotîye "Mem û Zîn" ji xwera kirine behane û bi vê hêncetê kula dilê xwe bi der daye, derdê miletê xwe ê ker û lal bi ziman kirîye û ew axivandiye. "Mem û Zîn" ji bo Ehmedê Xanî rêzên Kurdistanê, rêzike we latê wîne. Xanî di bin rêzkên winda, di bin kurmançê din bi zimanina din dixunin û dinivîsin. Bi rêzkên miletê din va diçin, belgên xwe ên nijadin ji xwe tavêjin, dike rengê miletê din û bi wî awayî û rêva bindestîya wan dîkin.

Seyda dibêje :

Sazi dil kul-bi zir û hem bit,
 Sazendeye eşqî Zîn û Mem bit,
 Şerha xemî dil bikim fesane,
 Zînê û Memê bikim behane.
 Nexme we ji perdê derînim,
 Zînê û Memê ji nûva vejînim,
 Derman bikim ez ewan dewa kim,
 Wan du mededan ji nûva rakim,
 Meşhur bikim bi terz û uslûb,
 Mumtaz bikim mihîb û mehbûb,
 Ew reng bikim ji nû serferaz
 Da bêne temaşeyê nezerbaz,
 Dilber li Memê bikim girînê,
 Aşiq bikenin bi derdê Zînê.
 Ev meyve eger xerabe, ger qenc
 Kêşaye di gel wî me dused renc,
 Ev meyve eger ne avdare,
 Kurmançîye, ew qeder li kare.
 Ev tifle eger ne nazenîne,
 Nubare, bi min qewî şêrine,
 Ev meyve eger ne pir lezize,
 Ev tifle bi min qewî ezize,
 Mehbub û libas û guşvare,
 Milkê di minin ne mişteare,

*Ez pilewerim, ne gewherîme,
Xudresteme ez ne perwerîme,
Kurmancim û kuhî û kenarî,
Ev cend xeberin di kuredeweri.*

Celadet Bedirxan ev rêzên jêrin ji eqîda Ahmedê Xanî çapkirine:

*Sifete di sibhe ji bo zilcelal,
Bizan heftin ey arifê pir kemal,
Xweşî, şîn û zanîn û vên û kelam,
Bihîstin di gel dîtî bû temam.*

Ew derheqa Ahmedê Xanîda dinivîse "Pexemberê diyaneta me a milî, pexemberê ola me a nijandin". Xanî di wextê weleda rabû koberiya nihâ bi sê sed û neh salan-ne li cem me, lê li Ewropayê jî xelk hej ji milîyet û li nijadê xwe hişyar ne bûbûn û zelaşên ji yek milletî hev û du bo katolîkî an protestanîyê dikuştin. Di heymake weleda Ahmedê Xanî bîra milletîya xwe, bîra kurdaniya xwe birî bû û ji kurdan ra gotibû hûn berî her tiştî kurdin, rabin ser xwe dewleteke kurdî çêkin û bindestîya milletên din mekin".

XARIS BITLÎSÎ (XVIII)

Xarîs Bitlîsî ji dayka xwe bûye sala 1758-da, sala mirina wî ne e'yane. Bi gotina A.Jaba û M.B.Rûdenko Xarîs Bitlîsî du dastan nivîsîne: Dastana "Usîb û Zelîxe", "Leyl û Mecnûn". Dastana "Usîb Zelîxe" berê pêşin Salîm Sulêman (sedsalîya XVIII) nivîsîbû, lê paşê li dû wî Xarîs Bitlîsî nivîsara wî li cî-cîyan wergerandibû, xeberên farsî û erebî derxistibûn, pak kiribû, gihandibû xebardana zargotina kurdî. M.B.Rûdenko dinivîse: "Bi gotina A.Jaba li qurnêd XVII-XIX da li medresêd nav kurdanda nivîsara Xarîs Bitlîsî "Usîb û Zelîxe" dixwendin, çimkî zimanê nivîsara wî pak û temiz û ferih bû, rind dihate fehmkirinê.

Bona ku xwendevanên me haj yekîtî û cudatîya Selîm Sulêman û Xarîs Bitlîsî li dastana "Usîb û Zelîxe" da hebin ez çend nivîsarêd wan jêrê hemberî hev dikim. Ew rêz min ji nivîsara M.B.Rûdenko derxistine (58-50).

JI DASTANA SELÎM SULÊMAN

*Ema bi sedat û bi envan
Besê bikin em ji pîrê Kenan,
Ev reng ji axretê di mezherî,
Yûsif bi cemal bûye meşhurî.*

*Xûna xwe ji bo mêra beyan ke
Te qerîr bike li me eyan ke
Yaqub hebû keçekî xebarsaz
Wextê ji pider bihist ev raz
Beyt bi mîra kuh û deştan
Reh şîhetê teyrekî bihiştan*

JI DASTANA XARIS BITLÎSÎ

*Ema bi sedat û bi envan
Besê me dikin ji pîrê Kenan,
Ev reng ji lawê wî di mezhorî,
Usîf bi rindî zehf bû meşhurî*

Xûna xwe ji bo mêran beyan ke,
 Tu bibêje ji mira li min eyan ke
 Yaqub wî hebû qîzekî pak
 Wextê ji bav bihîst ev dak
 Beyt bi mera çîya û deştan
 Teşbîyê teyrekî bihiştan.

Li paşê M.B.Rûdenko dinivîse, ku sernavêd pêşin, yêd ku têda Selîm Sulêman pesnê xwedê dane, li nivîsara Xarîs Bitlîsîda hatine berdanê (yanê Xarîs Bitlîsî ew li nivîsara xweda nenivîsîne).

Li sala 1965 M.B.Rûdenko têksta destînîvîsara Xarîs Bitlîsî ya "Leyl û Mecnûn" bi tencîma rûsî û pêşgotîna xweva çapkir. Li pêşgotînêda ewê nivîsîye, ku Xarîs Bitlîsî li sala 1758-59 da dastana xwe "Leyl û Mecnûn" nivîsîye, ku ewî ew dastan bi xwesteka keçeke kurd hûnandîye. Derheqa wêda ewî li destpêka nivîsara xweda ev gilîyêd jêrin nivîsîne :

El-gise di vê behara gilhêz,
 Ez bûm li nivê yekî dilavêz,
 Rûniştîm û ez li pencereyê,
 Fikirîme seharê û hewayê.

Niga mi dî derî kişa bû,
 Şimsik ji nivê mineala bû,
 Ji evelva silam û merheba kir,
 Pirsî me kir, û dilê mi şa kir,
 Rûniştî û bi leb kerem mesref,
 Exbar û gise kirin mesref,
 Esraf kirin ji ber kilamê,
 Behsa me gihîştê vê miqamê,

Ku şêr û wezin çî xweş kilamin,
 Meqbûl cemi'e xas û a'min,
 Nasil li me kir kemal teglîf,
 El-hah û tesleffek bitesif,

.....

Pirsî me wê miraz meknûn,
 Got tercîma kî ji "Leyl û Mecnûn",
 Kûrdî tu zîringî da bizanin,
 Lo em çî bi farsî nîzanim.

Ev xeber nîşan dikin, ku giva bi xwesteka keçekê kurd Xarîs Bitlîsî "Leyl û Mecnûn" ji farsî wergerandiye kurdî. Lê ewî li pûşgotina xweda çavkanîyê "Leyl û Mecnûna" xwe nenivîsiye, ne e'yanê ewî ji kîjan dastanê wergerandiye. Lê pêvîste bêjim, ku kovêk û kêrtî dastana Xarîs Bitlîsî mîna ya Nizamîne. Lê têda çend cîkarêd qisekirinêd wusan hene, ku li dastana Nizamîda tunene. Mesele, di wêda tê gotine, ku Mecnûn Zaru bûye, girînekî bûye, her li ser singê-berê şîrdayena rinde bedew aram û ker dibe, ku Leylê û Mecnûn li mektebêda kitêbêd xwe pev diguhêrin, ku bi me' nîya wê rastî hev bîn, hev bibînin, di dastana Xarîs Bitlîsîda wusan tê gillî kirin, ku Mecnûn postê mîya li xwe dike, ku tevî kerîya pez here cî-warê Leylê û Leylê bibîne, di wêda wusan jî tê gillîkirinê, ku terewul Îbin Selam vedikevîzînin û ew dimire. Têda wusan jî temîyê dîya Leylê tê gotinê, xên ji wê di dastana Xarîs Bitlîsîda navê çend merivêd dastana Nizamî nayê gotinê, mesele, navê Selam-Amîrît û Selam Bexdadî û kirêd wan li dastana Xarîs Bitlîsî qet tune, xên ji wê li dastana wîda sernavê çarde yê dastana Nizamî tune. Eva nîşan dike, ku dastana Xarîs Bitlîsî nivîsara xweserî xweye, ne tercîma dastana Nizamî ye.

M.B.Rûdenko dibêje dastana Xarîs Bitlîsîda 740 çar xanin, têda bîst sernavin, bi naverok û mezmûna xweva ev pare ve dibe ser van parêd jêrin :

- 1- Keykawûs dua'ji xwedê dike, ku kurekî bidê,
- 2- Destpêka evintîya Leyl û Mecnûn,
- 3- Miraxwez naxwezin sêra civintîya wan e'yan be.
- 4- Mecnûn li çolê dikeve.
- 5- Mecnûn diçe Kaabê.
- 6- Xwezgîntîya bavê Mecnûn
- 7- Xwezgîntîya Îbin Selam
- 8- Naufal xwe li navra dike.
- 9- Mêrkirina Leylê
- 10- Mecnûn dîsa li çolê dikeve.
- 11- Leyl û Mecnûn hev dibînin
- 12- Mirîna dayk û bavê Mecnûn
- 13- Mirîna Leylê
- 14- Mirîna Mecnûn.

Bi şîrovekirina M.B.Rûdenko eva nîşan dike, ku şaxê dasta

na Xarîs Bitlîsî mîna şaxêd Mektebî û Navaye. Mektebî bi xwe dibêje, ku ewî dastana xwe "Leyl û Mecnûn" ji ya Niza mî û Xosrovî hildaye û bi xwe li kenarêd nîvada ereban lî qurna XV ji zarê ereban bihîstîye. Bi melumetîyê îbin Batûlî li sedsalîya XIII koçêd kurdan li dor berê kenarêd nîvada ereban digerîyan, dibe wan kurdêd koçer ji zarê ereban ew şax bihîstîne, li nav xweda bi kurdî belav kiri ne û wusan li nav wanda maye heta niha. Dibe ew şax lî nav kurdanda maye û bûye binyat û binga dastana Xarîs Bitlîsî. Xên ji wê M.B.Rûdenko dinivîse, ku şaxê zargotîna Serhatîya "Leyl û Mecnûnê" ne mîna ya Xarîs Bitlîsîye, li şaxê zargotîna serhatîya "Leyl û Mecnûnda" kovek û kêrta qisekirna wê bi cûrekî dinêye, di wanda awa qise dikin : Mecnûn kurê dayk û bavê belengaz Leylê hez dike, Leylê qîza mala dewlemend bûye, Mecnûn dixweze jêra Leylê bistînin, dayka wî diçe xwezgînîyê, dayk û bavê wê nadin, dayka wî pojman vedigere malê, wê navno dike, dixweze ew wê hez neke. Mecnûn ji mal derdikeve, diçe ber kanîya Sindcan (yan jî kanîya Masabûl) ku her gav keç diçine avê. Li ber kanîyê Leylê û Mecnûn hev dibînin. Mecnûn pê dihesê, ku Leylê ji wî hez dike. Roj li wan dibihire, berî êvarê Leylê xwe dihesê, ku li malê hevîya wêne, ew dixweze here bibêje Mecnûn ewê zûzû bê cem wî. Mecnûn wê ber nade, dibêje hinekî li cem wî bimîne. Leylê morîya xewê dike guhê Mecnûn, bi xwe vedigere malê. Dibîne mala bavê wê barkirîye, diçe zozana. Ew leze-lez diçe, digihîje koça mala bavê xwe. Gelek wext diçe. Kerba Leylê nayê, Mecnûn li ber kanîyê li xewêda maye, ew nikare here cem. Ew ji rewîya derheqa Mecnûn pirs û pirsyaran dike, kesek tişteki nikare jêra bêje. Carekê teyr ji ber kanîya Sindcan difire. Leylê jê dipirse û pê dihesê, ku Mecnûn hê li xewêdaye, li ber kanîyê çivîkê helûna xwe li porê serê wîda çêkirîye û cûcûk derxistine û qamîş li nav rîşîyêd wîda gihîştine. Leylê xwe ji malê vedidize, ber bi Mecnûn diçe, li ber kanîyê ew hev hemez dikin. Hingê birêd wê bi wanva derdikevin. Leylê ji tirsê bira dua' dike, ku xwedê wan bike steyr, ew bifirine ser ezmanan. Xwedê wan dike du steyra, ew difirine ezmanan, salê du caran: biharê û payz ew rastî hev tên.

Li paşî têksta dastana Xarîs Bitlîsî "Leyl û Mecnûn" û tercima wê bi rûsî M.B.Rûdenko şaxekî zargotîna "Leyl û Mec-

nûn" di kitêba xweda çap dike, ew şax ewê ji zarê Qerexa-
nê Şerefexan kurdê kela Çiristane (Xurasan) li Aşxabadê ni
vîsiye.

Ne mumkûne eşq bit nihani,
Henek hebitin, heye e'yanî,
Şagirt di hucrê pê bi yek bar,
Bi cumle ji hal bûne xebêrdar.

Ev sêr nuha eşkera bû,
Cî-cî gerîya û bela bû,
Xeybet qewî ji bo etbê,
Agah kirin diya hebîbê,
Wê abdiya effî û salih,
Wextê ku bihistine ev tirane
Hal hal girî, rûy gil serî,
Serbend birî û ser helkirî,
Rabû bi xezb vehate Leylê,
Ber kir bû qehr misalê Sêlê
Rûnişt ber li lay qîzê,
Gotê ku lewend bi temizî,
Hala bi bihistiye ciwabek,
Aşiq li te bûye şabek,
Hikmet ne ewe, tu jê şa bî,
Aşiq kir bû ya dil kuta bî.

Ey doxtera min, eva çi kare ?
Ev kar ji bo te zêde a're,
Ferze ji tera hub û perde,
Royê te kesek bibîne derve,
Bike te heyn hezar aşiq
Aşiq bona te ne layq.

Te namûs û nisf li me bi ba kir,
Loma ereba li me rewa kir
Derzê te bibîne belkî a're,
Bikişîne di çavê li tare,
Min bed biki dê biçî ji xanî,
Bê nav benî di nêv zemani,
Êdî meçe mektebê tu caran,
Çûna te niha qewî mubaran,

Êdî tu biçî ji mal bi derva
 Teyrok te bibarin bi berva
 Dê bêje bav û xizm û mamam,
 Xûnê te vexun bi tas û caman,
 Keç a'r û heyane, tek berayê,
 Ya genc ewe, ew ne bin ji dayê,
 Yanê kur bin, bilind ser bin,
 Piştî bi her dera xeber da,
 A'r û edeba xwe wê bi der da,
 Gewher bikevit destê xakan,
 Dê ku bikitin bi miqteba pan,
 Ya bê heya û şermin û xamuş,
 Nav çadir û pêçeka serpûş,
 Înkariya Leylê ji eşqê baweriya,
 Dayê me'ne kirfiye wê mektebê.

Leylê ku bihistin ew kilame,
 Go Dayê ji te ecêb dimane,
 Ev terz xeber çî bi hale,
 Însaf bike, çî qîl û qalîn. (54-55-27-28)

.....

 Leylê sekini çadira xwe,
 Ev renga xiste xatira xwe,
 Ku carek biçe lay Mecnûn,
 Kanê bi çî hale ew Cegerxûn.

PERTEW-BEG HEKARÎ (XVIII)

Li sala 1976-da li Bexdadê zanyarê kurd Sadiq Bahadînê navdar dîwana Pertew-beg Hekarî çap kir. Dîwan bi herfê erebî ji destnivîsara herfê erebî hatîye hazirkirinê û çapkirinê. Di pêşgotina xweda ya di kitêba "Dîwana Pertew begê Hekarîda" Sadiq Bahadîn Amadî nivîsiye, ku tarîxnas û edebyetnasê kurd tiştêkî safî û ron derheqa Pertew-beg da nenivîsîne, serguzešta (serhatîya) wî ne e'yane, her nivîsîne, ku ewî dîwana xwe li sala 1221 hicrê (1802) -da nivîsiye.

Sadiq Bahadîn Amedî dinivîse, ku berê pêşin her tarîxnasê kurd Emin Zekî, rewşenbîrêd kurd Necimêdîn mela, Mehemed Elî Ewnî û edebyetnasê kurd Aladîn Sicadîn nivîsîne, ku Pertew-beg Hekarî dîwana xwe li sala 1221-da hicrêda nivîsiye.

Sadiq Bahadîn Amedî wusan jî li pêşgotina xweda dinivîse ku cara pêşin hine xezalêt Pertew-beg Hekarî li kovara "Dengê Gitî tezêda" li hejmarêd 3,4,5 yê sala 1944-da hatine çapkirinê. Bi gotina Sadiq Bahadîn du helbestê Pertew-beg li kitêba li "Dîwana kurmancîda" (rûyê 93-94, 95-96) hatine çapkirinê. Xên jî wê ew wusan jî e'lam dike ku sê-çar xezal û xweşxanêt Pertew-beg li kovara "Nuserî kurd da" N 2 -da sala 1971 hatine çapkirinê. Ev mesele gişk rastin, zanyarê xoşevîst Sadiq Bahadîn gelek wext û hêzê xwe terxan kirîye, gerîyaye, ku destnivîsara dîwana Pertew-beg li nav xelqê kurd destxe, hazir bike û bide çapkirinê. Ew dibêje "zanyarêd kurd tiştêkî rast derheqa jî-yîna Pertew-beg Hekarîda e'lam nekirine, bi fikira min Pertew-beg ji binemala mîrêd Hekarî bûye, ji ber wê bi navê Şa-Pertew navdare, ji mala camêr, xweşmerê balber û xêrxwezda hatîye dinyayê, ji dayka xwe bûye û mezin bûye, cî û wergêd ew têda mezin bûye, cîyê sirişt, rengîn, bi deşt û çîya, gol û havingê û zozan bûye. Ew cî warê zannist û torê kilasîkî kurdî bûye, li wira rabûne gelek merivêd pîspor, zana, gelek mîrêd rewşenbîrêd kurd xasma li sedsalîya 14-19, zanayêd wek Elî Teremoxî, Elî Herîrî, Feqê Teyran, Melayê Batê, Ahmedê Xanî, Ismayl Bayzêdî, Mûrad xan, Şeref xan, Siyapûş, Ebdulselam Babî û gelekê din jî ji vî wergehî rabûne û dîmayî kirina wan, berhevîya îş û

karê van mêrêt navdar li nav xelqê kurdda li Hekarîyêda belav bûbû. Kêm û zêde Pertew-beg haj nivîsarêd wan hebûye û bi xwe" ji binemala xwendkar bûye".

Bi fikira min Sadiq Bahadîn Amedî li paşgotina xweda, ya ku îî paşî dîwanê hatîyê çapkirinê, rast dibêje, ku "Bê guman Pertew-beg ji şagirtê Cizîrî bêt, cist û çelek bûye, li ser rêça seydayê xwe helbestê dîwanê bi seng û lêk înan û vehandî û avaz sazê wî vehandîne. Ev hozanvana heta niha her nav bûye, bi belavkirina dîwana wî, zîrek pelewani û desthatina wî dê bo rewşenbirê kurd û biyanî wekî heye çardê û roja nîvro rohin bêt". (228-229)

Helbestê dîwana Pertew-beg Hekarî bi naveroka xweva p'iranî (zorbe) şêr û helbestê û dildarîyêne, kêm û zêde hînek şêrêd wî dildarî mîna şêrêd Meleyê Cizîrî têkelin, dîwanda hem fikira evintîyê, hem ji şêrêd bi fikira çînayetiye (ya dewlemendî û belengazîyê) tê lûlandinê, her bi tenê çend şêranda mîna şêrêd Meleyê Cizîrî bîr û bawara sofitîyê di şêrêd Pertew-begda têne gotinê.

Li pêşîyê divêt bêjim, ku şêr û beyt û helbestê Pertew-beg Hekarî mîna şêr û helbestê Meleyê Cizîrî bê sernav hatine nivîsandinê, ew her bi tertîba herfê erêbî li dû hev hatine rêz kirinê û nivîsandinê.

Li jêrê ez çend şêr û helbestê wî bi herfê latînî bona xwendevanê me delal çap dikim, ku ew bixûnin û haj qeyde û naveroka nivîsara wî bin. Li bendanda min navê çend şêr û helbestên Pertew-beg ji ber xwe nivîsîne.

(Dermanê derdê întizar)

Ez nizanîm dê çi bit dermanê derdê întizar,
 Qet xilas nîne min esla jî derda întizar,
 Ne deme tê seate tê roje, nê mahe, nê sal,
 Dayme pê der pê ez kuştîm vê derdê întizar
 Ay ella ha min reha ke, qet neşêm çû der hed
 Êş û janan dil bi dêrda zêde derdê întizar,
 Hûş û danîş, aqîl û saman, fehîm û zanîn û xerêd
 Ber bi talan leşkerê xem kirme derdê întizar
 Merhemek nîne ku da halê dilî bo bikem beyan,
 Ya tebîbek da biket derman derdê întizar,
 Kes bi kes naket xudanî, nasojet dil bi kes

Dê heta kengê bikişim ez vî derdê intizar,
Bo ezîzek xerqê derda intizare Pertewî,
Çi kirin gazinde ev gotin ji derdê intizar.

(Dil ji min bir)

Wê ji nû çezba evinê dil ji min bir, dil ji min,
Eşweyek wê hor eynî dil ji min bir, dil ji min
Ağirê hubê bihetim, dil kire mislî kebab
Bi avran wê sur şîrinê dil ji min bir, dil ji min,
Sebir û aramek nema min her wekî li dêmê semek,
Dûrîya wê nazenîne dil ji min bir, dil ji min.

Mehroyê exter misalî aftaba tele'tê,
Lê me eya nûra hebîbî dil ji min bir, dil ji min,
Car bi nazan, car bi xemzan, car bi xêş û car bi k'în
Car bi envaet kenîfî dil ji min bir, dil ji min,
Çêşim mestê, fitne qestê, sahrê cadû sîfet,
Hatin û ketne kemînê, dil ji min bir, dil ji min,
Ez nîzanim dê çi bêjim zulmîya vê dilberê,
Kes ji min naket yeqînê, dil ji min bir, dil ji min,
Kirne êxsîrê du çavan sed şeh û siltan û mîr,
Ma tenê wê xemrevînê dil ji min bir, dil ji min,
Ez kirme mecruhê zexman lê bi lee'lan kir deva,
Merhema daxa kirîne dil ji min bir, dil ji min
Pertewî dil şubhî wê kî wê li ser narê evîn
Ateş coşa kelmê dil ji min bir, dil ji min. (176-177)

(Saqî, demekê min bike bêhuş)

Hêdî bihejîn badî seba torey dildar,
Her tayeke pê bestne sed zexmî û bîmar,
Saqî demekê min bike bêhuş ji bade
Rehet bibitin belkî dilî jarî bilindar,
Qurbanî te bîm rehn û murvet go te nîne,
Ji zulm û sitemê bîr bike vî canî li mî yekcar,
Canê min û eşqa te ne froke demsaz,
Belkî ji ezel yekin û yeknûrîn û yek nar,
Dişmin li me dilxoş neke, ey serwerê xuban,
Derdê wî da bîkitin aşîq qerar,
Ji k'erbê wî ew hingizî bed fel û bed encam,

Rû mede zelîlan û me êdî qe maye zar,
Yusif ke rem û nîne biha lêk wekî pîr,
Negda dil û can Pertewe ênandiye bazar. (121-122)

(Pertew were guh bide)

Pertew, were guh bide vê nesîhet(ê)
Emma ji dil û can bi diqget (ê)
Da çend xeberêk ji bo te bêjim,
Lel û gewher û duran birêjim,
Belke ji tera bête zadek,
Teşbihê xizir delîlî carek,
Hişyar bibe carek ji xeflet,
Bîdar bibe ji xewa saqlet,
Ger umir bitin te çend sed sal,
Axir ecele, menal her hal,
Gava ecelê tu bîne birê,
Kes nîne ji vî biket gizîrî,
Zêde ji hezar me li rê ne,
Ne xayfê gotina nezîran,
Ne wehmê sexire û kebiran,
Ne ta'bê gerdene ji eşîyan,
Ne nadmê xefleta ji nisîyan,
Ne tirs ji hatina eqabê,
Me bêm ji muhelka ezabê,
Ne xef ji gehra rebê Qehar,
Ne şerm ciwabê şahê cebar,
Şermende û şermsar û rû reş,
Tomarê emel ji bedkarê reş,
Bes nîne ji bo te hinde xeclet,
Roj û şev û mah û sal û xeflet,
Lehzek tu ne hazirî hizurî,
Daym tu ji îngîyan nifûrî,
Carek bike şerm ji dîn û mezheb,
Rû mal bibê li dergehê reb,
Pîr girye û zarî û fixan ke,
Rohnika tu birêje û eman ke,
Çavan bike nezer bo girînê,
Lêvan bike dijminê k'enînê,
Ker ke cihan ji seme' û guftar,
Destan ke seget ji xubsê kirdar,

Ezman bike lal ji gotina pis,
 Çavan bike kor şibhi îblis,
 Çolax ke piyan ji qenci reftar,
 Bê can bike qenc ji fêlê bedkar,
 Mehdum bike ezema fisq û infaq,
 Meksur bike cezma hesreta a'q,
 Xalî ke dilê ji keber û nexwet,
 Mesqel ke qewî ji rengê qeswet,
 Haffî te ku sineyê ji k'îne;
 Bê k'îne bike cihe yeqîne,
 Pir pak bike dil û hinavan,
 Newmî ke heram li herdu çavan,
 Pir nûr bike şevê di tarî,
 Mesrûr bikê dilê xubarî,
 Tae't ji xwera bike Misir,
 Da can û demax bibin metir,
 Şehva dilê xwe ji cîn û şeytan,
 Mehdum bike şibtî şere wêran,
 Paqij bike, gir ke ji kursî (37-43)

(Pertew bes Bibêj)

Teze çavêt te belke hatne me tîr,
 Zilfe bî zincîr bend girtim û kîrme esîr,
 Naz û nezaket cuda xemze û avîr cuda,
 Esweger ji me cuda bû, nîne ji min rah gir,
 Ew senema mest xweş hat ji nik meyfiroş,
 Gote me hanê bînoş saxir û bade gir,
 Ku te mey noş kir, aqîl feramuş kir,
 Helqe me der guş kir, bende wekî ebdê pîr,
 Xaneyê dil bû xerab, qalib û cîsmîn kebab,
 Ger ez nekim ya sewab get li me eybek megîr.

.....

Pertewya bes bibêj, lalê rewan bes birêj,
 De te bikin kas û gêj dost wekî kuzvîr. (123)

(Rez û xak hemû yêk denge)

Bî kerîman rez û xak hemî yek denge,
 Pêş çavêt hebîban heme dînya tenge,
 Ger çî rezaq didit rizqê bî her qenc û xîrab,

Ku xurf bade bi beq xud tera şîr ninge,
 Her kesê mest bitin ji meya roja alist,
 Av saqî vexutin badeye ya xud çinge,
 Ger ti gulsarê cuhan ser û sinewber guhenge,
 Dilbera min ji ewan zêde şepal û şenge,
 Sinbil û yasemîn û nesterin û çiçek û gul,
 Nirgis û lale hemî ceme' rexê gulrenge,
 Seherê wextê gulan ku bêy mîskile pir,
 Yek terefê badeyê me'rb û yek ca cenge,
 Dê bikim wê xezalê gulşena gulzara bihar,
 Lê çi bikit Pertew qafiye pir tenge. (194)

(Ji ehwal qîl û qal boşe)

.....
 Serxoşê sermest û rendan gote texmînan û bendan
 Zêde ger dînê duçendan kes nema ba fehîm û huşe,
 Hem birin reyhan û sor gul, hemserin, nesrîn û sinbil,
 Egreban dîv dane ser mil, efe'ya ser dane doşe,
 Hesleban û u'd û enber sendelîn û mîsk û ezfer,
 Dûr bûye hale li meher ezeta xoş e'yûş û nûşe,
 Aqil û zanîn çûn bi talan, niqte û ezman şibtî lala
 Lew ji van ehwal û halan qîl û qalek zêde boşe,
 Zêde van şah û emîran, begler û xan û emîran
 Kevtne nalêt êsîran, Pertewî helqe bi goşe. (195)

(Rast û Çap)

Îro ke ceyşê kafîran rê-m da hesarê rast û çap,
 Hindî û tirkî û hebeş hatin diyarê rast û çep,
 Tirkêt te mest û bê eman bakêşe û tîr û kewan,
 Êrîş bire qesra cibîn xelqê te tarî rast û çep,
 Bû rizme-rizma zirguwan, bû hurme-hurma bişkuwan,
 Têt û metîrk û qumçîyan hatin kenarê rast û çep,
 Meydan tîjî bû eskeran, çavan bi girê keybîran,
 Curnan bi tîrêt hawran çûne hewarê rast û çep,
 Nesrîn ji xûna sor gulan sor bûn wekî bergê gulan,
 Çavan ji xûna qatlan tîr jê vexwarî rast û çep,
 Geh sert çû hoşa herîm, geh dihat çû xala herîm,
 Car bû şev, car bû tav li dêm ta bînguha rê rast û çep,
 Perto tu zêde sahirî, rû mumîn û dil kafirî
 Ya her di xûnan mayî me kir û tera rê rast û çep (98)

(Hewar ji destê firqatê)

Vê firqetê sewda kirin, firyad ji destê firqetê,
 Mecmunekî şeyda kirim, firyad ji destê firqatê,
 Dûr bûm ji didara şerîf, ji derd û xeman bûme nehf,
 Bê muns û yar herîf, firyad ji destê firqatê,
 Avê birîn kesb û sey' umrê ezîz li min bû zey'
 Heyv-m sera erzê ebley' firyad ji destê firqatê,
 Îşqa ezîzan ateşe her dem ji nû taze geşe,
 Ger çi bi min halek xweşe, firyad ji destê firqatê,
 Eman ji hecra bê eded, geh agire, geh cemed,
 Dad û meded, dad û meded, firyad ji destê firqatê,
 Hecir û fergata namdar bêbextiya çerxa xeder,
 Têkda kirime tar û mar, firyad ji destê firqatê,
 Şewqek ji eşqê hate coş, vir dane nav muhbet bi toş,
 Heyrîne aqil û fehîm û huş, firyad ji destê firqatê,
 Ev firqata dîzex, sîfet cehnem ku hefzî jê diket,
 Bes Pertewê dê çi biket, firyad ji destê firqatê (212-213)

(Saqî demeke min bike bêhuş)

Hêdî bihejin badê seba toreş dildar,
 Her tayek pê beste sed zexel û bîmar,
 Saqî demeke min bike bêhuş ji bade
 Rehet bibitin belkî jarî birîndar,
 QURBANÎ TE BÎM? rehm û mirwe go te nîne,
 Ji zulm û stemê bîr bike vî canê li mi yekcar
 Canê min û eşqa te ne îrok ne dîmsaz

Belkî ji ezel yekî û yek nûrî û yek nar,
 Dijmin li me dîlxweş neke, ey serwerê xuban,
 Derdê wê ewe da bikîtin aşîq gerar
 Ji kerbêt wî ew hingîzî beç fêl û bedencam,
 Bû deme zelîlan û me êdî meya zar
 Yusîf ke remo nîne biha lêk wekî pîr,
 Neqda dîl û can Pertewê îrandîye bazar (121-122)

(Derdê te bêje, Ey dîl)

Çîye derdê te, bêje ey dîl, ey dîl,
 Ji çavan xûn birêje, ey dîl, ey dîl,
 Ji bo teskîna îş û hiregeta dîl,

Heme derdan birêje, ey dil, ey dil,
 Ji min ehwalê kovanan mepirse,
 Ku halatek dirêje, ey dil, ey dil,
 Heçî dax û birîna min li sîne,
 Ji vê bejna dirêj, ey dil, ey dil,
 Ne froke te terka aşnayê
 Ku geta' te jimêre, ey dil, ey dil,
 Me zahî eşqa me cuban belyayê,
 Heçî di sûs û gêje, ey dil, ey dil,
 Wekî te guh neda pendet Pertew
 Ti marê xem birêje, ey dil, ey dil. (126)

(Nizanim dê çi bêjim)

Were ey eftab husin, ey siltan ferzane,
 Nizanim dê çi bêjim ez aqilî bûme bêgane,
 Gelek medhuş û sermestim, li ser hale get nawestim,
 Wusa bê pa û bê destim, li min gum bû riya xane,
 Wekî tesîrê eşqane, esîr êxiste canê min,
 Wê bê huşim ji sewda te hedê can peymanê,
 Di dil eşqa te ger nehêla feg û serpoşek,
 Cihanek bûye efsûn, cihanek bûye efsane,
 Omda min ji cananê, heyata min bi weslê ket
 Min can mirwet sehraza ezîza min Silemane,
 Li min taze perişan kir, dil û xatir, riyal û fikir
 Gilê nazan di çavan ku zulf îmamê pir şane,
 Tu Pertew xane rewşen ke ji eşkan dîde gulşen ke,
 Çiraye meclîsan can hat, hemî can bûne perwane (185-186)

(Heta kengê dê zincîran bimînin)

Şehê cana li textê dil sime'na emir ber ça ke,
 Welê edilê bike, pêda binyaê zulmê wunda bike,
 Qiyamet qameta bala bi law afeta canê,
 Ji balayê bila bêne qiyamet ji qametê rake,
 Bi qurbanê te bim, cana çi bê dîn da te ev telîm,
 Di bezma meyxur û rendan du çavan mest û şehla ke,
 Heta kengê di zincîran bimînin şibtî êxsîran,
 Kerem ke min bi van tîran bikuj ya bende aza ke (192)

(Feqîran dê keve bikin hewar)

Wê ji xezman ku me dîtî şuhmetî koma teter,
Fitne peyda bûn ji her yek goşeyê sêsed hezar,
Eskerê tirkî û mestan bûn ji etrafan diyar,
Way ber halê feqîran, dê bikin keve hewar,
Nîne esla melceyek cuz saye zilfa eqab. (65)

Çûye seyra gulşena gulcehre ya gul pirehin,
Têk mijîn kirne bax û baxçe, deşt û çîmen,

Meyxur û meynûş û mestexafle ew sêmeten,
Nîne qet ageh ji halê bilbilê dewra weten,
Ma dê hîeran û firaqê aşîqê malik xirab (66)

Xûnxur û xûnrêj û xûnê qatle ew mehleka,
Meyxur û mexmur û mesta serxoşa can ez feda,
Şehsewarê şîr û kêre seyde bend merheba,
Sed wekî min fil û eslan kirne zindana bela,
Şibhî sirê dil kesek ma seyda humnan nebû (67)

(Ew qeder Cavr û cefa min dîtine)

Ser wê azad û qed eşnayî te yeksane li min,
Sibhî halê me serê zilfê perîşane li min,
Ew qeder cewr û cefa û stem dîtine min,
Dize yek lutfê te qîmet bi du sed canê li min,
Derheqî min te wekî nîne serî rehma kerem,
Ji lebê le'lê dur û yek te ehsane li min,
Sebir û saman û sekûn pir li me dijvare gelek,
Ecel û merg û mirin haletêke asane bi min,
Ger çî min nîne li nik te qedrê mû di qedir,
Bendeyê xakî, diret mislî silemane bi min,
Ji xetê hizretê min dîdey can rewşen bû,
Çi hedê Pertewê yara wê bende bibet,
Makim û malikê rûxan sekî cananê bi min. (178)

ŞÊX XALID

Kamûran Bedirxanê rehmetî di kitêba xweda "Fêrbûna zimanê kurdî" da derheqa Mewlana Xalîda van giliyê jêrin dinivîse: "Şêx Xalid Zîyaêdîn di terîqeta neqşbendîye, şibha xalîdî danîyê. Ji kurdê Silemanîyê ye. Li sala 1242 -an ê hicrîda li şamê mirîye. Di çiyayê Çilyaranda veşartîye. Şayrekî mitesewife, dîwanek nivisandîye, lê di bêjeyê wîda gelek yên farsî hene. Ji ber ku zimanê wî ne xwerûye hinek dibêjin wî bi nîvkurdî nivîsandîye". Kamûran Bedirxan şêreke Mewlana Xalid di kitêba xweda çapkirîye. Ez wê şêrê jî li vira çap dikim, ku xwendevanên delal bixûnîn û haj wî merî jî bin.

ÇI TEDBÎR EY MUSULMANAN

Çi tedbîr ey musulmanan
Ne tersa me, yahûdîyan,
Ne beriyem, ne behriyem,
Ne ez erkanê tebhîyem
Ne ez çînim, ne ez hindim,
Ne ez milkê Iraqê me
Ne ez avim, ne ez bame,
Ne ez dinya, ne ez îqba
Nişanim bê nişan başed
Ne ten başed, ne can başed,
Ne babame, ne dada me,
Li ser weche çiraya me,
Ji efxana bese salek
Ji bo mibihan hero carek

Kî men xûdra nemîdanem,
Ne gebr û ne misilmanim,
Ne şerqiyem, ne xerbiyem,
Ne ez eflaqî gerdanîm,
Ne bûlzar û maçînim,
Ne ez xakî Xurustanîm,
Ne ez xakim, ne ez ateş,
Ne ez Firdewesê Radwanîm,
Mekanim lame kan başed
Ne men ez canî cananîm,
Ne ema me, ne xala me,
Dikim îro di efxanîm,
Ji maşoqan bese yarek,
Walî bim ez bi çeşmanîm.

Dil kedef kir tîr li min dan,
 Bê eded cewher bi min dan,
 Xemzeyê pir mekr û fendan,
 Lê li min berda girînê,
 Bê sebeb ketme nivînê,
 Lê ji ber husna şerînê,
 Kanî hura ser zemînê,
 Ev bi xef, halim bibînî,
 Zilf û xal û xemrevînê,
 Zilf û xal û mest û naze
 Gerdenê gerden firaze,
 Cerd dîkin ehlê mecazê,
 Xef dîkin esrar û raze,
 Ez çi kim sewm û nemaze,
 Min ji dest tembûr û saze,
 Dil ebir û mest û mîrê,
 Dê li min derbek bi tîrê,
 Kirme hibba zemberîrê,
 Kanî Meleyê Cizîrê.
 Xanî şêxê Babeşîrê
 Xemrî û gîs û herîrî
 Şev dikim nalin û zarî
 Ey Sîyahpûş tu xumarî
 Çend Sîyapûş tu sitarî
 Dir û yaqût û mirarî
 Hespê şahê şehsiwarî
 Diiberê ehlê dîlan bû

Lê ji halê meste mendan
 Lewme noşê can bi der dan
 Lê li min casusî bû.
 Muhibeta wê nazenînê,
 Ax û efgan û enînê,
 Şeq bû bedra yasemînê,
 Carekê bête girînê,
 Merhema bavê birînê,
 Bo me calinosî bû,
 Îşweyê wan xemzebaze,
 Lê ji eşqa rûyê taze,
 Ta serî yasî û gaze
 Kar û şîxîl bê niyaze,
 Dil wekî naqusî bû.
 Begler û şah û wezîrê,
 Ta li mirînê min vebîrê,
 Sîne kir arman li tîrê,
 Mek-kî û Elîyê Herîrî.
 Ben li dengê min feqîrê,
 Şev li min kabusî bû.
 Şihbetî teyrê biharê,
 Sahibê edeb û karî,
 Lêbi eşqa dil nikarî,
 Misk û enber jê dibarî,
 Angeh ez pabûsî bûm,
 Qatîlê cergê pijan bû,
 Qasîdê ruh û can bû.

SIYAHPUŞ

Li nav xelqêda navê Sîyahpûş e' yane wek şayre, lê heta ni ha qet kesekî nav û nîşanê wî nenivîsîye, ne aşkeraye jî kîjan erdê Kurdistanêda, kengê ji dayka xwe bûye. Dibêjin ku li nav kurdanda nav û dengê wî belave û perçên şêrên wî jî li nav xelqê bi zar dibêjin, dixûnin. Lê sed car heyf heta niha kesekî dest nivîsara şêrên wî, yan jî dîwa na wî heta niha dest ne xistîye. Dibe li paşwextîyê merîvên kurdperwer, hezkerê ziman û edebyeta kurdî lê bigerin û ji wanra bext lêxe, li cîkî destnivîsara wî, yan jî be-revoka şêrên wî dest xin û çap bikin. Li vira ez her bi tenê dikarim perçekî şêra Sîyahpûş çap bikim bona xwendevanên delal. Ew şêr li kitêba doktor Kamûrane Bedirxanê rehmetîda ya bi navê "Fêrbûna zimanê kurdî", Paris, sala 1968, rûyê 47) çapbûye.

DİLBEREK MIN DÎ

Dilberêk min dî bi çavan
Agirek berda hinavan,
Şemh û rihniya zîlamê,
Zîlf û xalên di temamî,
Şerbeta şîrin kelamê,
Sed şikir îro selamê,
Şerh û teqrîrê îslamê,
Reng û elwanê di Camî,
Şihbetî çavê di rengê,
Mirarê tira xedengê,
Kes ne dî qet wî çî rengî,
Qet ne ma qet wî çî rengî,
Sifdera mêrê di cengê,
Sed hezaran wek bi şengê,
Min qebûle hikmê rindan,
Lê çî bêjim qewl û bendan
Zehmetek wan pîr bi min dan.

Sed elif pabûsî bû,
Şemh û der fanusî bû.
Agirek berda di amê,
Qeyd kirin mehbûs bi damê,
Terkî min ne dît midamê,
Kir li min teze xulamê,
Fikir û teswîrê kelamê,
Şihbetî tawûsî bû.
Qews û ebrûyê di bengê,
Zîlf û xal û xînce rengê,
Nexşe maçîn û firengê,
Hikmeta Têmûr û lengî,
Şêr û mexmur û pilingê,
Hikmekî kawusî bû.
Serxweş û sûret lewendan,
Ketme tora lehl û xendan,
Kefşe bim wek gaz û sindan.

CEGERXÛN

Cegerxûn şayirê azadîxweza neteweyê kurde, dengbêjê dostî û hevkarîya milletane, şerkarê aşîtiya dinyayêye, nav û dengê wî li her çar parên Kurdistanê parevekirîda belav bûye. Di zemanê mîda derheqa wî û efirandinên wîda gelek gotar û mîqale nivîsîne û kovar û rojnamada çapkirine, qedir û qîmetê helbestên wî anîne ber çavan, dinya pê hesiya ew çî mîrê, çawan jiye, çî kiriye û efirandîye. Heval û hevkarê delal Kemal Burkayî di pêşgotina xweda ya ku di "Rona-kêda" (dîwana Cegerxûnda) çap bûye, nivîsîye, ku wê gelek dûr û direj bikişîne, eger meriv bixweze bi ser Cegerxûn û efirandinê wî binivîse. Bi rastî jî wusane, meriv nikare li ser jiyîna wî, kirina wî û efirandinê wî yekoyekî gilî bike yan jî binivîse, wê gelek dirêj be. Bi kurteberî gotî Cegerxûn li sala 1903 ji daykê bûye, navê bavê wî Hesenê kurê Mehemed, Mehemedê kurê Mehmûdê kurê Elî. Di biçûktîya xweda berxanî, şivantî û gavantî kiriye. Berî wê bavê wî çûbû rehmê, ew sewî li cem xuşka xwe Asê maye. Piştî vê yekê çav daye xwendinê û ketiye rêza feqehan. Li cem mele Ubeyd dersê şeriyetê hin bûye, şadnama xwe ya ulmê şeriyetê standiye, li Kurdistanê Iraqê û Îranê bi meletî geriyaye, belengazî û hêşîrîya milletê xwe bi çavên xwe dîtîye û bûye xemxur û dilêşê milletê xwe, navê cegerxûn li xwe kiriye. Dest bi nivîsandina şêr û beyta, helbestan li ser jiyîna milletê xwe kirîye û nivîsîne. Heta niha pênc dîwanên wî çap bûne. Du dîwanên wî li Sûriyê çap bûne, sê dîwan jî li Swedê çap bûne. Osman Sebrî, tekoşerê neteweyê kurd di pêşgotina xweda ya ku li dû dîwana Cegerxûn ya duwemînda çap bûye, ev gilîyê jêrin nivîsîne: "Ev dîwana ji dîwana seyda a pêşin bi gelekî xweştir û hejattir derketîye. Di dîwana pêşînda seyda ne hinde xurt û ne ji armanca xweda durbîn û yekrû bû, lê ev dîwan li ser armanceke xuya hatîye nivîsîn û rû û rêça wî têda xweş dîyarin".

Niha şikir hemû dîwanên Cegerxûn çap bûne, em dikarin bi kurteberî çend gilîyan derheqa efirandinên wîda bêjin. Mezinayîya Cegerxûn, qedir, qîmet û hejaya efirandinên wî, jiyîn û kirina wî baştir û çaktirin têne ber çavan çaxê meriv nivîsarên wî, helbestên wî dixûne, bi xwendina efi-

randinên wî meriv bi zanîn, hozanî, marifetî, camerî, mêranî û deliya wî dihesê, bi çavê xwe dibîne ew kî bûye, çî kiriye û kîye; wî rojên xwe li nav agir û alava Kurdistanêda derbas kirine û gihîştîyê wê rojê, wî zemanî çaxê kurd ji xewa kibir hişyar bûne, berê xwe dana ser rîya şerê azadî û serxwebûna xwe û welatê xwe. Bextewariya wî di jiyîna wîda ewê, ku nav û dengê wî li nav parçên Kurdistanê parevekirîda belav bûne, biçûk û mezinê kurdan navê wî bihîstîne, keç û xortên kurd yên delale delir, xûnşîrîn û dilverin nivîsarên wî xwendine, bi ezber helbestên wî hîn bûne, rêzên wan li ser ala azadkirina kurd û Kurdistanê nivîsîne, dane ser milê xwe û derketine meydana şerê serxwebûna welatê xwe, bûne heval û hevkarên azadîxwez û aşîxwazên dinyayê, bûne dost û hevkarên pêşrevên demokratî ya rastî li welatên Rohilata Nêzik û Pêşinda.

Hemû efirandinên Cegerxûn bi naveroka xweva pareve dibin ser komê jêrîn:

- 1- Şêr û helbestên li ser jiyîn, ayîn û halê kurdan,
- 2- Şêr û helbestên li ser zana, hozan û şayîrên kurdan,
- 3- Şêrên dildariye û evîntîyê,
- 4- Şêrên li ser bajarvanîyê (yên dostî û hevkarîya neteweyan û aşî li nav wanda).
- 5- Şêrên tarîx û dîroka şerê serxwebûna kurdan,
- 6- Şêrên pêşberî muftexuran (axa, began, şêx, pîran, bûrjuwazî û kapîtalîstan),
- 7- Şêrên pêşberî zulma faşizmê,
- 8- Şêrên rewşenbîrîkirina (ronahîkirina) neteweyê kurd,
- 9- Şêrên pêşberî dîn, dîyaneta û ayîna kevneperestî,
- 10- Şêrên filosofîyê (binêre pêşgotina min li dîwana Cegerxûnda ya bi navê "Zend-avêsta, dîwana 5-a, Stokholm, sala 1981). Naveroka van komên şêrên Cegerxûn, bîr û bawara wî bûne bîr û bawara her xortekî kurd, her qîzeke kurd; her pênc dîwanê wî bûne qurana her mîrekî kurd, her jineke kurd bûne dîn û îmana azadîxwez û aşîtxwezê kurd.

Li vira ez çend şêr û helbestên wan dîwanên Cegerxûn ji xwendevanên me delalra çap dikim, ku ew wan bixûnin û mijû lîya xwe pê bikin.

P.S. Bêrf ku ev kitêba çap bibe, du dîwanên Seydayê Mezin Cigerxwîn dinê çapbûn: Dîwana 6'a, Şefaq û Dîwana 7'a Hê-vî.

XEWA BIRÇIYA NAYE

Birçibûnê serî xwe hilda ev deh salin,
Kurdên reben li hawîr birçî û bê malin,
Hin dewlemend û têrmal û pîr zêr û gundin,
Lê pîrên wan belengaz û reben û bê şalin,
Kurdên jor bi ser ên jêrda hilweşîyan tîn,
Xort û gedek û şîrmij û keç û pîr û kalin,
Dewlemendan kodik xistiye nav lingên xwe,
Guh nedêrin ka belengaz çima nale-nalin,
Li alîkî zarok û şîrmij birçîne, diqîrin,
Xewa birçiya nayê, tev zarok û mindalin,
Xuyaye, kurêd dijminê felekêye her dem,
Dijminên felekê di her çax û deman mirdalin.

Kes kesî xwedî nake, lê talanên hev
Ji çolê dibin, hin Rostem û hin Zalin,
Ji dijminra egît û comerd û nandarin,
Ji xwera parsek û bêmîrêş û pergalin.
Ma ji xwedê rewaye herkes nanê wan
Bixwîn û ew parsek û evdalin.
Heçî maldarin, ji xwe bi xaltik û xalin,
Lê heçî bê malin, ji xwe bê xaltik û xalin.
Herkes bi xwendin bûn xudanê tang û top,
Bê em derwêşin, bi xîst û xencer û kopalin.
Şal û qumaş ji me standine dijmin tev,
Li cihan dest tengin, bê pirtî û pertalin.
Cegerxûn xemhilgire, li ser we dinalî tim,
Mal nîne, lê xem di ser dilê wîda qerpalin.

DESTÊ ŞÊX MAÇI MEKIN

Destê şêx maçi mekin, ew şêx ne qutbê razîye,
 Tac û şewket tev xebata destê sar û taziye,
 Ew ne dîne, dîn mebe, dîn serxwebûna milete,
 Ser mebe ber lingê şêx, kengê xwedê jê razîye,
 Ma ji bo dîn şer dîkin xortê Feranse û Înglîz ?
 Wa li Misirê xwîn dirêjin, bûn şehîd û gaziye,
 Ger nexûnin dê beg û axa me tim talan bikin.
 Ev nezani cangirani karekî nasaziye,
 Rêncberê şêx û melayî, karkerê axa û beg,
 Ê hinan pê karine, lê ê hinan canbaziye,
 Ew kesê zana divêt tim wek Cegerxûn bikin qir,
 Raste, wî zincîr di mîlda tim bi qir û gaziye.

XANIYÊ COTYARA

Xanîkî kûr teng, li dor çar dîwar
 Li ser wî pûş, û li bin beşt û dar,
 Sifre û şîrîk bi kunc û eywan,
 Bi kulek û refik hem bi nêrdewan.
 Her çar dîwarên wî ji ax û av,
 Mal û sermiyan zar û zêc di nav.
 Kulav û balîf û doşek û mitêl,
 Beroş û merşef, hem teşt û hem sêl,
 Qadulk û kodik kaxik û hîzik,
 Meşk û eyazşîr, cewdik û dizik.
 Misîn û legan sêni û rûnpêj,
 Moxil û bêjing, serad û gîrbêj.
 Hestîv û maşîk, tîfik, xacîrgan,
 Bêr û zembîl û bîvir û dustan.
 Kevçî û kefgîr, derxwîn û berfmal,
 Heçî û weris, werqil û çengal,
 Xaş û bendek, û çewal, tûr û têr,
 Şûjin û derzî, çawbir û hem kêr.
 Di ber zavêda xencerke neriz,
 Li serê malxwê zêr-taca Hurmîz,
 Keçîk wer digirin şar kesrewan,
 Di ber datînin çiçek û reyhan.
 Dilxweşin her wek Sîfî û Tajdîn,
 Cegerxûn, welat man wek Mem û Zîn.

KONÊ REŞ

Konê reş bi pişkoj û rewake û çîft,
 Bi pêşmal û perde û pargon û şîrît.
 Di binda çewal û tejber û kulav û nivîn,
 Bi pez û deve û hêstir û dewar û mehin,
 Kebani sipîdê radibe, pîr çelenge, bê xew,
 Sêpiyê li dar datîne û li dar dixê meşka dew,
 Mast dibe dew û bi ser dikeve nivîşkê zer.
 Nivîşkê xwe xwê dike û davêji binê hiz,
 Li welatê jêr hîze, li welatê jori dîze.
 Sivika hundur keçe, yan bûke yaxud qerwaş,
 Benik li desta û tûrê rengî li paş.
 Kom dikî quncik û siturik û sergin,
 Malxo rûniştiye Çeko, Ferzende û Gurgin.
 Pez tê ser dana û bêrfivan diçin der,
 Şivan pez dike kom û serbêrî li ber.
 Şîr didoşin û vedigirin ciwanik û pîr,
 Kod bi desta û li nav piştê eyarşîr.
 Êr varî agir û pêtî geş dibe li nav konan,
 Wek qirax û loks yan stêrên li ezman.
 Rencber û malxo bi tîfingîn, bi qîrçîr û gîzgîz,
 Terşê xwe diparêzin ji dijmin û gur û diz.
 Çend rojan li warê xwe dimînin ew koçer,
 Bar dikin hêstir û bergîr û huştir û ker.
 Bi ir û zir deng ji wan tê geh bi sehîn û kalîn,
 Koçer diçin, swarin, xort û kal û keçên narîn.
 Wardozî tîm diçin, digerin li waran,
 Dengê pez tê, kalîna berxa û warîna karan,
 Kona datînin şerîta vedirêşînin paş û pêş rind,
 Li pişt hev rêz dikin wek bajar û gund.
 Mêkut radibe ser serê sing û di binra pêwend,
 Pev diçin pêşîr û bend û quffik û bazin û zend.
 Diçêrînin kulîlk û hoşib û gihayê rengreng,
 Li wan diborin sal û dem û gav û çax û beng,
 Bi şadî dîlxweşî dimênin bê keser û bê şîn,
 Li cihan temaşa nakin ey seydayê Cegerxûn.

DÛRÎ DIJWARE

Vê dûrîyê ez dîn kirim, eman ji destê dûrîyê,
 Bê xwendin û bê dîn kirim, eman ji destê dûrîyê,
 Dûrî ji pêta agirî, dil girtiye qet namirî,
 Her dem ji ber nal û girî, eman ji destê dûrîyê.
 Tirsim ji pir dût kevîm, dîsa di axa kûr kevîm,
 Nêv pence mar û mûr kevîm, eman ji destê dûrîyê.
 Vê dûrîyê em da kirin, çavên belek wunda kirin,
 Em girtiye derdan kirin, hewar ji destê dûrîyê.
 Çavên di rêş, dêmen gulî biskan xwe da ser wî milî,
 Tîr dane dil çî bikim gilî, hewar ji destê dûrîyê.
 Cênîk û zilf û bisk û bêş wek top û tang û tîp û geş,
 Min dil ji wan her dem bi êş, hewar ji destê dûrîyê.
 Êdî bese, ey dîlberê, carek ji pişt perdê derê,
 Wer cem rûnê wek berê, hewar ji destê dûrîyê.
 Wer em herin nêv baxçe tev, bade binoşin roj û şev,
 Rengê gulî dil bidne hev, eman ji destê dûrîyê.
 Her du dîlan pir xweş bikin, em sor gulî rûgeş bikin,
 Van bilbilan şûreş bikin, hewar ji destê dûrîyê,
 Bilbil dike qîr û eman, تنها li cem wî gulciwan,
 Ne gihaye remza ebriwan, eman ji destê dûrîyê,
 Ew çav li didara te kî, wê ariyê li yara xwe kî,
 Bezî ji gulzara xwe kî, hewar ji destê dûrîyê.
 Şanf bide wextê seher, zilfên di rêş, xalên di qer,
 Cênîk û zêran deynî ber, hewar ji destê dûrîyê.
 Da çav li wê bejna te kî, carek li ber min tobe kî,
 Pesnê gulî dîsa nekî, hewar ji destê dûrîyê.
 Rengê gulê ew kiriye dîn, her dem dike qîrîn û şîn,
 Wek min ceger nabî bi xûn, eman ji destê dûrîyê.

SERXWEBÛN

Kurdino, merdino, pir xweşe serxwebûn,
Ew demên tar û teng kô din vane çûn,
Dest bidin hev hemî, pêş kevin em hemî,
Da biçin bo welat yan mirin yan felat.

Roj li me hate der, zû şiyar bin ji xew,
Ev dema ceng û şer paş ketin êdî hew,
Dest bidin hev hemî, pêş kevin em hemî,
Da biçin welat yan mirin yan felat.

Min divê ol û bext, min divê pêşveçûn,
Min divê tac û text, min divê serxwebûn,
Dest bidin hev hemî, pêş kevin em hemî,
Da biçin bo welat yan mirin yan felat.

TA KENGÎ

Ev reng biratî me navê ger timî wa bin,
Hevsar me girêdayî bi turtanê kera bin,
Ew begler û axa û emê jar û geda bin,
Ew rencbêrê dijmin û emê rencberê wan bin,
Ey karker û cotkar bese, dem hatiye, rabin,
Ta kengê emê karkerê axa û bega bin,
Ta kengê emê hestiyê bin lingê sega bin,
Ta kengê emê kole û riswa û ebid bin,
Bin destê merivên wek Beyar û Seîd bin,
Ta kengê li sinora wekî birc û kilid bin,
Ta kengê ji hevra hemî mêrxas û egîd bin,
Ey karker û cotkar bese, dem hatiye, rabin,
Ta kengê emê karkerê axa û bega bin,
Ta kengê emê hestiyê ber lingê sega bin,
Çawa ko dizanim tu timî şerkar û mêrî,
Deng daye di Şerqêda bi xwe fêris û şêrî,
Îro tu çima wer biwe tirsok û newêrî,
Perda gidiya ser xwe veda, da xwe veşêrî,
Ey karker û cotkar bese, dem hatiye, rabin,
Ta kengê emê karkerê axa û bega bin,
Ta kengê emê hestiyê ber lingê sega bin.
Perda gidiya carekê xweş rake, hilîne,
Çavê xwe veke, guh bide hawar û qirîne.

Lingê terasan zû tu ji axa xwe derîne
 Îdî tu metirs hemdemê cebarê te çîne,
 Ey karker û cotkar bese, dem hatiye, rabin,
 Ta kengê emê karkerê axa û bega bin,
 Ta kengê emê hestiyê bin lingê sega bin,
 Pir şerme ko em deh ser milyonê nifusin,
 Pir şerme ko em abîdê dînar û filodin,
 Pir şerme ko em birçî û bê mad û mirusin,
 Heyfe ji mera hemdem û hemxakê Urisin.
 Ey karker û cotkar bese, dem hatiye rabin,
 Ta kengê emê karkerê axa û bega bin,
 Ta kengê emê hestiyê bin lingê sega bin,
 Ta kengê di zindana bibin, hebsî û girtî,
 Dara li ser û lingê me xîr begî û şîrtî
 Ta kengê bixun ev beg û axa me bi xurtî,
 Ta kengê emê dey li we kin her we bi sirtî,
 Ey karker û cotkar bese, dem hatiye, rabin.

HÛN ÇI ZANIN ŞER ÇIYE

Pîj û ber dibarin fironek, top û tang,
 Bi gîrîn, bi xumîn bûye şer, bûye ceng,
 Kumişîn, hilweşîn xan û bircên belek,
 Genî bûn, kurmî bûn pîr kelaş, pîr cedek,
 Bi sîngo, bi gule didirin, dikujîn,
 Ser gever, çav belaq, dev ji hev mêr û jin,
 Dil bi tîrs diçîn hev bi guluz, di dizî,
 Ser hasin bi tîving, bê hêvî, bê xwezî,
 Şevereş bi birûsk, bi çîrûsk, bi tavan,
 Bi qêrîn, bi nalîn, bi hawar, bi aman
 Ber diwar pîr û jar tev sêwî, tev bê cî,
 Bi hêstir, bi gîrî, tev tazî, tev birçî,
 Ser bi xwîn, dilbirîn, hemî jar, perîşan,
 Rû kirêt bi zincîr, bi merbend di zîndan,
 Nîzanin diçîn ku, ji bo çî dikin şer,
 Wan dajon ber kêrê xwînfiroşên beşer,
 Dikirin me ji hev bi dolar, bi peran,
 Me dikin qurban ji bo xwe wek beran,
 Destê xwe didin hev xwedî mal, xwedî gund,
 Me didin ber gulan da bijîn serbilind.

Em hemf belengaz tev cotkar, tev karker,
 Me digirin bi zorê, me dibin ji bo şer,
 Em hevdu dikujin tev birçî, tev tazî,
 Ew li mal dadigirin serên xwe bi nazî,
 Divê em şiyar bin, destê xwe bidin hev,
 Li ser xwe hilfinin perda reş weke şev.
 Koledar, xwedîmal, xwedî gund bikujin,
 Serbilind, rû bi ken, tev bijîn mêr û jin.

HALÊ GUNDIYA

Xanî ji kelpîç pir teng û nexweş,
 Reş û bê ronî ji dixanê reş,
 Hin pez û dewar di nav çavên wan,
 Kufletên wan pir, ne pênc û ne şeş,
 Wek kuna rovî govik û şkeft,
 Rindin ji derdan bûne wek heşêş,
 Kûrin weke koz tev gemar û toz,
 Jê tê bihna pîs tev av û dilop,
 Tev mêş û kelmêş pêşî û dûpişk
 Kolma sehê reş, hêlîna miqrop
 Li dora bîrê teqan û çirav,
 Her der weke hev ne rêş û ne şop,
 Hawîrdora gund tev qerş û gemar,
 Sergîn û tepik gihane ber dev,
 Jin û keçên wan li guhera pez,
 Pişkul û rixan her ro didin hev,
 Ba û babilosk toz û tirabelk,
 Li wan diderin bi roj û bi şev,
 Sergo li ber der pir xweşe ew der,
 Her kes diçin ser odeyê ew nav,
 Li hev dicivin ji cî nalivin,
 Hin bi tifold, hin jana zirav,
 Ava devê hev hemî vedixun,
 Bi şadî û ken çî xweşe ew nav
 Hawîr nexweşî li ser wanda tê,
 Derman ji doktor çawa bikirî,
 Xwe xwedî dîkin sal bi sal bi zor,
 Zor dane ser wan sorik û xurî,
 Her kes dil bi xem zor û stem,

Qêrîn û hawar nalîn û girî,
 Tim bi reş û şîn hemî dilbirîn,
 Hin kor û bawî hin keşel û kop,
 Axa û began ew kirne talan,
 Tebeqa mêrkuj tebeqa zirzop,
 Malê wan nine, hemî birçîne,
 Tim davêjin top, tim davêjin top
 Şev û roj xebat dîsa tev birçî,
 Yan nan zebeş yan nan û mehir,
 Pîrê wan pêxwas, bê şal û kiras,
 Cixare vexwar ne hiş û ne bîr.
 Kulla pîr giran besa li ser wan,
 Van şêr û melan ew hiştin feqîr,
 Cotkar û karker tev bê ser û bêr,
 Birçî û reben hemî palevan,
 Comer û camêr hemî wek şêr,
 Her şev li cem wan rêwî û mêvan,
 Ne xema waye çiqas birçî bin,
 Çiqas tazî bin, hemî dîlovan.

PEMBIWE MEYE LÊ EM TAZÎNE

Te av didin ey pembû ! bi hêstirên çavên xwe,
 Te xweş dîkin, geş dîkin, bi van dest û gavên xwe,
 Xebat hemî li ser me, di dest meda tevr û bêr,
 Bi zor em te pêk tînin, paşê digihê xwedî zêr,
 Tu pemiwê erdê me, lê em rût û tazîne !...
 Yek ji sedî digihê me, hê em jê razîne.
 Hewqas giran bîhayî, qedrê te em nîzanîn,
 Bê xwendin û gundîne, lewra em jî xîzanîn.
 Ev kaniyên hemî zêr ji rex gundên me tên der,
 Zêd û bendên me pîr xurt em tev cotkar û karker.
 Dixebitin şev û roj, şerme hê ji birçîne,
 Welat li ser navê me, lê em têda bê cîne.
 Dewlemendên polperest tim tim dixwin malê me,
 Bê îman û bê wijdan ew guh nadin halê me,
 Ew qerêja destê me dixwin li me napîrsin,
 Em tev tazî û birçîne, ew jî xwedê natîrsin.

Erdên me û avên me, lê bê fêdî dixwin ew,
 Paşdamayî belengaz, tev bê xwedî dixwin ew,
 Xebata me kara wan, em rencberên dizane,
 Berên rezan dixwin ew, em pêwanê rezane...
 Ew xwêdana mîlên me tê, ji wanra dike zêr,
 Heta şîyar nebin em tev, ew li jor, em li jêr,
 Şîyar dibin hin bi hin, em bi zorê dibin yek,
 Hindik maye bişkenîn serê axê, serê beg.
 Ji bo were bîmînî ev qas gund û dextl û av,
 Kes nikarî xelas bî bi gotin û lavelav.
 Divê hinik dişwarî di vê rêda bibînî,
 Yanê em çî biçînî, emê wî zû hilênî,
 Hevalên me li her der, ji xwe gelek dan kuştin,
 Heta ax û av û mal hemî ji bo xwe hiştin.
 Di vê rêda em rabin, weke şêr û weke mêr,
 Ev pembû û ev genim ji bo wera dibin zêr,
 Gundên me jî xweş dibin, dibin gesir û ronahî,
 Xwendigeh û sinêma, hemî av û şinahî...
 Ev hasin û trektor tevda dibin malê me.
 Îdî nabin gêj û kor, pir xweş dibe halê me.
 Bi serbestî, dilxweşî bikin kar û barê xwe,
 Mêr û jin û keç û kur rûgeş herin karê xwe...
 Ne hêstir û ne girî, ne kuştin û ne talaş,
 Weke xûşk û bira bin, dewlemend û xwendevan.
 Di nav meda nemînî ne axa û ne jî beg,
 Destê xwe em bidin hev, di her tiştî bibin yek,
 Bi çepik û lîlandin, bi devkan û xwedîti,
 Hemî bijî bi hevra; bijî bijî yekîti.....

HOZAN O ŞAYİRÊN KURD

Xortên kurd hozanên welatê te,
 Evin, rabûne ji şax û latê te.
 Li seyda guh bidêrê, ez bêjim,
 Çend dilopan ji xamê birêjim,
 Her yeke seyda melayê Botî,
 Di xoşxanêda evîndarî di totî,
 Ji kurdara wî çêkiriye yek diwan,
 Di balaxeta xweda wek quran,
 Yekî di heye, rêberê kurde, Xanî,
 Di xoşxanêda Firdewuse sanî.
 Wî çêkiriye ji kurdara yek diwan,
 Lê temaşê kin kurdno sed aman,
 Ma ne bese Nubar û Mem û Zîn,
 Gazî dike bi zarê şîrin û gêrin,
 Yekî di heye Feqê Teyran,
 Li şolan herdem girtiye seyran,
 Bi rastî murxê di benda evîn,
 Bi kurdi dibê bi zarê şêrin.
 Yekî di heye seydaye Sîyahpoş,
 Di welatê meda çerxa gerdoş,
 Seyfulnuluk çîroka vê merdî,
 Li Misrêye, lê bi zarê kurdi.
 Yek Mewlana Xelîlê Sierdî,
 Swarê hespê kêmwesê kurdi,
 Nivîstek bi navê nehecn leman,
 Bi zarê kurdi, lê ji bo xas û am.
 Yek mewlana Selîmê Hizne.
 Kurdperwer û mezin û rêzane,
 Wî di ber kurdada xwe da kuştin,
 Çend xoşxan bi şûna-xweva hiştin.
 Yekî di dibêjne wî feqê Reşîd,
 Di zarê kurdi fihris û egîd,
 Nivîstek wî heye bi navê Sermehşer,
 Zarokên kurdan dixwenin ezber,
 Şeyx Eburehmane ew ji Axtep,
 Hawîr lêdaye geh rast û geh çep,
 Nivîstek çêkir wî Rewduneim,
 Çîrokên kevnare û gotinên qedim.

Melaye Batî bi zarê durdî,
 Mewlûdek nivîsandîye kurdî,
 Swarekî çelenge ew serdar,
 Şêrê laxer berdaye bê hefsar.
 Pertewê jîr hozanê Hekkarî,
 Xoşxanê wî wek dur û mirarî,
 Yekane gewherin mane bê rumet.
 Kurdno bese, xirete, rabin sed xiret.
 Melayê Xasî mewlûda zazî,
 Bi zarê zazî çêkiriye, ne tazî,
 Cengnama kurd û ermen nivîsî,
 Wek agir berdî me di îsî.
 Hozanekî jîr û zanaye Bêdarî,
 Bi zarê kurdî tim dikî zarî,
 Axawikê hoşxanê wî kevnar,
 Ji Bêdarê gelek jar û bêdar.
 Hozanekî hêjaye Brivkanî,
 Di serê wîda hoşxanê kanî,
 Murxê şahîne di baxê evîn,
 Li xunçê gul girtiye kemin.
 Mîr -Miheye Hozanekî Miksî,
 Li ser Sînem dibêje û dipirse,
 Sotaye ew jî ber derdê evîn,
 Digirî û dinalî li hawar û şîn.
 Yekî di heye, seydayê Lîcî,
 Xoşxanê xwe wî kirne du cî,
 Pesin û dijûna dike ew wek min,
 Dostê şêxan û jî wanra dijmin.
 Yekî di heye, Yusifê Kenanî,
 Di rastîda wek Yusifê sanî,
 Şêrek çêkiriye li ser Semsiddin,
 Fegeh jî ber dixûnîn wek yaşîn.

EY HEVAL ROBSON

.....

 Ey heval, Pol Robson,
 Derdê min û te, ev derdê giran,
 Zordestiya ko kete nav cihan,
 Hin mezin, bilind, dehqan xanedan,
 Hin reben bindest mane perişan.
 Ji vî derdê Marks, Ingels,
 Bûne du rêzan, bûne du hozan,
 Lênin, Stalîn rê şanî me dan,
 Pale şiyar bûn, xebat û lebat,
 Roj hilat, roj hilat....
 Xelas bû rojhilat,
 Roja sor, roja zer,
 Ji Mosko hate der,
 Tava xwe da Balkan, da Elman,
 Xwe berdaye ser Çîn, Çîn,
 Çîna mezin, Çîna giran
 Şewqa xwe da Hind,
 Tev dagirt cihan, cihan ...
 Ey heval Pol Robson,
 Karker û rencber, cotar şiyar bûn,
 Reben perişan bi hevra rabûn,
 Bi tang û top diçin şêr û ceng,
 Li her der Qêrîn, li her der Hawar,
 Li hawîr bû deng,
 Dixwezin azadî, serbestî wekhevî.

.....

DESTÊ TE MAÇ NAKIM

Şêxê min destên te îdî maç nakim êz, beşe,
 Kavil û wêran te hiştin ev sera û medrese,
 Şêxê Evropa binêre, wana hasin birne jor,
 Em bi xîşt û def û dilan paş ketin, tev mane kor,
 Her keşakî deh zimana zanî rengê Eflatûn,
 Em çima hov û nezanin, ser di berda paşveçûn ?
 Qet bi sîwaka te dijmin paşve naçin gavekê,
 Bo çi tev mane perîşan, dil û bendê davekê.
 Xortê kurda tev şîyar bûn, dil bi pêta agirî,
 Bayê zanîne li wan da, gur dibe, qet namire.
 Dev ji vê paya xwe berde, ev tiralî ma çîye,
 Me ne şerme, rût û xwase, kurd jar û taziye,
 Bes di pişt perdêda rûnî, ey cwanmêr xwe binas,
 Dijminê jîna welatî, tim bi dest te tevr û das.
 Hêj bibêjim, tê bibêji ev Cigerxûn gawure.
 Na, di bextê tew xwedêda, dil bi pêt agire,
 Ez dizanim pir dirêj kir min li te peyv û kelim,
 Ger tu kurd û kurdperest bî, em birane, weselam.

MEHRECAN

Pêkva em xortê ciwanin,
 Tê nî ji her şop û cîhan,
 Mehrecan bo me ciwanin,
 Her bijî ev mehrecan.
 Doza me her azadiye,
 Doza me dîmoqratiye,
 Doza me her aşîtiye....
 Ger bi vîn û ger civîn,
 Yan xebat û keferat,
 Her divê em herne pêş,
 Her divê em herne pêş
 Bo felat û bo welat.
 Em hemî dost û hevalin,
 Bo çi bend û berberî ?
 Têkda nûhatî, delalîn,
 Ev çi ceng û şerkerî ?
 Doza me dewlemendiye,
 Doza me ser bilindiye,
 Doza me her aşîtiye.....

DINYA PÊLÊ EVÎNIM

Cana xwe derîne tu ji pişta çeperê,
 Perdê tu hilîne, ku li min roj bi derê,
 Şevreş bike ronî, tu bi loks û fenerê,
 Maçek ji du lêvan bide, ey lêv şekerê,
 Ewe dermanê birînê û kul û derd û kederê.
 Ronakê dilim, dawarê vê jin û evînê,
 Carekê tu bizane sebebê nal û girînê,
 Sozek bide min, ko ji mera bête civînê,
 Bi nedînê dikuji min, vedijênî me bi dinê,
 Maçek ji du lêvên teye dermanê birînê.
 Ey hor û perizanê, şepal, nazik û rindê,
 Wey xesrewê rindan û şehê bale bilindê,
 Ma qey tu nizanî şewitîm, ez wekî findê,
 Sed bendik û zincîr te girêdane li zendê,
 Ta kengê bihêlî me di vê davik û bendê ?
 Carek tu were xweş veke van bendik û dava,
 Destim bihejîne û li dil awirê çava,
 Tu bi lêvên şekerî min bide ber pirs û silava,
 Van ah û kulan der bixe carek ji hinava,
 Jîna me ne maye, li me roj va çiwe ava,
 Heta bi sipidê me li ser hev nalf û gazin,
 Ma qey tu nizanî, ji te ka em çi dixwezîn.
 Ahan vedirêsin, bi şevan dev wekî sazin,
 Sed tîre di dilda me ji birbên te di bazin
 Ronik me ji çavan dirêjin, dê çilo razin ?
 Wer da ko binoşim, ji lêban şîr û şerabê,
 Zaza ji mera lê bidî aheng û ribabê,
 Heta ku bipidê biderê bayê sebebê,
 Jîna me li ser destê perî, çengê xurabê,
 Kestî me şkest, mane di nav pêl û ibabê.

KEÇA KURD

Keçe rabe, serf hilde, di vê çaxê weha nâbî,
 Binêr, jin çûne ezmana, heta kengî di xewda bî,
 Dixwezim zû bixûnî xweş, ji ser rû rakî çara reş,
 Tu gavan pêşda bavêjî, wekî Ander û benda bî,
 Çine ev çarîk û pêçî, di rextada xwe rapêçî,
 Bi destê te kelaşnikof, bera zana û xwenda bî,
 Ji dijmînra tu merkuj bî, di hindurda tu paqij bî,
 Ne xav û bê xuy û rijî bî, meger çendan li gundan bî,
 Berê gundî û recber bî, welatparêz û perwer bî,
 Sipî bî yan tu esmer bî, wekî fanos û finda bî,
 Wekî findê dikî ronî, li bajêr yan li gund rûnî,
 Dîya şêr pilinga bî, hevala ser bilind bî,
 Erê şoxê, erê şengê, bi hevra em herne cengê,
 Girêdayî heta kengî bîminî dîl û winda bî,
 Dixwezim ko wekî min bî, bi dijmînra tu dijmîn bî,
 Di cengêda wekî cin bî, ne rengê bûm û kunda bî,
 Were, xûşkê, tu zû rabe, di şêrda rengê şêra be,
 Berê ala meye rengin li ser şaxan te hilda bî,
 Di rojên şahî û cejnê, binêrim ez li wê bêjnê,
 Bi hevra em herne dansê, tu padişahê rinda bî,
 Şêrin û nazik û rind bî, şeker lêv û sipî zend bî,
 Were, em hev bikin hemêz, bere fetwa xwe min da bî,
 Keça zana û jêhatî, bibe partî -Dîmoqratî,
 Bera dîsa tu şêrina dilê xorta û seyda bî.

GULA ROJHILATIM

Gula baxê bihiştî Rojhilatim
 Di tarîxa şevê rojî, hilatim,
 Ji nav sînga demê pîjiqîme fro,
 Di tarîxê fireh hatim, Feratîm,
 Hemî jînim, dixwezim xweş vejînim,
 Hezar û nehsedî şîn bûme, katim,
 Birûskim, pir çirûsk û hewr û tavan,
 Bi himhim tîm, ji ezmana welatim,
 Lehîme ez di ser hevda diborim,
 Dixwezim nû bikim rêz û civatim,

Birûsk û pêt û ar û kevne sojim,
 Ji pût û lat û lahutra şewatim,
 Disojim, lê dîkin ronî şeva reş,
 Çira koraye ev kar û xebatim ?
 Di rêva ez diçim, lê seg diqorin,
 Fidakarim, li ser rêça felatim,
 Dixwezim ez ser hevra bifurim,
 Xebatim, şorişim, xweş keferatim,
 Cihan tevda wekî pingav û derya,
 Têne jêra wekî çok û qenatim,

.....

KÎ HILGIRÊ VÎ BARÊ MIN

Qet nerm dîkî dilê neyar
 Ev hewar û gaziya min ?
 Pişt xuze, barê min giran,
 Kî hilgire vî barê min ?
 Her roj û her êvar û şev,
 Hewar û nalîn tên ji dev,
 Guh nedne dengê me tev
 Heval û hem cînarê min.
 Kurdên nezan û rê nenas,
 Jar û reben, birçî û pêxwas,
 Petrol di binda, bê kîras,
 Nabîne xweş vî halê min.
 Bi dest neyar top û tiving,
 Bi dar dixwezim herme ceng
 Hewar dikim, qêrîn û deng,
 Şkestiye ev darê min.
 Gazî dikim kurdên xewar,
 Rabin ji xew carek şiyar,
 Hawîr li dijmin bidne dar
 Tev gundî û bajarê min.

REWŞA WELAT

Şoriş dest pêkir, gêrin û gurmin,
 Gule barandin, li hawir xurmin,
 Dijmin hilweşand tev gund û bajar,
 Zar û zêçên me jar ber diwar,
 Li jor balafir, li jêr tang û top,
 Ji xûnê sor bûn hemî şûn û şop,
 Welat carekê dane ber şewat,
 Milet perişan, bê kar, bê xebat,
 Birçî û tazî, hemî perişan,
 Bê mal û bê cî, ne xew, ne razan,
 Eriş tînin me ew gurên devlok,
 Derketin çolan hemî pîrhevok.
 Ji ber firokan hewar û gazî,
 Jar û birçîne, pêxwas û tazî.
 Tev tirs û sawir, din û sergever,
 Gelf dagirtin axîn û keser,
 Di ber lîngan çûn jin û keç û bûk.
 Li ser lep diçin zarok û biçûk,
 Ser û dest û pê sor bûne ji xwîn,
 Cegerxwîn bigirî, bigirî dilbirin !

EVÎNA DIL

Evîna dil, te dil kirîye birîndar,
 Bihara min, hemî zer bûn gul û dar,
 Me ew rojên ciwanî dan bi tolik,
 Ketim heştê, ji nûva bûm evîndar,
 Diran û çav pêkva şkestin,
 Û porê min sipî bûye bi yek car,
 Bi her caran dibî xort, dibî pîr,
 Ji bona min nema hêjane her çar.
 Ne zanim ez, di gel jînê dibarim,
 Weke berxê di nav pencên gurê har.
 Dinya pêkva di çavê minda xweş bû,
 Niha pîrim, di çavê minda bû sar,
 Şeva reş pêj vedane, hate ser min,
 Kî roja min li ber avaye, êvar,
 Ciwan bûm, ez bi dost û yar û kes bûm,
 Ku pîr bûme, hemî kes bûne neyar.

Eyîna min weke hespê çelenge,
 Revandim ez, ne zengo û ne hevdar.
 Li ku dimirim, ezê çi bikim bi Hesar ?
 Ketim heştê û ser jêr bûme deştê,
 Ne ew lat û ne ew hîm û ne ew dar...
 Berê rengê pilingan ez bi saw' bûm,
 Ji ber xapan niha ez bûme keftar.
 Bi ber pêlan ketim bê doz û daxwaz,
 Dinalim ez wekî hirçê birîndar,
 Cigerxwîn bes bibêje, pir dirêje,
 Bese kurdo, ji xew rabe tu hişyar !...

Stokholm 18-6-1980

ZIMAN Û HÎNKIRINA ZIMAN

Vejêne zimanê xwe, ey xwendevan,
 Nebûye millet hiç kesek bê ziman,
 Zimanê me xoş û xeroş û ciwan,
 Eger baş bizanî, tu nakî zyan,
 Tu kurmancîya xwe ji bîra nekî,
 Eger baş nizanî, divê zêde kî,
 Elifba û diwan û ristan bixwîn,
 Heta ku wekî min nebi dil bi xwîn,
 Binêre, zimanê te çend dewlemend,
 Li bajêr tu carek xwe bigihîne gund,
 Bibêne çi şêrine ev reng ziman,
 Çi paye bilind û çi rûmet giran,
 Bi pirsên xwe nazik, bi dengên sivik,
 Ne pirsek biyanî be, nabe girik.
 Tu paqij ke, zarê xwe şêrin bike,
 Bi kurdi tu baxêv û qêrin bike,
 Tu binivîse, çêke hezaran nivîşt,
 Nivîstxan li herder ji wan bine mişt,
 Wî bigihîne rêza zimanên mezin,
 Zimanê beyanî dixwênî çira ?
 Zimanê xwe carek naxwenî, bira
 Sedan sal, hezaran zimanê meye,

Wekî me di bin destê dijmîndaye,
 Çi gernas û mêrê di meydanê ceng,
 Ne şûr û ne mertal, ne top û tîving,
 Xwe parast ji dijmin wek pehlewana,
 Gelek efîrandin wî pîrsên ciwan,
 Meger lê xuyane hinek toz û jeng,
 Ne guhnê wîye, em şîyar bûn dereng.
 Eger ko hebûna me Firdewîsek,
 Weyan Xanîyek, yan ji Kercosîyek,
 Zîmanê me xweştir dibû ji farisî,
 Belam bûye nanê ceh û garisî
 Li alîkî lor, li alîkî gor,
 Li alîkî kurmanc û kelhor û sor,
 Wekî me gelek perçene tev li jêr,
 Kesî guh nedaye mîzgeft û dêr.
 Mirîşo bi tazî me tazî dîkin,
 Di rojêda pênc car me gazî dîkin,
 Li mîzgeftê tazî dibêjin mela,
 Binêrin, çî deng tê ji dêrên fila,
 Bi tazî dixwênin wekî taziyan,
 Dijîn em bi hovî, çîye ew jiyan ?
 Bi çîrok û helbestê û folklor,
 Payê zîmanê me xweş çûye jor,
 Di ristêda carek me bê bêkese,
 Ji bo payedarî Hesarî bese,
 Cîzîrî û Xanî, çî gernase ew,
 Weke Dicle û Zab û Arase ew.
 Siyahpoş û Nalî û Batî bibîn,
 Tu Miksî û Nûrî û Hacı bixwîn,
 Tu ristên evan Sehsiwaran bikêş,
 Bi daxwaz û pîrsên gelew çûne pêş,
 Bi lêvên gulana wan şikandin şiker,
 Ku hingî bimênin, bixwênin ji ber.
 Li bûka ciwanî kirin xeml û xêz,
 Le meydanê tore bezin pîr bi hêz.
 Bi xema xwe dir siftine wan gelek,
 Bi saza xwe awaz gihandine felek,
 Ku yaqut û elmas û mîrcan bi rist,
 Bi hûnan ristin civandin dirîst.
 Ji bûka zîmanra ku pêşkêş kirin,
 Zîmanê me yê xweş bi pêşve birin,

Niha ji hinek nû bi pêşve diçin,
 Jin û mîr û kal û ciwan û keçin.
 Bi tîrê ji birê duran gul dîkin,
 Bi xwêdanê xaman gula şil dîkin.
 Bi awir cewahir dîkin parepar,
 Ku millet bi wan awiran bû şîyar,
 Serê xwe ji xew rake, şerm û fehêt,
 Mexeyde çi bêjim li bejna me têt.
 Zîmanê xwe bixûne her dem ji dil,
 Were da bi hevra herin mil bi mil.
 Li alîkî destê xwe bavên tîving,
 Mehêlê zîmanê te ji bigire zeng.
 Meger ko zîmanek ne ber tişte, lê
 Millet bê zîman wek girara ber kelê.
 Zîmanê me xweşê, ne sade qerêj,
 Eger yek nizane, tu jêra bibêj.
 Eger raste, tu hozanî, ey birewer,
 Rîya rast eve, ez dibêim pêda wer,
 Tu rêzan û hozan û hem xwendevan,
 Çima wer dixwezî bîmîni nezan.
 Eger min dirêj kir li te pîrsyar,
 Dixwezim tu şîyar bî, ey xwendewar.
 Dizanim xwendin çiraye, çira,
 Çima xwe li me geş nakî, ey bira ! ?

KARKER Û COTKAR

B1 destê te pale, cihan xweş dibe,
 Nezanî ko bextê te wer reş dibe,
 Bi roj û bi şev her li bajar û gund,
 Li ser hev dikî xan û qatên bilind,
 Tu hasin dikî top û tang û tiving,
 Di ser dijminanda dikî qîr û deng,
 Firok û gerokên xweş bi pehlewani,
 Bi hêzê milên xwe tîni cihan,
 Xwedî sermiyan vê gemarê dibin,
 Di rojekê dehyek bi dest nakevin.
 Tu kara xwe ya pir dixî dest ewan,
 Bi zor derdixî roj bi roj kinc û nan,
 Bi piştê xwe ya xûz û destên gemar,
 Xebata xwe bi erzan didî destê neyar,
 Çi gernas û mêrî, çi dêwê xebat,
 Ji bo dijminaye hemî keferat..
 Tu eywanê Kesra mezin çê dikî,
 Pir û xanên bilind lê dikî,
 Tuwî dawerê wan kelat û sera,
 Li pêşîya merivan tu bûyî çira.
 Tu çekrox û lêkirox û xweş dawerî,
 Tu dêwê xebatêye xweş karkerî,
 Dikî û didî, lê tu birçî û jar,
 Ne jendî, ne xwendî bi destê neyar,
 Tu xav û ne ristî, bi sistî diçî,
 Bi karên di zendê tu rû gerçîmî.
 Tu piştixûz û milxwar û ser tîm li ber,
 Bi xore şev ro dikî ceng û şer.
 Çi xurtî? Çi dêwî? Çi milhasînî,
 Çi kohe bilindî wekî dasînî?
 Tu Zagros û Cudî, bilind û stûr,
 Ku ev çende daxwaz ji te kûr û dûr,
 Ji xwe rabe, carek şiyar be tu zû,
 Di jînê tu xweş zanibe arezû,
 Bizane seranser cihana teye,
 Eger ranebî, tev ziyana teye,
 Divê hilgiri çek wekî pehlewani,
 Bi destê xwe bigiri seranser cihan,
 Li dar xî tu rista xwe ya wekhevî,
 Ebe wek bihiştê li her der zevî.

PARTİZANÎ

Bibe partîzanek bi rist û dirist,
 Di gel partizanan here dest bi dest,
 Ji miletra rê xweş vekin rengê şêr,
 Eger xurtemêrî bibe wek stêr,
 Tu ronî bide karker û gundîya,
 Tu xweş bike dilê bav û xuşk û diya,
 Tivingê tu bigire, girêde tu rext,
 Herin ser çiya, yan ji text, yan ji bext,
 Bibe partî, hem bibe partîzan,
 Eger serbilindî dixwezî bizan,
 Nikarî bibî serbilind, nav giran,
 Heta ko serda nebî wek beran.
 Li ser van çîyan ko neki qir û ceng,
 Bi êriş û hawar û halan û deng.
 Tu nabî serferaz û azad û kurd,
 Li çolan tu dimirî wek Yezdîgurd.
 Bi dijminra çendan bibî dost û yar,
 Dibî rencber û koleyê koledar,
 Cîqas şerme û pîse wilo dil bi tirs,
 Dibî koleyê turk û tazi û firs.
 Kurê Keyqubad û kurê Erdeşêr
 Çi şerme wilo ko te ser daye jêr.
 Here ser çiya, lê bi top û tiving,
 Şerê dijminê kurd bike wek pîlîng.
 Te dijmin deranî, dibî xweş mezin,
 Bi lîl têne pêş te kemerzêr û jin,
 Li eywanê Kesra dibî şehreyar,
 Xwedî rist û destûr û ferman û dar.
 Dibî payedar û xwedî mêr û pişt,
 Welatê xwe yekser diqî bihişt,
 Dibî wek çira geş di nêv rohilatê,
 Bi te geş dibin-tev çiya û kelat,
 Divê bîr û bawar bibî wekhevî,
 Xwedî par û pişk bin bi mal û zevî,
 Eger wek dibêjîm bikî, yan bibî,
 Derê zerzeminê li min de vebî,
 Bi paye bibin em hemî serbilind,
 Li we dê binêrin hemî şox û rind.
 Di xan û seranda bijîn dilxweşî,
 Ji nav me bigestî, herî çavreşî.

SERBESTI Ò BINDESTI

Tu serbest bîjî, pir xweşe ev jîyan,
 Ne tenha ez û tu, belê tev cihan,
 Tu serbest bibêje, tu serbest biger,
 Tu serbest bixwaze, tu serbest binêr,
 Tu serbest bilîze, tu serbest bixwe,
 Tu çî bîkî, bike, ger bikarî bi xwe ?
 Mehêlê ziyana te bigihê kesî,
 Di kar û xebatêda bibe Markisî,
 Tu kara xwe pêşkêş bike bo hemî,
 Bira û merovin hemî ademî.
 Bibe rêberê karker û palevan,
 Wekî roj tu tava xwe bidî cihan,
 Tu pir teng menêre li royê zemin,
 Eger seza bî, bibe durebîn.
 Belam ger di qada xwe serbest neji,
 Bizane, tu tava xwe nadi xwe jî.
 Tu xwîna xwe birêjîne, serbest dîbî,
 Divê rê cikûs bî tu bindest dîbî,
 Tu serbestiyê wa hêsanî mebin,
 Hevîrek strandî bi ronik û xwîn,
 Ne şerme hezar sal tu bindest diji,
 Çî bêjim, bi van gotinan napiji.
 Divê ko bixwîni, bibî xwendewar,
 Di bîr mijîda nemêni gemar.

.....

.....

XWENDIN

Xwendin nebi kes naçe pêş,
 Peyda dibin pîr derd û êş,
 Her dem di bin destê neyar,
 Em dê bidin xûkî û bêş,
 Ev tac û şewket xwendine,
 Ev dîn û dewlet xwendine,
 Ev serbilindî xwendine,
 Ev dewlemendî xwendine,
 Herçî nexwendî rêncbere,
 Ê ku bixwêne rêbere,
 Her dem di nêv xan û sera,
 Serkar e, ya serwere,
 Ev tac û şewket xwendine,
 Ev dîn û dewlet xwendine,
 Ev serbilindî xwendine,
 Ev dewlemendî xwendine.
 Xwendin divê hem pîr xebat,
 Bo milletê kurd û welat,
 Kurdno ji xew rabin hemî,
 Mizgîn li we, roja me hat.
 Ev tac û şewket xwendine,
 Ev dîn û dewlet xwendine,
 Ev serbilindî xwendine,
 Ev dewlemendî xwendine.

OSMAN SEBRÎ

Li paş Cegerxûn şêrê serê çiyayê Kurdistanê yê duwemîn Osman Sebrîye. Di rewşenbîrîkirin û şerê xwenaskirina kurdanda û di şerê serbestî û azadkirina kurdanda gelek roj û salên giran li pêşîya wî mêrî bûne. Lê ew li îş û karê xweda ji rîya xwe venegerîyaye, xebitîye, şer kirîye bo xatirê serxwebûn û azadîya neteweyê kurd.

Osman Sebrî di sala 1905-da li gundê Narincê (Kurdistana Tirkîyê) ji dayka xwe bûye. Bavê wî serekê eşîra mirdêsan bûye. Di sala 1915-da bavê wî çûye rehmetê. Apê wî Şukrî ew xwedî kiriye, daye ser xwendinê. Sala 1922-da Osman Sebrî dibistana "Ruşîyê kuta kirîye. Herdu apên wî Şukrî û Nurî ji ber têkelîya şûreşa şêx Sehdî li sala 1925 li Amedîyê (Diarbekirê) hatne dardakirinê. Zar û zêçên mal-apanê Osman Sebrî mîna zar û zêçên malên kurd bi hezaran dikevne nav rojên reş û giran. Osman Sebrî tev hevalên xwe, tev xortên bi xîret dikeve derdê neteweyê xwe, tevî wan bi dizî û aşkera dest bi şerê azadkirina neteweyê xwe dike, dixebite. Hukmeta roma reş wî digirin, davêjine hepisxana û ew di girtîxanada dimîne heta sala 1928. Di sala li 1929-da careke din li Malatîyê wî didine ber dadga herbîyê. Gava rê dikeve ber Osman Sebrî, ew berê xwe dide Suriyê û 24-XI sala 1929 derbasî sînor dibe. Di Suriyêda ew xebata xwe wetenperwerîyê dom dike, di zivarî, belenga zî û rojên reşda dijî û ji ber xebata şûreşgiriye li cîkî natevite, li nav welat û miletê xweda digere û bîr û bawera serxwebûn û serbestîya kurd û Kurdistanê belav dike. Sebeb vê yekê ew gelek caran tê girtinê. Têkuşerê neteweyê kurd Hemereş di nivîsara xweda, ya ku li pêşîya diwana Osman Sebrîda ya bi navê "Apo" sala 1976 li Evropê çap bûye, dinivîse: "Osman Sebrî 12 caran hatîye girtinê, car caran ji mal û welat sirgun kirine, 5 caran ketiye ber çav-nêriya polîsa Suriya".

Bi gotîna Hemereş û Nûrêdin Zaza Osman Sebrî xwendin û nîşandîna kurdî li cem Celadet Bedîrxanê navdar û emekdar bûye, bi saya serê jêhatî, zîrekî û fehmdariya xwe ew li demeke kurtda baş hîn bûye û dest pê kirîye bi pirsên dîrok, civakîya mijûl bûye, gotarên tarîxî li ser kurd û Kurdistanê nivîsîne, serpêhatî, hikyat û çîrok ni-

vîsîne. Ji her tiştê bêtir û baştir ewî jêhatî û şarezatî ya xwe di meydana nivîsandina şêr û helbestanda nîşan kirîye. Ewî gelek şêr û helbest nivîsîne. Nivîsarên wî dîrokî, yên serpêhatî, yên hekyatî û çîrokî û şêr û helbestên wî li nav salên 1932-1945 li kovar û rojnamên kurdîda yên Celadê Elî Bedirxan û Kamuran Bedirxan çap dikirin, dihatne çapkirinê. Xên ji wê hine şêr û helbestên Osman Sebrî li kovara "Çîyada" hatine çapkirinê. Heta van salên peşin berhevokên nivîsarên Osman Sebrî ne hatine çap kirinê, her bi tenê di sala 1979-da Hemereş dîwaneke wî biçûk bi sernavê "Apo" çap kirîye. Ewî di pêşgotina xweda nivîsiye çima ewî navê wê dîwanê lê kirîye "Apo". Ew dibêje: "Di nav Kurdistanê navînda pîrsa "Apo" gelek giranbîhaye û ew kesên ku têne hezkirin û pê bawarkirin, an ji navsal, xwendin zanîn û serpêhatine, ji wan kesanra bi vî rengî dibêjin "Apo". Gotina "Apo" ya van kesan tê bîlêstî û her kes hîvîya rindîyê, qencîyê, lêbanîne, alîkarî û şîretan ji wan dîkin". Hemereş dibêje "Ji wan kesan, yek jî Osman Sebrîra dibêjin "Apo", Osman Sebrî tê ber çavan, tê ser zîman û lêvan û ji ber vê yekê me jî li ser pertoka wî ev navê hêja danî".

Divêt bêjim, ku di vê pertokêda hemû nivîsarên Osman Sebrî ne hatine çapkirinê, mesele, helbestên "Pîra gendorê" "Xweşxana Çîyayekî", "Cejnepîrozîya welat", "Leheng" "Rewşa xortan" û çend hebên din di vê pertokêda çap ne bûne. Wusa jî têda nivîsarên wî din yên peşxan (çîrok, dîrok, serhatî û hekyat) çap ne bûne. Derheqa vê dîwana xweda Osman Sebrî van giliyên jêrîn dinivîse: "Rojekê ji rojan ne dihat bîra min, ku ev nivîsarên min di nava çîl û pênc salanda, di demeke xweser û rewşa kambaxda hatibûn nivîsin û piranîya wan di hin kovar û kitêbokên ku da hatibûn belavkirin, ho lê bigihîn li ser hev û dûrva kitêbêkêda bîne çapkirin. Berî her tiştî ez ne şaîrim, lê gelekî keyfa min ji xwendin wêra tê û car caran jî dinivîsim. Jê pêva bawariya min bi fêda û qenciya şêrê pir mezine. Çi dema şêr, an çîrok bi awakî rêber û rênas bîne nivîsîne, dîkarî û mîletekî serwest û hişyar bikin û ji bo têkuşînek-nîştîmanî pêk bînin". "Di sê salanda hevalê hêja Hemereş di xwestin van nivîsarên han bicivîne serhev û di dûrva kitêbêkêda çapke. Ji ber ku min ev nivîsarên xwe hêjayî wêlê ne didîtin, min qîma xwe bi daxwezeke wêlê ne tanî û

her min şûnda dixist. Lê bûyerên van salên paşin, nemaze îsal, pêlên nokerî, keysebazî û nandozîyê ku di nav gelê me ê rebenda bi awakî xurt û kirêt rabûn, hiştin ku qîma xwe bi gotina Hemereş bînin û hîn nivîsarên nuh ji têxme ser ên kevn". "Ji ber ku me kurdên bakur bi zimanê xwe ne xwendine bû û bi zaravê kurmançî nivîsan ne bûbû, nivîsarên min ên destpekê hinekî qels hatine. Heya xwendevan bi karin nivîsarên kevn û nuh ji hev binasin, me tarîxa her nivîsareke li bin danîye. Dawî welatê ku em têda dijîn, heke bihiştta em bi zimanê xwe bixwînin, teqez min dê îro bi karîya çaktirîn van nivîsara binivîsîya, ji ber ku ziman bi pir xwendin û nivîsandinê pêşve diçin. Lê gelek mixabin ku nehîştine ku ro bi serê me keve û em ji hemû mafê sîyasî, civakî û zanîstî bêpar hiştine. Ji ber vê yeke min nivîsarên xwe holê bi nav kirin: "Gotînen xav nepijîn bê tav".

Eva nîşan dike, ku Osman Sebrî bi xwe nivîsarên xwe şêrbê jî kom kirine û ji Hemereşra şandine. Ew şêr û helbestên wî yên di vê berhevokêda tunene, dibe ku ewî nikar bûye wan kovar û kitêban dest xe, yên ku ew têda çap bûne, yan jî dibe ewî bi xwe nexwestîye wan şêra û helbestana bike nav berhevoka diwana xwe. Bi gilîkî di vê diwanêda hemî şêr û helbestên Osman Sebrî çap ne bûne. Têda wusan ji nivîsarên wî din, nemaze nivîsarên peşxan (dîrok, serhatî, çîrok û hekyat) çap ne bûne û bi xwendina vê berhevokê xwendevanên me delal haj pê nabin, pê nahesin nivîsarên wî din hene, çawanin. Eger em dîna xwe bidne ser kovar û rojnamên kurdên Suriyê (kovarên "Hewar" û "Ronahî", "Roja nû" û yên din), emê pê bihesin û bizanbin, ku Osman Sebrî di wextê xweda a'lim û zanyarekî bi hêja bûye, bi pirsên tarîx û êtnografîya neteweyê kurdva mijûl bûye û çend nivîsar li ser wan nivîsîne. Mesele, em navê çend nivîsarên usa bêjin: "Tarîxa kurd û Kurdistanê" (Hewar N 29,28,30), "Êzdî û ola wan" (Ronahî N 19,20,21), "Nêçîr" (Ronahî N18) "Nêçîra xortan" ("Hewar" N 48). "Leheng" (Serhatîya merxa sên serê şêx-Sehîd) ("Çîya" N 3,4,5,6,7), "Çîyayê Sasunê" ("Hewar" N 27), "Ziman û nivîsandin" ("Ronahî, N 24), "Li welatê çînan" ("Ronahî" N 12), "Warên me ne ê kore" (Hewar, N 51), "Terşên şevê" ("Ronahî" N 14), "Şeytanqune kî" ("Hewar" N 55,56,57), û yên din. Divêt wusan ji bê gotinê, ku Osman Sebrî bo milletê xwe camêrîke mezin kirî-

ye, ku ewî bi rezadilê xwe dîwana yekem ya Cegerxwûn çapkiriye û li pêşiyê pêşgotineke bi hêja nivîsiye.

Ez li vira mijûlî lêgerîna van nivîsarên pêşxan yên Osman Sebrî nabim. Min li jorê navê wan nivîsaran nivîsin, ku xwendevanên me delal haj pê hebin, ku xên ji şêr û helbestên wî wusan jî nivîsarên wî pêşxan hene. Ez hîvîdarim, ku wextekê têkuşerê rewşenbîrkerên kurdan hemû efirandinên wî kom bikin û li berhevokêda çap bikin, reng û rûyê nivîsarên wî bînin ber çavan, qedir û qîmetê wan bi temamî nîşan bikin.

Herçend navê vê xebata min "Gulçîna Gulistana şêrbêjên kurdaye", ez li vira şêr û helbestên Osman Sebrî bona xwendevanên xoşevîst û delal çap dikim, ku ew hînî bîr û ramana wî jî bin.

Piraniya şêr û helbestên Osman Sebrî yên welatperwerîyê yên yekîtî û hevkarîya kurdanin, yên rewşenbîrkerîna wan bo xatirê azadî, serbestî û serxwebûna wan û welatê wan. Di şêr û helbestên xweda Osman Sebrî temiyê, şîrêtan û nesîhetan li milletê xwe dike, temî û şîretên wî berê pêşin ji keç û xortên kurdra têne gotin. Di şêr û helbestên xweda ew nifiran li merivên duru, xwefiroş dike, reng û rûyê kirêt şêx, axa, bega û serekên xwefiroş nîşanî gun dî û xebatkaran dike, gazî xort û keçên kurd dike rabin meydana şerê pêşberî stemkarên xelqê kurd, pêşberî faşîstên ereban, pêşberî goveka hukûmdarên tirk û fars, yên bûne xûnharê xûna milletê kurd. Ew fikir û bîr û bawar di van şêrên jêrinda têne dîtine :

HALÊ WELAT

Divê tu zanibî, ev bûne sê sal
Min ne dît xwişk û bira, xelkê di mal,
Ne me dît axa welat, pîra diyan,
Ne vexwar kewsera gewr ava çîyan,
Dipirsî fro ji min halê welat,
Dê bêjim jê diçin sed agir û pêt,
Çi çîya, deşt û newal, rêl û zimag,
Çi bajar, gund û kelat avahî pag,
Heya bi dar û çîya kuç û zinar,
Bi girîn, kezeb ji min anîne xar.

Ne kêzan, ne şivan û şîna giran,
 Sorgerî ava çeman bi xwîna biran,
 Rojê sed êş û birîn, renc û keser,
 Ji dil û cergê wan der têne der,
 An dibin armanc ji bo tira neyar,
 An dibin ji nav welat bê, şûn û war,
 Axivîn ji canê welat diwazde birîn,
 Herikîn Dicle, Firat deh sala xwîn...
 Qe nizam hewceye wî halê xirab,
 Ku ji min cerg û hinav kirîye kebab,
 Dibêjim bê sor û ber, bê doz û tol,
 Ji me çûn deşt û çiya, namûs û ol.
 Pir spas ji xwedê, we ew der ne dît,
 Tu bê qey nemane mêrxas û egît,
 Welat dîl, xelkê têda hemî reben,
 Bê girîn nabîni, rûkî li ken.

QULING

Ho quling, kude diçî? berva bakur kil dibi her,
 Te rana ustiyê xwe, pêl bûn ji te bazik û per,
 Ji bo çi te zu berdan berî demê ew germiyan?
 Qey diçî nava welêt, zozanên kurd serê çiyân,
 De fermo, venişe, tu pêlekî em bipeyvin,
 Heye ku gelek najo li wî erdî em bicivin,

Qin.... qin.... qin....

Te çi got? çi dibêji? serwest ne bûm, teyrê delal,
 Sî sal bûn çavneriya min dîkin gelek heval,
 Heye li zozanan, te dibînim pîrsê dîkin,
 Divê tu bi ser û ber bêji wan vî halê min,
 Li vira wer her derê em kurd bûne sê kerîyan,
 Ne yekin, nabine yek wek sêwiyên ber derîyan,
 Birek jê şêx û axa, yê duduyan dewlemendîn,
 Ê mayî reha millet, wî dest û pê li kemendîn,
 Du birran dest dane hev, birrê mayî dixapînin,

Geh bi virr, geh bi zirtan wan li pê xwe radikişînin,
 Çi dema feyde ne kir xap û derew, zirf û gurran,
 Dest davên darê neyar, dajone ser wekî guran,
 Bi destê zorkeran ew serê millet dişkênin,
 Holê ew bi bêbavî ronîya xwe dirêjînin.
 Me berê hêviya xwe girêda bû bi hinek kes,
 Pîrr ne çû, xweş xuya bû, ne ew mêr bûn, gelekî qels,
 Diçin ew li ser şopa bav û kalan hemî reben,
 Bûne her di nav destên neyaranda listik û ken.
 Gelê kurd spartina qîlên zorker bi dilreşî,
 Dixwun xêra welêt digel dijmîn ew bi xweşî,
 Gundî û karkerên kurd ji her mane bêpar,
 Derketin ji nav gundan, derbi derin, bê cîh û war,
 Çi cotkar, çi cewêlek mane li ser nanê tîşî,
 Keda wan têtê dizî bi zorbazî, çelp û pîşî,
 Jê hinek digihe miwezefên diz û keleş,
 Yê mayî dê bicive di berîka axayê rûreş,
 Da salê çend caran pê here Bêrût, Heleb û Şam,
 Bêereq, cuz û xapîn, tolazîyê wan ninin kam,
 Bi virr û zirt û pesin rave dibin xweyî rûmet,
 Herwekî piştîmêrê çak tîne cêla doza millet,
 Lê dema tê xebatê, dibêjne me "Em nikarin"
 Ne wekî we sotalin, tevda xudan kar û barin,
 Di rîya kar û debar her kêmiyê ew hiltînin,
 Ji bona ku neêşin herdem serê xwe datînin,
 Wunda bûn, wunda dibin, wecibê xwe ne di birîn,
 Ne xebat, lê di peyve tev jêhatî gelek jîrin,
 Bê kirin, him bê kêrin, bi kêr nayên zimandirêj,
 Ne birin, wan bir niye, qe bir nabin, mêjî qirêj.
 Dewlemend wekî dewar çav daniye bes xwerinê,
 Nizane rûmet çîye, tenê dirav, keyfa dinê,
 Daye pey çîpê keçan, reqs û govend û mey,
 Ji a genc dûr ketiye, careke din nema tê rê,
 Çi dema jêra tîni çêla rûmet û mêranî.
 Dibêje: "Birayê delal, hê dem ne hat, tu ne zanî,
 Çi gava keysa me bê, na mikûne, ke em nekin,
 De hingê bi comerdî derê kasa peran vekin.
 Îro em get nabinin, keyse ji bo doza welêt,
 Lê a rast malperestî di wan nema şerm û fihet.
 Derewe, derewînin, bi derewan nayên xapîn,
 Van kesan xwe bir kirin, di wan nema rûmet û vîn,

Bêje wan bazên çîyan, xortên celeng, rewşe piling,
 Ku kesên bi mêranî wan dinasin, tev bûne ping,
 Hinek jê eraqê, hinek bi mal, tev serxweşin,
 Çi dema keysa wan bê, min û millet difroşin,
 Lê têne navê millet bû kilita pîrr deriyan,
 Dolar û pawin û dinar xweş digihîne nav berfiyan,
 Heke na, navê millet get ne dihat ser zarê wan,
 Kesê kurd ne dikarî xwe bigihîne ber arê wan,
 Lê bira qenc bizanin xortên welêt ku em li vir,
 Bê tevger get rûnanin, armanca me xebat û kir,
 Xebatek demokrati, dane ber xwe rewşê gelêr,
 Xortên me pê rabûne, têda diçin tev wekî şêr,
 Pîrr najo wê destên me di nav destê xwe bibînin,
 Nema ew di bin darê "demoqratê" tirk dimînin,
 De hildin ala rengin li welatê jor û jêrin,
 Heya ku kurd ji wekî gelên mayî aza bijîn.

MARŞA AŞÎTIYE

Xortê çak rabe zû me divê dilşadî,
 Serxwebûn, aşîti, serbestî, azadî,
 Van tiştan her divê pîrr xebat, west û xweîn,
 Berî me sed hezar, sed hezar têda çûn,
 Kolîdar bûne har, wan divê ceng û şerr,
 Di vê rê pîrr didin dolara zêrrê zer,
 Agirê şerr dadan, Koriya bû doje,
 Tang û top qembele xwîna wan dirêje,
 Ev hemî di reya dewlemendên çillek,
 Dimirin kiç û kurr, mêr û jin lek bi lek,
 Mehêlin şerr bibe, aşîti ol û jin,
 Em bira tev hemî bo çi ev qirr û kîn,
 Sor û gewr, reş û zer em yekin, tev bira,
 Hemîyan yek rêye, yek raman, yek çira,
 Mesîhî, Musewî, Misilman hemdemin,
 Mecûsî, Êzdî tev kurrên Ademin,
 Me divê aşîti naxwezin şerr û bend,
 Bimirin kolîdar şerrxwezên dewlemend,
 Her bijî aşîti, aşîtxwez bijîn,
 Serbilind, serfiraz her wekî baz bijîn.

DURŮ

Ho reha çepel ! tev grêk û xar,
 Ji ruçikên çak hemîyan bê par,
 Ola te qelsî, bawerî, derew,
 Dilê te qirêj, bes ziman derew,
 Ramanek ne rast bû rêberê te,
 Ji rûmet vala maye serê te,
 Naşî bibêjî, tu gotina rast,
 Dikarî bêjî: "Reşe rengê mast".
 Dikî, dibêjî her tiştê kirêt,
 Xwe jê didî paş bê şerm û fihêt,
 Ji bo demekê têyî veşartin,
 Ji terra pirr tişt têne spartin,
 Lê dawî a rast wek royê tê der,
 Ew dibî rûreş, her serî di ber,
 Hinga tê zanîn tu çi hêsanî,
 Ji dûrva meriv rengê sa nî,
 Zuka biqeşe her ji pêş me,
 Em bêhn teng dibin bi dîtina te,
 Rûyê te yê çil navên bibînin,
 Ji ber kirên te tev dil birînin,
 Sed hezar xwelî li nav çavê te,
 Ji hinda pirtir para bavê te,
 Ku li pê xwe hişt kurekî durû,
 Bi sermesarî cihan berda çû.

NEWROZ

Newroz cejna Rohilat bîst yekê avdarê,
 Ew bû sersala kurdan di destpêka biharê,
 Newroz yanê nû serê salê dimînin,
 Nêrgîz sosin renga reng çarmedor ew didin bin,
 Ewe cejna mezintir, ji bo gelên rohilat,
 Bûyereke pirr bilind di êvarek wêda hat,
 Rabû Kawey hesinger bi şoreşa azadî,
 Dehek têda hat kuştin di îranê bû şadî,
 Çi zîvar û belengaz, cewekek tev civandin,
 Bi camêrî, yekdestî nîrê stem şkandin,
 Bervaneka hesinker direwşa Kaweyanî,
 Xemilandin bi gewher ket Methefa îranî,

Du rojên din di serve zêde kirin şaynet,
 Cejna bûne sê roja ji hingêva bû adar,
 Heya stem xurt nebe stemkar wê hiltîne,
 Dide ser rîya qelsan her pîsiyê dikşîne,
 Gava stem giran bû, dijvarê xwe ragirtin,
 Cerg û hinavên merov ji rîkî tên dagirtin,
 Dema ker digihê hestî hey aên qels har dibin,
 Bi agirê zinatê yên wek Kawe çar dibin,
 Dipelixin stemkar, dinê ra dihejfinin,
 Tola dused, sêsed sal bi carekê hiltinin,
 Gere yê me kurdan ji kêrik gihabe hestî,
 Nizam hey a çî demê dê bîminin rawestî.

ZOZAN

Tevî pez û koç û gan
 Derbas dîkin rojên geş,
 Li ser wê nefela xweş,
 Dilîzin û dibezin,
 Heyanî koç dakevin.
 Dema çiya dibin sar,
 Payz dibe, em têne xar,
 Kola dile min zozan,
 Xasma li nav Kurdistan.
 Zozanên me bilindin,
 Tev bi zevî û gundin,
 Di wan hene avên sar,
 Tev devî û rêl û dar.
 Raxerê wan gulçîçek,
 Firrinde tên lek bi lek
 Havînê em diçin wan,

NEWROZ

Newroz çiqas delalî
 Her dem û gav di balf,
 Her sal di vê çaxêda
 Bi kêf û lîz û govend
 Gul û kulîlk û çîçek
 Çem û cobar tijî tîn
 Berf li çiya dihele,
 Wekî çînen reşbelek
 Rûyê erdê ji rûkî,
 Nêrgîz, gupik û çîçek
 Di van rojên şîrînda
 Çi keç û xort û mindal
 Dikin cejna sê rojan
 Derdikevin ji malan
 Ew hildigirin digel xwe
 Hinek bi saz û sowet
 Cîh cîh li hev dicivin
 Hinek ji wan genimgûn
 Hinek ji wan çavreşin
 Gehîştina destê wan
 Li ber çem û çîmenan
 Direvin û dikenin
 Li ser gul û çîçekan
 Her dadinin û radibin
 Dema ji wan diyan bin
 Dibe pîrçe-pîrça wan
 Dawî di hev dibanin
 Hinek diben dîlokan
 Bisk û zilfên zerîyan
 Li ser dêm û rûyên gewr,
 Dilê xortan ji evîn
 Bi nêhrîna zerîyan
 Kal û pîrên gerçimî
 Demên borî dibîrin
 Lê çî feyde, nayê dest

Vedikujînî derdan,
 Tuyî cejna me kurdan
 Bist û yeke Avdarê,
 Me digihîni beharê,
 Dibişkivin di baxan,
 Heta perav û şaxan
 Bes diminin belekî,
 Dilgeş dîkin gelekî.
 Giya der tê kesk û şîn,
 Ji her alî didin bin,
 Welatê kurd ser û bin,
 Kal û pîr û bûk û jin,
 Bi xweşî û ken û bang,
 Bi xirroşme qir û bang,
 Nan û den û siranî,
 Hinek bi sergirani,
 Keçen xweşik û dîlber
 Hinek jê çûrr û gulîzer,
 Kezi dirêj gewr û boz,
 Divê gelek dew û doz,
 Di nava bax û bostan,
 Cihan dibe gulistan
 Ew surperî weke hing,
 Tekra dikne vinge ving,
 Xortên çeleng û şapik
 Dibin çîman wek xezal.
 Vedigerin çend bi çend,
 Dibe dîlan û govend.
 Ji duzanê der tîn,
 Dipengîzin, terrin tîn,
 Tijî dibe, dike coş,
 Tev dibin gēj û serxoş,
 Her ew didin keseran,
 Dixwezînin dîlberan.
 Emrê çûyî carek din.

Wekî gula çilmisî,
 Dilê xwe yê perritî
 Wê birîna bê derman
 Dijwarîyek mezine
 Bizan gelek kirête,
 Hersê rojên cejna xwe
 Tev kêr û saz û sowet
 Diviya bû tiştêkî bêjim
 Zanîna min hinde bû

Belgê wê dikevin bin,
 Bi hezringa dax dîkin,
 Bi xeyalan sax dîkin.
 Qelsiya xwe bîr birin,
 Pîrr jê xweştîre mirin,
 Derbas dîkin bi başî,
 Reqs û dîlan di xweşî,
 Çend gotinan di newroz
 Gelo cejna we pîroz.

DICLE Û FERAT

Ji dil û kezeb evîndarê Dicle û Feratim,
 Nizam bû çiqas bê dilê xwe dûrî we dijîn,
 Ev çem ji bakur dadikeve wek dû welat,
 Yek ta Bîrecik, yê din diçe nav diyarê Zîn,
 Melê Cizirî ilhama xwe ji wî çemî distand,
 Gelek mirarî di peravên Diclêda civand,
 Ehmedê Xanî ji serekî ava wî vexwar,
 Li ser nivîsî sernava Memê birîndar,
 Feqê Teyran, Melê Batê pîrr şaîrên çak,
 Hespên xwe bezandin di şaxa çemê çalak,
 Ger Dicle bi xwe kaniya zanîn û evîn bû,
 Ferat pê gerra gelek şêrên pence bi xwîn bû.
 Di qada rûmet û mêranî her bê hempa bû,
 Herdem ji bo her pesnekê hêja û seza bû,
 Min hêvî heye Dicle-Ferat barê we rake,
 Di warê ziman li rojhilat xelqê me şa ke,
 Zimanê mê yê paşda mayî çiçkî bide pêş,

QADRÎCAN

Nav û dengê Qadrîcan bi nav û dengê Cegerxûn, Osman Sebrî ra girêdayîye. Rast gotî di nivîsarên xweda ew ne qasî wa ne, nagîje wan, lê di kirina xweda, di nivîsarên xweda di meydana şer pêşve birina ronahkirina neteweyê kurda, di meydana şerê azadkirina welatê kal bavê xweda ewî jî cîkî layq girtiye û hiş û aqilê xwe terxan kiriye bo xatirê serxwebûn û serbestîya kurd û Kurdistanê. Di vî îş û karî da ewî jî mîna herdu şêrên serê çîyaên Kurdistanê dengê xwe ber bi keç û xortan kirîye, di şêr, çîrok û serpêhatîyên xweda temî û şîreta lî wan dike, ku yek bin, jî xewa kibîr hişyar bin, xwendevan bin, dest bidne destên hev, bi bin heval û hevkarên hev, bibin şerkerên bê tîrb û xof bo xatirê azadî û serbestîya kurd û Kurdistanê.

Piranîya şêr, çîrok û serpêhatîyên Qadrîcan li kovarên "Hewar", "Ronahî" û "Roja Nû" da çap bûne.

Çîrok û serpêhatîyên Qadrîcan yên çap kirî eve jêrinin :

"Hewar hebe, gazî li dûye" (Hewar, N.1, sala 1932)

"Silêman Bedirxan" (Hewar, N.3, sala 1932)

"Hîva çardeşevî" (Hewar, N.6, sala 1932)

"Bihara Dêrikê" (Hewar, N.13, sala 1933)

"Tabûta bi xûnê". Şex Ebdurehman Garisi çû rehmete (H.N. II, sala 1933)

"Gelô ne wusane" (Hewar, N.10, sala 1933)

"Gundê nûava" (Hewar, N.2, sala 1932)

"Dabê" (Hewar, N.14, sala 1933)

"Sond" (Hewar, N.33, s.1944)

"Gune" (Hewar, N.39, s.1942)

"Rojên derbasbûyî" (Hewar, N.52, s.1943)

"Gulçîn" (Ronahî, N.16, s.1933)

"Sehên zozanan" (Ronahî, N.14 s.1933)

"Tayek porê spî". Li ser şopa Manfleti (Ronahî N.13).

Di hejmarên "Roja Nû" da bir bi bir (parçe bi parçe) zîncî ra tercîma Qadrîcan ya kitêba rêbarê rûs Grigîrî Pêtrov "Di welatê Zembeqêda" hatine çapkirinê. Di vê kitêbêda Grigîrî Pêtrov basa jiyîn, ayîn neteweyê fînan gilî dike, basa welatê wanî bindest gilî dike, îş û karê şerevan û tekuşerên fînan tîne ber çavê xwendevan û xwendkarên xwe û nîşan dike çawan kom û komelên wan dixebitîn, çawan şer dikirin pêşberî hukmeta Swêdî, ku welatê xwe û neteweyê xwe azad bikin, ku serbest û bi serxwebûn bijîn.

Di pêşgotîna wergerîna vê kitêbê Qadrîcan dinivîse, ku bi temî û şewra doktor Ahmed Necîf ewî ev kitêb wergerande ser zîmanê kurmançî bona xort û keçên kurd, bona wetenperwerên kurd. Birên wergerîna Qadrîcan yê vê kitêbê di hejmarên "Roja Nû" yê jêrînda hatine çapkirinê: NN 4,5,6,7, 8,9,10,11,12,13,14,15,16,17 û di yê dînda.

Min baştrîna dîna xwe da ser wan hejmarên kovarên "Hewarê" "Ronahî" û rojnama "Roja Nû" û di wanda her sê-çar şêrên Qadrîcan yê çapkirî dîtî. Ew şêr evê jêrînin :

"Cegerxwîn" (Hewar, N.12, sala 1932)

"Berdêlk". Ji lorîya Bedirxanra (Hewar, N.6, sala 1933)

"Xewna hişyarî" (Hewar, N.13, sala 1933)

"Tabûta bi xwînê" (Hewar, N.II, sala 1932)

"Dadê" (Hewar, N.14, sala 1932)

"Di şorezarekêda" (Hewar, N.10, sala 1932)

"Hesinker" (Hewar, N.7, sala 1932)

Ku xwendevanên me delal haj cure û reng rûyê nivîsara şêrên Qadrîcan bînin, ez li jêrê çend hevan ji wan çap dikim. Pêşîyê em guh bidne şêra wî ya bi sernavê "Cegerxwîn"

CIGERXWÎN

Di dema heşê min wenda dibûyî,
 Mizgînek ji minra hat û got: bixwîn,
 Min cegerperitî, min dil hiluyî,
 Mezê kir ev mizgîn bi navê Cegerxwîn.
 Hevalê xoşevîst, pesna gundê min,
 Bi ah û keser pêşkêş didî min,
 Ji nuva pêtek ar da ser daxê min,
 Derd û kul tevdayîn tewşê Cegerxwîn.
 Dêrik pir xweşe, hêjaye pesnê,
 Çi bikim nakeve dest ji ber vê xesmê,
 Bi dil birindarin kurdên vê neslê,
 Ne ez û tu tenê hemî Cegerxwîn,
 Ma hindikin ji darên beran,
 Osmaniye, Sêvêrekî, Mûşa serhedan,
 Ji çiyaê Torosê heta deşta Rewan,
 Giş xabin, hin çêtir bizan Cegerxwîn.
 Dizanim tu zanî, welat giş xweşe,
 Hin bajar hene ku tu lê ne maşe,
 Mesele Êl Ezîz ci law keleşe,
 Bidîta bi çavê şîhrê Cegerxwîn,
 Hevalo, tu xweş bî, tim bi dilê xwe,
 Welatê bihuştî tim bi sazê xwe,
 Saz biki, di nava tiliyên destê xwe,
 Da nezan bizanin tuyî Cegerxwîn.

HESINKER

Hesinkerek şev û roj dixebitî ji dil û can
 Xebata wî zincîrek, ku naqete tu caran,
 Her carekê ku çakûç lêdixistî, dil xweş dibû,
 Imuda wî qewitir, heviya wî geş dibû,
 Çend roj hole pêşveçûn, min jî bala xwe dida,
 Zincîr hê zincîr bû, dîsa weke xwe dima.
 Bi wî çakûçê biçûk ew zincîra qerase,
 Ma tucar tê şikandin, gelo kî pê hesase,
 Çûme ez nik hasinker, min jê kire pirsyar,
 Li her pirsyara min karê xwe kir hebek sar,
 Lo mamê minî delal; kerem ke erzan ke,
 Dilopek ji derdê xwe ji minra nû şan ke,

Herçend bala xwe didim ev çakûç û ev zincîr,
 Tenê bûye derd û kul, tiştêkî din nakeve bîr,
 Heta kengê tê wusan bi reqîn û reqîn kî ?
 Xêr gunehê vê tokê ji bendera telqîn ke ?
 - Way ser çavan tu hati, lo lawikê zemanî,
 Ji xwe ez bûm çavniher, te bi xwe kir biyanî,
 Hêj hetanî vê demê ku kes ne hat bi meraq,
 Ne gotin gelo çiye ev teqîn û ev teraq,
 Guhdar bibe kurê min, tu hêjayî xuyaye,
 Sirê ji te veşêrim, ew bo min cezaye;
 Berî ya min ferztire gotina bav û kalan,
 Wan gotine "Yê bê sebir, tim tîhin û tim bê"
 Hûrik hûrik bi derziyê qulteyn dibin sar delav,
 Ev xebat û cehda min gotina bevanîye,
 Ger îro neçe serî, bo sibê hêsanîyê,
 Bi imudê ne genc tu destê xwe vemale,
 Ne ez zêde xweh bidim, ne tu bo min binale,
 Yekdest em bi repîn kin, heval dibe zilcelal,
 Bira toqa dîliyê bibe polayê zelal,
 Em vê toqa lanetî ji serê xwe biderxin,
 Hingê bira bibînin ya em gurin ya berxin.

DI ŞOREZAREKÊDA

Ez û hevalekî xwe li ser rêkêda dimeşin,
 Em ji kêra hatine, kuda diçin dipirsîn,
 Ji halê xwe dizanim em rêwînin qedîmin.
 Çiqas zeman dibore, xwe bê mal dibînin,
 Sol di lingê me ne man, peritîne cilê me,
 Neynukên me dirêjin, bûne gulî porê me,
 Tenê tiştê bi mera ku wekî berê mane,
 Keşkulê û gopalên di me ewan bi mera wefane,
 Hêstirên çavbiloq carna diket lingê me,
 Êşa di van miratan davîta ta ser dilê me,
 Gava dibû zivistan diricîfî canê tazî,
 Ku havînan germ dihat bêfêde bike gazî,
 Hêdî -Hêdî canê me qeşm û qetiş der dixê,
 Ber afatan hîn dibin, bivênevê xwe bi xwe,
 Bi vî halî em diçin bê aqilê xwe bi şûr,
 Ev rêya me bê dawî pêva diçû dûr bi dûr,

Rojek dîsan ji rojan qet hal di me ne bû,
 Ne gund û ne gundiyeke, ew cih pêda tenha bû,
 Çima şunda hinek deng hate ji nagihani,
 Lê bala xwe didime ew deng pir kûr dinalî,
 Min dil kir ku bibêjim: Mêze bike bikî hevalo,
 Meger ev jî bihîst, ku gotê :

- Ey delalo _ev çi denge dinale, gelo li vî cihê ha,
 Nebe ew jî weke me keramperê ber bi ba,
 Wusan derket texmîna hevalo jê nik te dan
 Bextreşekî kurdmanc bû dikir ax û ox û aman,
 Min jêra got: -Ey bira te çi hal û hewale ?
 Çima wusan li erdê veketî û dinale ?

Wî jî li min vegerand û got: "Derdê min girane,
 Çiroka min dirêje, bêt nivîsîn ramane,
 Ez ji kurdên serhedê, Milazgêrde gundê min,
 Ez derketî heft sale, bi hiş û bi dilê min,
 Zimanê me bû sebeb, bû telake ji bo me,
 Merovên çavsor hatin, jêra digotin rome,
 Zimanê me î delal "yaşax" kirin bi zorî,
 Zimanê xwe î di xwar bo me kirin mecbûrî,
 Êdîn curmek mezin bû bi kurdmancî xebirdan,
 Guh ne danî hedê kê hesp û sungî û zindan,
 Êdîn wusan ne dibû, me çendekan xwe kar kir,
 Li hemperê dijmin ne hespê xwe pir xar kir,
 Lê felekê bî mera ne bir serî, em qela man
 Weke nokên li kevir em li deran bê kes man,
 Dê û bavê min hemî bi kevayî wundane".
 Hevalê minî ewil xwe avête nav-

- Gelo tu qet nizani li kîjan alî mane ?

- Lo birao, zinaro, çima tu min nas nakî,
 Ez Ferzendê birame, emin jî dê û bavekî.
 Herdu bira himbez bûn bi kul û girî û keser
 Erd û ezman hejiyan, agir kete dar û ber.

TABÛTA BI XWÎNE

Şêx Evdirehman Garisî çû rehmetê
 Li erdê dinêrim dîlopên xwînê,
 Didime şopê çî bibînim ez,
 Dar û ber, kevir kiç giş dîkin şînê,
 Bê hemdî canê xwe diqirînim ez.
 Tabûtek di nava erdê bi xwîn,
 Melekan kişandin ezmanê jorîn,
 Tîrskê da ser min, libitîm, ricifîm,
 Ber çavê min reş hat, dil borînim ez,
 Ew tabût tabûta Erdrehman bû,
 Ser dinya derewîn ew yek mêvan bû,
 Ger tîrk heyat bû, cinet mîkan bû,
 Ber rehma wî şa bin hemî kur û ez,
 Lê sed heyf ji bo te ey Rehman şêxê,
 Cîqasî kurd hene ji bo te bêxem,
 Têlekî gazî bê û lêxim, lêxim,
 Ew hewar hindike jê têr nabim ez,
 Şehdat, me ne dît wusan bê ibret,
 Cînayet, xîyanet wusan bi rîqet,
 Ji bona merovê xudan himet,
 Tarîxa roja te şîn qeyd dikim ez.

DADÊ

Buhara jiyîna min bê te payze, dadê !
 Bo min diyarê cenet bê te faize, dadê,
 Çêl kewa ling şkestî li pê hevalên xwe ma,
 Çêlkew ez bim û negrîm ma qey caize, dadê,
 Dadê, pîr kûr menale, te ceger li min ne hişt,
 Dewsa kon û lorînê ah û zarîna xwe hişt,
 Girîn tîrsê dide min, xerab dike sîng û pişt,
 Êdin xwîn, kêmê dizên kanî û karêzê, dadê !
 Her çend pol û petalên ji ber xanûmanan man,
 Gelek qenc girê bide li birînên xwe eman !
 Bijîşkên me çêdîkin ji bo derdê te derman,
 Hinek ji wan sekbanin, hin jî Nafîze Dadê !

Daw ne ma me maç kir, paqij ne paqij bê dest,
 Her kê ev halê me dît, gotina "Parsekiye, geşt",
 De wer ji ber vi derdi mebe perîşan û mest,
 Ne eqil ma, ne şîur, ne ji hafîze, dadê !
 Xwerin, vexwerin tune, hebe jî, me sond xwarî,
 Pariyek bi hêsanî di qirika me nari,
 Dîtina te miyeser meke xudaê barî,
 Gav û demên me hemî, rojî ... pehrîze, dadê !
 Ji ber kêmanîyên xwe, li cem te şermî sarin,
 Tenê tu kûr menale, em ji te hêvîdarin,
 Ji çavên me yên melûl hêstirên xwîn dibarin,
 Jana zirav tov meke, eman ! Pakîze dadê !

XEWNA HIŞYARIYÊ

Ax welato, ax welato !
 Roja me zû lê hato,
 Bav û birên me çawanin ?
 Çima xeber jê ne hato,
 Îşev min dît xewnek bi tirs,
 Tu kerem ke ji min bipîrs,
 Ez carekê rest pê bikim,
 Da tu bibîn çiqas bi hêrs.
 Bayekî reş hate ji jor,
 Li ser min kire bore-bor,
 Ber girîn da kaxeza sor,
 Di nav hebûn du tayên por,
 Ez çûme cem pîrek zeman,
 Min got: Falikê vekî, eman !
 Min daye der ev ruh û can,
 Derdê minra bibî derman,
 Pîrê bo min rabû ser xwe,
 Piyana avê da ber xwe,
 Li avê xwend, li min nêrî,
 Dîsa serê xwe da ber xwe,
 Kaxez bi xwîna biran bû,
 Her du ta porên xwehan bû,
 Ma'na wan kor û giran bû,
 Ji fala pîrê nihan bû,
 Birayên me têne kuştin,
 Bi xwînên xwe têne şuştin,
 Xwehan porê xwe şandine,

Yanê çima hûn runiştine,
 Îro laşem pir dêşe,
 Qenc dizanim ji, çi dêşe,
 Lê çi bikim derman nîne,
 Ta'le tune, bextê reşe,
 Derman ku ez kifş dikim,
 Bi hêvîna xwe geş dikim,
 Ji dilbirînên wek xwerâ,
 Pelên Hewarê reş dikim
 Qedri bibêj û binale,
 Şînê girê de bikale,
 Namûs ne ma, rûmet ne ma,
 Ev çi derde, ev çi hale !?

BERDÊLK

Rabe, mêze ke, hebek li doran,
 Te xew dirêj kir, em pir li ber man,
 Êdin mezinî, lo-lo lawe can
 Rabe Bedirxan, de rabe lo-lo
 Hişyar be êdî, niha pir gence,
 Axa Kurdistanê ji tera gence,
 Paşîya xewê, bizane, rence,
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo
 Gurê dev bi xwîn kete nav berxan,
 Ma nizanî berx? berx zarê kurdan,
 Bûne armanca rimanên roman,
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo !
 Dewra felekê, eger ku kîne,
 Razan ji mera qet bi kêr nîne,
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo !
 Îroye namûs, îroye xeyret,
 Der û poxanan em bûne ibret,
 Êdî bes nîne, divê hemyet,
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo !
 Çerxa felekê, eger nesîme,
 Pêşî ku her çend kozik kemîne,
 Çavê xwe veke, xwedê kerîme
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo !
 Çîman nabêjî gelo çi hale,
 Sebra me ne ma, binal, bikale,
 Rabe, ji mera meydan kemale,
 Rabe Bedirxan, de rabe, lo-lo !

Sala 1957 havînê li Moskvayê Fêstivala cahilên dinyayê bû. Ji hemû welatan, ji welatên Rojhilat û Rojava xort û keçên dêmokrat, aştîxwez ber bi Moskvayê dihatin, kom dibûn ku bibin nasê hev, bibin heval û hevkarên hev, yekdeng bin, yekdil bin bo xatirê dostî, hevkarî, biratî û aştî li nav miletan û welatan li dinyayê. Hingê xort û keçên Kurdistana dabeşkirî (parçe-parçekirî) berê xwe dabûne welatê Sovetê, ber bi Moskvayê dihatin. Hingê Qadrîcan jî tev wan di hate fêstivalê (mehrîcanê). Ewî ji bajarê Adêsê ji minra birqî (têlêgram) bi kurmancî bi van xeberan şandibû: "têda nivîsî bû "Ez Qadrîcanîm, tevî xortan tême festivalê dixwezim te bibînim".

Wî wextî kurdnasê navdar akadêmîk Î.A.Orbêlî serokê Înstîtûta me bû, mabeyna min û wî xweş bû, min têlêgrama Qadrîcan nîşanî wî kir, jêra xwend. Ewî ji min pirs kir "Qadrîcan kîye?" Min got: "Şayrekî kurdaye, dêmokrat û pêşkevtîye, ji Siriyê tê fêstivalê, îznê bide ez herim Moskvayê, dibêjim gelek xortên kurd tene fêstivalê, hewas dare ez wan bibînim". Orbêlî got: "Baş, ezê te birêkir bikim, here".

Sibetira din ewî ez birêkir kirim, ez çûme Moskvayê, Qadrîcan û xortên kurdan bibînim. Ez çûme mêvanxana nimûnga malhebûna gundîyan. Me hev dît, heta 70-80 xortên kurdan ji Sûrîyê û Iraqê hatibûn.

Du-sê rojan ez û Qadrîcan tev hev digerîya, got û bêja me li ser pirsên kurd û Kurdistanê bûn, li ser armanc û bernamên kom û komeleyên kurdan bûn. Ji wan pirsên ewî jî minra gilî dikirin, pirsên here bi hewas û întêrê ew pirs bûn, ku ewî digot: "Niha li nav welatên Rojhilat û Rojava deng û bas belav dîkin, ku Amerîka dixweze Tirkîye bide înakirinê, ku ew qayl bibe parçên Kurdistanê bigihinne hev, bi serkarîya Tirkîyê hukmeta Kurdistanê serbi xwe saz bikin, ku ew hukmet bibe hevkarê pakta Bexdadê. Dibêjin, niha serok û serwerên hukmeta romê bi vê meselewa mijulin, e'ne'ne dîkin". "Pirsa duduwan ewe, -Qadrîcan serda zêde kir got: "dibêjin, ku Amerîka wisan jî dixweze li Wanê ûnîversîtê bi kîse xwe veke, lê heta niha Romê qay lîya xwe ne daye".

Min got: "Hevalê delal, bi fikira min Rom qet tu caran bi

van daxweze Amerîkayêva qayil nabe. Lê eger qayl be, wusan bikin, eva yeka jî kurd û Kurdistanêra başe yan na, tu çi dibêjî?"

Qadrîcan got: "Ez jî bawar nakim, ku rom qayl bibe, lê bi rastî gotî eger qayl bibe, ew baş dibe, Kurdê bigihîjne hev, qewata wan wê mezin be, bibe yek, hukmeta wan wê hebe, bona paşrojê eva yeka bo azadî û serxwebûna kurd û Kurdistanê wê bere-bere ber bi dêmokratî û sosîalistîyê herin, xwe heta-hetye tirk û Amerîka namînin hevkar û dostên hev, Amerîka dixweze welatên rohilat rake pêşberî Sovetê, Sovet ji nikare vê yekê bihêle, di vê meselêda em heval û piştîvanên Sovetêne, em baş dizanin û bi çave xwe dibînin, bi guhên xwe dibîhên, ku di vî zem zanîda her Sovetîstan azadkerê milletê bindeste".

Pirsa duwemîn ya here bi hewas û înterês ew pirs bû, ya ku Qadrîcan ji minra gilî kir. Ew pirs pirs partîyên kurdan bûn. Ewî got: "Niha sê partîyên têkuşerên kurd hene. Ew partî evin: Partiya dêmokrat ya kurdên Surîyê, partîya dêmokrat ya Kurdistanê Tirkîye, partîya dêmokrat ya Kurdistanê Iraqê. Tevgerêdana her sê partîya bi hevra heye, di armanc û bernama xweda ew bi hevranin, her sê partî dixwezin Kurdistanê azad bikin, Hukmeta dêmokrat ya netewe saz bikin, bibin heval û hevkarên millet û dewletên pêşkevtî". Qadrîcan andamê partîya dêmokrat ya kurdên Surîyê bû, ev melûmetî û gilîyên din, yên ewî derheqa kurdan ji minra gilî dikiirin, bi min xweş dihatin, gotinên wî, fikir û ramanê wî pêşkevtî bûn, ez şad dibûm, ku merivên wusa li nav kurdên derva hene, min ji xwera digot, dibe merivên mîna wî niha li nav kurdanda gelekî û çaxê çavê min bi xortên hatî diket, ez şad dibûm, min jî xera digot: "şikir şikir" kurd hişyar bûne ber bi rîya azadî û serxwebûnê di çin, dixwezin bibin heval û hevkarên welatên dêmokratî-pêşkevtî. Paşroja kurd û Kurdistanê li destê xortên kurdanê, ew gulistana her demîne, ewê reng û rûyê welatê xwe biguhêrin, Kurdistanê rewşen bikin".

Bona rastî hev hatine û hevbînê, bona bîranînê min û Qadrîcan me şikilê xwe bi tevayî kişand û ewî deftera çend şêrên xwe yên çapnekirî pêşkêşî min kir. Her çend heta niha ew şêr bi kurmancî ne hatine çapkirinê, ez wana gîşka li vê xebata xweda bona xwendevanên me delal çap dikim. Ji

wan şêra, şêra wî ya bi sernavê "Ez diçim Mosko" wextê Fêstivalê bi rûsî hatibû çapkirinê û li rojnama "Îzvestîyada".

Navê wan şêra evin: "Ez diçim Mosko", "Begê axirzeman", "Rî ya teze", "Gula Sor". Her kesê van her sê şêrên wî bixwîne, wê bê ser wê fikirê, wê remanê, ku Qadrîcan bi wan şêranva derdikeve meydana şêrê têkuşêrên hemû neteweyên bindest, ku ew ji mîna Cegerxwîn bûye bazê serbestî û azadiyê, bûye heyloyê bangavazê dostî, hevkarî neteweyan, bûye dengbêjê aşîtiya nav dinyayê.

ŞÊRÊN QADRÎCAN YÊN DESTNIVÎSAR

EZ DIÇIM MOSKO

*Bi agirê dilê zahîdeki diçe heca...
Bi hewesa evindarê ber bi delala xwe diçe,
Bi arzûya zarokî radipelike diya xwe dike,
Ez diçim Mosko.....
Devê min, dilê min her zere ê laşê min dikeve,
Her sê zarokên min li dora min dicivin,
Ji min diyarîya Mosko dixwezin.*

X X X X

*Swarê geştê bûm,
Teva pêncêd hevalî,
Her yek ji wan ji min bêtir bi heyecan,
Hinek ji wan erebin,
Hinek ji çerkes, kurd û ermenin....
Lê hemû yek ziman û yek dilin,
Zimanê dostanî, aşîti....
Weke bira diçin Mosko....
Stran, govend û dîlan,
Ji cuş û xuruşa wan ra,
Pêl û masiyên deryayê minêkar,
Bi vî ahengî em gihîştin Derdenêl,*

Paşê Istembul,
 Diyar û bajarê Nazim Hikmet,
 Nazim Hikmetê zarok di wê derguşêda
 Hate hejandin
 Diya wî a muhriban li wir,
 Ji Nazimê zarokra loriya azadiyê dilurand,
 Dengê Nazim Hikmetê mezin li wir,
 Li himber istibdadê kire gurmin ...
 Lê fro'ev diyar hezîne,
 Ji dorketina kurê xwe ê fedakar, wefakar...
 Û dinale ...
 Di bin lingên Emerikan û niştimanfiroşan

X X X X

Em gihiştin "Odesa" !
 Mehşera biratî....
 Giruh-giruh xelk, jin, mêr, pîr û zaro
 Li bendê me bûn,
 Mina kerîyê berx û mîyan
 Em li ser hev keliyan,
 Me hevdu hemêz dikir,
 Me hevdu maç dikir,
 Ji çavan hêsirên kêfxweşî û dilgeşî,
 Diherikîn ser rûyan....
 Dengê "Bijî aşîti û dostanî"
 Diçû ezmanan ...
 Ev hal li ser rê, li her bajari,
 Heta Mosko wusan bû
 Di nav welatekî buhuştin,
 Însanê wek Melekan ...
 Dil saf
 Dev bi ken ... rû bi kenin
 Nizanim çawan destên nasîyên ehmaq
 Li van digeriya
 Xoş, paşê destê wan jî
 Lingê wan jî hate kişandin, ya
 Mucizê jî eve ...
 Gava dijmin destê xwe
 Dirêjî vi welatî dîkin,
 Berxê vî welatî dibin şêr,

X X X X

Ez gihîştîm Mosko
 Bi germiya dilê zahîde gihîşte hecê,
 Bi hewesa evîndare gihîşte
 Hembeza dêla xwe
 Bi heyecana zarokî radîpelke memikê diya xwe,
 Ez gihîştîm Mosko

MOSKO 26.7.1957

BEGÊ AXIRZEMAN

Dostê min !
 Dijminê postê min...
 Begê axîrzeman ...
 Ew zenbîla tu pê hatî,
 Nema datê ji ezman.

 Benê wê rîziya,
 Li nava rê qetîya,
 Û ket
 Ket nava derîya sor,
 Derîya sor jêra bû gor,
 Derîya sor
 Ji têr xawen û çend xudayê biçûkra
 Bû kefen
 Musa û mirîdên wî hemî
 Bê pir û bê gemî
 Ji wê deryayê derbas bûn,
 Ji cewr û cefayê
 Li wir xelas bûn.
 Nemrudê biçûk
 Me bi agir ditîrsîne,
 Pif meşka vala
 Ey kevnare ê sala ...
 Bawarîya dilê me,
 Taqeta milê me
 Ji îmana Ibrahîm bêtîre,
 Ne kêmtîre

Vêya bizan,
 Ey pexemberê dizan,
 Dostê min,
 Dijminê postê min,
 Begê axir zeman
 Ev zembila tu pê hatî,
 Nema datê ji ezman.

Meznatî

Ne bi pare û male,
 Ne jî bi germâ kale,
 Meznatî

Bi cewherê insane,
 Bi ilm û bi irfane,
 Belê, em xizanê malin,
 Lê zengînê kemalîn,
 Zingînê îdêalîn

Koşka te a him -vala,
 Ya bi neynûkê pala
 Ên bi xayîn,
 Ên bi birîn

Te ava kir û di binda rûnişt,
 û gelek reben ji birçîna kuşt,
 Ewê li ser serê te hilweşe,
 Ger çi dilê me bi te naêşe,
 Lê em dixezin,

Bi dil dibezin,

Zaro ên te ên bi guneh,

Ku bi hejmar hene neh -deh ...

Ji wê talokê xelas bikin,

Di rîya rastra derbas bikin,

Rîya rast rîya me,

Ewe pexemberiya me ...

Zincîr şikandin,

Armanc gihandin,

Babilûskan bistan,

Dîroka ristan

Dibêje :

Bibêje :

Guh mede efsane yê dêwan,

Bi şûnda nemîne ji karvan,

Karvanê medeniyet,

Guruhê beşerîyet,

Xulase,
 Pêşi û paşiya filosofe,
 Filoşofiya me
 Eve
 Dîn, mezheb îman
 Bibe insan, bibe insan
 Dostê min !
 Dijminê postê min
 Begê axir zeman,
 Ew zembila tu pê hatî,
 Nema datê ji ezman...

GULA SOR

Gula sor
 Hil bû jor,
 Bîn da dor,
 Gula sor
 Gula sor
 Li paş çiyayê Qaf şîn b
 A'lem jêra evin bû,
 Gula sor,
 Bi me xweş,
 Da me heş,
 Em bi bîna wê sermest,
 Emê pê şa bin serbest.
 Nazenîn
 Xemrevîn,
 Xemilîn,
 Pê zemîn,
 Guleke bê kelemê,
 Di nav baxê îreme.
 Gula sor,
 Em lê dor
 Bicivin,
 Bîn bikin
 Dor bi dor.

RIYA TEZE

Ew perdeya reş û tarî,
 Ku ji şevên reş diyarî,
 Min ji rûyê xwe kişand
 Li ber çavên xwe çirand
 Ê avît

Avêt paş sed çiyayê
 Nava hezar dergayê,
 Min gemara guhê xwe
 Bi zimzimeke nuh şûşt,
 Ê meqrobên canê xwe
 Bi dermanekî nuh kuşt,
 Ew kufîka tufeylî,
 Ku di dilda diçerî,
 Min ji kokêda rakir,
 Hêlîna wê xerab kir
 Ê belav kir

Li rojên derbas bûyî,
 Li rastîyên kevnare
 Li hevalên ne heval,
 Cara pêşin silav kir,
 Ew zingora di mêjî,
 Ku mejîyê min dimijî,
 Min bi kêrê xeritand,
 Ê bi agir şewitand,
 Ê paqij kir

Paqij kir ji serê xwe
 Min avêt ji derê xwe,
 Bi çavekî bê perde,
 Bi guheki bê gemar,
 Dibin ser rêke teze
 Bi mejîkî bê zengar.
 Edî bi dîtina xwe,
 Bi bihistîna xwe,
 Bi vîna xwe û bi mejî,
 Bi rêveçûna xwe jî,
 Ez bûm insanekî nû
 Peresteşê oleke nû
 Ê di bajarê dilda
 Min ava kir holek nû.

(1936).

NALÎ (1797-1855)

Navê wî rastî Mela Xidir bûye, kurê Şawayse bûye, li sala 1797 li Şarezûrê, gundê Qeredaxê ji dayka xwe bûye, li pêşîyê li Sulemanîyê cem Mela Ebdileres hîn bûye, diçû xanê qa Mewlana Xalid, paşê li Şamê, du-sê sal maye, li wê derê bîra şêherê Sulemanîyê dike û şêrekê bi navê "Qurbana hinek rîya te bim..." dinivîse. Paşê ji Şamê diçe Stembolê û li wê derê dibe nasê gire-girê kurdan, dibe nasê Ahmed Paşayê Baban û derheqa wîda şêreke kurdperwerî bi navê "Ta felek dewr neda ser, kewkeka wî ava ne bû", dinivîse.

Di xortanîyêda dilê Nalî ketibû qîzekê, navê wê Hebîbe bû û ewî gelek şêrên dildarî derheqa xwe û wêda nivîsîne. Edebyetnasên kurd Aladîn Sicadîn, Gîwî Mukrîyanî û Maruf Xeznedar û yên din, Nalî hesab dikin binyatdar û binexedarê edebyeta kurdî klasîkî yê edebyeta kurdê Iraqê.

Şêrên Nalî bi piranî şêrên têkelin (tev hevin), ew hem yên dildariyêne, hem jî yên wetenperwerîyêne. Ji ber êşa dildariya xwe û ji ber derdê negbetîya milletê xwe ewî navê xwe şayrî kirîye "Nalî" li şêrên xweda bo wan ew dinale.

Di sala 1857-da li kovara Asiaticque-da miqela Xodko "Etude philologiques sur la langue kurd"-da (dialecta Suleimanie) çap bûye. Xodko têda nivisiye: "Merivek ji Suleimanîyê hatibû Parîsê, navê wî Ahmed Xan bû, ew bi xwe, eslê xwe ji binemala Bebe bû." Paşê ewî nivîsiye: "Bi gotina

wî li Sirîyêda, di Şamêda merivekî gelekî xwendewer dimîne, navê wî Mela Xidîro, navê wî edebîyetî Nalî Efendiye, ew rind zâravêd Kurdistanê dizane, ewî ji zîmanê erebî rê zmana erebî tercîmeyî ser zîmanê kurdî kiriye. (binêrê journal Asiaticque, avrêl-may, 1857, cinqueme serie, tome IX, Paris).

Li jêrê ez çend şêrên Nalî yên dildariyê, wetenperweriyê çap dikim, ku xwendkarên me bixûnin.

AX LI CEM VÊ HEBÎBE

*Ax li cem vê hebîbê, pêbenda serê wê tune,
Ne şekir gende, bejna wê bilinde, qendê wê tune.
E'deteki wê heye: get car ji kesî napirse,
Zalimeke bedê, get xeyfa xweda rînda mîna wê tune.*

*Dayme derheq min sirke firoşê, bi rû,
Derheqî xeyrî min xêra şeker xendî nîne.*

*Xanaqa wê ji mezin wek meyxana kahreba,
Meclîsa wê heye, lê gep û gubendî têda tune.*

*Dilbera mine, meşhûre bê hevtayî,
Bê şîk şehbê xweda şahdê manendî wê tune.*

*Ehlê dînya li ber hîrs û time' hişyarî,
Bi xusûsî bigere mest û xîremendî nîne.*

*Medresa mîhbeseyê mîbhîsê pir weswese,
Kesê têdaye, lê amadî xuresendî nîne.*

*Talibê rahê hicazî, ji mixalîf hildîn,
Bê neva qelbê hezînim, gewata bendî nîne.*

*Şêrên min ku ceger guşêd minin, der derin,
Dilê Nalî çî reşê, get xema ferzendê nake.*

(Diwana Nalî, rûpelê 64)

WERE QURBAN EM HERDU BIBIN BIRA

Zivistanê dilşkestî berd û serma me,
Havînê ceste-ceste derdê germa me,
Ji çeka bê qab du çekin biruyê te,
Îzna min tune, dûr û der bi der mam.

Li hêlîna zemînda mîna ştur murx,
Ez li lana qudsada bê bask û per mam,
Demeke welle ser pê yek dilşewitim,
Were, qurban, bi can em herdû bira bin.

Tu bê mader û ez bê pider mam,
Alîkî qurbana gerdena te bim, eger mam,
Li dara dinya tehsîl marîf,
Mîna Nalî cehil û bê xeber mam.

(Dîwana Nalî, 25)

EŞQA BÊ DIL DINALE

Eşqa bê dil dinale, mêla wê girîne,
Bê şîk trişqa e'wr teviya barane.

Ji çavan wext-wext diriye ava saf û xûna geş,
Hêşir dur û mircana deriya Amane.

Mehê lehzekê çavê min û çavê wê hev nedîne,
K'ê dibêje mêla însanî wek wehşîya xezalê.

Esmanê husnê mehbûba min li birû û zîlfê rûyane
Du hîlal û du şev û du mehê tabanîne.

Wehşîyê ji me ji ber te'nê reqîbê segsîfet,
Raste herzî ruhê wî bo waswasê şeytane.

Dil meşk bû li ber êşan û nişana bijangane,
Heyfe qurban, axir eva nişana êşane.

Ew rûmeta xwe vedişêre bi çînê zîlfane,
Heta ji rojêra jî dibêjin ew şeba' şebustane.

Tu eger rabî, li cî bisekinî, dêw û kafir bî,

Wê bêjin: Bê şik qiyamet raste, rabûna wê serî.
 Farsî, kurdî û erebî her sê min girtin bi defte
 rî,
 Nalî iro bûye hakimê milkê sê diwanê ber malî.

EZÎZA MIN

Ezîza min, rûhê şîrina min, du çavê min,
 Dawa birîna dil û kula cerga min dikim.

Tu jî ji min gede dada min bipirse,
 Eger nedî, destê min be qetla min.

Li roja axretê bê penavim,
 Di salêda serê zilfa te ser rûtim.

Rûtim her rûtim û mêla bê tawim,
 Libatê xûna xwe razîme bi maçê.

Maçê bide heta ez zêndî û mame,
 Ew nişana mirna mine e'yane.

Ez xerêqî xem û xûn zoxavim,
 Min mekin me'nî ji şiven û reqîban.

Mehzîn û xemîn û dilşkestîme,
 Nalî, umuda min qetîya ji jîna min,
 Şewitîn hemû cerg û hinavê min.

(Diwana Nalî, 21)

ZILFÊN TE VEMEŞÊRE

Bo wî kesê dinê te nûra dil û imanêye,
 Zilfên te jê vemeşêre, ne kafirstaniye,
 Dil hem rege, hem jî asane, dûre ji te,
 Nayê ditin li kîjan cî te qasekê daniye.

Te got ji avazê sirşkê min giraniya guhare,
 Xaflî ji vê durê behrin û eqiqê kaniye,
 Rûmeta te şima şevê wek dilê min perwaniye,
 Çemê e'yn û roja eyde, rû hekim qurbanîye.

Dûrî te be, Nalî sekê bêwefa herze goye,
 Bo çi gazi wî kelbî nakî, ku nanê nanîye

EGER NEMIRIM

Eger ez nemirim vê carê bê te,
 Şert be naçim heta vê jêrê bê te.

Hinavê min xaliye, mîna ney dinale,
 Hewareke çi pire, heware bê te.

Qesem bi vî şertî be, didara te gulale,
 Şeraba min e'ynî jehra mare bê te.

Li cem te xar û xes' gulzare bê te,
 Li cem min xirmanê gulxare bê te.

Çavê min korin, nabînin tu kes,
 Birûyê min yek-yek tîrê bizmarin bê te.

Bira li cem te bibin nas û ecnas,
 Kes li vî şehêrîda nîne bê te.

Hemû rojê ji taw hicrana vê salê,
 Wextê mirna pêrare bê te.

Heta tu bûyi nasa min, bûne nasê min,
 Ew nika mû bi mû striye bê te.

Çavê Nalî husreta ser û bejna te,
 Dû cewin, belkî du rûbarin bê te.

(Dîwana Nalî, rûpelê 64)

AGIRÊ EŞQA TE

Li dilda agirê eşqa te mîna çirûsa tendûrê,
Çemê hêstra nebe mane, dişewtim, dibme çiyayê nû
re,

Bi ava çev, agirê dil cesed mîna hesreta Mûsa,
P'êla behra Faraon û refîqe agirê Tûre.

Diçe cem reqîb xweşe, lê wê daxê ez kuştim,
Li cem wî çend mecbûre, li cem min çend mexmû-
ru,

Peyama te hat, got: " Rûyê xeyalê min şande du
Geye,
Resûlê min kete rê, gir kira nav mîna agirê şo-
re.

Ku min dît şiklê sed reng, min got: "babaye e'ya
re",

Ku min bihist gotina bêdeng, min got: " Şepûre,
Şepûre",

Min got: " rastî seba heste", got: " Meşreb mi-
xalife",

Min got: "Agirî", got: " Baye", min got: " Raw-
çiyî", got: "Dûrê".

Min got: " Qurbana te bim", got: " Qurbana te
se be",

Min got: " Şîşa dil tu naxwezî?" got: " Bo çime
meskure",

Xerabetî dile, Nalî ferman meke, cî tune, nayê
Bi mirna te qesem çavê min, bi zikra te beyta
mee' mûre.

LI HEMÛ ALÎ MÊLA ŞER Û DA'WAYÊ

Min bihist li hemû alî mêla şer û da'waye,
Sewda li ser mindaye, baka min çi li xewxewaye,
Fermana bi bijangê mestî azad nêw ter destî,
Sade ji dilsistî tîra temenyaye.

Çerxa çepî gerdûne, rast û çepî çendûne,
Bê çakî çi bê çûne, rastî ji çepî nayê,
Gote min: " qencî meke, çak çakim, pêşxizmçeta
zor çakim,

Kerem ke bi serê kakim, daxa te li dilê minî-

Zahid meke me'ni, dil bê te ne wêslê dile,
Axa te bi ser xafil ketiye, çi sêwadayê,
Nalî meke wêsfê te barîkî nemamê te,
Me'lûme ku ser wî te meşhûre li dinya.

BO ÇI RÛTÎ

Bergê dinya çendek kurt, kevn û bazariye,
Çimkî nagihîjî kevnê diwana jê a'riye,
Min ji bê bergî Minê pirsî: "Bo çi rûti?",
Got: Ya rebî, şêr bim eger şad bim bi bergê a'
riye

Xelata teşrîfa her kesî be, çiye xeyrî kefen,
Her ewe hem faxre bo axretê yek carîye,
Gença rehet tacê ezet xaricê me'mûre,
Kunde bû her bange-bange, hudud jî heware,
Pêş bikole a'mrê ferman kir ku wa puxtebûn,
Gote: " ser serê çîyan gelek çatir li taqê şe-
her,

Qûş-qûşrawik nebe murxê kulane û axure,
Seg-segî teze nebe gavî bine enbare,
Ferqa kusaran ji pasaran defer morê wek çiye,
Wek ezîzê baz û wek bê hurmetê pasariye.

Sihm ta ce'be noşîn bê gune zerdî xelwete,
Qews ta çiley guzin bê her êsîrê xware,
Tezmî Nalî renga her kes bê bêy bike guh,
Çimkî nezmi saf û her wek mirdariye.

Ta felek dewr ne da û sed kewkebey ava ne bû,
Kewkebey mîhrê mubarek ta'îlî peyda ne bû,
Ta negiriya esman û tem û welatî da ne girt,
Gul çemen ara ne bû, hem lêvê xunçe vane bû,
Ta çemen pêrane ser eslî dextî ne da alîkî,
Ferey teze û xurem û berzî bejn bilind ne bû,
Ta Sulemanan ne bûn sedrî textê axret,
Ahmedê Muxtarî vî şahî text ara ne bû,
Qezey perde û kinayet xweşe, şahê min keva,

Adîlek bû , qet edil wa li dinya me bû ,
 Wek nîşangê murxê ruhê wî kemalî fitrete ,
 Cîyê xweştir li yaxê cinnet Almava ne bû ,
 Wek qiyasekî kêr şêr be , netîca wî bê cî bû ,
 Hemdulla şah kemala cî bû , xalî cî ne bû ,
 Şahê cem ca nalîya (tarîx cim) tarîxiye ,
 Ta nalî li vê esrêda Îskenderê cem ca ne bû .

xxx

Dil sîya seng nebe , mêla wî axa wetene .

KURDÎ (1809-1849)

Navê wî Mustefa begê kurê Mehemed begê Ahmed bege, ji qebîla sahibqiranê xelkê Sulemanîyê bû, Di zarutîya xweda li cem zanyarêd şêherê Sulemanîyê hîn bûye, hewesa wî gelek bi nivîsandina şêranra hebûye. Navê xwe şayîrî danye "Kurdî", şêrêd xwe bi kurdî, farsî, erebî û tirkî nivîsîne.

Li welatê Kurdistana jêrîn gerîyaye, çûye Sinne, Sablaxê û Taranê. Li Taranê bûye mamostayê kurêd şahêd eceman, di çû civata nivîsvanan.

Kurdî hevçaxê Nalî bûye, şêrêd wî piranî derheqa dildarîyê hatne nivîsandinê, her şêrek derheqa palamarîya(êrîşîya) tirkan li ser baban hatiye nivîsandin.

Li jêrê min çend şêrêd wî yêd evinîyê û şêra wî derheqa palamarîya tirka li ser baban guhastine ser kurmancî.

XWARINA MIN JEHRA MARE

*Xwerna min fro jehra mare, şîrna min ne hat,
Bîrîna min kevn hate jan, melhema birîna min ne hat*

Min xem xwar, xemê jî xûna cegera min xwar,
 Lema girîyam, çend bi çend hêşra min xûnî ne
 hat,
 Xemê serîk li min da, yarê qet serîk li min ne
 da,
 Sebir û hişê min çûne, xaretgera dinê min ne
 hat,
 Dil dişewite çîn bi çîn, dikişê ser hev wek ne-
 fer,
 Xudana rû agrîn û zulfê çîn-çîn ne hat,
 Dide wek hevriya beharan xûnê digirîne û seda,
 Kenîn û xûnça nû sebze perjîna min ne hat,
 Guh sera min çewganê mihnetê da ber xwe revand,
 Wey ecêb, bo şasiwarê xan zîna min ne hat,
 Ketme wextê mirin, xemê ez xistme halê xer-xer,
 Kurdî bê kes, ez bi xwe, qet ji cîkî seda şîna
 min ne hat.

TA KENGÊ VÊ CEWRÊ

Ta kengê vê cewrê û cefa te çav xumarê soxme al,
 Dil ji hîcr û firqeta te sotiye, reş bûye wek
 zoxal,
 Çavê te mest û vêl hem şîvav û weşşî kirim,
 Qed bi qed qet ne maye aqil, fdrak û kemal,
 Banê çavê min bareşî xem wa li ser çîya ketiye,
 Xûn berjêr lê dadeçe wek dilopa wêran mal,
 Dilbere wa pir kemal û aqil û danişkê min heye,
 Wa min dizanî bêkemale, çimku tifle û xurd sal,
 Ey tebîb, eger tu tematê zamî, derdê min çare
 ke,
 T'ake germe-germ bo min peyda ke şehdî û sal,
 Aşîqî xweşe, ne wek bo min xerîbê qur bi ser,
 Dilbera min wek dijmin û ez bi xwe bê kes û a-
 şifte hal.

TE EZ KUŞTIM

Kor bûn wek Yaqub, bi xuda, dîde ji bo te,
 De bişîne wek Yusif besfay dîde be ji bo te,
 Dil ku li ciyê xwe bû, bi agirê xemê hicr te so
 tand,
 Bo çi bi destê xwe vî agirî dixî li nav menzîla
 xwe?

Dil bi des tirkî du çavên çê dibû halî eger,
 Li serê tîra mijangê te, tîra birûyê te,
 Bergê wê rût bi hezar xerqê sadi nadim,
 Çimkî mehbûba bi naz dibêje min: "Carna meçe",
 Min qot: "Te ez kuştîm, wê sebrê bi deng dibêjî"
 Kevne kurmanc vê salê beled bûm ji derewê te,
 Şemiyê meyhanê fitîla wê ne bû heta dûhinê şî-
 kir,

Şêxê me bi şerab delqê gedayê difrot.
 Ku reqîb dît ez û yarê bi tev rûniştî bûn li ri
 gan,

Wek segê gurî girijî, dev û lêv lev danî,
 Dilê Kurdî giriftarê cepa qirmizî.
 Bo çi dîkin bi me'nî bi xûna dil, eger berg di-
 soze,

Bi dawa rût û danê ser rût,
 Giriftarê dilê wê aşiqê rût,
 Nigara çavê mest-nîvê xema te bût,
 Hazarê wek min ewê xistiye nav tabût.

EZÎZNO EZ EWARÊ CEM WE

Ezîzno, ez ewareme cem we,
 Ji mezluman li çolê, li welatê we,
 Hûnin padşahê lefz û edalet,
 Bi xuda heyfe birencînin gedê we,
 Eger çi xak û xolê rehguzarim,
 Bi tefsîlat bibînin macra we,
 Ku ez çûm cehnemê pir mekin jî min,
 Ji min xalî mekin koşk û sera we.
 We cefa da min, we ez kuştîm bi zarî,

Nizûlî rehmete cewr û cefa we,
 Ez mehwi bibim rojê du sed car,
 Bi qurbanê geda û padşae we,
 Mebêjin sûd ne bû ji rûyê cehnema min,
 Serê min li qelxane, bo tira wê qeza we,
 Neşimî koyî tu xatir diki cem
 Bona tira pêşîva paniya we,
 Ezim serkarê wê bo leşkerê xem,
 Ditirsim ez herim, bişke sipa we,
 Eger şer be, eger dil be, eger ruh
 hemû çûn, çiye êdî tema we,
 Sefera me çû, kê rê hat û ne hat,
 Dua bo me bikin, hun bî xudaê xwe,
 Lava kurdi waye car-car
 Binin bîra xwe mehbûba riya we.

DIL XEMGÎNE

Dilhinav brîndare; dil xemgîne bê te,
 Serê min gêje, canê min bê cane bê te,
 Xewa min bê hişîye, bergê min palase,
 Xureka min xûne, şadiya min şîne bê te,
 Ji çav îşq û ji dil ah û keder bê te,
 Te tîrê tofane, ba û barane bê te,
 Ciyê min sehra ye, wehşyarim û hev dem,
 Dirk û refş û gewene balgiyê bê te,
 Ji îşq û aha sar û awîna dil
 Cemala zer û reş rengîne bê te,
 Serê min mestûr û singê min cenge, dil-def,
 Xefet yar û megam nalîne bê te,
 Kebab-dilxûn, meyê saqi-feraqê te
 Qedeh çav û mezem esrîne bê te,
 Hinav-gulzar û xun-gul, baxevan-dil,
 Fuxan-bilbil, cefa perjîne bê te,
 Zivistan mêla te, payz birê min,
 Biharê em ûmûdin, havînê bê te,
 Awa ez bûm şa û siltan û walî,
 Tu xwedê, can get najî bê te.
 Sae'qe û bergî niहुset zîlmetê da şerq û Xerb,
 Berdebarane bi xusûsî li ser milkê Baban,
 Çavê ibret tu hilbire, ey dil li wezî behrî dun
 Seyrê wê ke çawan felekê çi kirye bi zumrea
 kurdziman,
 Çavê ser kin, bê neva wan nan û nemeta we bir,
 Lûle û sîfre û newale wun bûne zerf û xan,
 Cimle sadat û mela û hacî bi la şîn ken bi sewz
 Deftera ehlê wazayf ser hefta pê kirin pê pan,
 Dil ji mihnet keylemeyîê seyrê nav şêher nîne,
 Herdu çavê min xûn jê tê ji daxa tîrkan,
 Bê zîman koma jinan her xanedan tê difikirim,
 Qewmê kurdan girî dîkin bo axa û mezinan,
 Nivî bend kirin, nivî kuştin, nivê wan sirgûn
 kirin,
 Kol be doş, xerqe poş bin, tac û keşkul hilgi-
 rin,
 Rû bikne eflakê, bedxû biçne şêherê xamûşan.

QADIR KOYÎ (1815-1892)

Hacî Qadir Koyî li gundê Qoreqeracda li herîmê Koyê sala 1815 ji dayka xwe bûye. Di biçûktîya xweda bêbav maye, ba vê wî miribû, dayka wî ew birîye Koyê û bi arîkariya axa û begên dewlemend û xêrxwez daye ser xwendnê. Ew li mizgefta Koyêda li cem mele Ahmed Gunbetî tevî Mehemed Gelîzadê hînîxwendnê bûye û navê feqîtiyê standîye û bi feqîti gerîyaye, çûye Xoşnavê, Serdeştê, Erbîlê, Kerkûkê, Sulêmanîyê, Sabilaxê û Şîno.

Li cem merivên zana û ulmdar hîn bûye, navê mela standîye, bûye mela û bi navê mela li Kurdistanê gerîyaye, çûye Stembolê, li wê derê bûye nasê gire-girên kurd û Kurdistanê, yên li wî wextî li ser qulixa hukmatê bûn û komên rewşenbîrkişna kurdan û serbestîya wan saz kiribûn. Li Stembolê Qadir Koyî bûye nasê şervanên azadkişna Kurdistanê. Çend salan bûye mamostayê kurên Bedîrxan paşa, li mala wî da dibe nasê nivîsara Ahmedê Xanî, destana wî "Mem û Zî-nê" dixûne û pêşgotna wê gelekî bi wî xweş hatîye, bîr û bawara wetenperwerî û mîletperwerîya Ahmedê Xanî li dilê û aqlê wîda rûniştne. Ew dibe xemxurê mîletê xwe, şêrên xwe derheqa halê mîletê xwe, derheqa paşketna wîda nivîsîne, di şêrên xweda ew derdikeve meydana rewşenbîrkişna mîlet, meydana şerê azadkişna mîlet ji bin destê şêx, pîr û axa û begên kurd, ji bin destê hukmeta romê û Îranê nîşan dike. Mîna Ahmedê Xanî mîlet şîret dike, ku ber bi xwend

nê herin, li şerên azadkirna xweda yekbin, raberî hev şer nekin, bi tifaq şerbikin bo xatirê azadkirna kurd û Kurdistanê.

Qadir Koyî şerên xwe bi soranî(kurmanciya jêrîn) nivîsîne ez çend şerên wî bi herfên latîniya Celadê Bedirxan bi kurmançiya jorîn li jêrê dinivîsim, ku xortên me delal wan bixwûnin û bibin nasê bîr û bawara Qadir Koyî - şayrê kurdan navdar û peyketîyê Ahmedê Xanî.

HETA KU LI HEVNEYÊN QEBÎLÊN KURDA

Heta li hev neyên qebîlê kurdan,
Her wê ha bibin xirabe mal,
Hemû dinya mezin û biçûk,
Xemilîye bi milk'kê wek bûk,
Yekbergin, yekziman û yek reng,
Bêxeybet û bê a'yb û a'r û bê deng,
Dinya bi tîrên dixun û didin,
Her çi meremê wane, dîkin,
Her kurdin, t'enê bi p'akî merdin.
P'amalî zemanê, mehsusî k'urdin.
Her mane bê deng û mezlûm,
Mîna e'rdê xerabe zarê me'sûm.
Ger basê vê dipirsi k'îjane,
Şerteke ku bû, hemû temane.
Ew şerte bi k'ullî îtfage,
Ger Mere'ş û Wanê, ger Îraqe,
Qesreke awaxî ew îtfage,
Ger wa ne be, her bi tage.
Sed şêx û mela û mîr û xanî,
Bo lezeta îş û zîdeganî,
Li vî alî wan bi hîlebazî,
Li wî alî wan bi teqlebazî,
Qir kirin hemû li welatda,
Heta milk û reya fewta
Çi te kir, wan ne kird;
Xema wan nî bû ku mirin hemû kurd.

TU WERE HÎNÎ FEN BE

Tu were hînî fen be, çi te li wiye,
Gawure, hinde ya xût cihûye,

.....

Di vê esra dirîxda,
Şûrê min qelem teraşe,
Û kalanê min qelemdane.
Hesinê sar bi fû nerm nabe,
Bi t'irane jî hemam germ nabe,
Eger karekî nekin li vê navê bi zû,
Tuyê wextekî bibîni welat jî dest çû.

Merg û jîn wek siber û tavin,
Awa baqî bîminin, her bi t'avin
Çimkî çi li dara dinêye,
Tê û diçe, hemû wek baye,

Sed şahanşa û p'adşa mirdin,
Seyr ke, k'urdê me her K'urdin.

Her jî cafi heta bi goranî,
Hesreta min her ewe li dinêda
Hacî wê bimre, nagîje dewra wanda,
Çi menşûr û gire-girê k'urdi,
Çi bi nazamî û k'itebê hurdi,

Sa'dî heyama xwe ma bû bê nanî,
Wek min bû gerok û bê xanî,
Nika xelq jî hesretê dimirin,
Beytên wî bi hêr û zîv dik'irin,
Axirê rojekê jî wêbê û ehdi,
Xefetê bo min bixûnin wekû Sa'dî.

HER KURD E QISA BAVÊ XWE NIZANE

Ger kurdek qisa bavê xwe nizane,
 Muheq dayka wî hêze û bavê wî nizane,
 Were, bo te bikim basa nihayet
 Tifin xweşe, ger tu çakî bizanî,
 Salahedîn û Nûredînê kurdi,
 Ezîzanê Cizîr û Mûş û Wanî,
 Mihelhel şerda şêrê Deysemî şêr,
 Qubad û baz û mîrê Erdelan,
 Evîn, pakê wan kurdin nihayet,
 Ji ber bêdefterî wun bûn û Xanî,
 Kitêb, defter û tarîx û kaxez
 Ger bi kurdi bihata nivisandin bi zemanî,
 Mela û zana û mîr û p'adşayê me,
 Heta muhşer dema nav û niştimanî.

HER KURDE LI NAV HEMÛ MILET

Her kurde li nav hemû millet
 Bê behre ji xwendin û k'itabet,
 Bigane ji tercima zimanî,
 Estrarê k'itebê xelqê dizanî.

Yekser alim mezin û çûk,
 Nexwendne get du herfê k'urdî,
 Estadê xetên ji van hersê yane,
 Wek gund zimanê xwe nizane,
 mumkîne der here ji binçengî,
 heta reqem û xeta frengî,

Bo çi k'ifrê bi zimanê me nûsîn?
 milletê bê k'itêb û bê nûsîn
 Keyrî k'urdan t'une li rû zemîn.
 Qazî, nesir û muftiyên nizam,
 Wê te bigehên ta medres û alim
 Bo nesîheyê zimanê k'urdane,
 Şêrên min delîl û birhane.

HAKIM Û MÎRÊN KURDISTANÊ

Hakim û mîrên K'urdistanê
 Her ji Botan heta Baban,
 Yek bi yek xafizê şerîyetê bûn,
 Seyd û şêxê qewm û millet bûn,
 Seyed û şêx ji tirsê wan
 Ew ku mirin, rê ketê ber wan,
 Seyr ke çawan bûne p'ûş û agir û neft,
 Yek li vî alî rû dike ber bi ecem,
 Yê din li wî alî dibne dijminê hev.

.....

.....

Ka axa Cizirê û Botan,
 Ka welatê Kurdistan?
 Ka ew dema kurd azad û serxwebûn?
 Siltanê milk û millet û xudanê çî û erfên bûn

.....

ŞÊX RIZA TELEBANÎ (1842-1910)

Şêx Riza li gundê Çirîxê nehîya Çemçemalê herîmê Kerkûkê sala 1842 ji daykê bûye, kurê Ebdurehmane ji qebîla telebanîye, bavê wî derebegê telebanîyan bû, serekê şêxêd qadirîyê bûye. Di biçûktîya xweda şêx Riza li cem bavê xwe xwendîye, hînî zimanê farsî, erebî û tirkî bûye, kitêbêd ayîna dîn xwendne, li xortanîya xweda li medresa Kerkûkêda hîn bûye, di bîstpêncsalîya xweda li paşî temamkirna medresê çûye Stembolê, li wê du salan maye û diha hê rind hînî farsî û tirkî bûye, hema li wêderê dest bi nivîsandna şêran kirîye. Şêrêd xwe bi farsî û tirkî û kurdî nivîsîne, paşî du salan li Stembolê vegerîyaye welatê xwe û pê hesîyaye, ku bavê wî çûye rehmetê, mal û mîrata bavê wî ketîye destê birê wî Elî. Bi tiştêkî ji mîratênade wî. Ew diçe Koysincaqê cem xalê xwe Xefûr, wextekê li cem wî dimîne û paşê vedigere diçe Kerkûkê û dest bi rêncberîyê dike.

Ew ji şêxan û ji pismamêd xwe zivêr dibe, halê jîyîna xelqê şêherê Kerkûkê bi wî xweş nayê, ew şêrêd xweda çêrî wan dike, sebeb wê yekê li sala 1901 diçe Bexdadê û li wêdrê dimîne û sala 1910 diçe rehmetê.

Du caran dîwana Şêx Riza Telebanî hatîye çapkirnê (sala 1935 û sala 1946 li Bexdadê). Dîwana wî ya sala 1946 bi şêrêd kurdî(3-81), farsî(84-198) û tirkî(201-258) hatne çap

kirnê. Şêrêd wî derheqa evinîyê, derheqa halê wî hejarî û der bi dero, derheqa stemkariya şêx û derebegada hatne ni vîsandnê, pîranîya şêrêd wî yêd satîrîne(şêrêd tirane û pê kenînêne).

Min li jêr çend şêrêd wî bi vî cûrayî çap kirne, ku xwend karêd me delal bixûnin. Ew parçe şêr ji kitaba Aladîn Sicadî hatne wegirtinê, çimkî dîwana şêx li ber destê me nîn bû. Eger ew dîwan li ber destê me bûya, me dê şêrêd temam çap bikirna.

EV SADE RÛXANE...

Ev sade rûxane ji melahet ku temamin,
Li dora te didin, tefre mexwe, qet mebêje ramin,
Geh dostê wefadarin, geh dijminê xunxwarin,
Geh dîkin dilnêrmî, geh jî sixt kilamin,
A'cîz mebe, nek her bo te ew bê wefane, bo her kes,

Me'lûme ku eva taqme mîna hemamin,
Kes hebê bê heya û şerm namûs,
Ebed nake refîqê taqme lûs,
Eger sed salî bidî wî renc û neyanga te,
Şêx dikeve ber qîsa nesteqî û nuqtebazî dibêjê:
"Şoxî bi enab çûye cem zehd firoşî,
Bo exzî terîqet bi dil pir jê xurusî",
Cewab da û gotê: " Hege teye, lê baş,
Saleke, ku min îman firotîye îmanfiroş.
Cem te heye şûrê deban, cem min heye şûrê zi-man.

Her dengê keranê û şepûrê çîngîz dike xan,
Ahengê biçûk ya merivê pir li wextê san.

Pîr ku li kuh tir ne kir, dûre ji mirinê,
Ahenga biçûk li k'uxînê nişana ecele,
Sax li dinyada ne mane, ger basa saxan dikî
Bi hezaran nişanî te bikim, ger qîsa qurumsaxan dikî,

Duhînê qetre xûn bo te, îro kefek ax bo te,
Benî adem kerî, qer ker nebî, bo çi ewqas bê ba kî ?"
(Aladîn Sicadîn, rûyê, 356-358).

QEHPEJINEKE MAMÊ MIN

Qehbejinke mamê minî dewletî şidadi heye,
 Ta'le ya rahber û bextê wî xwedê dadî heye,
 Yek-du gundê wî bi daweta siltan heye,
 Her yek bi qedera xiznê irdayê wî heye,
 Çi firoş û çi ziruf û çi zîa û çi aqar,
 Ji hemû cinsî meta'y sed û heştad hê ne bese!
 Ev hemû genc û xezna wî heye, hela hê terese,
 Ne hewa cud û ne mêla kerem û ne dada wî heye,
 Ne ji aba wî heye û ne ecdada wî heye,
 Ger serî û rûyê wî yê mêranin, pê bawar meke,
 Batnî cuhude, zahrî zuhada wî heye,
 Rengê k'er, dengê beqer, heyata seg, bi xwe çê-
 gel.

(Aladîn Sicadîn, rûyê 348-349).

NAÇME KERKÛKÊ

Bi vî h'alî ger careke din herme Kerkûkê,
 Me'lûme bi merdî ji serê min kur nakin tûkê,
 Bo çi herme Kerkûka qurumsax cîkê
 Ehliyê wê hemû di gel min nesaze mîna ava hema-
 mokê,
 Min xweş tê ji ber cewra bira û lomê gewm,
 Sed car li xerîbîyê bibim miflis û mefluk,
 Bo mirazê min jî helbet rojekê wê bigere çerx,
 Qirarê vî esmanî tine, carna çike, carna bûk,
 Şahî ku nebe, emê derbas bin bi feqirî,
 Bo ehliyê qenaet ji pilawê xweştîre dendûk,
 Şeş mange zêdetir, ku li mirna bavê min
 Ez mexdûrim û mezlûmim û cefa dîde û mehtûk.

(Aladîn Sicadîn, rûyê 347) .

EDEB EBDILA MISBAH (1862-1912)

Navê wî rastî Ebdila, kurê Ebdila begê, kurê Rostem begê bûye, ji e'slê mîrêd begzadeyê muqrîyan bûye, li herîmê muqrîyan li gundê Ermenîbûlaxda sala 1862 ji dayka xwe bû ye. Di xortanîya xweda hezkerê rewşkarê, stran, lîstik, kêf û şayê bûye, li biçûktîya xweda xwendna xwe li cem gi re-girêd begzadeyan û zana û ulmdarêd Sabilaxê hînî zimanê erebî, farsî û kurdî bûye, kitebêd şêr, çîrok û dastanêd farsî û kurdî xwendine, bi xwe hînî cûre-cûre pêşan bûye.

Gîvî Muqrîyanî dinivîse, ku edeb şikilkêş, nexşkêş û xweş nivîs bûye. Dilê wî ketibû qîza Îzet-xanê Serdarê gund, navê wê qîzê Nûsret Xanim bûye, ew li gundê Qeregozê mêrkî rî bûye, Edeb dibe dildarê wê û wê hez dike, pêra yartîyê dike, paşê mêrê wê, wê ber dide û ew û Edeb dibne mêr ji-nê hev.

Hemû şêrêd Edeb derheqa dildariyê hatne nivîsandnê. Gîvî Muqrîyanî dinivîse "Li nivîsandana şêrêd dildariyê û hezkirnê hevtayê Edeb tune". Di wextê xweda Edeb pertoka şêrêd xwe di gel stran û guranîyêd kurdî bi destnivîsara xweşnivîs dinivîsî, bi şikil û nîgarêd qeşeng dineqîşand û difrot.

Min li jêrê çend şêrêd wî dildarî çap kirne, ku xwendevanêd ezîz bi xwe bixwûnin û haj bi nivîsara Edeb bin.

WÊ SEHETA KU MIN NAS KIR...

Wê seheta ku min nas kir ew dilbera şenge,
 Ew tirkê kevandar, ew xemze xedeng,
 Ew şahde tetere, her ew mahî fireng,
 Ew yara cefakar di gel me serê ceng,
 Her dilbera pare, her ew yara stemkar,
 Ketme li ber pê wê, min got: " Ey gula re'na",
 Ey ruhê rewanîm, çi bi sûret, çi bi me'na,
 Her ci ku ferman ki, sime'na û a'te'na,
 Ma şê fe'lit walî alan qine'na,
 Niha were kerem ke, ji çi bûyî jivê miqdar,
 Ey lale ruh û tîre wek mişkî teterî,
 Sed canî ezîza min bi fîdayî xunçe zarî,
 Çi te ji min xeta dîtiye, ku li nik kenarî,
 Ferman ke, li ser çi di gel me bi niqqarî,
 Saleke li ser çi tu ji me rawa seraserî,
 Kerem ke, çi hingavê gil û wextê edaye,
 Îşev şeva îş tîreb û bezm û sîfaye,
 Seyrî serê kulma min bike, te tirê nûra çiraye,
 Sîngê min te t'irê rezê rezvanê xudaye
 Şehdî dehenim ke, ku deda te'na ji kewser,
 Tebî fikir ji Xurşîdê Cemalîm bi tae'mil,
 Bigire serê gîso wek destê sinbul,
 Sinbulê e'cha bo çi dida bîna qirînfîl,
 Şevgarîya te eslî nîne hingava nîxafîl,
 Îşev şeva eyşa nehkayeta Skender,
 Her wa got rubendê wela da bi qifêda,
 Zîlfê bi serê pence li ser erdê da alîkî,
 Ew tele'ta wek mehê li nav zîlfê reşda,
 Rojek bû tilwe'y bû li nav lîlê di cîda,
 Ronkayî xiste nav hemû xîte û benderan,
 Ser kumî gulê daye lala xumaren,
 Zîbî serê du kulma du gîsoye metran,
 Carekê xem û geh hilgê û carekê digora,
 Carekê bi ser kulme, carekê li ser ra,
 Wek pêç û xemî dîde li ser micmerî azê.

(Dîwana Edeb, rûyê 40-42)

KUR Û KEÇ

Bo kesê dildar firqî tune nav kur û keç,
 Her çend me'lume firqî tune nav kur û keç,
 Bo dilê şeyda firqî tune li her alî,
 Her alî be, vî alî kur, wî alî keç,
 Bona işqa te micazî û meremê te razî,
 Şevgariya te dirêj ella kur, ehî keç,,
 Kur ya keç şîmen can û herdu gula yek gulşen,
 Herdu sunmî yemen late kur û xeza keç,
 Kur ya keç lêv nûşîn, herdu bi rux û rengîn,
 Herdu bi mizin, şîrin qende kur û helweye keç,
 Kur ya keç şîmin her herdu bextên enber,
 Herdu wek yek dilber, re'na kur û zîba keç,
 Kur ya keça lalerû şîrine, ev herdu,
 Wek noqla mîşa kur û wek şehdî misfa keç,
 Kur ya keç xweş menzer, yek pertew û du peykar,
 Wek eqda sirîya kur û wek xeterê şîwa keç,
 Kur ya keç mîşkin mû, herdu berê min ahû,
 Tîra nîgehî herdu dilsoze kur ya keç,
 Kur ya keça suret xweş yek cinete, yek lezet,
 Kur ava kewserê, qedşaxê tobeye keç,
 Kur ya keça can nasîk, herdu bi vê ecazet,
 Lêv mîna devê î'sa, kur rû mîna kefî, Mûsa keç,
 Kur şehde lêva me'lum, keç wek eslê bê mûm,
 Yek lazîme, yek mezlume, nîseye kur, sibha keç,
 Bê herduwan herame rukun jî, qewm jî,
 Û hîngê wê tima jî bîmîne kur, êsîr keç, şeysta
 na te,
 Wa xweşe bi her alî te pîr be li şahrîstana te.
 Sed horî û xilmana te, xilmane kur, horîye keç,
 Kur lalêya gulzare, keç li ebeta pîr xare,
 Bona hev demi sehra kur sihbete, bevaye keç,
 Kur ser û gulîstane, keç e'sretê mestane,
 Bo wextê temaşa kur hengaveke, tawanaye keç,
 Kur saqî sibêye, keç ezrî pezîraye,
 Bo meclîsê mestaneye kur, bo mesemî tenêye keç,
 Kur rûyê mîna mehtab, keç mûye wêk sincab,
 Bo pertawê eywane kur, bo bostere dibaye keç,
 Axuzê sebhaye kur, encamê sihraye keç,

Maşogê ezhibîye kur, mehbûba zilimêye keç,
 Kur bo dema ferwerdîne, keç bo çilleyê havîne,
 Keç behmene û keç şîrine, germe kur, şerme keç,
 Bona îşe Edeb her dem paçê meye derxeme,
 Xende keç, cama cem bade kur û mina keç,
 Nalî ku eva bidîta, dibû qutabê wê,
 Îşq ku micaz be, talib mebe, ella keç.

(Dîwana Edeb, 29-31)

E'MRÊ GIHIŞTÎ AXIR

E'mrê min gihîşte axir, min canik carekê paç ne
 kir,

Nezeke t'er min temaşa mahî taban ne kir,
 Dawa min pir xunçe, bi hêsir, girîn û getim,
 Ji wê xûnça gulşena li damanê min xendan ne kir,
 Nişe baxçe, rûxê bade, lelê canan, ey eceb,
 Bo çi min ji wê fincanê getrek mey ne xwar?
 Çaxê şerekî hev demî xiste ber zarîna min,
 Heta min ah û zarîna rojê hêsan kir,
 Ey nigara bê wefa çi qas min cefayê te dît,
 Yekserî mû get xilaf ehd û peyman min ne kir,
 Heta lêvê te lele min dît, qeşem bi lêvê te,
 Qet t'u caran yadê yaqûti Bedexşanê min ne kir,
 Sibê dema ku ez hatim, lêvê te lele reş nişan
 kim,

Çimki bi ne meremî te bû, perîşanî min ne kir,
 Te gotê: " Mircane, lêvê min", min got: " canê,
 behaye",

Xên ji vî sewdayî cana min get tawana ne kir,
 Tîra bijangê te li dilda xemzê teye dawa wê,
 Întîzarê merhemê te bim, get derman min ne kir,
 Weslê te min evel ku dît, min nizanî hicrane ji
 dîn,

Lezetê xildî berîn bo yadê neranî min ne kir,
 Wê demê paçî lêvê te xewfî e'tabê te ne bûm,
 Xatemin pê bû, ku min yadê Silêman ne kir,
 Çi qas wa'ze û ece'zî daw kerem ke ku el-eşq ci-
 nûn,

Aqlê min kir, ey Edeb, bi wê pendê nadan min ne
 kir.

(Dîwana Edeb, rûyê 32-33).

MELA MEHEMED KOYÎ (1876-1943)

Ebdal Xaliq Aladin li kitêba xweda ya bi navê " Serhatî û jîyîna zana û şayrê navdarê kurd da" derheqa Mela Mehemedê Koyîda dinivîse: " Li sala 1876-da li şêherê Koyyêda Mele Mehemed ji dayka xwe bûye. Malbavanê wî û xizmê dayka wî-qîza Babekir-axa Hewêsi ji binemala zanyar û xwende werana bûn, weke sê sed salan malbavê Mela Mehemed xerêqî bûn xwendwerî li Kurdistanê belav dikirin. Mela Mehemed ji biçûktîya xwe heta bîst salîya xwe li ber destê bavê xwe hînî xwendinê dibû. Çûbû Stembolê, hevaltî û hevkarî bi Qadir Koyîra kiribû, zîmanê tirkî, erebî, farsî û kurdî rind hîn bûbû, li pêşîyê bûbû feqî, paşê li mizgefta Koyêda dersê dîn û diyanet da bû, xelq hîn kir bû. Li noz de salîya wîda bavê wî çûbû rehmêtê, ew li şûna wî dibe serokê zanyarêd şêherê Koyê, li cîyê bavê xwe ders dide, ji hemû Kurdistanê jêrîn xwendkar, zana û feqî têne cem wî hînî dersê ayîna dîn û diyanetê dibin, gelek şagirtêd wî, gelek peyketîyê wî mane, mesele, Mela Fethula, Mele Sadiq, Mela Ebdula Nazanîn(1880-1906)?, Mela Mesum Hewremanî, Mela Evdal Qadir Kanî Derbendî û yê din.

Sala 1912 Mele Mehemed dibe muftîyê şêherê Koyê, paşê sala 1919 dibe qazî, li sala 1924 dibe andamê civata sazkirina parlamenê Îraqê, çend sal andamîya encumena welatê Musulê kirîye.

Li paşî sazkirîna parlamane Îraqê Mela Mehemed di gel çend heval û hevkarên xwe dawa mafê kurdê Îraqê dike. Li sala 1924 heta sala 1928 Mele Mehemed dibe qazîyê şêherê Koyê û li nav wan salanda ew gelekî dixebite ku rewşenbîrîyê û xwendewarîyê li nav xelqêda belav bike, mektebê saz dike, ders dide, şêran û xebatên zanyarî dinivîse, Eb dal Xaliq Aladîn dinivîse, ku Mele Mehemed weke 13 kitêbêd dîn, dîyanet, zanyarî û fîlosofî bi zimanê erebî nivîsîne, ji wan kitêban-destnivîsaran her bi tenê çend heb çap bûne. Destnivîsarêd wî "Eqîda Îslamê" û "Mecîdda Nû kirî" yêd bi zimanê kurdî nivîsandî heta nika çap ne bûne. Lê çend nivîsarêd wî din jî bi zimanê kurdî hene. Ji wan her dîwana şêrêd wî li Rewandizê û li Hewlerê çap bûye. Li sala 1943-da berhevoka şêrêd wî li Hewlêrê çap bûye, li sala 1957-da destnivîsara wî "Fîrî-fîrî" hatiye çapkirinê, destnivîsara wî "Tefsîra Kurdî" "Kelamê xaliq xudavend" bi du paran çap bûne, para pêşîn li sala 1968 - da çap bûye, paşîn li sala 1971-da çap bûye.

Li sala 1943-da Mele Mehemed li Koyê çûye rehmetê, mirna wî şîn û girîn xiste nav xelqê Kurdistanê jêrîn. Gelek mêrêd xîret, xudannamûs li ber destê mele Mehemed Koyî hîn bûne, bûne zana, pispor, şareza û wetenperwer. Nav û dengê wî li nav xelqê kurddê belav bûye, qedrê wî li cem gelek merivêd maqûl û navudeng hebûye, şayrê mezin Qadir Koyî van herdu rêzên şêr derheqa wîda nivîsîne:

*Ji xêncî Celî-zade kê ji we zanî,
Binaxa ulm û zanî li Kurdistanê danî.*

Li dîwana mele Mehemed da(navê şîrin zêde Celî-zade lê kiribûn) navê wan şêrên wî kurdî hatine nivîsandinê: "Umîd û xwestna dû çêbûne", "Ah û nalîna bo vejîna millet", "Qazınca şêxêd me"(pêşperî şêxan û durutîya wan nivîsîye), "Bawerîya cahilîya qelet", "Bo agadarîya û hişyarîya lawan", "Lay-laya lawan", "Teleq", "Eva axa Kurdistanê", "Lal bim bo milletê kurd", "Fêlên şêxan", "Azadbûna jinan", "Henesa hilkişandin û lava kirin", "Şox û şengîya kurd", "Halê kurd û Kurdistanê dipirsî" û yêd din.

Çaxê dengê mirna mele Mehemed li nav xelqê Kurdistanê jê-
rîn belav bû, ji hemû cî û waran hatne hewar, bû şîn û gi-
rîn. Bajarê Koyê pêda li hev ket, bazar û dikan hatne gir-
tinê, biçûk û mezin li mala mele Mehemed û mizgefta Eshe-
de bapîr, biçûk mezinan reş girêdan. Ji cî û warêd Kurdis-
tana Îraqê û Îranê hatne hewariyê û serxweşiyê. Nivîskar
û şayrên kurd derheqa wîda şêrên pesnawî nivîsîne. Ebdal
Xaliq Aladîn çend şêrên wusan li kitêba xweda derheq mele
Mehemed da çap kirine. Şayrê navdar Dilzaz li ser winckî
(şklekî) wîda ev çarêka jêrîn nivîsîne.

*Eva wîna bê cane, lê nav û nîşane,
Her zendîyê ta çerxa felek beha girane,
Bo nusêr û zana û şayr qet tûne mirdin,
Mirdin tûne bo hevbirê Eflatonê Yûnan.*

Bona xwendevanêd me delal haj nivîsarêd mele Mehemed he-
bin, min çend şêr û parçêd şêrêd wî ji soranî kirne kur-
mancî.

DESTÊ HEV BIGIRIN

*Milet, qebilno, rabin, destê hev bigirin,
Hûn şerefin, xwedî wujdanin,
Li ser çîyan hev bibînin, destê hev bigirin,
Meriv tenê bi hoz û doz namînin,
Dewlemend, hinekî ji xwedê bitirse,
Hal-hewalê hejar car-car bipirse,
Bira sê qat nebe koşk û sera te,
Hinek pere bide bira û pismamê te,
Ku nan bikire bo biçûkan,
Ku ew jî bibe beşdarê jîn û can,
Ew bimire, tu jî wê bimrî,
Bibî agir, kes gun nagire,
Çend xweşe birçî têr kî bi nan,
Xwe bidî kuştin li şerê meydan,
Dewlemend, nebêje: "ew qisa bê ma'niye",
Nebûna hejar, nebûna teye,
Eger hejar şevê te pawan ne kin,
Cerdê her mala te talan bikin.*

JIN

Bêjne qewmê kurdan,
 Destê min dawa wan,
 Heye bi heqê êzdan,
 Jin anîn û telaq dan.
 Jin zeyneta dinyaye,
 Ew emaneta xudaye
 Hebibâ Mistefaye,
 Qelatin ji bo mêrdan.
 Eger jin bi hurmet be,
 Bê zilet û zehmet be,
 Bi terbyet û xizmet be,
 Dil şad û lêv xendan be,
 Kurê jê bibin wek şêr,
 Aqil û zana û delêr,
 Bê dil xem û çav têr,

.....

Jina ku der bi der be,
 Dil pir xem be û keder be,
 Rezil û dest li ser be,
 Li ku ewledê çê li ber 'be ?

GOTUBÊJA KEWA HEWÎ

Hey kewa hêwî! bo çi damawî ?
 Bo çi wa rengêşin helperî ?
 Bo çi rengê te bûye rengê axa bê avî ?
 Bo çi tu li nav şînayê nagerî ?
 Bo çi li vir, li wê bê warî ?
 Bo çi bê dengî, bo çi wa digerî ?
 Kawa pirîn û badana perê te ?
 Kawa şelpîn û telpîna bejn û bala te ?
 Caba min tu bide bi dest û bizd,
 Çiyayê ser bilind, kela qewmê kurd,
 Gelek bi kesasî, çiyayê kevne sal,
 Caba wî min da bi zimanê hal:
 " Çiyakî bilind şîn û sixt bûm,

Pir gul û nesrîn, pir ji dirext bûm,
 Qezwan û mazû û perû û reşedar,
 Welgu, kekîf û qivîl û çînar,
 Hemî çîn bi çîn bi rêz li dawîn,
 Bi hewa nesîm wek etrâ xawîn,
 Bawêşîn bû li jêr û jêrîn,
 Cem min bû ava heyatê, meşûr,
 Li beharê wextê xêla û jûr,
 Reng bi reng dibûm bi gul zer û sor,
 Ji tewgê serê min heta biniya deştê,
 Dixemilîm mîna baxê bihuşte.
 Sor û şîn û mor komela fer bûm,
 Topa gulbax mîna şest per bûm,
 Bûkek bûm, tara min dida bi serda,
 Rû zerd min dida li rûyê qenerda,
 Kom kom nazdaran gerden pir xalan
 Rûmet perey gul bala şimşalan
 Bi nav binaya çavê kale,
 Bi wurşe-wurşa gulm û xale,
 Bê perwa, bê bak, be xweşî serbestî ?
 Li cem min çopiya şayê debestî,
 Xudanê pêşmergê dilgîr bûm,
 Rîya donzde swarê Mêrîvan bûm,
 Şêr li mêşeda nire-nîr bû,
 Dijmin li ber min çire-çîr bû,
 Landika, şêran û ciyê nêçîr bûm,
 Birayê hevpiştî Eriwan bûm,
 Kwanê ne'reta şêrê jîna min?!
 Kwa nîrîna pilingê berî beyana min?!
 Kwa çirkîna baz li ser kilavan?!
 Kwanê gaspa kewan li k'una şkevan?!
 Bêjme te çima rengê min şîn bûye,
 Çima bûne qeqnes, çima şewitîm,
 Min dî rijîya xûna ewledê min,
 Li serda got: " goşê cegera te me,
 Li ser minda rijîya germe xûna kurd,
 Şewitîm, pertîm, bûme kul û derd,
 Çend caran şewitîm, peritîm,
 Bûme k'ozîdana her dem,
 Nizanim, hûn çawan dijîn,

Hewar: mîna min ne şewitin,
 Ez her bo intîqamê çaverême,
 Belkî raborê kurdê qewmê min,
 Ez kela wême, ezim soperê wê,
 Wunda mekin xûna bira bavê xwe,
 Birêjin xûna dijmin li ber me,
 Wextekê wê qenc be birîna min,
 Sor bike rengê şîna min",

EY LAWÊ KOYÊ!

Rabe, pêş keve, ey lawê Koyê,
 Ta kengê li xewê bî, karvanê te çûye,
 Bi nûra ulm xwe ji rê derxe,
 Bi zora milan bar ser xe,
 Bi p'erê ulm bifire mîna teyran,
 Bi zora ulm here bin behran,
 Ger feyda ulmê hekayet hebûya,
 Dinya hemû wê bûme ba bibûya,
 Ulmê k'imîyayê ger te ne xwendîye,
 Bi xa tu nizanî xuda çi kirîye,
 Em pêbendî waha xeyalîn,
 Emê xerêqî kerev decalîn
 Bi def û zurne û reqs û sema,
 Ulm û marîfet ji kurdanra ne ma,
 Bi xwedê gelek heyfe, heyfe, mixabin,
 Miletê kurdan heta kengê wa bin,
 Cahiltîyê bihêle, dewra erfane,
 Bira tirsî bimre, dewra kurane,
 Bavêd minra ne edet bû mekteb,
 Bi exlaqê çak, bi ulm û edeb,
 Bi rêk û pêk mîna biran
 Li gel yekin du mîna ruh û beden,
 Xîret bikin, li rîya weten,
 Hûnin iro gula rewşen,
 Hûnin hîvî û namûsa weten,
 Wek barût û marût bin serobino bin.
 Bêje şêxo, qiyamet li wê rabû,
 Cahil û tembelfî mala me xirab bû,
 Ji ber qewlê pir pûç amanî,
 Li destan nema xênc ji hevanê,

Gelê kurd nabne sahib û rayet û toxt,
 Ji ber çi karê xelqê wa duruste ?
 Eger hindus, ger agir pereste,
 Eger laze, eger rome, eger cû,
 Ji bin nîrê vî û wî pakî der çû
 Eger raste, dibêjî dinya xirawe,
 Êdî bo çiye ew cot û yarewe ?
 Eger raste qiyamet wa nêzîke,
 Cenabê te bo dinê wa xerike ?
 Eger hêza te dixweze hesta bi hêmet,
 Bê fikir û seyr û kiyamet,
 Bira millet hemû yek bin di gel yek,
 Ji erbabê qelem ta xudanê çek,
 Eger kurdek sihanet kin li Besrê,
 Hemû bêne xuruş û coş û nehrê.
 Heta heqê xwe nestînin, ranewestin,
 Ji ber bê îtfaqî em xwar û pestin,
 Xeznek hebe malê umumî,
 Wek cû, ermen û bosnaq û romî,
 Ji pare û rûpiya çarek xazî,
 Belku bê roja pence bazi.

EVA XAKA DAYKA TEYE

Eva xaka dayka teye,
 Ketiyê destê ecnebî,
 Ey kurdê sahib xîret, tu çawan razî dibî ?
 Bo xwe ewê dibînî dijmin erdê te dikole,
 Paş çend salên din get destê teda nahêle,
 Li ser k'ûra erdê we erzek û nasin,
 Eva jî gelê xerîbe, niha jî hûn xwe ne nasin,
 Çengê nan xurf, xelqê li ser milk û malî xweyî,
 Axa te hemû medene, tu xwe feqîr rût û qût,
 Ta kengê wek gacot li bin norê zilletî,
 Sed heyf û sed mixabin, li aliyê xwe tu jî mile
 ti,
 Sorî, mûzerdî, çav şîn, nek bê umud bî,
 Evel bi qewata xwe, duwem bi hewnî rê bî,
 Ulm û emelê te hilde, cahil û tembelî mirine,
 Pist û zergan bavêjin, wextê xwendin û nûsîne,
 Mele eger mele bûna, wa li millet ne dihat,
 Evro payê tişt ne dikir li erdê Rohilat,
 Nefta babe Gurgur ne diçû Paris,
 Ne dikir hesret û mendî li derûnê daalês.

QAZINCA ŞÊXÊ ME

Meta şêxek li Kurdistanê bîmîne,
 Umuda jîna te pê nemîne,
 Bi ba da rewnek û ahenga kurdî,
 Hemû bûne sofî, pîr û derwêş,
 Bi bermal, bi sehbe û rişterîş,
 Hemû bê îş û kar û tewezel,
 Zik pan, mil estûr, selk zil,
 Ji Wanê, Erzurumê ta cavan
 Tewella bûn ji aqil û ulm û erfân,
 Be wê şol, be wê heqîl û temizê,
 Muheqeq qewmê kurd na bi rêzê,
 Be rêşî pan û pîrç pîr sipî,
 Bînga îşê kurdan çawan li hev bê,
 Bi keşkûl û parsê û feqîr û zillet,
 Mihale kake xwe teşkîla dewlet,
 Hemû bê hiş û bê guş û nezanîn,
 Îdara milk û dewlet çawan nezanîn,
 Umud û qet nabe, kurd bibe dewlet,
 Ji bedbextî ew êsta bûne sê parçe,
 Ewê zanaye, nav cerga wî pelase,
 Ewê ne zane, nizane çî base,
 Cenabê şêx dibê " Axir zemanê,
 Qiyamet radibe her bi van zûyan,
 Îradeya xudaye, hûnê her wa bin".

WEFAYÎ (1838-1902)

Zanyar û edebyatnasên k'urd ji Wefayîra dibêjin Mîrze Ebdulrehîm, lê dinivîsin Wefayî. Wefayî, navê şayîr edebyatîye, ewî li şêrên xweda gelek car nivîsiye wefa yan wefayî. Çawan şayîrê me mezin Şêx Mûsa navê Cegerxûn li xwe kirîye, wusan jî Mîrze Rehîm navê Wefayî li xwe kirîye. Bi vî t'eherî navê wefa-wefayî bûye navê wî şayîrî, sebeb vê yekê edebyetnas dinivîsin " Dîwanan Wefayî", "Şayîr Wefayî yan jî Wefayî,,.

Zanyarê k'urd, Mehemed E'îlî Qeredaxî sala 1978-da li Bexdadê dîwana Wefayî çap kirîye. Ew li pêşgotna çapkirna xweda dinivîse, ku du caran dîwana Wefayî hatiye çapkirinê, cara pêşîn Mamosta Gîvî Muqrîyanî li Hewlêrê çap kirîye, cara duwînan Mamosta Mele Mehemed Seyd çap kirîye. Ew dinivîse, ku ewî herdu çapkirin beramberî hev kirne û pê hesîyaye, ku di wanda hemû şêrên Wefayî nehatne çapkirinê û li hinek şêranda jî gelek rêz hatne berdanê, çap ne bûne. Sebeb wê yekê ew lêgerîyaye çend destxetên Wefayî dest xistne, ji keşkûlan melumetiyên teze wergirtne û ji nûva dîwana Wefayî çap kirîye.

Mehemed E'îlî Qeredaxî dîwana Wefayî bi arîkarîya akadêmîya k'urdî ya Îraqê çap kirîye. Ew li pêşgotna xweda dinivîse, ku heta nika baş ne eşkeraye çawan Wefayî jîye û li cem kê xwendîye û hîn bûye, li kovar û rojnamên k'urdîda,

melûmetî derheq wîda kêmîn û belav-belavin. Gilî dîkin, ku Wefayî serdarê şayrên Babilaxê(Mehabadê) bûye, ku ew bilbilê xweşxanê baxçê welatê muqriyan bûye, ku navê wî rastî hacî Mîrza Rehîm bûye, ew kurê mela Xefurî bûye, li sala 1844-da li şêherê Sabilaxê(Mehabadê) ji dayka xwe bûye û her li wêderê xwendîye, hînî zimanê farsî û k'urdî odebyetîyê bûye û bi herdu zimanan jî şêr nivîsîne û gotne. Şêxê Nehrî, şêx Ebdule pê dihesê, ku Wefayî şêrbêj û dengbêjekî xweşgoye, ewî gazî Wefayî kirîye cem xwe. Wefayî çûye cem şêxê Nehrîyî û gelek wext li cem wî maye, şêrên evintîyê û dildarîyê jêra gotîye û xwendîye. Du caran ew ji cem şêx Ebdule vegerîyaye Sabilaxê, hatîye mala xwe paşê cara sisîyan ew ji cem şêx Nehrî çûye Sulemanîyê, gelek wext li wêderê maye û li cem gire-girê şêxan hînî bûye, ulm tehsîl kirîye, paşê t'ev Şêx Seyd Xefîd, Şêx Mustafa û Teyfîq beg(Pîremêrd) çûye hecê û sala 1902-da li rêda li çolê Erebestanê nexweş ketîye û mirîye. Teyfîq beg nivîsîye, ku ewî bi destê xwe defin kirîye.

Mehemed E'lî Qeredaxî li pêşgotna dîwana Wefayîda nivîsîye, ku Wefayî e'mrê xwe p'iranî li Sulemanîyêda derbas kirîye, şêrên wî hemû yên hezkirnê û dildarîyêne, yên evintîya şîrin û bi derd û kul û xem û xiyala bêmirazîne, her şêreke wî bi k'eşeke(çapeke) ahengêkî taybetî hatne gotnê û nivîsandnê, ew dinivîse, ku mezmûn(naveroka) şêrên Wefayî derdê dilê Wefayî, halê Wefayî û reng û rûyê evîna(dîl dara) Wefayî nîşan dîkin û tînin ber çavên xwendeweran. Bi çend şêrên Wefayîda em bi jîyîna û halê Wefayî dihesin, em haj pê dibin, ku ew belengaz bûye, bê nan û av û bê mal bûye, ku ewî bi fitrê, zekatê û nanê malan jîye, nerazîbûna xwe ji jîyîn û halê xwe xirab ewî mîna Meleyê Cizîrî li şêrên xwe dildarîda nivîsîne û neqîşandîye. Li jêrê ez çend şêrên wî çap dikim wek nimûne.

Hezar sowim û selat be,
Çawit li dûy zekat be

Xudat niye, heyat be,

Qet wa niye tobek'ar,

Tîf bi reng û rewanit,

Di gel fêl û jîyanit

Çi têda niye dik'anit,

Çit bik'irî xirîdar.

Ey reffîqan, werne ya-
rim,

Zor zelîlim, dilşkes-
tîme,

Can û dil meraqa na-
rim,

Ax ji bo terek dirav,

Ax ji bo terek dira-
van,

Nera dil, bînaya ça-
van,

Melhema dil qul kirin,

Mûmiya piştê şkestîye,

Zêr û zîv fikir û xeyâ
la minin,

Dayk û bav û mam û xa-
lê minin.

Hezar se û selat be,
Çavê te li dû zekat
be,

Xwedê te t'une, he-
yat be,

Qet wa t'une t'obe-
k'ar,

Tû bi reng û rewana
te,

Di gel fêl û jîyîna
te

Çi têda t'une dik'a-
na te,

Çi tu bik'irî xerî-
dar.

Ey hevalno, werne alî
min,

Gelek zelûlim, dilşkes
tîme,

Can û dil meraqa na-
rim,

Ax ji bo terek dirav,

Ax ji bo terek dira-
van,

Nera dil bînaya çavan,

Melhema dil qul kirin,

Mûmiya piştê şkestîye,

Zêr û zîv fikir û xeyâ
la minin,

Dayk û bav û mam û xa-
lê minin.

Mehemed E'lî Qeredaxî dinivîse, ku Wefayî di xortaniya
xweda aşiq bûye, p'iranîya şêrên wî derheqa hezkirî û
dildariya wîda hatne nivîsandnê.

Ez jêrê çend şêrên wî evintîyê bi zarê kurmancîya bakur
tînim ber çavên xwendewerên me delal, ku bixûnin, qedir
û qimetê wan bizan bin û sûdîyê jê wergirin.

.....
 Xûdanê ser rûra berda ji ber pek'enîna te,
 Şebnem gul jê barî, roj girt p'erwanê te,
 Tu bi xwedê, zilfê te bide alîkî, bi t'êr gul-
 mên te paç kim,
 Rê bide bilbil, bira negirî ji ber baxê p'erjî-
 na te,
 Zilfê te xetak'arin bo çavê te, birû daxistne,
 Were em hev paç kin, bi destan hev hemêz kin,
 Çavbaziye meke ji wê badeya elestê,

Destê min bigre, rabe; tu ji din e'ynatê
K'etme nav zilfê te, de tu bigre destê min;
K'afir bûm bê iman heta bême ser dinê te.
Şev heta seher wek gul dil p'ir xûnavim,
Ya xwedê, şemal bike bin aragçîna te,
Qurban! ew reng min rengand rengê te,
Zilfê te roj veşart, birûyê te xû nadin,
Wan roj li min kirne şev bi meh û p'erwinê te,
Rehma te pê ne hat, şîrin xudagir bi,
Bo çî her wefayî, bo dîn bûyî, bi çiya k'etî ?
Sed Xosrov û Ferhad bo şîrin lêvên te ?

(Diwan, rûyê 31)

Binevş û gul li baxan bûn, li baxan şev çirax
bû.
Meger dermanê nesaxan bû ser rûda zilf tata kir
Tata kir zilfê serk'arî, direwşa nûrî riswa kir,
Li her xelqekî sed tarî hezar xurşîd p'eyda kir
Wa xururî husnê xwe bû, dev p'ir k'enî û çû,
Ku ji xwe razîbe, bêje : Wefayî bo çî rewsa kir
Hewa binekê p'erçeme û li çîyan k'et,
Seba etrekê xûnçe zar anî, rû bi sehra kir,
Nişanê ji nûra cemala xwe baxşande Şemê,
Seraser canê p'erwane piraz sot û şewda kir,
Nesîmek ji baxê husnê xwe anî bi gul da.

(*Dīwan*, rūyē 35')

.....
 Erê, ey bi zîlf û ruxsar senemê çîn mehte bim,
 Demeke û xendeke û nigah te nimek û meza şerab-
 bim,
 Ez li ber nigah te biminim heta ser û xemze û
 cela bim,
 Were bi şertê caran, rojê sed car fida te bim.
 Ji wêrana dili şewawim, şîwen û wawayla û roro,
 Agirek ber bûye, hinavê min tê der, li henas
 min bûso,
 Bûme efseneyê welatan, şêher bi şêher, mal bi
 mal, çiya bi çiya,
 Xalên çavên te, goşê ebrû ez du dîn kirim li
 ser te,
 Yan min bike p'irê meyhan, ya mirazê xaneqa
 bim,
 Tu melek û firîşte û p'eri, guldev û gulber û
 dilberî,
 Lale reng û ferengê çîni, şox û şengi, xeta û
 berberî,
 Nazik û nazanî û şîrin û awina rojî, reng û agi
 rî,
 Li nav menzera duderî, xoşî, seyri mewicî beh-
 rî.
 Were ser canê min, ezîza min, çi dikî, ji dil
 k'ebabim,
 Ewê şoxê bi tayê zilfan zincîr kirim diwanê,
 Ruhê, ruhê min k'îşiyaye, ruh t'une li ruhê be
 yane.

(Diwan, rûyê 48)

Xweşe rojek li a'lem der bi der bim,
 Li nav ewzayê diniya bê xeber bim,
 Ji ber taqeta diwane asa
 Ji xewasanê derya bê xeber bim.
 Şev û roj li çolê her binalim
 Herifi şevrevê bayê seher bim,
 Nezanbe get kes nav nişanê min.
 Eger aqil, eger aşifte ser bim,
 Li her alî bira bizvire xubara min
 Li her cî wara pêvîste seper bim,
 Cirabê helgire, cana ji nav dil,
 Li ronakî dilê yârê xeber bim,
 Li ber çavê ter min sorani birzî,
 Geh bê dayk, geh bê bavik bim,
 Xuda! çawan xwe carê bişewitînim
 Ji der û daxê ehwalê xwe der bim,
 Şevê her heta rojê binalim,
 Bi giryan dest û damanê seher bim,
 Qet rêkê çare naînim wefayî,
 Meger ser hate çedem xerqî nezer bim,
 Eger bê yadê zilf û çavê te lehzekê sebir bim,
 Hêşir bendê k'afir kuştîyê bêdadî sahir bim.

(Diwan, rûyê 54-55)

Geh disojim, geh digirîm, xerqê av û agirim,
 Ax ji ber bextê reş nizamim ez bo çi namirim,
 Herke dibînim, dibêje: Tu şima, ez p'erwana te-
 me,
 Heta serapa nabme çiya, zoxal, get aram nagi-
 rim,
 Her rêkê min tarîke, nalîn tê ji şewqa rûyê te.

(Diwan, rûyê 59)

Bûme ciyê destrêja turkan, loma cerga min let-
 lete,
 Daxdara bejna te bira ji rûyê te mehrûm nebe,
 Ez k'efilê weslê cennetê, her çi ehlê wehdete.
 Zilf lerizin, k'etne ser rû şadman fewcê dilan
 Qet li dûzexêda ebed nînin, cennetîn ew omete,
 Qet t'u dergak wa nine elî bi şerteke hermê,
 Bi hezar cûra û xeta baz yar li ser rû wî zehme
 te,
 Çavê bazî ez kuştîm, xenda bi naz ez anîm,
 Sed bêmar û nexweş bin, pêk'enîn li min şehde-
 te.

(Diwan, rûyê 118)

.....
 Ferenga miletî, k'afira dilekî, egrîca terzayê,
 Mêla sûretê, ahu heramê, mah simayê,
 P'erê peyk'ar, pûtê, gulprçemê, zincîr gesûyê,
 Şeker lêvê, nazenînê, işwesazê serû û balayê,
 Nîgarê, t'undxûyê, serk'eşê, aşîqkujê, şoxê,
 Gulandamê, dilaramê, semenber, dîdeşelayê,
 Bi dû zilfan resenbazê, bi dû egrîca tennazê,
 Bi dû çavan sehrbazê, bi dû lêvan mesîhayê
 Kevan ebrû pêwîste, ji Eyşê nêrgîs mestê.

(Diwan, rûyê 163)

.....
 Seher mestane ez rabîhîrîm li ber dergê kilîsê,
 Keçê destê dilê min girt xeraman herne terîsê,
 Erem bo min bû enber zilfî, hêşîrê cenber zilfî
 Keramete ser zilfê wê bi her tayî mesîhayî,
 Bi dawê zilf mijang rabûn li ser heddê dilê min
 rawestan,
 Nîzamê çîn û turkestan rîjan, ber bûne yexmayî,
 Nîgaha dilistana min xumar da canê min,

Tobîbê halzanê min nexweş bû, şerbet da min,
 Îşarek bi çavan kir, birûyê hevbaşê turkan kir,
 Dilê min wan tîrebar kir kevandara li her alî.
 Sefê zilfa perişan kir, bi rûxsarî ereqnakî,
 Çi şîrine di gel yekdu, meh û perwîn şevê daye,
 Perişanê zilfê zunnarî, direxşanê rûyê gulnarî,
 Were em herne meyxanê, çi mee'mûre, çi wêrane,
 Li her alî dil arayî, li her goşe şeydayî,
 Li zarê gul şekir barî, ey Mecnûna Leylayê,
 Were, em herne meyxanê çi mee'mûre, çi wêrane,
 Li her alî dil arayî, li her goşe şeydayî
 Ku min dest da derî, dil bû, ne dil bû, gulşena
 gul bû,
 Hemû nesrîn û sunbul û qerîqal hexlê tubayî.

(Diwan, rûyê 165-166)

Way cennetê E'yûşê ebed ez ser rê guzara te,
 Nûrê nezerim, t'acê serê min axa ber derê te,
 Bi wê qametê xal û xetê rûyê te dibînim,
 Her gulşanê Firdewse bi nexlî şecara te,

Badam û gul û sunbul û nesrîne li berê te,
 Didirewşe li nav zilfê te reş araqa gerdena te,
 Xwe her şev p'eyda bû stêra sehera te,
 Nizanim tu çi bî lêv û gamet şîrînî,
 Xûnçe şecerî, yan ne gula ney şekerî
 Daxu çi bikim fitna dewra qemerê te,
 Tu xwedê, devê te derxe ji nav t'orra bizanim,
 Tamê wî çiyê şevhoqqeyê şîr û şekerê te,
 K'afir ku nebû bo çi ez kuştîm li ber derê te?

(Diwan, rûyê 111-112)

Ezîza min, şîrina min, bo çi ji min wa dîrî tu?
 Were ser herdu çavê min serî û cubarê te,
 Li ser qencî giribana te seba şêr bû, bi çiya
 ket,

Ku rê ket xiyabana gul û baxê henarê te,
 Nexweşê çavê te bûm û xenda te ez dam seburê,
 Sifayê bimara xwe te da, gulşekir barî ji zarê
 te,

Li alîk tarê dawê dil, li alîk marê qesda sor,
 Çi sehre? eceb mame ji zilfê tar û marê te,
 Xeta te anî, cemala te pê nema, k'wa rewneqê xa
 lê te?

Fereng hat û k'ee'be girt, mehdi çû ji şehere
 te,
 Deq û rîşê dilê her dîng û nalêna eşqa te
 da,

Bêje mutrib, were saqî, serapa bûme tarê te
 Çavê te ketim, bo zarê te agir ji min ber bû,
 Sipindarim, her bişewitim başe, ez çavezare te,

(Dîwan, rûyê 110)

Serabstan xerebstane îro,
 Behara E'yûşê her zivistane îro,
 Bi zerîna payzê rengê min diyare,
 Bi xalî rûte, tabistane îro,
 Jîyîna e'mrê min bê te zyane,
 Gulistan bûm, xaristane îro,
 Temamî zîdegana te bê wucude,
 Serapa wek qumaristane îro,

Tava axa germîna te bi min çî?
 Bo min her weku çiyastane îro,
 Gula min bê nezîra tu temaşa
 Welat pakî baxistane îro,
 Xedenga te karê hejmara bi miqat
 Hemû mêşe û çinaristane îro
 Wefa mezlumê beyrûte bi rûfî
 Hetivê şehere K'urdistane îro.

(Dîwan, rûyê 114)

XERÎQ (1851-1907)

Bavê wî mela Salih bûye, li gundê Zêwê nehîya Sulemanîyê ji dayka xwe bûye. Bavê wî xelqê sînore Îranê bû, ji cîyê xwe hatibû Îraqê û li gundê Zêwê jîn anî bû. Zarutîya xweda Xerîk li cem bavê xwe xwendibû, li xortanîya xweda li Sulemanîyê, li mizgevtî Mehemed Berzencî dibesuxtê feqîyê paşê diçe Qeredaxê, Li wêderê li cem mala Ebdurehman pênc wîni hîn dibe û ji wêderê diçe Sabilaxê, li cem şêx Burhan hîn dibe û dikeve ser rîya terîqeta neqşebendîyê. Li Sabilaxê, li mizgefta Seyd Hesên dibe dersdar. Li Sabilaxê jinê tîne, jêra kur û keçek dibin.

Sala 1907 diçe rehmetê, gora wî li Sabilaxê li Goristana mele Camîdaye. Edebîyetnasê kurd Aladîn Sicadî, Refîq Hil mî û Maruf Xeznedar dinivîsin, ku şêrêd Xerîq yêd dildarîya sofîyane. Dibe ew wusabe, piranîya şêrêd wî derheqê dildarîyê hatne nivîsandin, lê heta nika ne hatîye zelal kirin û safîkirin kîjan şêrêd wî yêd sofîyane, kîjan yêd dildarîya siruştî û tebîytîne. Bi fikra min li nav şêrêd wîda li gelek cîyan derheqê hal û hewalê wî û yê xelqê hatîye nivîsandnê. Şêrêd dildarî, yêd derheqê jîn û halê wî û halê miletêda wusan bi hevra hatne hunandin, ku ne rehetê meriv wan ji hev cuda bike. Şêrêd wî dildarîya tebîyetî, şêrêd sofîyatî, şêrêd hal û hewalê wî û yê xelqê bi xeberêd xweşgo, bi rengê rind û qeşeng hatne nivîsandin û neqşê dildarîyê bi curê here baş hatne xemlandnê. Bona me selan min li jêrê çend şêrêd wî ji xwendkarêd me delalra çapkirne.

Kes tune bi hêsa pal li strîyan dayne,
 Talibê vê salê derxist, rû bi rû hate pêş,
 Sahibê e'rfan û daniş ser bi zana çûye paş.
 Bo silokî rîya marîf palewan ji nikare,
 Bo rîya hizb heyfe wek yek derd û heraş,
 Nan û avê ehlfî dil her xiseye û xûna ciger,
 Dest berdaye ji erşê talibê nanê belaş,
 Her kesê dangê sewr be, şêreke wî heye,
 Eblê bê deng bûne sahib milki şeş dang û meaş.
 Ger bi tîla û zor nebe, rozî bi dest kes nakeve
 Şahid bo mode'y rastî hukmî qazî giri caş,
 Dîn be zaye ger boy rêk keve piyawê nagehan,
 Wek kelîm ella xwedê kirîye delîlê seng teraş,
 Nek weku qazî zerurî û wek melayê nexwendewar,
 Ya xelîfeyê kuletaş û murşîdê cewher teraş,
 Ya wek min bext û ta'le yawer û yara min ne bû,
 Ciyê mitala û nora dersê min bûye dewra dora aş,
 Wek Rostem, Cahangîrim, Skender be na,
 Carê babaye refîqê min be wek yoldaşê baş.

(27-28)

Huzna min û hesena te aşkaraye heta axra nefes,
 Bo çî zekata husna te û ya huzna min negîşte bi
 kes,
 Zahirin, kerem ke, wextê mirnê hazir bim,
 û bi xweşî mirnê bimirim, de bese, îsafe bes,
 Çawan biki me'na dilê min tu ji şedetîya lêvê
 xwe,
 Lêvê te wek şekîrstan û dilê min wek meges,
 Çavê min bi wî baxê husn, me'ni çavê min meke,
 Lazime bo pasewanê baxê te cotek ebes.
 Teze te got cem kesî razî eşqa min mebêj,
 Te ne zanî dil gul bû, deng jê tê wek ceres,
 Bêjne zahîd bi xêra xwedê ji halê min mepîrs,
 Eşqa min dişxule û diçirûse, halê wê wek dirîk û
 dale
 Xala sewze, daxa sewze, basa nasorê meken,
 Heta pêşberî wî Xerîq qet şikê nabe tu kes.

(26-27)

Bira hemû kes bizane, ez sewdayê zilfê dutanim,
 Li xana kokda gulim bi ferzî şayî û rextmanim,
 Eger çî saknî milkê ecom bûm, dûr ketim ji romê
 Ji saya perçemê te reysê milkê şamatim.
 Dilê min her wek reyet xweş nişînê milkê ezate,
 Li her ciyê rûnêy, lê bigerî, qurbana bejna te
 bim,

Mitala haşa zilfê serê sefhe ruxê sihbe,
 Bo min çê bû bi mindalî li dersê eşqêda rehetim.

(29)

.....

Para nasîna nemerdî di kasa merdîda nabînim,
 Li cem wê kir û germî nebe, dilsarî nabînim,
 Çî rûspiye bi rû sorî ji bûyîna întîhamê der çû
 Derew nakim bi uca rastî rû zerê nabînim,
 Ji gend û rindî a'lem mepirse, ger tu zanayî,
 Xuda hilnagire, rindî min ne ditiye, gendî nabînim,
 Min serê hûr ne ditiye, wekî gir mîna wî be.

(43)

.....

Diyare saqî, ne bê baqîye mêla bi dildarî,
 Dibêjim ha neqdî can û dil dibêje wêda çû ji
 ber çavê min
 Dawa hicranî gul, ey dil ji şêx Şabaz temenî ke
 Bêje: îro bi neheq newnemamî cergê pê kewim,
 Weku ereb dexlî te bim, zelîl û zar damaw bim,
 Xerîq narê hicran û xerîqî eşkî hîrmanim,
 Li xak û bad û a'lemda enîse agir û avim.

(50)

enis: hevdem

Bi peykana bijangê te çend caran ez ketim,
Bi mihraza birûyê te best û girê bûm.

(83-84)

Min tirê tu nêçîra Reşîdî, yarî bo yarî
Li milkê mihrebanîda ji yaran wefadari
Tevî her zerê bo cilwe celay mihre cihanara
Ji şewqa mişterî nûra qemerî wek zehre seyari,
Cewarê rehmet û desga û pişga edil û insanî
Li der heq feqîran rast emîn û ehilî derbarî,
Ji xelqa mihusan serxweşî her mest û hişyarî,
Ji zimrûy çavesanî baregayê barê selaye a'mî
Telibeyê fewcî u'cî û yawerê siltan û serhengî,
Ji serbazan mumtazî, li ser esker qumandarî,
Çi xêre, wa dûrî bezma te bê seda şabaşî çawuş
çû,
Neva t'arê te, cena t'ar bo dem levsazî ne hat
barî,
Wek min dûre û bi çaverê mame ji ber çavan
Ji dest çûm û ji pê ketim li ser sing û bêmari.

(82-83)

Îlmê celeb û kesbî dinya bûye e'cîza kimiya,
Bo yekî mîna min sewda sewdayê seqmûniya,
Hev dest bûm ez di gel zahîd li destpêka kitêb,
Ez ne gihîştme fesla tezwîr, ew çû bû babê rîya
Fikirîm swarê merkebê(bim) li dewra milkê mehal
Swarê tasinê himet lena geht al rical,
Daxê daxanîm ku min zû Sabilax hişt,
Her wek muftî bi muftî qazî rûyê xwe ji heq pêçayî,

Ji uzra bû, ji mela bû cab da got: "Nadîm"
Ulax dest nakeve, çî dibe, eger peya bim.

Çûme cem ehlfya, dil û cerga wan bêdax min ne
dît,
Nalîna bilbil li baxda, qarîna qelereş min ne
dît,
Dinyake pîr ji nesaxan yekî sax min ne dît.

(91-92)

Dûrî merivê xwedê yekî qurumsax min ne dît,
 Ezîza min, tu dizanî ji ber çavê te ez ker û gê
 jim,
 Swar nînim, peyame, çawan bê te bînim,
 Ulax dest nakeve, her bi tibareka xwedê ser avê
 jim,
 Min got: Dixwezim paç kim, rûyê xwe bi ava rût
 gulav nakim,
 Ewê got: Tu dixwezî paç kî, dîno, ez jî rûyê
 xwe gulav nakim,
 Tal û şîrin tev hev min ne dîtne, ça bê ça nebe
 Her kesê di gel min rûnê, ça ne be, ji wîra jî
 ça nabe.

(91-92)

Ey padşayê milkê wulayet bi edalet
Mezlûmê şerê nefsa min û hatime şkayet,
Ketime jêr destê şeytan û nefesa min,
Dest bide destê min şkestî bi enayet,
Qurban û feda seyê ber qapiyê te bim,
Wa bizane se min bigire bo hefz û himayet,
Mîna taji dû nêçîrwan ez li pey te tîm
Bi wî şertî kes te neqire bi enuaet.

(18)

E'wrê xefetê berfa xemê daye ser min,
 Nirîna sir û serma ez kirmê serma,
 Canra beşrarê xemê cana sir û serma hicran,
 Bo min xweş ne bû bi serma, ne bi germa,
 Ketne serê min eşk û xubara ulmê dil,
 Axa minetê min ser xweda kir,
 Herme sahib get yekî têda nabinim,
 Herme Saqiz, agirê Saqizê wê cigerê min bisotinim.

(10-11)

BÊHÛD (1878-1955)

Navê Bêhûd bi rastî Mehemed bûye, ji binemala hekîm, muf-tî û zanyarêd şêherê Sulemanîyêye, nevîyê mela Ahmedê ku-rê Mehemedê pîr Hesênê navdar bûye; li sala 1878-da ji dayka xwe bûye. Li biçûktîya xweda li cem mele û zanyarêd kurd xwendîye û xwendna xwe derheqa dîn û dîyanet û ayîna Îslamîyê xilas kirîye; li pêşîyê li Sulemanîyê li mizgef-têda dersê dînê îslamîyê xwendîye, li sala 1900 hukmetê ew kirîye hakmê Helebçe, paşê kirîye serokê encumena marî fetîya Sulemanîyê; gelek sal şixulê hakimîyê û wekiltîya dînê îslamê kiriye. Di gel zanyarê kurdê navdar Refîq Hîlmî û di gel şayrê kurdperwer Zîver mamostayî kiriye, ders daye biçûkêd kurdan. Berî mirna xwe Bêhûd çend salan li Helebçe maye, paşê çûye Sulemanîyê û li wêderê hukmetê ew kirîye muftî. Li sala 1955 çûye rehmetê. Li sala 1960 edebyetnasê navdar Mehemed mela Kerîm dîwana Bêhûd çap ki-rîye. Dîwana wî bêş dibe ser du bêşan: Şêrêd bi kurdî ni-vîsandî(1-140) û şêrên bi farsî nivîsandî(141-291). Ew şêr derheqa dildatîyê hal û jîyîna mîletê kurdda û welatê kurdanda hatine nivîsandnê.

Bêhûd jî mîna şayirên me din wetenperwerîya xwe di şêrên xweda dîyar dike, reng û riyê welatê xwe, hal û hewalê xwe bextreş dîyar dike, derdu kulên weten dikişîne, dibê-je, digirî, dikewgire û dilûvîne, ku çerxa feleka kurda,

çerxa rojgara kurdan çep dizvire, herdem li ser wanda bî-
rûske, reşebaye, tofane. Ew dibêje, ku ji wî halî azad
bin, pêwîste kurd di gel hev bin; arîkarî hev bikin.

Min li jêrê hine şêrên Bêhûd yen kurdî ji ber dîwana wî
girtine, kirne ser zaravê me Kurmancîya jorîn, ku xortên
me delal wan bixûnin û haj nivisara wî bin.

DÎLÊ MIN

Ji wê rojê çûye, xeydiye dilê min,
Çiqas digrim, bê serî û bê şûn maye dilê min,
Ax li çi şaxî agir lê ketiye dilê min,
Ax ji çi daxê sût û şewitiye dilê min,
Ew hevdem xemxwera nedîma mine, ya reb,
Ew merhema esrera qedimê mine, ya reb,
Ew gewhera şahwara û êtîma mine, ya reb,
Ketîye çi behrê, xeniqîye, dilê min,
Mecnûnî, du gîsoyî, çi leyloye, wax lo,
Ya wamiqê caduyî, çi Ezraye, wax lo,
Dîwaneyê ahuyî, çi sehraye, wax lo,
Çi cehre perî dîtîye, ku tirsîyaye dilê min,
Ditemire carna bi xeyalê xet û xalê,
Dişewite carna bi çîra şewqa şemalê,
Nizane çawan be ji derdê wî halî,
Mîna pûş û pelaşê ber baye dilê min,
Li wê çolê, li wî biyabanî kê bibe yawer,
Ya li wî kefî, li wî çiyayî kê bibe sewdaser,
Ya parçe-parçe bibe efkara bijûyê xencer,
Çawan maye li sed çîyan, hatiye kuştin dilê min
Bo çi ne rîje sêlava hesrê min mîna baran,
Bo çi mîna Yaqub ne bûm şuhreyê şeheran ?
Min pîrs kir ji wî Yûsifî, ji began û yaran,
Qet car qenc nabe birîna dilê min,
Bo xwe bigrim, ya bo nefesa perda dirî ?
Ya bo cegera gul-gul sed parçe kiri ?
Çi kirîye, ya reb! ku xwerin û av,
Her dem bi xem, bêdar û xûnave, dilê min,
Çi bikim, çi bêjim, çima bi derdê girane dilê min.

Şahdê minin mûye sipî û cihreyê zer,
 Ne k'urê nalin, germ û dema min,
 Helbet li her ciyan alave, dilê min.

(Dîwana Bêhûd, laperê 66-67)

ARAMÎ CANE DÎL

Aramî cane, mehrûmê razî nihane dil,
 Yanê li nav yar û minda tercumane dil,
 Erşê xudaye, xatirê pîr nûra mûmane,
 Lema wa li ser serê heft esmane dil,
 Ser xwe be, qet bijîşkek xûnê naxe gunê te,
 Bo teyrê muhbetê heq hêline dil,
 Her dem li dergê singe, yada rûyê nîgar,
 Wa şimşîr li destê, mîna pasevane dil,
 Bêgana bê jorê, wê serê wî qet bike,
 Eger yar nase, îda mêvane dil,
 Ax lo, yada nergisê, bêmare kêya, wa,
 Rûxsara sore zere, behara xezane dil,
 Bêmara, nazê xemzeyê çavekî getil,
 Mecruhî mewcê cewherê şûrê debane dil,
 Ax ji hesreta ney bala kêye, wa,
 Daym xerêqî nalin û ah fixane dil.

(Dîwana Bêhûd, laperê 38)

HETA KENGÊ

Dîsan qapîyê xemê li me ve bû,
 Pergayê tereb ji a'lemê dil hate girtin,
 Dîsan ceger kirne kenarê mişgeqet,
 Yanê dikana çerxa cegerê ve kirin,
 Dîsan birîna kevne xemê me xebitî,
 Dîsan ji herdu çavan weten bû gola xûnê,
 Hesîr mîna fewarê ji dil hilqolîn,
 Dîsan lîva xezayê ji lîva û nehîya qezê,
 Bo kurdê qurbeser bi mezel helkirin,
 Stêra birca hequqê wî bû weten,
 Îşev nişkêva kişîya û carekêva hate kuştin,

Daxa xemê feraqê danî ser cegerê
 Birîna hezar salî dil wa k'olîya,
 Girîya û got: " Weten, cegera min hate birîn",
 Şewqa çîra meclîsa xûret hatiye kuştin,
 Ey çerxa bed me'a'mele, heta kengê xeta biki ?
 Vî kurdê bê kesî bi xem eşna biki,
 Heta kengê lazime danê biki ar ?
 Heta kengê xirmanê e'mrê me ba biki ?

(Dîwana Bêhûd, laperê 96-97)

KURDNO DI GEL HEV BIN

Kurdno di gel hev bin, wa wextê sirûre,
 Wextê gul û rehane û nesrîn û çinare,
 Binêrin, gulşen ku dibe bo qelemûne,
 Geh sewze, geh zere, geh mawî û sore,
 Binêre avî û gihîya heta bizanin,
 Ev her zimrûte, ew jî cejnî bilûre,
 Binêre, dinya ku dibe, cinnete îro,
 Li alîkî hemû xilmane, li alîkî hemû hûre,
 Nergiz ku îro temaşegeha seyrankere îro,
 Wek çavê bî we xudanê sed cûre fitûre,
 Xizmno, eger basa min û bavê min dîkin,
 Axayê Silêman û kemala wî jî wek mûre.

(Dîwana Bêhûd, laperê 80)

RIJÎN HESRÊ BARANÊ

Dîsan bi xulîn rijîn hesrê baranê,
 Li ewrê şavê sore sor belavkerê mirvaran,
 Mij û dûman welatê kurd dagirt,
 Nişkêva mîna dûkela maşîna şeheran,
 Li zemîn bû tarî bo min û te,
 Zeman nişêvî mîna her caran,
 Cenabê hepsxanê teşrîfa wî çû,
 Şkest piştî feqîr û fiqaran.

(Dîwana Bêhûd, 63)

HETA KENGÊ EM NEBNE PERWAN

Heta ez û tu nebne perwane,
 Wê çawan xweş be şewga weten,
 Hişmetê Xosrovê mehalî heta
 Canê şîrîn nekin fîdaya weten,
 Bê şirikaya biratî get car
 Tune çare bo rê û dirba weten,
 Bê k'îna yekîtî û cîdîdî,
 Zehmetê çara lerz û t'a weten,
 Heta kengê em li zehmetêda bin,
 Heta kengê li nav zulmêda bin,
 Lazime bi kêf û mesret
 Em ruh bikne qurbana mîlet,
 Zatî em xuliqîne,
 Bo xizmet kirin,
 Bo wî fidakar bin
 Heta roja mirin.

(Dîwana Bêhûd, lapelê 140)

DILÊ MIN MEFTÛNE

Dilê min meftûne, çavê dilberekê nîkte perdaze,
 Ku mehîzî husne, eynî xweşîyê, ser çavê wî naze,
 Li baxê nazikîda mua'dil serokê savaye,
 Li dîwana çemenzarî dilda derdekî mîmtaze.
 Bi zorê husnê xwe îqlîmê erzê esman girt,
 Li ser textê zemîn şahê zeman meha feleknaze,
 Suweyda perçemê mîna fexra kazib zulmet efşane,
 Beyaza gerdenê wek subhî sadîq purte û endaze,
 Herimê çav li nav rûmet û take xemê ebrû,
 Metafî naze, ku ebeya wê îmtaze û qibla raze,
 Li bazara muhbetêda hezar lomê min bikin exvan
 Ku ev Kerkûka cîyê rawê şehîn û şev baze,

(Dîwana Bêhûd 81)

.....
 Mîna murxê qefesê bo çi nekin zarîn û nefirîn?
 Heyranîm ku nika min bikne bîrê,
 Min ne bihistîye qet rawker heta nika wê bigre,
 Min bihistîye, ku bi dawê û şkarê asik hatiye
 girtin,
 Însanê bigre dîdeyê ahuyê birayê min.

(Dîwana Bêhûd)

DÎSA EW RÊN BELA HAT

Dîsan e'wrê bela hat, saya weslê gulan çû,
 Şevê matem peya bû, roja xweşî bilbilan çû,
 Temê xemê ta qiyametê bo çi venagere ji welatê
 kurd?

Çaxê zatîkê wefadar û necîb û xanêdan çû,
 Biçûk çima te qor ne pîva? mezin, tu xwedê,
 Kengê asaya destê pir û hêza ecnûya xortan çû,
 Îro mîna ree'de behar ji mezin heta esman çû,
 Mişûr xurî, gelî milletê cenabê Mistefa Muzher,
 Kengê bangê husnî xuliqî? çima hemû Kurdistan
 çû?

Eger, keko, ew hevtayî bike, navê wan ji hev
 dûr be,

U, eger na mîna wî rengî hikyat û dastan çû,
 Li ser wetraxê destê rux û şax û daxa berza dîl
 Humaya wî cîyî saedet, bazê erfana asê wan çû,
 Bi xeyb bûna wî ew bavkê feqîr û xadîmê gewm
 Ji ser hiş û dîl sebir û ji can tab û tawan çû,
 Bo çi milletê kurd du car li duzexê xem kir?
 Lê şikir ji xwedê xwe ber bi bihuştê cavidan çû
 Muhasib muhemlê vê şêrê ger cime û kom biki,
 Tuê bizanî, ku rewana pak çû baxê çîyan,
 Weten, Bêhûd mîna ewledê te bo çi ne nalîne?

(Dîwana Bêhûd, 130-131)

ZÎVER (1875-1948)

Zîver kurê Mehemedê kurê mela Resûle, li şêherê Sulemanîyê ji dayka xwe bûye. Li h'eftsaliya xweda li hucra mela Sehîd xoce Efendîda dest bi xwendnê kirîye, quran, negehan û gulistana Sehîd Şîrazî xwendine, li pêşîyê feqîtfî kirîye, li K'urdistana jêrin gerîyaye, çû bû Merîvanê, Banê, Sabilaxê, Rewandizê, Hewlêrê, K'erkûkê û paşê vegerîyaye Sulemanîyê dersê ulmê e'rûz û qafî û erfana xwendîye, li wextê hukmeta romê çûbû Stembolê, li wêderê ulm û zanîn hîn bûye. Bûye nasê merivêd k'urd yêd li wêderê hingê dixebitîn û li ser rewşenkirna xelqê k'urd wextekê li gel (t'evî) wan xebitîye, li paşî çar salan vegerîyaye Sulemanîyê û li wêderê bûye mamostayê mek'teba "Rîşdîyê eskerî".

Li wextê hukmeta Îraqê bûye mamostayê "Edadê Milk'i". Li wî wextî li Sulemanîyêda zanyarêd k'urd k'omêk bi navê "Zanistî" teşkîl kir bûn. Zîver di wê komêda tevî zanyaran dixebitî. Wezîretîya hukmeta Îraqê Zîver bi navê mamosta dişîne gelek cîyan ser îşê dersdayînê. Zîver wek sîsalî li Sulemanîyê ders daye. Li sala 1948 li Sulemanîyê çûye rehmetê. Ewî rind zimanê farsî, erebî, tirkî û kurdî dizanbû. Bi wan zimanan jî şêrêd xwe nivîsîne, dîwana şêrêd wî li sala 1958-da li Bexdadêda çap bûye. Li pêşgotna xweda Necmedîn mela kurt serhatîya Zîver nivîsîye, li wê dîwanêda şêrêd Zîver derheqa jîyîna gundî, bajarvanan, jin û keç û kurêd kurdada û derheqa h'alê miletê kurd û Kurdistanêda nivîsîne.

ÇIROKA KOMELETI

Li xewa şevê min dît xewnek xirab,
 Ez ne quranê dizanim, ne kitab,
 Çûme cem melekî esebî,
 Min gotê: "Ey werisê ulmê nebi,
 Dixwezim hîni xwendin û xet bim,
 Li îşê ulmda weke pût bim".
 Ewî got: "Hînbûn bi meznayî bî pilaw,
 parî nan bo poz be yan bo çav,
 Ehmeqî, tu nizanî û ne jî dizanî,
 Çawan tu bibî wek pût bi asanî"
 Min got: "Ey nûra çavê îslam,
 Nîşana hukmetê helal û heram,
 Min bê umud meke, jî heq û hucret,
 Nexdî ez canê xwe tera dikim xizmet".
 Ji wan qisan hinekî lê ket lerzan,
 Got: "Ji min vegere, cahilê zorzan,
 Dixwezî bêjme te bi quran,
 Dixwezim manga hucretê deh qiran,
 Solkingê min dirîne, bidru vê gavê,
 Bidru, qencyê bike heta berî êvarê",
 Solêd wî min danî ser milan,
 Çûme cem pînedirû bi şewqû xinan,
 Min seyrî hosta kir, qet karê wî tune bû,
 Zahirê taqet û qerarê wî ne bû?
 Min got: "Ey mamô, mêrê sene'tkar,
 Çavnêriya lutfê teme li nav bazar,
 Gotê: " Solê min heye li mehela Esef,
 Pîne lê lazime li nav kef",
 Ewî got: " Birçîme, nikarim ez,
 Eva du rojin ji nan dûrim ez,
 Bibeze cem nanpêjê kulor firoş,
 Bîne niv hoqe nanê zar bîn xweş,
 Solêd te zu bidrûm ser çavan,
 Tu here, nan bîne bi dewan".
 Çûme cem nanfiroş, silav lê kir,
 Kulorek nan min jê lava kir,
 Got: " Bavê min, tune nanê firotin
 Ar bîne, bo te bikim nane pê".

Çûme ber derê dikana yek qat,
 Min got: " Ey hacî, tu bê beyt û tewaf,
 Hoqe arê genim bide min,
 Qîmet çiye, peran derxim ji cêba min".
 Got: " Arê min tune, eve maye,
 Mişterî hemû pere daye,
 Ji cem pale bîne genimê temiz,
 Bo te zû bikim nanê ezîz".
 Çûme cem pale xudan cot,
 Mixaza rizq û medena qût,
 Min got: " Ey xoşevîstê ruh beran,
 Yek men genim bi min lazime bo nan",
 Got: " Ne maye da'nê genimê par,
 Zû-zû bibeze, here bazar,
 Bibîne dikana asinger,
 Bêje mame hunerwer,
 Da'sen palan bide min,
 Bi kirê çend pale girtine min,
 Ku da's kete destê wan,
 Ezê tera katan çêkim ji ber dîlan",
 Çûme ber derê dikana asinger,
 Min dît: kiz û mat, a'ciz û mizter,
 Basa da'sa palan min jê kir,
 Caba min da, wa got:
 "Ez çawan îş bikim bi van lerze t'a?
 Him li serma me, him li germê,
 Kes tune here bijîşk bîne
 Bo min bîne dermanê lez û t'a".
 Ne îlac çûme cem bijîşkê welat,
 Min gotê: " Ey aqilê bi malûmat,
 Bide min du heb sûlfat
 Nexweşxane mikanê xêrat".
 Gote min: " Ku dest xim dermanê baş,
 Here, gazî bike Xelifeyê dar taş,
 Şkestiye şûşa pencera min,
 Ba pêra bir kitêb û deftera min",
 Zû bi çapik gihiştme bazar,
 Çûme ber derê dikana necar,
 Çol bû, dikan li ciki xewle bû,
 Gotin: " Çûye cem xeyat û cilbir,

Bûkê tîne, tivdarek dike"
 Ne îlac bûm, li ber dikanê westam,
 Seyrî xelqê min kir wek merivê sersam,
 Pir bû meydan ji gundî û şeherî,
 Gişk ber bi hev bûne bi yek hişyarî.
 Gale-gal û hare-hara merivan,
 Xewa mine şîrin ji dest min birin,
 Bihirim, çûm, min seyri mala xwe kir,
 Ji vê xewê diqet û xeyala xwe min kir,
 Min got: " ev xelq wehşî û medenî,
 Îhtîfacin bi yek feqîr û xenî,
 Wek zincîrin û ji hev belavîn,
 Bi dest û pêne û ser û çavîn,
 Heyfe, dewlemend rû nake feqîr,
 Bo feqîr tengê 'trêk' e 'mrê mir,
 Dewlemend e 'ybe, kebir û fêz bî,
 Bo feqîr boxil û ne temiz bî,
 Şûrê dest yekin xenî û feqîr,
 Têne stran mîna hevîr,
 Cotyar, şivan, şa û gede
 Hemû motacê hevin, bi xuda.

EY ŞAGIRTÊN WETEN

Ey şagirtê weten!
 Roja fezil û hunure,
 Li vî wextî, li vî zemanî,
 Rûniştin bo te zerare.
 New û nemamî nav wetenin,
 Zîndeganî bo te çiye?
 Bê şewqa ulm û marifat
 Colana me bê semere.
 Dest û milê hev bigirin,
 Bibin hemû bav û bira,
 Çav li destê meye ev dayka qur bi ser,
 Mektêb sûra kela meye,
 Bo xafizî dîn û dinya,
 Însan ne xwendewar be,
 Kêm qedre û bê cewahire,

Kurdistana me wê bê beş be,
 Ji nûra marifatê
 Av û hewa wek buhuştê
 Dar û berê cewahirê.

XÎRET BIKIN

Lawanê weten xîret bikin,
 De ji xewê hilsin, wa şev bihirî,
 Ne ma zemanê cehil û nezanî,
 Îro firsete, roja hîmete,
 Bi ulm û sene't berz be milet,
 Ulm her dem xereqî îşe,
 Her dem îsan dibe pêşe,
 Îş dike bi merdî, bi dest û birdin,
 Yek dil û dev bin ta roja mirdin.

LURÎNA KEÇKA KURD

Keça Kurdistanîm,
 Ber rezê ser berdanim,
 Mirîna nav çîyanîm,
 Bi xwe ez ciwanîm,
 Ey kesê bê dîne,
 Zû were, min bibîne,
 Karê xwedê çend şîrîne,
 Bi xwedê ez ciwanîm,
 Ne wek rom û firingim,
 Keçka zor şox û şengim,
 Bi xwedê ez ciwanîm,
 Ne çînî, ne yaponîm,
 Ne bi reng zefranîm,
 Ne Sudanî, ne Hebeşîm,
 Ne liç zil û ne rû reşîm,
 Her gav wek gul geşîm,
 Bi xwedê ez ciwanîm,
 Kênîrê şax û deştîm,
 Wek gihabenê bihuştîm,

Rêhana bi siruştim,
 Bi xwedê ez ciwanîm,
 Ez kewa daristanîm,
 Çav şehîna çiyastanîm,
 Ava be Kurdistanê min,
 Bi xwedê ewe şox û şenga min.

(Dîwana Zîver, Bexdad, 1958)

KURDISTAN WETENÊ MINE

Kurdistan wetenê min,
 Ciyê şêrê babane,
 Ciyê ab û îcdade,
 Û hem ciyê şêrane,
 Her bijî, ew wetenê mine,
 Bo weten can fîda bin,
 Wa xweşe têda her fena bin,
 Li rîya têda em yek çavîn,
 Yekî, em qurbana te bin,
 Em her gav heyrana te bin,
 Şax û deştê Kurdistan,
 Mîna cînet wahanî, nî,
 Gîşk deşt û seyranî
 Her bijî wetenê me,
 Hêlîna heyata me,
 Aşnaya sedata me,
 Ban kin bo wetenê me,
 Em qurbana te bin.
 Bi ulm û marîfat ava be Sulemanî,
 Hemû şeherê kurdan
 Sinne, Sabilax û Wan,
 Nuranî û ciwan be weten,
 Weten wetenê kurdan,
 Ciyê şêr û mîran
 Qurbana te bin, ey heyran.

ARAQ NAXUM

Araq naxum, ku rastî derde ser ne bim,
 Ku giriftarê hezar êş û xeder ne bim,
 Her çî xwedê hez nake, ez dikim bi sirî,
 Îda bo çî şerme bibin nav beşerî
 Araq naxum ku jîna min kurt û kêr nêbe,
 Ku bi ciwanî ez rastî zerarê ne bim,
 Ku nexweşê hîle û qelp ne bim,
 Araq naxum, ku ji neslê xwe negetim,
 Hez dikim, ku bavê sed kur bim
 Araq naxum, ku bê hiş û bê xîret ne bim,
 Ku li halê dost û dijmindî bêxeber ne bim,
 Araq naxum, ku qaqa û kenîn bim,
 Ku tu car mesxerê ehlê nezer ne bim.

CEJNA REMEZAN

Cejna remezan hat, heyamê zirûre,
 Li her cî ez seyr dikim-komeke nûre,
 Alîkî bi neva u'd, ney û çeng û cexane,
 Bazar, der û kûçe mîna wa'dê tûre,
 Alîkî ji zahîd ser kiz kirîye, bazare kesase,
 Şahîd xem der kirîye, bi xwe şemî hizûre.

ZIVISTANE

Zivistane û Cûdî safe bi gewate,
 Îro bîst û pêncê sibate, şaye bo te,
 Ev haje-haj barişê û u'd û ribate,
 Derheq feqîr û kor û etîm bê mirwate.
 Dinya bûye behra sipî, şax û şew û deşt,
 Nav dê cizîreke reşe cejna malete,
 Eva berfe, berfa raste, ne wek berfa galte,
 Rê hatiye birîn, ji vir çawan herî geşt.
 Gerden keçî, sibê zivistane, şax û dar,
 Ser xwar bî, terawet bî menzera ciwan,
 Bê sewze zare rêyî, ava sipî û rewan,

Bê gaspe-gaspa kewê û bê nexmeta huzar.
 Rabûm bi lerze-lerz çûm astanê şa,
 Zivistan ku şahe leşkere, bi şik û kadowa.
 A'lem ji zulma leşkerê wî kete helwala,
 Min gotê : "Daxilî teme, bi dil, ey şahê mekola.
 Tirsî bibî ji xaliqê û şahê beharê,
 Siltanê edil perware, şahê kewem teme,
 Tîne pêş, ku bigihijên defeyê sed cefa,
 Şimşîr bi dest û nize bi kef sed hezar hezara.
 Tu aqilî ji halê min wesfê kainat,
 Behrê sipî buxarî dişîne ser welat,
 Ulme te tune bi halete erz û kurey sema.
 Rabûm ku biçme xizmeta behra sipî, got:
 "Rûnê, li vira, eva sefera te her bi xêre,
 Eva we'zê hal heta wextekê qiyamete,
 Bo çi dikeví ser rê mîna gêjê ser pête".
 Behr ji dibêje: " ji rojê peyda dibe buxar,
 Roj ji cabê wa dibêje: mijge xaliqe,
 Teqsîmî risqê a'lem dike, çimkî razîqe,
 Xalî nine ji hukmetê, zivistane ya behar.
 Îro ku berf û terze, te xiste zem herîr,
 Havîn ku hate pêş, berf avê dixê dixê deştê,
 Ew deşt hişk û germe, dibe sera bihuştê,
 Qarûn û Dicle bête vicud bo xenî û feqîr.
 Ez çime li fasonê fereng, çuxê bê rêvî,
 Ta şalê merez yanê hirî bibete qumaş,
 Rûniştina ser çavê avana çiyayê min,
 Nadim bi hemû milkê cihan, eger gede bim,
 Bo seyra gul, mergê nizaran li beharan,
 Çavê min wek nêrgiz geşe, meftûnê hewanim,
 Daxa min ewe, her wetenê min gelek nezanin,
 Bi vî derdî dihelim, av ketiye aşê min.

STRANEK BO BIÇÛKAN

Em mindalin û nû ciwanin,
 Hemû qurbana Kurdistanin ,
 Çimkî huba weten ya meye,
 Bi wê em hezkerê îmanin,
 De wusan hevalno, li riya weten
 Zor bixebitin, zor bi wujdan,
 Wetenê me wek bihuşte.
 Em jî li navda xulamin,
 Her bi hewa Kurdistan em dijîn,
 Li wî baxîda bilbil xweş dixûnin.

SERKEVE KÛRDO

Ser keve, Kurdo, ser kel gulzare,
 Nav şov û nav deşt bi xwedê ciyê mûrî û mar,
 Bi xîret be, nevîyê şêrê zor delîlî,
 Bo çi li vê demê her tu hêsîrî?
 Eger ser kevî, bi xwedê ser kel behare,
 Hemû çiyayê dinya wele bi te diyare,
 Bi himet be, bi qîmet be, tu pilingî,
 Bo çi li vê demê kurdo! tu dil tengî?
 Ser ketin wele firo bi xwendine,
 Miletê cehil wele lapî mirine,
 Bi xîret be, li vê demê, lawo, her tu hêsîrî.

SEBRÎ (1881-1944)

Navê Sebrî rastî şêx Necîmêdîne, ew kurê şêx Ebdurehmane, ji eşîra berzencîyane, li gundê Şorîcê(Qerehesenê) li nehîya K'erkûkê ji dayka xwe bûye. Li biçûktîya xweda li cem şêxên barzancyan hîn bûye, li xortanîya xweda gelek guhdarî dabû ser hînbûna p'êşan(senetê), jîr û feraset bû ye, bi zimanê erebî, kurdî, tirkî û farsî şêr nivîsîne, gelekî li Kurdistana jêrînda gerîyaye, li paşî jinanînê (zewacê) li gundê Şoreçêda gundîtî kirîye, bûye serperestê gund, car-caran jî şêxtî û îmantî kirîye. Merivekî dîn perest bûye, ser dîn û ayna musulmanîyê jîye, pêşê hekîmî yê jî zanibûye, xwe ser terîqeta qadirîyê girtîye. Xwedênas, rastbêj, xîretk'êş, camêr û dîlfîre û maqul bûye.

Li pêşgotna dîwana wîda nivîsîne, ku ewî bi çar zimanan şêr nivîsîne, bi kurdî, erebî, tirkî û farsî şêr nivîsîne. Dîwana şêrên wî ya kurdî nivîsandî li K'erkûkê hatîye çapkirnê. Şêrên wî derheqa ayn û dînê musulmanîye û derheqa evin û dildarîye hatîne nivîsandnê. Ji wan şêran şêrên evintîye hezkirnê û dildarîyê yên here p'irin.

Li pêşgotna şêrên wîda nivîsîne, ku Sebrî ne merivekî xwe firoş bû, jîyîn û ayna kurdewarî hez dikir, ji jîyîna xwê razî bû. Çaxê Înglîz li Îraqê bûn, gazî wî kirin, ku ew bibe wergerê(tercmaçîyê) zimanê kurdî, erebî, ewî nexwest bibe xulamê zevtk'aran, ne çû. Derheqa vê yekêda Sebrî ev rêzên jêrîn nivîsîne.

K'olosê serê xwe dirî nadim t'acê padşa,
 K'olosê xwe du kolosi nadim qesir û qencî padşa
 Bi xûnê can û bergê xwe alûde dikim, ezî gêjim,
 Rehma xwedê nadim bi du nan û eba, ezî gêjim.

Min xwest ku xwendevanên me delal bibne nasê efirandna
 Sebrî û bo wê yekê min çend şêrên wî evintîyê û dildarîyê
 bi zaravê me kurmancî çap kirne.

ÇAVÊ GÊLAVÊJÊ

Tîrêja rûmeta çavê Gêlavêjê
 Bi carekê a'lem kire şevgêjê
 Manga rûmeta çavê Gêlavêjê
 Musulmanno, îlac bûmê şevgêjê
 Hemû a'lem hêsir û zamdarin,
 Bi defka zilfê tîra çavê xûnrêj
 Ji defka zulfan derçûna min mihale,
 Bi quran û bi Loqman û beravêj
 Ji destê wê mihalê ristgarî,
 Bi loqman û bi derman û beravêj
 Awa min kir, ji defka zilfê wê derçûm,
 Bi kî alî birevim, ji tîrsa çavê xûnrêj
 Ne hatî defeye, derdê min derman ke
 Wesyet be, were ser qebran min binêj
 Ji tîrm û tar û tîra te t'êr nebûme
 Bi k'ewa dîl, bi çavê te bihavêj,
 Bi xemzeya çavê dîl teskînî nabe,
 Weku te bihistîye bûye berxê ber mêj
 Xwedê bextê bilind da we,
 Da me destê kurt û ta'le lîj
 Tu ne hatî ser vê nesaxî carekê,
 Ku mirim, min bibe ser gorê, min binêj
 Mepirse Sebrî tu çawanî ji dûrî
 P'erîşane bi vîna ademê gêj. (88)

TEYRÊ DILÊ MIN

Li fezê teyrê dilê min kete nav defka firaqê,
 Asika ruhê min kevte nav destê (Zerxamê) firaqê
 Ey dirîxa bo hekimê aşna û mîhrebana,
 Yek bi yek erzê bikim azar û alamî firaqê
 Çewa xûnavî çavê min erd rengîn kiriye,
 Tu kerem ke, melhema dane li ser birîna firaqê,
 Halê derdim, nale-nalim, ew kes fam dîkin
 Jehra hicrê bibe xur, yan birîna sersamê firaqê
 Heta bikî bedra cemala te vedişêrî gelekî
 Cewra bê payan û hicrê mihnetî şamî firaqê,
 Şev nixûnî xweşe bi wê umudê sibê tel'etê,
 Derkeve herçende ne me'lume (ayamê) firaqê,
 Sebrî ku t'eke şev nabêjin çimkî wesfê yar,
 Întihayî nayê, bê payane encamê firaqê. (III)

EY PÎRÊ CANGIRAN

Ey pîrê cangiran, guhgiran, aqîl hoqe sivik,
 Wey mîrê tekiyê zil û xaneyê dîn biçûk,
 P'uka te nema, gûza p'uk menî bi dev bide,
 Bo pîran û rîspîyan ne rinde teze bûk,
 Roja tucaret û teme'e xwe ji birê mezinra a'd
 dîkî,
 Meydana nivêjê û cimaetê dibe bîra biçûk,
 Şikir ji xwedê şewket daye te û şewkete,
 Bostanê dînê te berelaye bi du kuşik,
 A'lem girtine naçne ser hekim
 Diçûn, dixwerin hebê hekim
 Vê nale-nala zaruwa, ku fexrî pê dîkin
 Bê îtbare, nalîna zaruwa nalîna fisûk,
 Sebîrî, eger çî qisa te raste, bese bêjî,
 Tezîzê nas meke li mesakîna ta milûk. (II6)

SELAM(1892-1959)

Nevîyê şêxê gundê Azebanêye li topraxa Sulemanîyê, kurê şêx Ahmede, li sala 1892 ji dayka xwe bûye; bavê wî ber destê derebeg Mehmed paşa dixebitî. Li pêşîyê ew li gundê Azebanê li cem şêxan li mekteba gundda hîn bûye, paşê li Sulemanîyê hîn bûye. Li paşî şerê hemû dinyayê yê sala 1914 Selam dikeve nav şerê azadbûna millet. Li destpêka sala 1920 li eskerîya hukumdarê Kurdistanê Îraqêda bû, li paşê heta sala 1955 li dîwana hukmetêda qulix dikir, dewletê gelek cara ew ji şeherekî dişande şêherê din ser qulixê. Sala 1955 ew ji qulixê derket. Sala 1959 li Sulemanîyê çûye rehmêtê.

Refîk Hîlmî dinivîse Selam "tengî û çelema dinyaê gelek dîtîye, gelek rojêd giran li serda hatine, lema zûva porê wî sîpî bûye".

Li sala 1920-da dest bi nivisandina şeran kir, rind erebî û farsî û kurdî zanbû. Şêrêd wî piranî yêd derheq hal-he-wal, jîyîna xelqê, derheqa negbetîy û bindestîya milletê kurde. Bêr û bawara wî ewe, ku rojek millet ji bin destê dijmin derkeve, serbest be û ber bi rîya bextewarî here.

Maruf Xeznedar dinivîse, ku Selam rind zimanê farsî zani-bû, ewî bi ezber "Şah-nema" Firdewusî dixwend, şêrêd Omer Heyam tercimey zimanê kurdî kirne û gelek çîrok û serhatî

nivîsîne. Lê sed heyf heta nika hemû nivîsarêd Selam kom ne kirne û li berhevokekêda çap nekirne. Her bi tenê sala 1958 dîwana nivîsarêd wî bijartî li Kerkûkê çap bû.

Ez jêrê çend nimûnêd şêrêd wî bi lihev anîna xwe tînim ber çavê xwendevanê delal.

KIZINA DERDÊ COTKAR

Feqîr û hejarim, kesas û kilûl,
 Ne têr û birçî, cîyê min deşt û çol,
 Xulamê axa bûm heft sal temam,
 Zevî, deşt û dol jêra dikola,
 Bi heqê mehê yan bi kirê karî dimam
 Carnan bê peran û parî nan.
 Li zivistanê bi destê cilê dirî,
 Bi cote pêlav-çarixê pan
 Tifing li destê min bû,
 Bêdar bûm, şev li çolan
 Carna ez pawan bûm li Dehol,
 Zivistanê cotkar bûm, havînê titunevan
 Li ber berf baranê bo garanê axan
 Dar min danîn bi mal û piştan.
 Ez dû wî diketim, kuda ew diçû,
 Bi kişîn û fişîna e'ba pir qul
 Xûdanê li ser min dikire xule-xul,
 Nav li min kir bû "Kabrayê kirmol".
 Neçar bûm, revîyam cem şêx,
 Min dest û pê wî paç fikir,
 Bûme xizmetkar, bûme devrêş,
 Pirça serê min ma bû li şûna kakol,
 Çend bavê min kuştin bo xirman,
 Çend birê min kuştin bo parî nan
 Bo wî şewitîm çend caran
 Bûme merivekî heramzade û zor,
 Bi rojan li cerdê bûm li çîyan,
 Êşk min digirt li şûna gol,
 Pêpes bûm li bin p'ê şêx û axan
 Ez berade bûm, mala min kor,
 Li Kurdistanê rez û tirî bû,

Ji min standin, nadme min yek pol.
 Nêzîkî tepil û defê me bin,
 Her ji dûrva xweşe dengê dehol.
 Deşta Şarezûrê lîrîn û birin,
 Bêjin nebêjin kwa ew xak û xol,
 Li ser vê xakê bimîne bê zevî,
 Bo hejaran ne maye ger gemol
 Bi vir û derew, bi lûla tîfing,
 Av û deşt û çiya bûne xîşt û xol,
 Bi zîkekî têrim, bi sed zîkî birçî,
 Bê beş bûm ji rencê şan, mil û qol.
 Ev henasa sîngê min tê der û dor,
 Heta azad nehim, nadme xwedê gula sor.
 Çira ronîk va hate ser pencê jor,
 Baskê şkestî, lawê gurec û kol
 Wê darê eqtayê ji bin derînin,
 Cotkar û law û koma kirêkaran
 Wê rêkê ji vî halîra bibinin,
 Komelê saz kin, ber bi azadiyê herin,
 Şêx û axayê kedxur ji nav xwe derînin.

ŞAGIRTÊ KURDISTANÊ

Zanînga mezin wa li Kurdistan,
 Yekum Mektebe her bo musulman,
 Tek tûk şagirt gawur û cihû bûn,
 Dihatin jimartin li rêza nebûn.
 Ji kîsê millet yanê xêrdane,
 Baş hatibû çêkirin ev saxtemane,
 Xanîkî baş, gelekî mezin û dilgîr,
 Mezin û firewan mîna qesra wezîr.
 Bûye fêrga gelek bi dil xweşî,
 Roja pîrozê şerbet me dinoşî
 Ji hemû aşî xurek têda didan,
 Heta hat basa mamostan.
 Merivekî mezin, berêz û hurmet,
 Got: "Guh bidin, koma millet,
 Mamostayê mezin, xudan hiş û bîr,
 Gelek kême li cem me, ku bikin tedbîr",

Milet gişkî bi carê qîrar kir
 Ser û mal dan, zana peyda kir,
 Me'lume, li cem me xwendewar kême,
 Mesela xwendin nakin bi gême,
 Eger can û mal hemû fida kin,
 Em bêçarî, lazime zana peyda kin,
 Gelê bê zana, xudan jîn nîne,
 Nizane bo komel sudê bine.
 Çend mêrê gelek jîr û zana,
 Rîya karsazî bi vî rengî danîn,
 Li Rohilatê ulm ne maye
 Ew jî ku bibe, çavê me li rêye,
 Çaxê zaruwê me pê bigihîjin,
 Ji Evropê mamosta binin û bêjin:
 Huner, telsaz, radio û teyar,
 Zaruwê me hîn kin, emin bêçar.
 Gelek bi dilsozî me hostaê ziman anî,
 Ji Evropê hemû merivê îş dizanî.

.....

Tenê mudîrê îdarê kurde,
 Zanakî bi bîr û jîre,
 Hemû beyanê bi dil pir xweşî,
 Nav dixwendin Mudîrê pir huş,
 Nav derkeve, kê hatiye, kê ne hatiye,
 Hinek mîna hergav xayb bûn,
 Li listekêda navê wan nivîsî bûn,
 Qet yek jê wunda ne dibûn
 Navê şagirtê vê zanîngêye, ,
 Qet navê xelqê wa heye!
 Guh bidin, ewî mudîrî navê wan
 Xwend li ber çavan.
 Berçavkê pîse kuna xolawî,
 Bi ben pêça bû, çilk û tozawî,
 Ji girfan der anî, da ber çavan
 Nav xwendin bi dil û daman:
 "Nîfaq efendî"-hazîre efendî".
 "Îtfaq kwanê?" Çûye cehnem".
 Derew û delese qurban hazîrin,
 Ev herdu li vir daxilin,

Rastî û sedaqet mirê min, du birane,
 Yek ji wan du sal par mehkum kirne,
 Dayk û bavê wan her mîna wan bûn,
 Li nav komelê ciyê wan tune bû,
 Bo te gelek eybe navê wan,
 Li ser lêva te be ev saxteman
 Ji vê a'ylê yekê bimîne,
 Wê zû-zû proja mektebê bişewtine,
 Ji wê latirçin her wê bimîne,
 Reh û rîşiyê wan ji bin der bine.
 Wetenê kwanê? çima diyar nine,
 Wa sal temam bû, sebeb çiyê?
 Qurban fa'm ke, bese, sebebê megere,
 Navê wî bi qelet nivîsîne bo te,
 Bi esil navê wî mêrî Note,
 Bi herfan qet ferqî niye,
 Çaxê nav nivîsîn, tu jê mayosî,
 Li ciyê Notê wetenî te nivîsî;
 Herdu yek tîpin, Notê wetenî,
 Mudîr ku bihist, giriya û pê kenî
 Dîsan mudîr kete pîrsyarê:
 "Kwanê Rizgarî? Min qet ne diye,
 Bi xwedê, ev nav qet tune li dinyayê,
 Çima temyon li şûna şekir û ça nivîsîne?
 Qet kesek tune, navê wî Rizgarî be?
 Gerek bi nivîsîn şekir û ça be.
 Azadî kwanê? bang bikin zû
 Qurban, bi rastî pêrar mehkum bû.
 Edalet kwanê? li kuye edeb?
 Terk din, yasaxe, çawan hûn têne mekteb?
 Nexweşî?—Belê hazîre li ser pêye,
 Herdu li cem me mirine, çi li şêher, çi lu gund
 Kwanê Serbestî li vê saxtemanê?
 Polis rapêça, kire bendixanê.
 Zanîstî kwanê? Ew çima der çû?
 Mehkumê hukmê eşayrê bû.
 Cehil li kuye?—Li virim roj û şev,
 Xereqî îşîm, li min herame xew,
 Beroka min girt ulm bi ne heq,
 Timaya cî bo min bike leq,

Şikyat min lê kir bi çavnêrî,
 Mehkema me ya eşayrî
 Birçî û nexweşî kirin bi hekem,
 Hukmê ulm wan da zû bi xatir cem.
 Hakim ji me pirsî moda me herduwan,
 Kê ji me li pêş hate Kurdistan?
 Min gotê: "Qurban, welidê virin,
 Zûda li vira bûm, berî rom û ecem,
 Qanûn anîn, hakim da pişkan,
 Xwend madeya "Mirurî zeman".
 De sal mehkum bû bi zincîra Mesdûd,
 Wusan der xist xaricê hudud,
 Ulm li cem wî wa bû hukmet niye,
 Zû da famkirin ku gora wî çiye,
 Bo çi dinya serî lê poş girtîye,
 Her cî û dol spartî bûne wî,
 Seyrî bêaqilî çima nakin,
 Heta dinya temam fam bikin".
 Mudîr li wan pirs kir dîsan ji nûve,
 Gazî kir, got: " Gişk guhê we lê be,
 Navê we kîjan ne hatiye xwendin? îcar?
 Dengê hat got: "Mudîr, îstimar".
 Mudîr xeydî ji dengê bê reng,
 Li ciyê xwe hişk bû mîna neqşê seng,
 "Tu kêyî? Wa herdem hazirî cewab bî,
 Nêzikî ber çavî, dûrî ji sewabî,
 Çend zû cabê didî li pirsyar".
 Got: "Tu nizanî, ezim îstimar"
 Eger dixwezî tu bi xwe fam kî,
 Nabe get carekê bêjî navê aqilekî,
 Reh û rişiyê me ji bin hiljenî.
 Ezê bi qanûn ulm û edilê bixeniqînim,
 Yan ez her hebim, yan ewan bin,
 Hazir bin herdu bo gor û kefen,
 Tarîxa me kevn herdem bixûnîn,
 Wusan ra bihirin, ji der me raborin,
 Mudîr berê xwe kire wî got: Qet nabe,
 Kê tu aniyî nav vê zanîngê?
 Seysetiya wusan min anîye,
 Lê min rişiyê baş da kutaye,

Her merivekî ku dilê wî lê de,
 Ku çz derkevim, bo min wê bê sema;
 Sirewt û pare û dewlet yê minin,
 Xwerna xelqê dinya arzane,
 Eqtayê mêrim hemû.....
 Xwefiroş û casusê minin hemû.
 Eger wan xweş tê, cotê min digere,
 Eger barane, aşê min dihêre"
 Mudîr gotê: "Mektebê dadin, daxin
 Çima bo çara serî ez jî birevim,
 Gote wan: "Hejar kuda bireve,
 Cî ne maye, pena xwe pê bîne,
 Li bin dest meda dariza cihan,
 Neçar şer dîkin em xwe bi xwe
 Qanuna we jî devê meye,
 Aqıl û mintiq cem me gemeye.
 Dengek hat, got: "Cenabê mudîr,
 Êzdan dizane huş û bîra min,
 Bo serbestiyêye kuştina dijmin,
 Nabe bitirsî, yan tefre bî,
 Hîva zanistî bi fêr nedî,
 Ez îtfaqim, we, de bidme te,
 Naka der çûm, min dest pê kir çûn û hatin,
 Hukmê tamam bo zanistî ezîz,
 Ji xwedê wê zêde be, wa hate rêz,
 Eger li piştî min bî, ku ez tenême ew,
 Naxwezim hezar Qubad û Xosrow,
 Çimkî xwendin hevalê zore,
 Hepsin ber bin, lê bi nûre,
 Serbestî teze bendixanî,
 Tê ber bi vî niştimanî,
 Mijda ber bûna azadiyê daye,
 Ji mangê zêdetir hukmê wî ne maye,
 Ez kefilê teme, barmte bidim,
 Zanistî besî mine, ez bi xatir cem
 Wusan serbestî û azadiya min heye,
 Rizgarî tene cem min zû bi zû,
 Hemû bi carek dest bidin hev,
 Dest bi dest û gewat ji xwedê,
 Zanistî bese bo serperestî,

Bi dil itfaq û yekîtî û giştî,
 İstimar wusan ser, lê bû gêjtî,
 Wê bizanê ji bo çi û çawan bû kuştî.

YAR LI XEWA MINDA

Şevekê ji şevan yara min hate xewê,
 Rûniştî bûm li cembî dirêjya şevê,
 Li nav jûreke bê çira û tarîk,
 Ezî xemgîn û yara qed barîk.
 Du bû du, herdu tarîk li xeyalê,
 Min xwest bêjim cefa rojgarê,
 Kengê carekê ji minra wa lê bê,
 Yar li cem min serapa şevê,
 Bo wê birêjim cefa derdê dil,
 Ez bo yara rûmet perê gul,
 Çi derd? derdê dil,
 Çi derd? kurdê xem,
 Ew derdê ku wa dil dike av,
 Çi dil? koma xunav û zoxav,
 Ew derdê ku wa dil tîne çoş,
 Ew derdê ku wa dil dike bê huş,
 Ew derdê ku wa dil disotîne,
 Rişiyê cerg û dil ji bin der tîne.
 Kiz-kiz rûniştî bûm hundurê xemê keylê,
 Ez mecnûnim, yar çêtire ji Leylê,
 Destê hesretê min da bû ser ejnû,
 Min ejnû xiste jêr li nav du ebrû,
 Dil, eger bêjim, kaniya koma zoxave,
 Keliya, qulpa wê gilê xûna çave,
 Tik-tik dilopê xûnê ji çav dikişîyan,
 Li ser suretê lal û alda dirijîyan,
 Xûn ji dil bo çav, ji çav bo rûmet,
 Tik-tik dikir, dikete erdê wek yaqût.
 Cew û binav ferware ser çem,
 Ji cerg û dil û çav hate ber hev,
 Bi hêsrê çav ber çav bû rengîn,
 Berenisk dihatin ji ciyê girîn û şîn,
 Ne gise, ne razî bûm, min ne kir, ne da,

Sînama bûm, min xwe nişan da,
 Bo goşa çavê şîrin Dilber
 Sima Sinnema kete ber min nezer,
 Sehetekê henesa giran min kişand,
 Seyrî sînama dîsan min kir,
 Balî çav da min, temaşa min kir,
 Li ser sextî bûm, ku mam, ne mirim,
 Bi pencê şimşalî pêça xwe helbîrî,
 Qed-qed perda dil çîti bi çîti birî,
 Şewq xiste nav jûra teng û tarî,
 Êlêtrîkî ser gune û ruxsarî,
 Bi sînama ku wa bê deng bû,
 Ew leşê ku wek nexşê seng bû,
 Kete zeylê û şîven û giryan,
 Lûrîna wê çêtir bû ji qewan,
 Bê perde, bê tîrs, bê nalîna sed terz,
 Girîya û got bi awazekî berz:
 "Ezîz, nû nemam, bejn û bala e're're terz,
 Eskola xeta, yara gerden berz,
 Gul xunça beharê, baxca jiyan,
 Binewşa teze, berê berî beyan,
 Aska şermoke, çavê te kal,
 Bînevşa çîman, dengê te xal,
 Bo te bêzarim ji xîzm û xweş,
 Dev xunçe gul, rûmet şekrê sêvê,
 Be rêza şaxan, egrîca peşîvê,
 Rûmet perê gul dema nû beharê,
 Dilopa şev nîm, xudana ruxsarê,
 Leylê nîzanim, bejna dara ter,
 Ez mecnûnim ji mecnûn bedter,
 Bo te bêzarim ez jî jiyan,
 Xereqî zarîn û şîrî giryan
 Bo te bû cergê min wek bêjînga gul-gul
 Bo teye ah û zarîna min,
 Şev û roj her dem şîrî û girîme,
 Bo çî nîzanî, hemû bo teme,
 Ji bo te xûn tê ji çavê min,
 Henasa sar şevan bûye para min.
 Te ber daw kirim, ketme ser erdan,
 Bo te her wa bûm bi sergerdan,

Bo te bêzarim ji xizm û xweş,
 Şerte şert, ezfîz, bibime devrêş,
 Bo te li min herame xewa şevê,
 Bo teye nalîn û girin nivê şevê.
 Binêre, kizîn û henasa sarim,
 Ruh û canê min, dîn û îmana min,
 Bo çi tu napirsî derdê dilê min?
 Min seyr kir li yara xemwarî,
 Hate ber çavan rêza mirwarî,
 Çi bikim, bêçarim, girane halê min,
 Ez ji te zêdetir henase sarim.
 Bi şîn û girîn maf mestî,
 Mêrin, dikarin bi mêranî bistinî.

ÇIVİKA GIRTÎ

Çivikek firî ji ser hêlinê,
 Ji çûkêd xwera dan biçînê,
 Bê beş û bê sûd çivîk li geranê
 Evarê li ser balaxanê
 Dît gefesek li ser hêlanê.
 Çivîkê avaz û nexme berdan,
 Li nav gefesê bi kamiranî
 Xem dikir bo ba û şadmanî,
 Mîna pîran dikir yadê civanî.
 Çivîkê got: "Xwezî bi xweş zindeganî,
 Xwezî sed xwezî wekî ew ez bûma,
 Li nav gefesêda bihatama û biçûma,
 Pêç-pêç îşê min mîna zilfê yar bûya,
 Çê bi çê sîngê min mîna-şanê sed car bûya,
 Qet car bo dan ew nake ah û zar,
 Bê hiş nabe, nake nal û hewar
 Li nav gefesêda tirs ji kê bê ser,
 Tîra bela serda nayê qet car".
 Baskê xwe nizm kir, çû cem gefesê,
 Nefs kir, dan bikişîne ji gefesê,
 Bo live dan bû qeqnes.
 Berê xwe kire çivîkê û got bi dengê hewes.
 Mineteke giran bike ser şanê min,

Ji cinsê teme, cem te mêvanim,
 Zor zelûlim ji destê çûn û hatin,
 Jar û hejarim mîna gulê bîna xwe bide min,
 Tu destê xêrê bide min,
 Ezê rokê kêrî te bim,
 Min dayne rex xwe bi rancerû,
 Hinekî em tev hev bijîn,
 Bi gaspe-gasp, bi qaqa û kenîn",
 Got: "Azadî li cem seyard nîne,
 Her cewre pêşê edil û dad nîne,
 Nalîna min tenê ne bo firîne,
 Bimre meriyê azad nîne,
 Çi azadiye, dîl û zelûlî?
 Mirin çêtire ji rengê dîlî.
 Here, çolê be, ji min dûr,
 Zix û lim bixwe genimê sor,
 Me be tev çûk, mar û mor,
 Dûr be ji merivê serkêş û mexrûr.
 Helbet danê wan bê daw nabin,
 Li warê wan bê raw nabin".
 Ev gise bihistin çûka dîl xûn,
 Got: "Ji vê qisê em xêrê nabînin".
 Çûkê baskê xwe ba kir, hilfirî,
 Kete rû ezman, li her alî nihêrî,
 Heta çend heb dan bi çavan dî.
 Gelek dilşa bû, çaxê dan dî,
 Gihîşte dan, milê wî kete daw,
 Hate bîra çivîkê çûk li cî maye,
 Ahek kişand, dîl bû ava sar,
 Rojekê êvarê şeva tarî,
 Kire axî ji destê bê cî warî,
 Nexwest bi azadî bifire rû ezman,
 Gelek têkuşa, necat kir bo firan,
 Per û bask get lê ne man,
 Gelek talî dît li erd ezman,
 Gelek çû hat bo çûkan
 Hêzê firîne li ser ne man,
 Destekî bi hişke hişk milê çûkê girt.
 Bê sûdî bû firt-firt,
 Bê sûdî bû pele-pel

Kire nav qefesê, birî riya emel,
 Qet carek ne ma xên ji ecel.
 Ku çivîk hate girtin bi destê kê be,
 Azadiya wa her li bîra te be.

KOTIR Û NÊÇÎRVAN

Kotreke can, xal û mil nexşîn
 Per û bask û ling rengîn,
 Bi nikulê xwe pûş anî,
 Li ser dareke bilind belgedar
 Ji xwera hêlîn li hev anî
 Bi hêlan hêlan hêkêd xwe veşar.
 Du hêk anîn kotra kevtekir,
 Piştivani bû daristana çir
 Rojekê nêçîrvan çû raw û şkarê,
 Hûre-hûr nihêrî li bin darê
 Nêçîrek ne dî nêçîrvan,
 Got: "Wextekê wê bê ser çavan".
 Berê xwe da rê rawkerê rawê,
 Rê ket, here malê berî evarê,
 Kotra ne fam, bê aqil û kemal,
 Bilind bû bi baskê xwe bi xal,
 Nizan bû derdê wê derdê hemûyan,
 Derdê derdan, derdê zor giran
 Çavan qenc bike derdê bê derman,
 Çawan xwe rizgar bike ji ne zanîn,
 Heta rastî wî bê kotra nexşîn.
 Kotirê dest pê kir bi haqu-haû,
 Rawker û kew get li bîrê ne bû,
 Rawker bi dengê pirîna kotirê dil xweş bû,
 Rê ji bîr kir, bi dil xirûş bû,
 Lûla tifingê zû-zû dirêj kir,
 Mêş girt, tifing agir kir,
 Bi vizîna gullê kotirê hejar
 Birîndar bû, ji darê kete xwar.

Nêçîrvan mîna peranî ber bi kotirê revî,
Kêr derxist, serê wê zû-zû birî.
Zana dibêje: "Fikra min waye,
Nefsa xwe ragirê heta aqilê te heye,
Wextê tu ketî ber dar û destan
Aqilê te gerek zortir be ji nefsan.

SALIM (1805-1869)

Navê wî rastî Ewrehmen begê kurê Mehemed begê kurê Ahmed begê Sahibqiran bûye, binemala Sahibqiran li Kurdistana Îranê bûye, Ewrehman pismamê Mistefa bege, ku bi navê kur-dî aşkera bûye wek şayr. Ewrehman li sala 1805-da li Sulemanîyê ji daykê bûye û sala 1869 çûye rehmêtê û li rex qebra pismamê wî Mistefa begê kirne çal. Ewrehman gelek caran çûye Kurdistana Îranê gerîyaye, çûye Taranê (Tehranê). Refîq Hilmî dinivîse, ku Ewrehman bijîjk bûye xelq qenc û sax kirne û sebeb wê yeke navê xwe guhestîye Salim û bi wî navî ji e'yane wek şayr. Li sala 1945-da li Bexda dê dîwana wî bi destî Merîvan hatîye çap kirnê. Têda şêrêd dildarîyê, niştmanîyê û wetenperwerîyê hatne çapkirnê. Çend şêrêd wî derheqa şerê romê û hukmeta baban hatne nivîsandnê. Di wan şêranda ah û zarîn, derd û kulê xwe li ser halê xelqê kurd û li ser rûxandina hukmeta baban nivîsîne.

Dîwana Salim li ber destê min nîne, sebeb wê yekê ez li vira çend şêrêd wî ji kitêba mamostyaê rehmetî Refîq Hilmî ber digirim û li vira tînim ber çavê xwendkarêd me delal.

ÇI KIR TEQÎNA TOP Û TIFINGA

*Hey xwedê, li wê demê çî kir teqîna top û tifingan,
Ser zemîn tarîk û dinya toz û ker guhê esman,
Meha talerê mehaq û roja negbet cilewger,
Xirmanê şayî li ber ba, berqa xem ateş feşan,*

Laxerê tale şikand hezreta bazû û qeda wî
 Exterê bircê mizeffer xwe ji vê kîrnê nihan,
 Ger çî pêşe-pêş bi heybet bûn û aza çûne pêş,
 Hesreta baz hem wan ne zanî "nizam" wa bê heyar
 Pêş devê wan "oxlemeya" top, piştî ser wan a-
 gir,
 Gihîşte çerxa hevtemîn ji wê a'nêda ah û fixan,
 Guhê felekê ker bû ji ber nalîna neferê şêher,
 Li mikana girtin seda, nalîn û fixan û a'leman,
 Muddemî kor be "nizam" îflîs mekan jêr û zeber,
 Mîrê sordaş û emînê mervê herdu engewan,
 Ger eşîret bigrin, her yek heta bimrin, kême,
 Kuştina mîr bayê mixalîf bû, bi şemeyê dijminan,
 Roja qetlê îroye elheq, ehsine pê divêt,
 Yadîgarî hakimî, canûşîne silsile,
 Na mirad û newres û meqsed nedî û newciwan.

(Refîq Hilmi, 62-63)

DİLÊ MIN ŞAYE

Dilê min şaye li benda silsila gîsoye dilberda,
 Li şane xewf nake defeye li vê daye dilberda
 Girê best dil li singê minda li hesreta ser û
 mîhrê te,
 Ger heta agrê pir gir bişewteine li mecmerda
 Te'mul ke zemanê kuştina min sure'tê naxweze,
 Li dil meda bigrin xwe bi dewra dest û xencerda

(Refîq Hilmi, 63)

LI MIN VGERIN

Li min vegerin, guhdar bim, dest li ejnû bim,
 kef li zenan,
 Gêjelu kengê bayê nedamet tarî kir sehfa ci-
 han,
 Bezma seyde mê siyadê felekê karek kir,
 Rengê balaya tîr qed dan bêne terkîbê kevan,

Ze'fî tale cazbe bo kareba, bo xûn û dev,
 Seyrî çara bextê min kin, bûye rengê zeferan,
 Nû behara min xezane, wextê kengê subhê min ze-
 muze,

Pertewa mehê xemû çakî derûnê min mîna kitan,
 Turkê qursî xur ku tale bû û tilumî kir bi reqs
 Kewkebe meha miradê ehlîyê baban bûn nihan,
 Dil ji mihnet keyl û meylê nav şêherê min nîne,
 E'ynî çavê min xûn jê tên ji daxa mêrê me,
 Raste gerdun çak bike bo rengê bed rêtin welî
 Narijîne rengê wî bi vî rengî bi muddey sed qî-
 ran,

Sae'qe û berqî ne damet zulmetê da şerq û xerb,
 Berdebarane bi mexsûs li ser milkê baban,
 Çavê îbret hilbire ey dil li we'zê dewrê dîn,
 Seyrî ke çawan turk, felek çî kir bi zumra kurd
 ziman,

Hakimê romê li ser textê suleman dirêx
 Kete destê dêwê dîn mîhrê sulêman ala man,

(Refîq Hilmî, 58-59)

.....

Ger omuda dil bîne cî meha cihanara,
 Bi xalê hind jî bexşan Semergend û Buxara,
 Ji bin xarê muxeylan wesl eger be arazû û nakam
 Kenarê ava rîkinabad û gil gişt mislara,
 Nesîhet bigre guhê cana ji aliyê wan zor bi te'
 zîme,

"Ciwanan sea'detmend pend pîr danra"
 Du sed car ger bi guhê xwe herfê te sar noş kim
 şame,

"Cab tilx mizibid leb lel şekir xara"
 Eger horî ji kewserê şûstşûya xwe da te,
 Bi av û reng û xal û xet çî hacib rûy zîbara?
 Ji îdrakê şkencî e'qdeyê ziliê te perişanim.

(Refîq Hilmî, 70-71)

QANE MUZHER (1898-1960)

Navê wî bi rastî Mehemed bûye, kurê şêx Ebdulqadirê Dela-şî. Li sala 1898, li gundê Rîşînda ji dayka xwe bûye. Ew gund li Binara(Binatara) Şarezûrêye. Şêrên Qane gişk derheqa belengazî, hejarî û negbetîya merivanda, derheqa cî û warên kurdanda, derheqa stemkarî û xûnwarîya şêx, beg û axayên kurd û stemkarîya dewletên derva li ser neteweyê kurd û Kurdistanêda hatine nivîsandinê. Di şêr û helbestên xweda Qane mîna Cegerxûn, Guran û şêrbêj û helbestbêjên kurdan derdikeve meydana şêrê rewşenbîrkirina neteweyê xwe, di şêr û helbestên xweda ew xelqê xwe şîret dike, nesîhet dike, ku ber bi rîya pêşrev û pêşketin herin, wêla tê xweda xwendewarî, marifatî, hunur û sene't û pêşezanînê belav bikin, xelqê xwe ber bi rîya aşîtî, dostî û hevkarî di gel cîranê xwe bibin û bextewar bi serbixwe bijîn. Navê hine şêr û helbestên wî, wê fikirê û wê ramanê tînin ber hiş û çavên xwendeweran, mesele, "Kurdistan", "Ez Kurê Kurdî", "Merîvana Min", "Nevîyê Kurdî", "Eger Mirim", "Li Xewna Mînda". Hine efirandinên Qane li ser gotubêja wî heywanan û tiştan hatine nivîsandinê, mesele, "Qane û Lihêfa wî", "Qane Tajî Tawus", "Qane û Kera wî" û yên din. Di van helbestanda bi mecazî hevbendîya merivan nîşan dike.

Divêt bêjim, ku zimanê Qane xweşe, şîrine û zelale, baş tê fehmkirinê. Min li jêrê hine şêr û helbestên wî kirine kurmancîya me jorîn û bi latînya kurdî nivîsîne, ku xwendewarê me delal xoşevîst bibine nasê efirandina wî, haj vî mîrî jî bin.

TIMAKAR MEBE POJMAN DIBÎ

Careke sekî gelek timakar,
 Hestûk dest ket li kûçê nav şêher,
 Hestû hilgirt, revî çû ber kenar,
 Ku dûr ket ji bazar û şêher,
 Gihîşte avê, aveke zelal,
 Mîna aynê şiklê însan têda xwan,
 Li avê nihêrî, şiklê wî hate ber çavan,
 Wextê çavê wî şiklê wî ket,
 Mîna neftê agirê timayê lê ket,
 Li şiklê xwey nav avê kire ewtîn,
 Hestû ji devê wî der firîn,
 Rahîştê ku ji avê der bîne,
 Hinek ma xwe bixeniqîne,
 Ne ev girt, ne ew, tişt jê ne bû,
 Ji dest der çû wusa zû bi zû,
 Netîca vê timayî ser gerdaniye,
 Li axir her pojmaniye.

(Rojnama Kurdistan H.22, Taran 1962)

BERBEREKÎ JI NEXWENDEWARIYÊ

Sewad çî bikim, nanê min tûne,
 Qiranek li cêba minda tune,
 Sed xwezla min bi wî t'êrê û dilşad,
 Cehnem û gor bi gor be sêwade,
 Sewad qet zikê birçî t'êr nake,
 Rîya rast nişanî kes nake,
 Eger bixwaze dewleta Îran,
 Welat nebe xebûr û wêran,
 Bipirse halê feqîrê şêheran,
 Zehmet nekişîne her tenê bi Taran,
 Arzan ke nîrxê xurek û poşak,
 Wê bê tam be rengê sor û ne pak,
 Giranfiroş û xûnmij û merivkuj,
 Bide dadê, darda ke li dar axac,
 Eger na, rojekê firqa hejaran
 Gişkê bibin yek mîna agir û baran,

Wê bibin lêy, bidne ber xwe mal û gund,
 Ji bin der binin rişiyê dara tund,
 Bi girme û haje û kêf û hîlmet,
 Ziyaneke zor wê bidne dewlet.
 Hesên, Zînet, Nadir û Perî,
 Wê hinek nan bidin ji derdê serî,
 Ji şevda axir her yekî mîna mişk,
 Qirte-qirt bikin nanê reş û hişk,
 Îcar bi vî halî şevan li mekteban,
 Wê bixûnin dersê exlaq û edeban.
 Zîna jina Hesên nexweş bû,
 Ji ber ku li sermada bê poş bû,
 Hesên bi nalîn gote kurê xwe:
 Hinek derman bîne bo Zîna daka xwe.
 Ewî got: Min ji dûr gazî doktor kir,
 Merizo, tu kuyî, herê, çavên te kor,
 Hesên dama û Zînê beste serî,
 Kirin qirîn Nadir û Perî,
 Famîla Hesên nimûna karê
 Nimûna feqîr û renc û îtbare,
 Bi zîmanê hal ya bi aşkar,
 Dewlet nezerîya xwe dike îzhar,
 Dibêje: Eydxweş, cehnem birçiyî,
 Bê libasî û zoxal û gursî,
 Tu her bixûne, sewad peyda ke,
 Bi zîkê birçî heta alman rev ke,
 Padar be axa şeş hezar sale,
 T'êr bixum, besî mine ev qebale,
 Lisans, diplom daman û eqeb,
 Sport û hemal wê herne mekteb,
 Mamostayê bê hêz bo nanê davan,
 Bidne zorana du gel ewan.
 Rehme li qebra kurdê bê çar,
 Kurdê caf, goran, kurmanc û rencber.
 Dinya û strîyê ga li pişt masî,
 Nirînek ji qiya nabe esasî.

(Rojname Kurdistan N 124, sala 1962 Taran)

QANE Û TAWUS

Tawus, ez û tu, em herdu pîrin,
 Yek ji yek bedtirin, mat û zivistan,
 Ez dua bo te, tu dua bo min,
 Tawus têne ser me çi cudaye dijmin,
 Tawus dizanin, hale te ne hale,
 Qet xefet mexwe, va nivê sale,
 Pênc-şeş mangê din bi îzna xuda,
 Ya cote hêstir, ya jî cote ga,
 Bixme zevîyê, pê cot bikim,
 Bi t'êr û tesel nanê te jî bidim,
 Ku wa rê çûn heft sal temam,
 Qet kes nizan be bi çi dirûnê,
 Sala din bikim cil û berg ber te,
 Ku kulinc nebî, ez ne li ser te,
 Lê nika wa feslê zivistanê,
 Wextê kilîta berfa çiyastanê,
 Ku te bibînim ey şêrê min,
 Kêwrişk û rûvî çawan digirin bo min,
 Menêre wa li min, kizî û damawim,
 Heta min bibînî, aşiqî bi rawim,
 Tawus got: Qane, kes mîna min nîne qet cî,
 Ji min xerabtir, herdem birçî,
 Ne şêx, ne mela, ne sofî, ne beg,
 Tu bi xwe nan bixwe, çi te daye seg,
 Tu kevne feqiyî, perwerdeye mizgefta,
 Ewqas te dîtîye ji jar û çewta,
 Sed hezar şîrim, tu nivê şîrî,
 Destê min bi gune koteka kurê te,
 Wî wextî min zanî, ku bê nanî,
 Ji min xerabtir, dil perîşanî,
 Xereqî şerî, şer jî negbete,
 Jîna şayran gelek zehmete,
 Ta tu şayr bî, ez feqiyê te bim,
 Ji vê xerabtir her rehber bim,
 Va ez xerêqim, ji birçîya bimirim,
 Şûna kêwrişkê meya gun bi te bigirim.

ÇAR TIŞT NEGBETA KURDIN

Çar tişt iro bûne negbeta kurdê hejar,
 Cehilî yek, bêaqilî du, dil pîsî sê, dawa çar,
 Me paş dixin li vê axa meda çar giro,
 Xan yek, serdar du, begzade sê, axa çar,
 Nahêlin bo xwe rehet bin, serbixwe bijîn,
 Ecnebî yek, mame du, eqtay sê, kwêxa çar,
 Dax û kiz bim, li ser vî miletî min çar derde,
 Sêl yek, aras du, samet sê, Bexda çar,
 Fexrê bo min, iftixar û hurmete çar teyfe;
 Zend yek, gelbaxî du, şîrvanî sê, midya çar,
 Baz bûm, baskâ min şkestin, çar bela nehsî xerab,
 Xaneqa yek, tekiye du, emame sê, e'ba çar,
 Çar sifet mewcude bo min, lema qet kesî naxwezim,
 Qane yek, şêr du, xweşî sê, mela çar.

MERÎVANA MIN

Mêrivan mîskênê mehr û xane,
 Mêrivan wek baxê cihane,
 Mêrivan bihuşta rû zemîne,
 Mêrivan wek neyabê cihane.
 Bîra serê kanîyê wê wek silsilane,
 Bî e'ynî axeke ferdê zemanê,
 Li nav vê deştêda gula zirîbare,
 Nimûna çavê lêla eşqane,
 Hewa mute'dil çiyastana pir gulane,
 Bihuşta av û axê, ba û erdê,
 Keçên horî û kurên xilmanîyane,
 Eva gelek fexre bo axa Mêrivanê,
 Emirxan diben çiyê Erdelane,
 Emir Xemze, xalo xan û Qubad beg,
 Yek-yek ciyê deysan têda nişane,
 Cenabê Nûrî, Kerem ke axa me,
 Ji qedîm heta nika ciyê şayrane,
 Xeyalî û şêx Seyd û Xato-Xurşîd,
 Mela Nabî ku şerê wî çiqas ciwanîn,
 Ferîq û Nûrî herdû behra ulmanîn,
 Li hemû alîyan hunerê wan e'yane,
 Bî farsî, erebî, kurdî û tirkî,

Bi çar zimanan nivîsara wan e'yane,
 Ji gurna pêşîn karê Mêrivan
 Muheqeq xaricê şîro û beyane,
 Ziman ka qiweta şîro e'da ke,
 Qelem kengê qabilê vê dastane,
 Xên ji Qane kê heye wesf û seha wê bike,
 Çi bikim, ew nika menzîla biyane.

(Dîwana Qane, 65-66)

KURDISTAN

Kurdistan mêşelana şêrê meydana mine,
 Ax û bayê niştimana mêşê lawanê meye,
 Kurdistan mekteba wujdan û hem erfanê meye,
 Dirê û darê Kurdistanê sosin û rihana meye,
 Germe sîra Kurdistanê şerbet û fîncana meye,
 Çiya û çiyastana welatê Kurdistanê cineta meye,
 Ava temiz rizqê kurde, dayka pir şefketa meye,
 Ava sare, nanê wê zore, nimeta wê bê zehmeta me
 ye,

Kengê mîna xelqê li axa xelqêda pir minetîm,
 Her bêjim ava be, ya rebi cenet û el-ednana me
 ye,
 Qesra Firdewusê berîne, baxê hencîr û henarê me
 ye,

Xudanê hewz û heyat û mer-mer û coge û çînar,
 Kewsera min coge û delîne ya hinarê serçînar,
 Çemçemal û baziya meskenê şêrin swar,
 Bê temaşe Şarezûr û çala dextîlî dana meye,
 Fexrî razî be, bê bêkes hurmet û qedrê te tune,
 Sed kirurê te be, ku bi xwe maqul nebî, sûdî çi
 ye?
 Milkê bê xudan, ezîzê min, her wek dara biyê.

(Dîwana Qane, 76-77)

QANE Û LIHÊFA WÎ

Qane dibêje lihêfa xwe:
 Lihêfa kevn û rizî,
 Pir tu kevnî û dirî,
 Ne sarî, ne germî,
 Ne berê defî, ne çermî,
 Ne marî, mîna maran digezî,
 Tûjî tûj, mîna derzî,
 Bîna te bîna seyê gurî,
 Tê vî alî, diçe wî alî,
 Tu bê berî û bê pişt,
 Bavê min jî her te kuşt,
 Tu kevnî, ewqas kevnanî,
 Kes nizane tu çawanî,
 Ne sorî, ne şînî,
 Derzî, dirî û birînî,
 Ne hêşînî, ne borî,
 Nizanim çi cûrî,
 Mîna meska meşka reqî,
 Qul-gulkî û gelişokî,
 Çaxê te didme xwe ser,
 Piştî min dimîne li der,
 Çaxê te didme ser pêva,
 Laşê min dimîne li derva.
 Ezî jarim, bê don û bê rûnî,
 Axir çima tu wusan bi donî?
 Xwezla min bi wê roja zivistan,
 Rê û berê xwe bikim çiyastan,
 Li nav berfê û seholê,
 Li tepka ser çiya û çolê,
 Li te dûr bim, şad û mesrur bim,
 Nebêjim çima wusan diriyayî,
 Dizanim ku tu zû miriyî,
 Lê ji minra rast bêje,
 Hûr-hûr serhatiya xwe birêje,
 Kê cara ewil tu dirandî?
 Wa tu jî kar getandî?.

LIHÊF CABA QANE DIDE :

Qane, tu ji min diriftirî,
 Ji min gelek mirartirî,
 Çaxê adem hate der,
 Para xwe ji bihuştê bir,
 Wana ez dam bi xelat,
 Li cem wan mam roj û sehet,
 Li cem adem hezar sal
 Ez mam bi her hewal,
 Bi mirat ketme destê Şî,
 Ji dest Şî ketme destê İdrîsî,
 Dest bi destê pexemberan,
 Heta ketme destê Suleman,
 Wusan ketme destê şahan,
 Hukumdarên cihanan,
 Ji Cimşîd û Keykubad,
 Xamurabî heta Şîdad,
 İskender û Feylequs,
 Heta çar qeyserê rûs,
 Lema wusan mirîme,
 Lema qet ne mame,
 Nika başe havîne,
 Germe tamam bi kîne,
 Rabe heta zivistan,
 Berf bikeve li çiyastan,
 Tu qur bi ser bî,
 Eger hîviya min bî,
 Çawan bikî, bi tivdîr bî,
 Li ciya tuê oxîna dijmin bî.
 Mîna kelaşa sofileran,
 Pêçî têda dimîne dervan,
 Pozka wê dibe panî,
 Bê kar dibe yeksanî,
 Tu jî ji serma ne razî,
 Bi çûk û ejnû dilerizî,
 Xwe dikî qonc wek jûjî,
 Dibî jûjî, ji serma dimirî,
 Wusan mala te wêrane,
 Wusan derdê te girane,

QANE Û KERA WÎ

Kereki min hebû, çi ker, wek ba û boran,
 Kereki min hebû, çi ker, barkêşê dewran,
 Kereki min hebû, çi ker, cejna seyar,
 Kerê Nuh Nebî bapirê wî bû,
 Bi qed guhdrêjê I'sa xal û xarziyan,
 Bi lesê berz û zik stûr û serî zil,
 Kefel gurc û parsû çix û guh pan,
 Şeqa û dar û doşane berz û mil qinc,
 Dêl şûr, sipî tûk û gewî dan
 Ji kewşê sim heta şeqê refisge,
 Xeteker musteqîm bê kes û nuxsan,
 Şevşe min gotê: Çawani, yarê dirîn?
 Vê sermê destê min li dawa te be,
 Îda zivistane, wextê dar kêşane,
 Wek salanê pêşîn bire çewalane,
 Ne nanê min hes, ne şekirê min hes, ne çay,
 Ne bergê min û jîna baqî xizan,
 Hemû her çavênîya hemeta tene,
 Binirkinî bi bar û were meydan.

CABA KERA ŞÎN

Kerê got: Qane, esef be, bê heyatî,
 Heya zor xweşe bo meriv û wujdan,
 Bi kîjan çi? kîjan gewer? kîjan nal û bizmar?
 Bi kîjan rewşe û cil û cilbend û kurtan?
 Eva çend sale, ez barkêşê we bûm,
 Bi xwedê min ne dît cewalê alif û dan,
 Hostayê nalbend min wek teyrê enqa,
 Nayê ditin li dewrana dewran,
 Bi wê nale qesem tengda li jêr pê min,
 Bi wî cehê qesem ne minaye jêr dan,
 Qesem bi wê gaza min dîtîye li e'mrê minda,
 Bi wî çakûcê ku min ne dît mer lê dan
 Dibe xêra min nebe xên ji zire-zir,
 Eger hûr ji bikî e'zam bi goçan.

(Dîwana Qane, 72-73)

Wusan dizanî xêncî min,
 Ne baştire ji dijmin,
 Eger hîvîya te bi min be,
 Herdu destê te li ser çok be,
 Eger nakî bimirî,
 Divêt xwe bi karekî bigirî,
 Here cem paredar,
 Cem axa û tucar,
 Bibe kargerê wan,
 Yanê hilgirê barê wan,
 Darê axa bigire dest,
 Bikuje, guh mede get kes,
 Şêq lê de, miskînê jar,
 Heta bibe bo te pîgar,
 Bi serê axa sond xwerin,
 Diyarî ji xanimêra birin,
 Belkî te bikin serkar,
 Xerman hilgirî bo hejar,
 Ji deha pênc tapo be,
 Yê mayî, nivî para te be,
 Wusan here diwenxan,
 Behar bê yan ji zivistan,
 Li bin lihêfa teze reng-rengî,
 Kesk û sor û heftrengî,
 Li ser doşeka nerm,
 Li diwexana germ,
 Xwera bimîne bê xem,
 Lê ez her wame û wam.

(Ji diwana Qane "Şaxê Hewreman", rûpelê 32-35)

AHMED MUXTAR BEG (1896-1935)

Ahmet Muxtar beg, kurê Osman paşayê serokê qebîlka kurdê caf bûye. Dayka wî A'dle xanima navdar, qîza Xosrov paşayê Erdelanî bûye. Li zarutîya xweda hindik li mektebêda xwendîye, lê gelek ziring, jîr jêhatî bûye, mêla wî gelek li ser xwendnê bûye, bi xwe hînî zimanê farsî, erebî û inglîsî bûye. Nivîsarêd edebyetî û hunermendî hez kirîye. Edebyetnasêd kurd Aladîn Sicadî, Refîq Hilmî, Gîvî Mukrîyanî û Maruf Xeznedar derheqa Ahmed Muxtarda nivîsîne, ku ew merivekî dîlpak, xêrxwez, camêr û maqûl bûye, her gav terefdarêd merivêd hejar, belengaz bûye, li bîstsalîya xweda dest bi nivîsandna şêr û çîrokêd kurdî kirîye. Sala 1922 bûye qaymeqame Helebê, sala 1924 bûye nivînerê(şandî yê) sazkirna dewleta Îraqê û heta sala 1935 andamê civata hukmeta Îraqê bûye. Li sala 1935-da li ser çemê Sêrvanê li çîyayê Neverê bi destî çend merivêd xwefiroş hatîye kuştinê. Li pêşîyê şêrêd Ahmed Muxtar li kovar û rojnamêd kurdîda li kovara "Zarê Kurmancî" li Revandizêda, li rojnamêd "Jîyan", "Jîyaneve" û "Jîn" li Sulemanîyêda, li rojnama "Kerkûkêda" û li kovara "Gelavejda" hatne çapkirnê.

Derheqa şêrêd Ahmed Muxtarda mamoste Aladîn Secadî û Refîq Hilmî û nivîskarêd din fikra xwe baş nivîsîne.

Dîwana Ahmed Muxtar du caran hatîye çapkirnê, cara pêşîn li Sulemanîyê sala 1960, cara duwemîn li Hewlêrê 1969. He

mû edebyenasêd kurd û hemû çapkerêd şêr û dîwana şêrêd Ahmed Muxtar dinivîsin, ku şêrêd wî derheqa hal-hewal, jî-yîn, paşketin û bindestîya kurd û kurdistanêda hatne nivî sandnê. Ew dinivîsin, ku sebebî du tiştan Ahmed Muxtar mî letê xwe û welatê xwe hez kirîye, bûye hezkar û dildarê wan, bo wan xêmgîn, dilêş, dilzar bûye. Ew herdu tişt ev bûne: Yek çîya, deşt, gird, dol û newal, kanî, çem û rûbar, bax, baxçe, dar û daristanê dilgîr û dilrevîn û hemû av û hewa Kurdistanê, îş û karê cotkar, rencber, şivan û gavanêd nexwendewar etaet(kar) kirne ser ruh û canê wî, ku ew welat û xelqê xwe hez bike, derheq derd û kulê wîda bînvîse, binale, bigrî û bîzarê. Sebeba duwemîn ya şêrêd wî wetenperwerî ew bûye, ku hestê civatî û wetenperwerî yê şayrêd kurd Nalî, Salim, Mewlewî û Narî gelek etaet kirne ser hunurê nivîsara wî(Ahmed Muxtar Beg).

Zanyarê kurd Elî Kemal Bapir axa, derheqa nivîsarêd Ahmed Muxtarda nivîsiye, ku ew bi fikir, nêt û naverok û kakilê xweva pare ve dibin. ser şêrêd dildarî, şêrêd komelatî(civâtî), niştîmanperwerî û filosofî. Bi fikra min eva gotna raste, li hemû şêrêd wîda yêd ku bi navê "Dilber", "Xeyala Min Waye", "Du çavê Min Xunê Dibarînin", "Sisê Dilê Min", "Were, Bigre bi Yadî Çavê Dilber", "Dilê Min Pir Xû ne", "Ji Çiye, Ey Gul ku Rengê te Nika Sore", û yêd din da wan fikrê jorê gotî tînin ber çavan.

Bona xwendevanêd me delal bibne nasê nivîsarêd Ahmed Muxtar, ez li vira çend şêrêd wî bi zaravê me kurmançî çap dikim; ez hîvîdarim, ku ewê baş li bîr û bawara wî bihesin û fambikin.

JI XEWÊ RABE DERENGE

*Ji xewê rabe, derenge, milletê kurd, xew ji tera zirare,
Hemû tarîxa a'lem ji tera şahde, fezl û hunure,
Zû têbikuşe, ey qewmê necîb, bêkes û mezlum,
Zû kurt bike wê rîya dûre li ber te.
Hemû kirê vî zemanî xût ji tera qelxan û sepore
Bi zû dest ji vê axa şîrin ber me de,
Hebek xalîya wê ji tera cewahir, sum û kuhle be sere,*

Eger li ser wê nazê xwe bikin, heqê weye, kurdno,
 Temaşa sîbera vî şanoy û van çîyan li ser weye,
 Bê qedir derbas mebin, hurmeta wê bigrin,
 Gulûla sore eva sehraya xûnava cegera weye,
 Demeke eva welata wa hêfirê pencê cahile,
 Bi saya ulm iro îda sirîya zefera weye,
 Zimanê halê Ahmed her dibêje: Ziring be, ey xelqo,
 Bizanbe, berdê van çîyan ji wera elmas û cewahî
 re, (33).

DIKEVE GUHÊ MIN

Dikeve guhê min dengê ah û zarîn û girînê,
 Nalîna dilê mine ji hesreta axa Kurdistanê,
 Nevaz û bêkes û mezlume nika qewmê kurd,
 Gah bi destê tirkan, ga bi destê Îran,
 Navê wujdanê û edaletê musemîye û derewin,
 Bo seyasetê ew qise her li ser lêvin,
 Eger raste navê edaletê, bo çi mindalê kurd
 Hejar, sergerdan digere li ser çîyan?
 Ewqas hêze bextê kurd bo kuştin û talan?
 Ew qise her rûte, ew qise jî qet nakeve girfan,
 Îro bira wa be, lê rojekê wê bê ewladê kurd,
 Bêne meydanê bi ulm, sene't û erfân
 Nûciwanê weten wê vî miletî bikin yek,
 Ji Kermanşa heta Romê, Sinne û Botan
 Wê bi rê xîn sine'ta Wanê û Cizîrê ser bi ser,
 Bûkê Akra û Zaxo wê destê hev bigirin dor û ber

Paşê dest pê bikin te'mirê milk,
 Riya hesin here çîyayê Hewreman
 Çiya û kej gişt bibin bax, kolan, qesir û rê
 Bo temaşe deste deste bên ji Înglîstan. (34-35)

Şayranê kurd, bese bes basî zilf û çav bikin,
 Kêm xeyala perçem û kakolê alozav bikin,
 Bidin alîkî, kêm basa simbul ya liqî lavlav bikin,
 Hûn tegbîrekê halê gewmê xwe belengaz bikin(14).

BO ÇI

Bo çî eva zemana her ji mera mêla xedere?
 Bo çî felek herdem ji mera mêla azare?
 Zalime, bê mirwete, xesmê kesan bi aqile,
 Fitna vê zalimiyê her ji mera mêla xunxare.
 Ez nexweş, xeste û zarim li rojê wa,
 Çavê min mexmurê nîgara rengê bêmare,
 Besî mine, saqî, mêla gerdenê, mey û bademê,
 Xuda, çiqas bê aqilî, herdem cîlve berî,
 Terka dîn û mezheb min kir, ku min dît zilfê nî
 gar,
 Helge-helge pêç-pêç şiklê zînhar
 Xûna pak ya lawê kurdane, ku li çiya û kej pîja
 we,
 Lema nika wa sore rengê wê gulzarê,
 Bo çî dilê min xweşe bê rengê vê biharê û feslê
 wê?
 Dest û ejnû li ser girînê, pêşê roj û şevê,
 Ahmedê bêçare dike mêla şîven û zarê (43).

DILÊ MIN PIR XÛNE

Dilê min pir xûne, cegera min pirtî-pirtî bû bo
 lêva te gulnar,
 Nexweş û derdedarim ez ji hisreta çavê te zor
 bîmar,
 Çelipa perçema te dest min keve, ezê ji îslamê
 derkevîm yekcar
 Kilîsa cî me, çana, ji eşqa zulfê te zînnar
 Got: Bibe aşîq, kuştîna te bi vê dibe dilxweş û
 mesrûr,
 Li nav aşîqanda her tenê tuyî qurban û dildar,

Ku şkest bazar, şehed û şekir û şirna qennad,
 Li rojekê wê bibihên xelqê neqd û gotar,
 Kaxezê bibe ji belgê gul, qelemê ji enber
 Ku mêla min be binivîsim bi rastî wesfê ruxsara
 te,
 Ku tu li ser rêyî, ez jî bêçare, qumrî dîlxûne.

(51)

XEYALA MIN

Xeyalê min waye, xelqo, ku ez terka eşqa dilbe-
 rê' bikim,
 Îda mêla perîyan bi carekê ji dil der kim,
 Eger dil mêla gulzar û nezanîna bike,
 Ezê bi nikê xencerê singê xwe pirto-pirto bikim
 Ji daxa silsila torê nîgara nazenîna xwe
 Divêt terka binevş û sunbul, etre û enber bikim
 Dibên dilber di gel min gelekî dilê wê sare û
 reqîb şade,
 Divêt ez axa a'lem ser li ser serê xwe bikim,
 Ku bejna dilberê bê ser bostanê min, got: Şerte
 Îda xwe der naxim, terka libas û bergê exzer
 kim,
 Heta kengê her li dûrî tu, bêm û herme cana,
 Bê sûd bo çi nîgebanî gul û gulzarê bê ber kim,
 Eger şevê ser li ser xîştekin bikim, tîrsa min tu
 ne, çimkî
 Bi ava çav umuda min waye, bira leşê min ter
 bikim,
 Got: Aşiq, ji bo çi dest ji zilfê min ber didî
 vê şevê?
 Min got: Heta kengê reqîbê eqrebî cerraz û ejde
 der kim,
 Eger bibe, paçî lêvê dilbera te wê bikevê destê
 te, Ahmed,
 Heram be ger dîsan bira behuşt û hewzê kewser
 bikim(57).

EV DILÊ MIN WA DIYARE

Ev dilê min wa diyare, mêla wî rûyê gula yare,
 Bilbila asa bûye, herdem nalin û zare-zare,
 Her ji destî cewra reqîban ez binalim, ne heqe,
 Çimkî me'lûme, ku gul bîn herdem bi xare dare.
 Welle, eşqa pirtewê ser sûrtê te sore, çavê
 min,

Sîngê min dişxule bi çirûsa agir û nare
 Kerem ke were, hucra dil xewleye bo bezma te,
 Xencî te, gurban, bê mehrem û bê xeyare,
 Îşqa çavê min wa ji hesreta lele lêvê te
 Dem bi dem carîye, sor û sorerengê gulzare,
 Dil ji xewfa zîlfê te bo gence rût ne rê bere,
 Çimkî li dora wî telîsma cotê reşmare,
 Ahmed bêçare, bo weslê te dinale roj û şeve,
 Rengê zer û ahê sar qelbê bêmare(35).

DIL WEK BILBIL EFXAN DIKE

Dil wek bilbil li hîcrê nû gulê efxan dike,
 Agrê cerga min xerêqe a'lemê boryan bike,
 Wa diyare ji vî welatî dilsare, a'cize,
 Mêla axa girmesîr û hem gela şîrvan dike,
 Eva welata bê sifaye, sare bo aşîqî rûte,
 Dilxwezê şewqa tava rûmeta canan dike,
 Ba reş û barana e'wrê çavêd min carîye,
 Zulme yan jî tance rûye, têkelî Sêrvan dike,
 Her kesê îro ji dergê wê niqarê rê keve,
 Gep bi milk û text û tacê padşâ û siltan bike,
 E'ferim bo eskerê birjang û her du zîlfêd te
 reş,

Wa bi carekê milkê can û dil hemû wêran dike,
 Bi riqî ah û ava çavê min li dûrî dîlberim,
 Her dibê e'wrê biharê, nalin û tofan dike,
 Leyla dihêlim, tu bi tundî wa meçe,
 Aşqî mecnûn siwet li vî destê wa girîn dike,
 Wa li bîra tîxê birûyê dîlbere, bê rehme,
 Ahmed nika ku xereqe canê xwe gurban bike(17B).

PİREMÊR (1868-1950)

Navê wî rastî Tofîq bûye, kurê Mehemed Axayê kurê Hemze a xa Mesref bûye, li sala 1968 li şêherê Sulêmanîya ji daykê bûye, di şeş û heft salîya wîda şandne hucra mela Huseyn Goce, li cem wî hînî xwendnê bûye. Şêrêd Xafiz Şîrazî xwendîye. Wextek derbas dibe, ew xwendna xwe rind hîn dibe û dibe feqî û diçe mizgefta Hemze Axa, li cem mela Mehemed hînî zimanê farsî û erebî û dersê ayîna dîn dibe, li paşê mîna şayrêd kurd bi navbang û navdar Hacî Qadir Koy, Nalî, Mehîwî û Mewlewî li Kurdistana jêrîn digere, li cem mela û zanayê mezin li mizgefta Sulemanîyê û Banêda xwendna xwe baş û rind distîne, li nav salêd 1882 û 1895 da dibe qulixdarê hukmetê. Sala 1882 li Sulemanîyê dibe katibê nifûsî û sala 1886 dibe katibê sereke (başkatibê) mehkema Şarbajêr, li sala 1895 li Kerbelayê dibe katibê muawnê midî am. Li sala 1898 di gel şêx Seydê Xefîde bavê şêx Mehmûdê qehreman çûye Turkîyê û di gel wî çûye hecê, vedgere tê û tev şêx Ahmedê Xaneqa û Wefayê şayr dîsan diçe Turkîyê. Sala 1891 li Stembolê ku pê dihesin, ku Tofîq hacî rind zimanê farsî dizane, wî dikne andamê alî-meclîs û ritbê begtîyê didne wî. Li Stembolê Îzet Paşa Tofîq hacî diçe mekteba huquqî, ew wê mektebê xilas dike û şadname xwe dadgerîyê distîne û paşê dizewice, qîzeke tirk distîne, paşê dest bi mihamtîyê û nivîsandnê dike, dixweze rojname û kovaran derxe. Wî çaxî, sala 1907 li Stembolê

komeleke kurdî bi serkarîya şêx Ebdilqadir şêx Ebdile saz dibe, Tofîq hacî tev wê komelê dibe û mijûlî îş û karê rewşenbîrkirna kurdan dibe.

Sala 1909 Tofîq hacî dibe qaymeqamê Colamerkê û sala 1918 dibe muteseserîfê Amasîyê, paşê ew jina xwe û du kurê xwe li Turkîyê dihêle û vedigere tê Sulemanîyê, wî çaxî rojname "Jîn" bi serkarîya Huseyn Nizam li Sulemanîyê çap dibû. Huseyn Nazim serperestîya wê rojnamê dispêre Tofîq hacî. Li sala 1934-da Huseyn Nazim diçe rehmê û Tofîq hacî dibe serokê birêbirna rojname "Jîn" û sala 1934 çapxanê bi kirê digre û mafê rojnamê hildide ser xwe.

Li sala 1937 mabeyna Pîremêr karbidestkarê şêherê Sulemanîyê xirab dibe, çapxana beled ji Pîremêr distînin û ew diçe cîkî dinê kirê digre û rojname xwe "Jîn" çap dike he ta sala 1950, wê salê jî diçe rehmê. Mehemed Resûl Hewar li kitêba xweda "Pîremêrdê Nemir", ya sala 1960 li Bexdayê çap bûye, bi hûr gilî derheqa jîyîna Pîremêr û nivîsarê wîda gelek gilîyê baş û hêja nivîsîne. Ewî nivîsîye ku Pîremêr nek bi tenê berevker û çapkerê filosoffî û pendêt miletê kurd bûye, wûsan jî şayr û nivîskarî kurd herî mezin bûye, ku nivîsarêd wî, îş û karêd wî li rîya rewşenkirin û perwerdekirna miletê kurda bê hesabin, ku bi reng û rûyê nivîsara wîva divêt navê wî li rex navê Tolstoy, Vîktor Hugo û Tagor bê gotnê û nivîsandnê. Nivîsarêd wî pîranî derheqa wan pîrsêd jêrin hatne nivîsandnê: Jîyîn û halê însan, îş û karê wan, reng û rûyê tebîyetê, dildarî û siruştîya evntîyê, halê bindestîya miletê kurd, şerê şerker û têkûşerêd azad kirna kurd û Kurdistanê, hevkarî û dostîya kurd û ereb û gelek-gelek pîrs di nivîsara wîda hatne nivîsandnê û xemlandnê.

Divêr bê gotnê, ku nivîsarêd Pîremêr bi zimanê kurdî baş hatne nivîsandnê, şêrêd wî baş tene fehm kirnê, nêt û merem û fikra wan zelal û safîye, bona nimûn jêrê ez çend şêran çap dikim, ku xwendkarêd me delal bixûnin bi bîr û bawara Pîremêrra bibne nas.

NEVROZ

Eva roja sala tezeye, Nevroz hatiye,
 Cejna kevne kurde bi xweşi hatiye,
 Çend sala gula hîvya me best bû heta par,
 Her xûna lavan bû gola ava nû bihar,
 Vî rengî sore bû ke asoyê bilindî kurd,
 Mizgîna beyanê bo gele dûr û nêzk bir,
 Nevroz bû agrekî weha xiste nav ceger,
 Lawan bi eşq diçûn pêşber mirin,
 Awa rojhilat ji beşena berza welat
 Xûna şehidê, rengê şefeq şewq ve daye,
 Heta nika li tarîxa miletîda rû nede,
 Qelxana gulê singê keçikan be li hîlmetda
 Bo şehidê weten naxweze şiven û girîn
 Ew namrîn, wa li dilê miletîda dijîn.

(Pîremêrê Nemirî, 120)

HAVÎN

Hewa havînê, hewa havînê,
 Îsal havîna me zor bi kîne,
 Girê agrê Sebûn si tîne,
 Bergê esman bo me şîne,
 Feslê gulgeştê baxê Penewîne,
 Ev sebûna me ji kuva hat?
 Bi tîna germê hilqirça welat,
 Stêra ta'lê xwe guhêrî, ne hat,
 Bêşnê û şiveya şemal kişumat,
 Dil vê germê k'iz xemgîne,
 Girê yarê ciyê rojtavê,
 Rîya seyranê nevroz biriye,
 Karêza şerîf av têda maye,
 Erxewan çiq popê wê şkaye
 Girê Seyvan ciyê zar û şîne,
 De xwedêye, hilkeve k'izîna şemalê,
 Hewa zenga xemê min ji dil bimalê,
 Ay bo dengxweşek di gel şimşalê
 Bi wê xwestnê têr bûm binalê
 Derdê min karye û cerga min birîne

(Pîremêrê nemirî, 108)

ŞEHÎD HATÎN

Hatîn şehîdêd bi cilê sore xûnîn,
 Dayka weten, de rabe, silava wan hilîn,
 Şêx Qadre li pêşê û ser qafî ewan,
 Çiqas ciwane, xûn û rîşî spî, pîr û nû ciwan,
 Seyrî van ke, hemû kurdê sef şekin,
 Canê xwe pêşkêş kirin û gotin: bijî weten,
 Qurbana te berêze, ku xem li ber nebe,
 Bo me mirdne, eger azadî ser nebe,
 Megrî, menale, ku bi xefet dîlşkest ne bin,
 Hinekî li cem te bimîne ber bihuşt herin,
 Ez wa dixwezim, ku heşir bigrim, xûn ber keve,
 Bi eşqa millet, bi kizî û sozîna cergeva,
 Ew agrê ji dilê min bîr be, kefen nakim,
 Heta dijmin neke zoxal, şert be pif nakim.

(Pîremêrê Nemirî, 103)

EZ Û STÊR

Stêrêd bilind diçirûsin bi şev,
 Mîna min ji daxa dil, ne taba wan heye, ne xew,
 Çend sale aşnayê şevê bêdarê hevin,
 Em serserin, şevê serî nagihînne serserin,
 Jêr û jor ji dest min çûye, bê welatin ewan,
 Mîna xêla xwar û jor gera kurd, wêlê esman
 Şev şevnema wan çîmena avê vedixwe,
 Roj hilme ava çavê mine ser dixwe,
 Duh şev berî beyan bû, digrîn li ser min,
 Ew min kesas dibîne li nav dost dijmin,
 Dilsozê wa min ne dît, ku bo min bigrî mîna Xeşîm

Hêsrêd wan bûn, min t'irê avîne,
 Bira bispartana min, sebeb çî ew xeflet bin,
 Mîna me nêzîktir nînin li baregayê xan,
 Caba wan nivîsîne bi şevnema li ser giha
 Ta esman piriskê bedî wê hilpija,
 Ah û nizîna kurdane şîmal gihîşte esman
 Bi wê dukelê henasa av tê ber çavê me. (106-107)

WEFDÊ KURDISTANÊ

Wefdê Kurdistanê, mîletfiroşan,
 Herze wekilê seherê xamûşan,
 Çepke ji gula wê, baxê şêran
 Ku bi xûna lavan hate avdan,
 Bibne xizmetê erşê Îraqê,
 Bêjin yar baqî û hem sohbet baqî,
 Perde û tara sor berin bo emîr,
 Bêjin paş kuştar hê tuyî dilgîr,
 De xecalet bin li rûyê meşhera,
 Emê axa xem bikin bi sera,
 Hûn ji wê erşa bi xûn bikin gulrengê,
 Sicde bo wê bin, bikin bi nalîn û nenge,
 Kurd ne mirîye, xeyala we xamîne,
 Berata necata xwe bi xûnê nivîsîne,
 Ez rengê sorim, lema min hez dîkin,
 Mizgîna şefeqê ser wanda bi rêdîkin. (102)

EY KEÇIKNO WERNE MEKTEBÊ

Ey keçikno, werne mektebê,
 Hûn teskinê dilê mene,
 Zînetê bax û tereqîne,
 Rewnêga destê gulim,
 Teze em têgehîştin,
 Dayka genc xwendewar
 Nesla wa tîne meydan,
 Qewmekê pê bêye kar,
 Jin şîrîka jîna mêre,
 Nek û tenê xerêqa bar û dare,
 Terbyeta mêjki mindale
 Bo weten bê wijdan helale. (28)

TENÊ DILSOZÎ

Rengê zengê p'utê siruştî,
 Qalibê minî kurdî têda riştî,
 Heta bimirim wê bimîne,
 Ku wusane, wê çi bê serê min,
 Belê, her kurdim, kurdê ser çil,
 Pejarê hejar kirme jêr gil,
 Herze girêkim li ser yalê,
 Serî datînim ser berd bi dev nalê,
 Dibînim her çi bange, ez dikevmê,
 Devê min girtî bo hev demî,
 Eva qewma mîna peza bê ziman,
 Dû her kesî ket, ne birne nav wan,
 Bi hurî û şûr dest nayê hildanê
 Bo goşt serê peş nayê birinê,
 Nika destek peyda bû, xeybûn,
 Dengê wan heye, rengê wan nabinin,
 Ketne xola bilind perwazî,
 Bi rişiyê baba ketne nav bazi,
 Bi baskê xeyal û bi belaf û kezaf
 Em hilfirîn ser banê qaf
 Em li axa Îraqêda dijîn,
 Çawan em bo helo jê der biçin,

Îraq zûda hatiye xulqandin,
 Toxmê du gewman têda hatiye çandin,
 Çawan têda here rîya bigana,
 Bikeve nav van cî û mikana. (III)

BESTEKA KURDI

Wa beyanê gizînga tavê der ket,
 Nema şevem bi tîrêja rojê ser ket,
 Xunçe gul xwe xuyan kir li dara,
 Bilbilê jî şewra xwe kir nav gulzara,
 Lale taraye, li ber perê çîyan,
 Hênika cane bayê leylexan,
 Dema êvarê sîbera baxan,
 Xweşe bo yarê bayê ser şêher,
 Ev tirana gul û milê cane,
 Bê te cem min jîna zîndane,
 Cejn û şaya min hergav girîne,
 Ez û bilbil cote zar û hejar,
 Hînî hesra me, gulala dewrim,
 Wa ji daxa te bê wefa bimirim,
 Çaverîya min ke, wa tîm ser qebrê,
 Bi hêwa te zêndî bibim du carê. (163)

BARAN BARI

Barana nisanê bû mirwarî,
 Bi rehmê li ser meda barî,
 Zanîstî bi wê hinekî kêş bû,
 Mîna gewher li naf sefda wun bû,
 Xwaşî erfana ji nîslê xwaş
 Zanîstî li gêj-gêjî kir xilas,
 Zanîstî û zanîst xwedê bi min bînin,
 Belkî bê kesan bi şev bixûnin,
 Xwendin şevê dike bi roj,
 P'erde tarîkê dike bi laş. (310)

WA MIN DIZANÎ

Wa min dizanî, ku min dîl dabû te,
 Dilê te jî bo min dibe sifte,
 Çi bikim dilê şêr ez rastî te kirim,
 Bi sewadê bê sûdî ez jî navê birim,
 Tu jî tê gihîştî dîl wa dijmine,
 Îda li cem te bûye gayê jêr-bine,
 Eger carna dijmin ne bûya,
 Te ne dihişt ew bê ber derga,
 Lê ruhê min, kirna te boşê,
 Li têkelêda her rastî xweşê,
 Dilê elmast min bêkerdîge divê,
 Tiştê saxte be, wê zû der keve,
 Tu xwedê, heyf nîne mîna elmast ciwan bî,
 Bi rengê xûna aşîq penhan bî,
 Dîl birevîni bedxwezê mîna te,
 Vê cewr û zorê xêr çiye bo te?
 Çi dibe rojekê eger ya min bî,
 Dest neweşîni û sehetekê hêminbî. (195-196)

FERYADA PÎREMÊR

Dibêjin hesrê e'wr barane,
 Giva girîna wan şîna yarane,
 Kwa? Eger e'wr wa bigirîya,
 Dibû baran get newestîya,
 Çimkî çar sale ev ser zemîne,
 Tev xûnê kuştîye û rengîne,
 Eger em hevdu bikujin,
 Çima e'wr û esman bo me bigrîn?
 Eva qîr-qîra qîrîna îsane,
 Raste bêjme te fêlê şeytane,
 Xwestna xwedêye, gerek bê cî,
 Bonê wê ku dîna bi fesadî ne çê. (243)

DİLÊ MIN XEMGÎNE

Dilê min xemgîne, dilê min xemgîne,
 Eger xemxwarî, were min bibîne,
 Xudayo, bo çî te ew dil da min?
 Eşq xemê divêt û heyata xweş,
 Agir li dîlda çawan dadipoşî?
 Barê hukmetê li cestem bare,
 Dil jî bi tîra yarê birîndare,
 Dewra rojgarê gerdena wê jî bada,
 Bîra bade, em xema bîdin bi bada,
 Ku xem min bixe halê bê hiş,
 Neçar dest bikme nav badenûş,
 Min destgîr ke, ey yara şevgerê,
 Bi peyamê yarê jî dil derxe xemyarê. (307-308)

RÛNÎŞTÎ BÛM DI GEL YARÊ

Rûniştî bûm di gel yarê,
 Ez sermest bûm û ew hişyarê,
 Bi tîla çavê wê bêmar
 Dilê min firand yek car,
 Li şûn dilim, ketim neçar,
 Min gelem lê kir lava,
 Avrûk li min da lêva,
 Ketim, ra ne bûm,
 Wê ez bi hevva pêçam,
 Extyarê bê extyar,
 Îcar hat ber serê min,
 Çavê wê kete lîrîzîna min,
 Can anî ber bîna min,
 Yax da alîkî wê bibînîm,
 Ronak bûn der û dîwar,
 Mang bi kitan xemlan bû,
 Du dogme tirazan bû,
 Du nar jî nûrê sazan bû,
 Bala destê wê zaba bû,
 Nûra tûr li cem tîr û tar,
 Bû got û bêja vê yarê,
 Bi şîrînî û giriftarî,

Helwa gezo ji dev dibarî,
 Yek car lêva xaldarî,
 Altir ji perê gulnarê.
 Ax nizanîm dil çawane,
 Ji birûska çi gune
 Agir ber bû mîna berê
 Ketme sovekarî mîna sonê,
 Min xwe kire ber pê dildar,
 Bi du zilfêd mîna zincîr,
 Ez pê grêda bûm mîna nêçîr,
 Bi min k'enî, got: Ey pîr,
 Wa te jî ez anîme gîr,
 Mîna ciwanekî bextyar.
 Min gotê: " Pîrî azad bûm,
 Qelenderê dilşa bûm,
 Bend ne bûm, bend guşad bûm
 Qehremanê dêwazê bûm
 Wa bi te hatme jêr bar,
 Kerem ke vê ola êzdan,
 Te ez anîme meydan,
 Wusan bûme bê binewan,
 Bo serperestîya mêran,
 Emê mervan bikne ber kar,
 Neveyê perîn ji pêşîn
 Reha dil ra dikêşîn,
 Lema çi gewimye, em lê xweşîn,
 Barê xemê wê bikişîn,
 Em hem xemxwerin, hem dildar,
 Eger em ne bûna,
 Mêrê çawan bihata kaye,
 Eger li cem we haye,
 Dinya her nivî yê weye,
 Xwe pesn û dilazar,
 Em hez ji şer nakin,
 Hivî xwendin û çakin,
 Neteveyê baş peyda kin,
 Emê wêranê ava bikin,
 Bi xwendin dibin rizgar,
 Weten bikin baxê gulzar, (358-359)

BIGUHERIN

Tu wa li min menêre ez her digirim,
 Ez xudan sipayê endîşim û bi derdim,
 Her çi li deşt û çiya û ser ave
 Bi bihayê şêfî xuda da min nave,
 Sefideya beyan, zerîna roj tavê,
 Tirêja hîvê û lenc û lûrîna avê,
 Sil û avrû û gerden berza asik
 Qaspe-qaspa kewê li ser aso û bask,
 Gul û gulale û nêrgisa beharê
 Şexya beraz û çînûr ji nizarê,
 Evin yek bi yek dibaxşîme te,
 Tu jî nazdara xwe bibaxşîne min,
 Sefîdayê subh say beroka te,
 Kenê bi xuruş û kenkenoka te,
 Mang bo rûxsarê te, av bo cebîna te,
 Rêma ahu jî bo lence şîrina te,
 Qaspe-qaspa kewê bo qarqîne ciwana te,
 Nexma bilbilê bo hûr xemla te,
 Gul bo nazikya te, gulale jî bo lêvê te,
 Çînûr bo zilfê lule peşivê te,
 Wan em biguhêrin,
 Berawer kin, girêw bigirin. (205)

KOSTÊ NÛ

Dîsan wa kostê nû kete nav me,
 Li gera gerdûnê kurd girtine,
 Ev du dar terme du nêreşêr,
 Zincîr kirî anîne li vir,
 Li rîya meda wana xwe fîda kir,
 Navê bilind bo xwe der kir,
 Ew peta li milê wan xistî,
 Ew xenigandin, lê pet getî,
 Pilingê hingirî bi hilmettir,
 Gol çiqas k'ûr be, sovekarî têda xweş be,
 Wa ji mera dibêje dev bi keşîn
 Me ruhê xwe fîda kir, hûn pê bijîn
 Van cotê şêre delîre şêrze,
 Li nav tarîxêda navê wan berze
 Qet bo wan ne lazîmin kefen û def û şîn,
 Şahîdin, li nav dilê meda dijîn. (334)

STRANA NÛ CIWANAN

Ey nûciwanêd weten
 De pêş kevin, aza birevin,
 Hûn ber bi zanîn herin,
 De têkuşin, dû mekevin,
 Li sîberîya serbestiyêda.
 Ey dijmênêd nezan
 Xelqê here k'ûra meydan,
 Rizgar bibe welatê min
 Zu nîmîne paşketna wan,
 Bi gewata lawêd nû ciwan. (354)

MERIVEKÎ KURD ÇÛ BÛ BESRA

Mervekî kurd çû bû Besra,
 Sibê şîrê xwe bir gera,
 Yek bi yek av kire nav,
 Qazınca zor anî ser hev.
 Sermaya wî bû sed lîr,
 Rabû, hat bi tivdîr
 Syarî paporê bû, çû Bexda,
 Şevêkê li ber mange şevê,
 Xerêq bû pere jimart,
 Xuda xirabî bo xiraba dinêre,
 Meymûna qeptan peyda bû,
 Ew kisê lîr têda bûn,
 Revand û bi darêva hilgerî,
 Kurd arama xwe jê birî,
 Tep li rana xwe xist û girî,
 Hewara xwe bire ber qeptan,
 Qeptan çiqas lê tûnd dibû,
 Meymûn ber bi jor diçû,
 Çû, gihîşte tewqê serê dar,
 Lîr li jorda kire xwar,
 Yek-yek avîte nav avê,
 Heta sed lîr avît navê,
 Yek bo avê, yek bo kurd,
 Kurd har bû ji kerbana,
 Rabû çû gijî qeptana
 Qeptan her wa şaş mat ma,
 Ji wê heryaê ecêb ma,
 Gote kurd: "Tu xwedê, bêbext,
 Ev pere ji ku te dest xist?"
 Got: min şîr firot,
 Çend sal min wa fikir,
 Ez tê gehîştîm, çûye,
 Sûcê meymûnê te nîne,
 Nivî av bû, çû ket avê,
 Te jî para xwe wergirt ji havê,
 Kesîb xoşevîstê xudaye,
 Heram bi kesîb agir û kaye.

EBDULA GURAN (1904-1962)

Di sala 1904-da li şêherê Helebçiyêda Ebdula Guran ji day ka xwe bûye, bavê wî qulixtarê hukmetê bûye, li zarutîya xweda Guran xwendina xwe li şêherê Helebçiyêda li mektebê da bi zimanê tirkî standiye, li paşê sala 1921 li mektebâ mamostanda ya Kerkûkêda hin bûye. Lê ewî ew mekteb xilas nekir, ji belengazîyê û tengasiyê ew mecbûr bûye mektebê bihelê, bikeve ser qulixekê. Ji sala 1921 heta sala 1925 Guran li halekî belengazî giranda bûye, paşê ew dike ve ser xebata dersdar û li şêherê Helebçiyêda donzde sala li vira ders dide û bi xwe hînî zimanê tirkî, erebî, far-sî û înglisî dibe, kitêbên literatûrê yê peşkevtî bi zima-nê tirkî û ewropayî dixûne.

Li sala 1937-da Guran li qulixa wezîretîya çûn- hatinêda dixebite, li ser vê qulixê Guran rê têra dibîne û mijûlî nivîsandina şêran dibe. Li wî çaxî ew hine şêrên rind di-nivîse, mesele, şêrên Geştekan li Qeredaxê (yanê gerînek li Qeredaxê), "Geştekan li Hewremanê". Li van herdû şêranda ew reng û rûyê Qerîdaxê û Hewremanê bi hostatî li şêrên xweda dixemilîne, tîne ber çavê xwendevanan.

Li nav salên 1940-1945 da li şêherê Yafêda Guran li radî-ya hevpaymana "Rohilata Nêzîkda" dixebitî. Di jîyîna xwe-da Guran gelek caran hatîye girtinê, çimkî ew bûbû heval

û hevkarê merivên şoreşger, mîna wan dixebitî, ku welatê xwe ber bi pûşketine bibe, xelqê xwe azad bike. Şorşa sala 1951 li Îraqêda Guran ji girtîxanê azad kir. Li Îraqêda li sala 1951 Guran bû himdar û binaxedarekî komîtêta pawantîya dinyayê. Sala 1959 da ew li paşî şorşa Îraqê tê Sovêtîstanê wek mewan, sala 1962 ew têbijartinê wek anda-mê komîtêta şewra aştiya hemû dinyayê.

Guran du caran hatibû Moskovayê. Sala 1962 ew nexweş ket û çû rehmetê. Nivîsarên Guran, gişk derheqa rindî û qeşen giya welatê kurdanin, derheqa evintî û hal ehwalê milletê kurdanda nin, derheqa serbestîya kurd û Kurdistanêda hati ne nivîsandinê, têda rêalîstî gişk têne ber çavên me. Şêrên Guran van salên paşin bi arîkarîya koma nivîskarên kurdên Îraqê li berhevokekêda hatine çapkirinê. Ez hinekan ji wan ji xwendkar û xwendevanên me delal ra bi kur-mancîya jorîn li vira çap dikim.

Sala 1978 meha Îlûlê, komela nûserî kurd biryar kir ku he ta van salên paşin hemû nivîsarên Guran ne hatine komkirî nê û çapkirinê. Ewê ew îş kire ser stûyê xwe. Komelê biryar kir ku nivîsarên Guran li du berhevokanda çap bike. Di berhevoka pêşînda hemû şêrên wî çap bike, lê di berhevoka duduwanda nivîsarên wî peşxan(çîrok, serhetî û tercîmên ji zimanê bevanî û gotarên wî zanîstî yên lêgerînê) çap bike.

Doktor Êzêdîn Resul Mustefa di pêşgotina xweda ya li dîwana Guranda çapkirîda dinivîse, berî biryarê komela nûserên kurd Mehemed mele Kerîm bi xwe nivîsarên Guran kom kirî bûn û xwedî kir bûn, lê bi xwesteka komela nivîskarên pêvîst bû hemû nivîsarên Guran li nav wextekî kurtda hemû nivîsarên wî kom bikin û çap bikin. Sebeb vê yekê ewê çend meriv nîşan kirin, ku wî îşî zû kuta bikin. Merivên nîşankirî(Mehemed mela Kerîm, Kake Felah, Mehemed Kerîm Fe tah û Celal Debax) şêrên Guran gişk kom kirin, dane kome-la nûserên kurd û ewê jî ew li berhevoka pêşînda li sala 1981 da çap kir.

Di pêşgotina xweda doktor Êzêdîn Resûl Mustefa dinivise, ku nivîsarên Guran yên berepêşîn yên romantîkîne, lê nivîsarên wî yên paşin yên rêalîstîyê rexnegirî sosyalîstîne.

Ew dibêje, ku di şêr û peşxanên Guranda rengê merivatîyê tê ber çavan, merivî, şoreşgirî û pêşveçûna û paşverûya wî mezin tê ber çavan. Ew dibêje, "Guran şêrên neteweyên dostî û hevkarîya neteweyê kurd û ereb gelek nivîsîne û bînga biratîya wan berk kirîyê, mirata samanê neteweyê xwe qaym kirîye, bi folklora zargotinê dergê dil û hînavê neteweyê xwe vekirîye, rê û dirba seyr û temaşe lêkirinê vekirîye, saya serê zanîna zimana ewî gelek şêrên inglîsî, tirkî wergerandine, kirne nav edebyata kurdî û litêratûra neteweyê xwe dewlemend kirîye. Di nivîsarên Guranda bîr û bawara azadî û serxwebûna milletê kurd ciyê pêşîn digire. Piranîya nivîsarên wî mîna nivîsarên şayrên

kurdin, mîna nivîsarên wan şayranin, yên ku li axirîya sedsalîya 19 û li nivê pêşîn yê sedsalîya 20' da derketne meydana ronak kirin û azadkirina neteweyê kurd, hişyar kirin û pêşvebirina wan. Êzêdin dinivîse "Guran mamostayê me bû, ewî temîyên bi qîmet li me dikirin, rîya samanê me rîya yekîtiya serekaniya saman, bîr û bawara şerê rasteqîn dida pêşîya me, li kûranîya xebatêda ew heval û hevka rê me geleka bû, li meydana şerê pêşberî împêrîalîzm û kevneperestanda ew tev me bû û pêşvebirê me bû. Di şêrên Guranda ciwanî û xoşevîstî tavgî zelm û çiyayê Hewreman, rêva kewrîşkên qelew û xirpin, bizîna lêvên keçên delal, ciwanîya qij qalû dev û lêvên şîrin, peyamê tekuşeranên kurd û desteka lawkên nebez, binaxa berk ya biratîya kurd û erebên çavreş, dijminatîya împêrîalîzma Emerîka yankî û dostîya Kore û Vietname û yekîti û hevkarîya xebatkarên bin bîra nefta Îraqê tevî kenarê behra Xezîr û hemû îşkerên dinyayê, baskê kevoka sipî ya Pîkaso li nav şêrên Guranda têne dîtinê. Xeberên kurdî xas, kêş û qafiyên ciwan û kurt û dirêj yên şêrên xwerû, dîalog, opêrê, pîyes galte û henek û xeberên bijare li tercimên çîrokên bîgananda û rind û qesengî di nivîsarên Guranda têne dîtinê. Di nivîsara wîda wineyê kurdê xas û pak û temîz, biratî û zordestîya mîletan, hevkarî, şerkarî, merivatî û wefadarî di nivîsarên wîda têne dîtinê.

XWEZLA MIN BI PAR

Bêjne yarê, bêjne yarê, yara nazdar,
Sed hezar car xwezla bi par, minî hejar! min bi
sala par,

Xwezla min bi par,
Xwezla min bi sala bihirî,
E'mrê kurtda dildara min bû,
Nişkêva hat, nişkêva çû,
Yek car tijî bû dinya arezû,
Deryake tasê, em herdû
Cida ma bûn, li par mirî,
Bêjne yarê, bêjne yarê, yara nazdar,
Sed hezar car xwezla par, ezî hejar,
Xwezla min bi par.

Roj ne bû çavê min didar,
Şa mebe, rehet bê azar,
Roj nebe bi xwar û mar
Mîna askê erdê behar,
Li ber min nake guzar.
Bêjne yarê, bêjne yarê, yara nazdar
Sed hezar car xwezla min bi par, ezî hejar
Xwezla min bi par.

Her roj bi rengekî nazî,
Her xelveta cejna razî,
Ji tiwanê bi min nazî,
Bo maçê, niqurçînê dikî gazî,
Her bezmê bi deng avazî,
Bi çavbînî, çav ditin dilxwezi.
Bêjne yarê, bêjne yarê, yara nazdar,
Sed hezar car xwezla min bi par, ezî hejar
Xwezla min bi sala par
Bêjne yarê, bêjne yarê, yara nazdar,
Sed hezar car xwezle min bi par, ezî hejar.
Xwezla min bi sala par.
Bêjne yarê bê nav çavê,
Me dit ji tawê, dûrî tawê
Dirêt ji hêsrâ lêya avê,
Ax dikir wê gavê
Bona bejn û bala lavlavê.

Çav reşê, egrice xavê,
 Bêjne yarê, bêjne yarê, yara nazdar,
 Sed hezar car xwezla min bi sala par ezi hejar.
 Xwezla min bi par.

Pirsî kî? bêjin damave,
 Hêlîna dil lê siwave,
 Donzde mang ji yarê dûr xistine,
 Hinek nîzîn têda mane.

Got: Nav û nîşanê navê wê,
 Dizanî yar bi xweye, kîjan hejar, rojê sed car
 Dike hewar, xwezla bi yarê, xwezla min bi par.

GULA XÛNAVÎ

Kur: "Binêre, şaye, çopiye li wê malê,
 Guh bide zurnê, deholê, şimşalê,
 Zer û sor tev hev bûne, jin û mêr heraye,
 Li vê navê her deng û sêda fireye!
 Dê zû bike, em herin, dest bigirin,
 Kê ji me dildarî tevayî helperin,
 Keç: " Gul ne be li serê min, al çepkî, zer çep
 kî,

Naêm zemavendê, naêm helperkî".

Kur: "Keç li rîya ciwanîda, keç li rîya ciwanî-
 da,

Keç ji nîvingayê hat û çû kanîda,
 Payze, belgê daran dawşin, bax rûtin,
 Gul kwanê? gul lêvê bibre, bişkivîn".

Keç: " Gul ne be li serê min, zer çepkî, al çep
 kî,

Naêm zemavendê, naême helperkî,
 Te dil da min bi hemû ma'niyan,
 Du çepke te anîn ji baxê padşan".
 Kur diçe, li ber xwe stranê dibêje:

"Baxçê paşa li wî berî avê,
 Êla dijmîn lê daye navê,
 Herim, rîya min girtiye,
 Neçim, çav kal ji min bi xeydêye."
 Bere-bere ji gund dûr dikeve.

Kur: "Li baxçê paşê xweş digirim xwar û jor,
 Zer hebû, min bo te çinî, dest ne ket gula sor,
 Nizanim îcar têyî bo şay û hilperkî"

Keç: "Naêm, gul maye bo serê min sor çepkî"

Kur: "Bikî ya miraxanê tirazanî,
 Naxwezi ev kula serê min li batê?"

Keç: "Hey hewar, tîfinga dijmîn ji pêva tê,
 Rakişî, hinekî binêre ser ranê min,
 Bira bigrîm bo dilê wî, bo gula ne para min;"

CIWANI LI GUNDADA

Êvare, va hilgera kizîna teze,
 Rîya kanî Quban çavnêrî koma naze,
 Ber dergê we qibla rîya ehlê dilxweze,
 Êvare, va hilgera çaxê kizîna teze,
 Ser kûça metre bi bîna xunçe û mêxek,
 Bi wê lencêva beste hê weşîna xamek,
 Heraya kemerê û pilpila guhar û kermek.
 Êvarê, va hilgera çaxê kizîna teze,
 Çend ciwan bere û mexrib diçe, zerde dide te,
 Pîrşînga xîşîl dorê digre, dor berê te,
 Rojekê gelê hazîr be bo pêşkêşê ber pê te.
 Êvare, va hilgera çaxê kizîna teze,
 Ey hûr qise û besta gişt kurêd ser rê,
 Şewata hemû ciwanîne, kê? kurê kê?
 Êvare, va hilgera çaxê kizîna teze,
 Wek siwiske birî, aska nigay çavê reş û mest,
 Pîr e'şwe biçerxîne, îda qet me be der best,
 Çend mal hilşîn, çend şîl bin hêzê dil û dest,
 Êvare, va hilgera çaxê kizîna teze,
 Rîya kanî Quban çavnêrî koma naze,
 Ber dergê we qebîla rîya ehlê dilxweze,
 Êvare, va hilgera kizîna teze !

BO CIWANIYA SER RÊ

Bo şevêkê min hişt eva gunda, rê wunda kir,
 Beyanê roj hilat, siwar bim, cî bihêlim,
 Mîna savayê yek şev, ku gund li paş ne man,
 Çol temam wê bibin nav û nişan.
 Vî gundî bihêlim bê nişan, bê şûn, bê pê,
 Ey perfî sil mebe, nede alî tu hejarî,
 Ew nîga nîv ke çey, ew çav mestane,
 Qûz mebe, ber pê û berz û geş binêre,
 Penca naz berde ji çimkê mişkê şerm,
 Derkevin lêvê al, zulfê xav, gulmê nerm,
 Sil mebe, ji mêla bi germîya nêrîna min,
 Merêkim, ciwanîye qiblega ayîna min,

Serekî ez lê dim bi wê bejn û balê
 Ji singê pakva bo ciwanîya tenê,
 Dixwezim der herim ji vî gundî beyanî
 Dixwezim der herim ji vî gundî beyanî
 Xatirê min bigire bi baştir nişanê,
 Çimkî ax! eger tu min bimrîni,
 Lê tu bi xwe têyi, her li cem min bimîni
 Te ji di gel her ciwanîkî bibînim heta mirna min
 Wê bibe mirwarî mlonek şêrêd min.

CIWANIYA BÊNAV

Qijqalê, lêvalê, pirşingê, nige kal,
 Ey keça ciwan, ya ser reng hinekî al,
 Ey keça menga bi deng cipe dû,
 Dev û lêvê daliqandî û çavan hilne girî.
 El endama hûrinok, nermkok, hestû sivik,
 Ey cilê wa karê te dilgirtire ji yê bûk,
 Raste, ez rêbarim, ser pê çûn wê min,
 Lê va ciwanîya te kar kire ser canê min,
 Te tirê nek her niha, e'mrekî dirêj,
 Bi wan dest û pêncê birîna min ke sarêj.
 Ey keça kal, ciwanê din eger zor kal bin,
 Ji baxçê beharê gulbaxê ber xur bin,
 Bira rengê wan perdaxt be û cîyê wan ser çil be
 Bi gotna xelqê din bira navê wan şa gul be,
 Canê min bo têle binevşê diherişe,
 Ku li bin sîbera tûtirka xamûşe.
 Li hemû esmanî stêra berê beyan,
 Dilê min dixê hestûkî sipî ciwan.
 Ji textê yekdestî hezar yek nexme,
 Ewê şîrintir têne guhê min nizme
 Kanike ron li ber çirûsa mangesêvê,
 Li binîda bilerzî mirwarê zix û çavê,
 Ciwantire li cem min ji derya bê sinor.
 Şepola bate ber tirêja rojê şil bû hur,
 Qijqalê, lêvalê, pirşingê, nige kal,
 Ey keça ciwan ser renga hinek al,
 Der best nînim, rêbarim, derbest nînim, revok nînim

*Dizani şerpeze û derbest yekcar çira min
Ey ewa nîgareke hate kişandin ji bira min,
Şoxê, neyabê, lê ax, bê navê bona min.*

(Dîwana Guran, 45-46)

JIN

*Jin dizgîna husnê bi eşq dike pernaz,
Jin qût dixê xeyalê reqsa engîz,
Jin eşqê tîne û jin ji eşqê nevaz,
Jin tarê rûbay heyat dike tehzîz.
Sima wasmî dilger ji jînê biki xalî,
Teclîatê bidaye xirub bike dîncurî.
Bi ser sima tehida guşad bike balî,
Jin ku mezina sertacê ehtirame, jine,
Bi nîke niştira almasa tûja eşq û xiram,
Xitûtî qîdsîtî hik kirî gelbê mine,
Bi sehrî xariqî jin pir qirincima elham,
Li kuhcê xatré minda ta jineke şox neke
Perê sifet bi pelu poy cemala cilve
Li ku li sethî zemînda li singê felekda
Wê bibe menbe şêrêd min bidayî! e'şîya.*

BESTA DILDARÎ

*Li bin esmanê şîn,
Li pal çiyayê befrîn,
Li Kurdistanê gerîm.
Li dor ber min meriv,
Ne li şêher, ne li gund,
Min ne dî get kes,
Weke te ciwan be.
Keça kurd, dil pê şa be,
Wek firişte û perîzad be,
Ne berik, ne goştîn,
Ne keçika e'şî jin,
Ne zor çav reş,
Ne îcgar geş,*

Lê bî nîga şîrin
 Ne min dî qet kes.
 Wek te bi tîn,
 Tuyî, tu bes...
 Li te bê bîza mangeseyê,
 Bejnê rêga û rewşa kewê,
 Ji jorda min tu dîtî,
 Eşqa dilê min şewitî,
 Sehetekê dûr bî ji min,
 Agir dikeve canê min.
 Ku dest ji yaxa te gir nebe,
 Ji cem kesekî dil jîr nabe,
 Tuyî, her tuyî bes
 Wusan ku min tu ne dît bû,
 Jîna min ta'î û tîrş bû,
 Bê şadî û aram,
 Bê hîvî û nakam,
 Dijîyam, jîna serserî,
 Ne min dî kes
 Bo rêberî,
 Tuyî, her tuyî, bes.
 Rîya hîva nîşanderim,
 Sixtiya jînê asan kerim.
 Ey keça gir, keça Zevos, (1)
 Xuşka civan, xuşka Vênos, (2)
 Ez te perestim,
 Lema wa mestim,
 Bo ayîna min digerî,
 Hinek kes,
 Bi car bidirî,
 Tuyî, her tuyî, bes.
 Qibla ayîn û bawarim,
 Xweya bihiştî, dilî terim
 Wek serê rê şwên amanc,
 Ne zazame, ne kurmanc,
 Geram li Kurdistanê,
 Germiyan û Kuhistanê,
 Ne li nav şêher, ne li nav gund
 Ne min dî qet kes.
 Mîna te ciwan be,

*Tuyî, her tuyî, bes.
Keça kurd wek gul wa be,
Kurdistanê pê ava be.*

- 1) Yanê Zevs, bavê mezin yê xwedê yê hurimê kevn.
- 2) Vînos, Afredîta jina here rind, stêra zehre.

BERBANGA SIBÊYE

*Berbanga sibêye, ronaka aso,
Hîva kurde, mizgîn bo te,
Deng û bang hatin ji mizgevtî gund,
Baldara helîna xwe cîda hiştin,
Qaspe-qaspa wan dibêje:
Berbanga sibêye, ronaka aso,
Asoya hemû kurda, mizgîn bo te,
Rabe, ey lawê niştimana kurd,
Wextê rabûne, ne yê xewê,
Pêvîste pîroz bî bi sixt û bird,
Çavnêriya tene, rabe bi dest û bird,
Berbanga sibêye, ronaka aso,
Asoya hîva kurd, mizgîn bo te,
Bo bextewarî û serketina gel,
Gişkê bibîne hevalê te pel bi pel,
Ji devê kelê tîrêja rojê wê bê der,
Zîring be, zor baş îş bike bi hel,
Berbanga sibêye, ronaka aso,
Asoya hîva kurde, mizgîn bo te,*

(Ji Dîwana Guran, rûyê 402)

ÇIROKA BIRATIYÊ

Birayê ereb!
 Çexmaxa şimşîra zordar,
 Awa li nav xûnêde bû,
 Ji milê bavê min, bavê te,
 Dirijîya, dikişîya xûna bavê min û te,
 Cot bi cot dikuştin bavê me,
 Tik bi tik xûn dihat ji çavê me,
 Me dest digirt bi hevra
 Bi hevra digirîya bi bira.
 Lê zordar
 Kellê wî pir bû ji xûna mar,
 Pelê me digirtin, em kêş dikirin
 Bin darê êş, ah û azar,
 Zincîr dixistne gerdena me,
 Destê me didane ser sengîn,
 Qamçî kutan li ser me dikir rengîn,
 Me her gav dikir axîn, dikir zarîn,
 Li ber dara zor azar,
 Em bi hevra bûn bira,
 Lema ji nav me herduwan,
 Bi çirpiyên hûr û gir,
 Em didane nav dar û dirkan.
 Birayê ereb û kurd,
 Îda bûye girme-girma zengila,
 Nalîna rencê te bû nalîna min,
 Bi roj û bi şev û sala
 Nalîna me zor der çû ji çalan
 Bona berîka bavkujê me
 Şêlî renca şirinkujê me
 Birayê ereb !
 Ji bo bêkarîya zordara,
 Eba û firinca me dirîn,
 Ava ji ber giraniya bara,
 Xwêdan ji nav çavê me dibarîn
 Piştî me ji keser qûz bûbû,
 Zordar ser me bû, ser mera diçû,
 Me ji neçarîyê şan dabû bi şan,
 Bê sekin me paçê xwe dawşand

Ji niçê paç em hatne der,
 Kom bi kom, rêz û gewher,
 Zordar dibir, ez û tu
 Bê berg diman, bê nan tû
 Çavê me bi ziq-ziq li çavê rê bû,
 Birayê erebê çav reşê min,
 Tal bû riskê te, tal bû risqê min,
 Ji kasekê me talî dinoşin
 Me biratî dikir bi hingivîn,
 Herdu bira ereb û kurd,
 Serê me bû binguhê yek bird,
 Ta me têr xwar, me çipê dikir,
 Me pê dibir bi ravêja hûr,
 Diban bi vî şanî, bi vî şanî,
 Bê westan me paçê xwe weşand,
 Lê paçek ji binê birê,
 Paçek ji ji qefa zincîrê,
 Nişkêva zincîr quruffî, qetîya
 Dîlî ne ma li qefesa me,
 Niha em herdu birên azad,
 Raste, bi serbestin, dilşad,
 Lê asoya rêga me lîle,
 Rîya asoyê lîl bi wîle,
 Wîle bibin bed kemîne,
 Bed rêgirî, bed bi rêye,
 Birayê ereb !
 Em dixwezin bira bin,
 Meyvê şîrin biçînin ji darê,
 Em dixwezin azadiya xwe,
 Gul bigihîjin li baxçê beharê,
 Ev sala baştir bê ji sala par
 Em hevra bin bi îtbar.
 Îda destê zordar û îstmar
 Neyê, negîje ser me,
 Em ber bi asoya ronak bin,
 Rîya rast bigirin, pak nîyaz bin,
 Mîna gelên din pak bira bin,
 Li gera kotirê bask spî bin,
 Ber bi asoyê şîn alî bin,
 Siwarê yekitiya yek xeber bin,

Pey kevin, ber bi wê herin
Heta bigihijne armancê xwa herî şîrin.

(Ji diwana Guran, bêlgê 320-323)

DILDAR (1918-1948)

Edebyetnasêd kurdan derheqa Dildarda dinivîsin, ku ew kurê Hedîm Sicadî bîstê fevralê sala 1918 li Koysıncaqê ji dayka xwe bûye. Bavê wî qulixdarekî biçûk bûye, li pêşîyê Dildar du sala li Ranîyê hîn bûye, mekteba navîn li Hewlêrê kuta kiriye, li Bexdadê fakültêta dadperwerîyê ya za nînga Bexdadê xilas kirîye û çend salan bi pêşê xwe xebitîye wek dadgir.

Hewas û berjevendiya Dildar gelek bi xwendina kitebên derheqa tarîxa welatê Evropêda û rohilatêda hebûye, ewî gelek kitêb derheqa Fransîya, Hûnistanê, Turkîye û welatên ereban û derheq tarîx û kûltûra kurdan xwendine. Bi gotîna Refîq Hilmî, Gîvî Muqrîyanî û Maruf Xeznedar Dildar li bin bandûra nivîsarên Emîn Zekî tarîxa "Kurd û Kurdistanêda" bûye. Li bin bîr bawara Qadir Koyî, Kurdî, Bêkes, Zîver û şayrêd kurd dinda bûye û li xortanîya xweda şêr hez kirne û dest bi nivîsandina wan kirîye, nivîsarêd wî şêrî gişk derheqa rindî û ciwanîya (bedewîya) Kurdistanêda nin, derheqa jîyîna xwe tal û tîrşda nivîsîne, îlamk derheqa negbetîya hemû miletê kurdda şêr nivîsandine. Çend şêrêd Dildar li westê xweda li nav xwendkaranda distran mîna şêrêd strana şûrşgirî, mesele, şêrên wî "Ey Reqîb", "Kurdistan" stranê here hezkirîne li nav qîz û xortên kur danda.

Ez li jêrê çend şêrên Dildar ji soranî dikme kurmançî û bona xwendkarêd me delal çap dikim, ku bizanbin qedir û qîmetê nivîsarên wî mêrê dilawer û wetenperwer çawa bûye.

EY BAYÊ SEMAL

Ey bayê şemal, ey bayê şemal,
 Posta hewayê dil pir zoxal,
 Destê min li dawa te be, diçî kiderê,
 Naçî çîya, silav biki dîlberê,
 Mîna ereb nekevi nav agir, herî wêderê,
 Mesekine heta diçî ber Leyla porzerê,
 Mesekine li cem kewa şox û zîba,
 Nivê tirê li dilê meda ma,
 Li vî çemî, mêşe û erd û bane,
 Bêje, qurban ev rîya çîyane,
 Tiştêkî risva û rût û qût min dît,
 Hêsrên al mîna yaqût min dît,
 Rû li xûn, xalê zeferan min dît,
 Çavê lêl û wêl pir girîn min dît,
 Heykelê mirî bes hestû min dît,
 Bejna xwar mîna kevan min dît,
 Min dît ku car caran ew lêv bi bare,
 Dest hildibire, li te diyardê,
 Çimkî xeyala bejn û bala te,
 Tirêja ronakî ya şewqa lêla te,
 Nêrgîza şehla çavên te xumar,
 Xermanê zilfê te meha ruxsar,
 Frişta aza hezar car
 Xwe nişan dide, xwe dike heşar,
 Îda her car ew mal wêrane,
 Ew kej mesken hejîna şeherane,
 Her wa te digihê cejna salane,
 Nîzane tu tuneyî, wîneyê xeyalê,
 Dest dirêj dike bi nikamê,
 Bi cerga şewtî û dilbezmê,
 Ku lê wun be, dike bang û heyar,
 Destê wî bigre, dibê hewar hey hewar.

KURDISTAN

Kurdistana xweş, niştimana ciwan,
 Qible geha min bê guman,
 Çavê min bişkivîn li çiyayê te,
 Bûne îni jiyîna baxên te,
 Dengê şimşala şivanên te,
 Zirqî û baqî ciwana te,
 Qaspa kewê li pala te,
 Xulîna avên newalên te,
 Ev hemû gûhê mindane,
 Girtiyê evina şêrê dilame,
 Nû nemamek bûm, vê axê gihiştim,
 Bi xoşewistî min welatê xwe av dida,
 Belê, Kurdistan, te ez xuliqandim,
 Te ez xuliqandim, te jîn da min,
 Xweş jîna min xweş jîna teye,
 Êşa jîna min roja şîna teye,
 Çimkî Kurdistan, niştimana ciwan,
 Tu qible geha dilî bê guman.

BO KOVARA RONAKÎ

"Ronakî" navê te çend li cem min xweşe,
 A'lem bi saya te dilpir coşe,
 Tariya royê derket "Ronakî"
 Bi ulm û fen û ruxsarê pakî,
 Şewqê bexşande çîya û bostan,
 Zêndî kir ulmê Kurdistan.
 Bi hoy "Ronakî" em hilhatin ji xewê,
 Me berê xwe xiste nehşî û şoma şevê,
 Mizgîn bo weten, axa te ronak bû,
 Bin saya şewqê lawê te çalak bû,
 Nehşî û şom çûn ji ser lêvê te,
 "RONAKÎYÊ" cî girt li ser rûyê te,
 Ûmud peyda bû, belav bûn fen,
 Xuyan bikin xizmet guzara weten,
 Milet "RONAKÎ" meya jiyîne,
 Sirê dora çalakiya lawê cane,
 Îcar seyrê wê bike hunurê qelem,
 Heta bilind kin Îraq û elem,
 Xuda ! tu "Ronakîyê" dûr kî ji şeqaq,
 Şewlê bexş ke li axa Îraq..

MINDALÊ HÎVA

Mindalê hîva, kolka dîlan,
 Teze xunça nav baxê gulan,
 Her çend seyri nav çavê te dikim,
 Nabînim girê ne zor û ne kêr,
 Rû û rengê te mîna esmanê saf,
 Wextê perşenga rojê dide tav,
 Tîrêja ûmûd ser dilê tarî,
 Li esmanê rût dide diyarî,
 Seveyla çavê te birqedar,
 Ronaka pake wîneyê te ruxsar,
 Kenîna bê fêlin lêvê te al,
 Neşa herdu çavê te mest û kal,
 Bê şik mizgîna me pêşîne, dilê şade,
 Yan ji nexme xana baxê me azade,
 Ûmûda paş rojî, kurê hîva tuyî,
 Hîva min bi teye, teze mindal,
 Siba bibe nimûna dengê misal.
 Van qisê ku ez wa gili dikim,
 Biziringîne guhê xwe herdem,
 Rastgo be, herdem get derew nekî,
 Wext bê sûd ji dest der nekî,
 Tê kuşe, her dem mîna hêng be,
 Li meydana jînê hazirî ceng be,
 Eve ji tera dibêjim, qenc bizane,
 Jîna meriv barê girane,
 Nek wa bizanî mîna jîna duhinê,
 Dixuyî, dinivî tu li nav nivînê,
 Ew jîn nîne, ku mîna jin bijî,
 Divêt hem azad û hem mezin bijî,
 Rojekê wê bê, tuyê pêra bigihîjî,
 Çavê xwe vekî, bizanî jîna ne mir ne jî,
 Tuyê bibînî, ku jîn çiyayê berze,
 Rîya we xwar, jor bi tirs û lerze,
 Gişk kend û kusp û devene û dare,
 Tîjî dirinde û dupişk û mare,
 Ger rîya te hemû dane û dawe,
 Nezan û dana têda bê t'awe,
 Ruh û canê min, tuyê bikevî vê rêgê,

Li vê telê û daw, çerx û dezgê,
 Gelek biwestî, xudanê birêjî,
 Wî derdî û îşî yek-yek biçêjî,
 Li rîya serketin divêt pêşkevî,
 Heta yekî divêt ser kevî,
 Nişana tira xwe bide ser rîyan,
 Ku li şûna te rêzan girêdin, herin her deran,
 Divêt tu çira zanistî hel kî,
 Destê min dawa te rê wun nekî,
 Bîr û hişê xwe baş bi kar bîne,
 Vê danê û dawe yek-yek bepesîne,
 Heta der ne kevî ji hemû dinya,
 Çiqas wan kir, tu himirî, lê kurdê her bimîne.

TITÛNEVAN

Rojekê havînê li girçîna germêda,
 Avdrekî rût titûn av dida.
 Zer bê hêz û jar û nexweş,
 Malwêran, perpût bi dev lerze tal,
 Xudanê çar reza û xwedî mal,
 Her ava wî hebû, rabû giva
 Sepkeyê bike, kuze av bîne,
 Tutunê av bide, mindal xwedî bike,
 Bi lerze-lerz hinekî westî,
 Zor da xwe vî alî, wî alî,
 Min jî ji taba germê û li rê westî,
 Bi tîma cêrek ava sar jê xwestî,
 Min selam elem li avdêr kir,
 Elek îslam mervê tenê,
 Min got: "Tîme, ava sar bide min",
 Got: "Nizanim, maye, yan na,
 Here jorê kepir, ger li nav kûze
 Avek têda bû, vexwe, emma,
 Nexweşî jê tê, ger t'î bên
 Xêra bavkê te avê bide wan"

KAPIRÊ AVDER

Kerpeke dargez, tarî sazkirî,
Bo parêzgarî ji germa tavê û tozê,
Bi çixekî şîr, se dora wê birî,
Nav mala avdêr herzeleke çûk,
Du parçeyê berra şîr û hildirî,
Cêrekî gul, sê kûzê ker xêw,
Çend amanê reş, cameke qupav,
Sêlekî teng, xwanîkî biçûk,

Li alîlkî mencalek devexûn kirî,
Du lihêfê şîrê çilkîne gul-gul,
Sê piyalê çayê û qurekî şkestî,
Jinek li wî alîlal û pal ketî,
Bê hiş ji ber t'a, ji birçiya jakav,
Mindalekî tirsava û bê perwa,
Du parçe cil ser pê lê pêçav
Vizîna bayê germ û gujîna koma mêşan,
Têkel bû di gel dengê bav û av.

DU SWAR

Av min kire devê mindalê sava,
Westî û îşê min li bîra minda ne ma,
Halê vê mala hejar û nexweş,
Erkê ser milê avdêrê تنها,
Wana ez avîtmê gêjgeroka serîndan,
Nav kar û barê tariya dinya,
Ev hemû erka, ev hemû renca,
Giva loqme nanê xwe dixwe,
Ez li vî xeyalî û du bargir swar
Hatin ji otaxê bi lez û zûva,
Birne li ber dev, dêmance li qed,
Simêl qît qinc, çav kişt û wurîya,
Moheya ji bo şer û çêr kirin,
Xeyd, şeranî bê sebir û heya,
Hatin, peya bûn, bê silav kirin,
Yekî ji wan got: "Ey kwanê ewla?"
Min got: "Awa hat, kerem kin vira".
Ez li vê qisê û ewla ji jêr,
Hat bi rûkî xweş got:
"Bi xêr hatine, bi xêr bên kwêxa!".

ÇEND Û ÇÛN

Lihêfeke peritî gul-qulî'dirî,
 Anî raxist dûr ji germa tavâ,
 Got: "Dê kerem kin, rûnên li vira,
 De hûn bi xêr hatne ser çava"
 Kwêxa got: "Selama te ne be,
 Ûkorayî çav, wa mebêje, şkiyav,
 Kwa te got...kwanê rista xeberê te?
 Kwanê çar daxê te hey keran, bav ga,
 Tutunevan got: "Bo çi çêran dikî?
 Ne hatim bo dar, ne hatim bo daw,
 Nika çi hegê te çêran heye,
 Qusura teye, ez çi bikim, heyran!
 Ey-kwêxa got: " Çi li min die'wtî
 çawan xwe kêfa xwe dikî, didî min çawa
 kengê hatî, etîm, bêj flankes,
 Ez dawê dixwezim, hey abrû û lawa,
 Tutunevan got: "Roja şayê,
 Ne hatme cem te, û te ez şandme aş,
 Min ne got mam-kwêxa dawa min pêwîste,
 Te ne got ne maye, min şandiye du dawê"

MAL WÊRAN

Ji wê rojê heta nika,
 ne daw min dîtîye, ne rehmeta xuda,
 Dawa min ne be, kirê negire,
 Çar dax li ku be, li ku bibînim?
 Însafa te hebe, seyri halê min bike,
 Rewşa te çawane, çawan min tu anîyi?
 Heta aqsana min tu kirî avdêr,
 Te xwe kire noker, ez bûme axa,
 Ku hatim, zigê kete ser zevî,
 Tutun min çand, renc da milê xwe,
 Dibêjim dar bigire, dibêjim dawa bine,
 Dibêjim birçîme, dibêjî kwa pere?
 Ez bê pere, mindalê min birçî,
 Li ku qurîn bikim, bese, hilşîya"
 Kwêxa ku got, ewla guh didayê,
 Pirsê eva şertke yad neke,
 Qewlê me nohet dînar hû,
 Sed û bîst te xwar heta nika,
 Nika jî eger li beroka minda hebûya pere,
 Perê çî, kuro, bo xezne jî ne ma.

HESAB

Tutunevan got: "bo min bike hesav,
 Bizanim hal, çawan perê min tamam,
 Wa bûye du mang get te tişteke ne daye min,
 Kwêxa got: "Wa ser çavê min,
 A, mele Seyd...deftera te derxe,
 Lê binêre, Ewla çi hatiye nav?
 Merik di gel wî Tomez mela bû,
 Melakî genc, teze û rû teraş kirî bû,
 Herze û dildarî ji rûyê wî dibarî,
 Simêl tenik, çav kil kirî bû,
 Mele defter ji paxilê der anî,
 Defter, çi defter, perpût û gec lanî,
 Erqame zil-zil, xetê xwar û xîç,
 Emla farsî û bi kurdî nivîsî bû,
 Min ne dît, perek bê fêl ne nivîsî bû,
 Mela defter ser û jêr dîkir,
 Ewla mintezîr mil keç û damaw,
 Kwêxa simêla sor ba dida,
 Bîra min jî li ser ewlayê malwêran,

HESAB KIRIN

Hinekî paş mela serê xwe helbirî,
 Em jî di gel wî lê bûn gudar,
 Mele got: "Mam Ewla, eva hesabê te,
 Penca şeş dînar ji destê kwêxa,
 Sî dînar gacot, çar jî kerste,
 Bîst û pênc dînar kereste û eşîya,
 Du dînar carekê, sê dînar jî
 Te jî min wer girt li mala axa,
 Cema wê sed û bîst dînar tamam,
 Bi gora defter Sehî Ewla".
 Tutunevan got: "Kwêxa, Ewrehman!
 Pêncî şeş dînar ji ku te dan?"
 Kwêxa got: "Giva derewe,
 Giva em li te dîkin eftira,
 Axir eva genciya nalê bar
 Ne'let li bavkê xwar û xêv be,
 Nika jî get heqê te cem min ne maye,
 Te xwerin jî wer girt gelek zêde,
 Eger tu dixwazî peran, tutunê selam ke,
 Li ser para xwe her hinekî zêde ke".

LAWÊ KURD

Tu dizanî ey weten, îro bo çî bêbeşî,
 Bo çî destî şev nîşanî te dida nema reşî,
 Bêjme te esbabê mezîni zillet û çarereşî,
 Gencê kurdan her li wextê meyê dîkin xîretkêşî,
 Wextê bade tê ser meclisê, navê kurd tê ser zi-
 man,

De were seyri fikrê ke û ax û daxa lawan,
 Rengê nalin va li guhda dibêjin bê guman,
 lawê kurdan her li wextê meyê xîretkêşî.
 û di gel dengê tîfing û agirê hinavda,
 û di gel nalîna weten ger te jî zîndanda
 Dikeve guhê min bi şewat hewar dike li vê hanê-
 da,

Lawê kurdan her li wextê meyê dîkin xîretkêşî.
 Sîlîha her mîletî sade li stuyê gencane,
 Roja şîxul bexşî ûmûd fikir û karê gencane,
 Her hemû kirne kul û birîn, hem li rencane,
 Lawê me jî her li wextê meyê dîkin xîretkêşî.
 Çimkî mîlet be tole jî be, lawo, ruhê vî leşî,
 Bê te eva ruha namîne, ew li jînê bê beşe,
 E'ynî derdê kurde, ku kete derdê karê dawesa,
 Mîletê gencê wî sist be, mirîye, najî,
 Şadmanî textê jîn û tacê e'zet nîne,
 Lawê kurdan her li wextê meyê dîkin xîretkêşî.
 Mîletê ku lawê wî cust be, dijî, qet namîre,
 Qet tu cara dest û pê wî wa li bendê nabe,
 Sed hezar tixê zemanê be, stuyê te nabîre,
 Lawê me jî her li wextê meyê dîkin xîretkêşî.
 E'ybe-e'yb, lawê kurdan, seyri lawê xelqê bikin
 Fikra bêbakî, bi ser çû, bade hiş û kelle xwe,
 Dewra xewê bi ser çû, binêr li dor berê xwe,
 E'ybe, çêtir bes li wextê meyê mekin xîretkêşî,
 Seyrî nakin lawê xelqê, gişte bazû gewatîn,
 Gişte sûdbexşîn, welat û merkezê sed hêmetîn,
 Bo çî anîna karê ciwan li rîya mihnetîn.
 E'ybe, çêtir bes li wextê meyê mekin xîretkêşî.
 Lawê xelqê têne ser xwe, canfîda kar dîkin,

Bo niştiman xwe gişt xunkarî dîkin.
 Îcar bo fewtina dijmin neçîra xelqê dîkin,
 E'ybe, hûn jî her li wextê meyê mekin xîretkêşî
 Hûn seyr nakin çend bi tîne destê lawê xelqê,
 Ger bê wextê kinê, radibin ser pê wê deqê,
 Û ji tirsana dilerizn gayê çerxa dînya û sema,
 Lawê kurdan, bese li wextê meyê mekin xîretkêşî
 Û şayrêd esra bîstem, hêmete, hêmet bikin,
 Mêveke dareke hêmet xizmete xizmet bikin,
 Melhema kul û birînan qudrete, qudret bikin,
 Hûn heta kengê her li wextê meyê bikin xîretkê-
 şî.

Seyrî ehwalê weten kin çawan ji bûnê mirîye,
 Seyrî karê dijmin kin çî bi halî kirîye,
 Seyrî reşmal kin zelalet esman girtîye,
 Hûn heta kengê her li wextê meyê bikin xîretkê-
 şî.

Seyrî baxê weten kin, hişk bûne, bûne xezan,
 Seyrî xunçê nû bişkivî kin, çend beban naz hel-
 weran,
 Şahdê bêkarî hûnin, we vaye av hate birin,
 E'ybe, ta kengê her li wextê meyê bikin xîretkê-
 şî.

E'ybe, lawê xudanê vî çiyayî û daxa kurdi tu,
 Xudanê tarîxa xûnî û delirî û gurdî tu,
 E'ybe, bêkarî, heta kengê seyri nakî, mirî tu,
 E'ybe çêtir bes li wextê meyê mekin xîretkêşî.
 Rabin ey lawno, we tê bigihînim, millet ma'na çî
 ye,

Ku bizanin xên ji mezheb rêga çîye,
 Rabin, rabin, bes, li wextê meyê mekin xîretkê-
 şî.

Millet yan bi nikê rima dijmin dibe bê hiş,
 Seyrî dor berê xwe bikin, rûnên li rex beroş,
 Agrê hestî bi zilleta we li dilda bike coş,
 Rabin, îcar nek li wextê meyê bikin xîretkêşî.
 Millet ku ji zirîna toq û zincîr rabe ser xwe,
 Wê toqa hêsirî ji stuyê xwe û milletê xwe bavê-
 je.

Werin ser xwe, bizanin, hûn ji rê derin,
 Rabin fcar bes li wextê meyê bikin xiretkêşî.
 Rabin, heta kengê ha li jêr axê rizi bin,
 Rabin heta kengê miriyê li nav dawê bin,
 Rabin, rabin, bes wextê meyê mekin xiretkêşî,
 Her kesê pişta wî li gerdûn be, pişta wî wê biş
 kê,

Her kesê çav li destê ecnebi be, wê kor be,
 Rabin, rabin, bes li wextê meyê mekin xiretkêşî
 Miletê ger xûnê nerêje, dest û pê wî ve nabin,
 Bê kifa guftar û siqeya jîn nayê standin,
 Bade û mestî miqamê huryetê nayê girtin,
 Rabin, rabin, bes wextê meyê mekin xiretkêşî.

BÊKES(1905-1948)

Bêkes, navê şayrîye, navê wî rastî Fayq bûye, kurê Ebdal begê jibinemala qerecolanê, li sala 1905 li gundê Sêtokda bîst kilomêtr li bakurê(fêza) Sulêmaniyê ji daykê bûye. Gundê Sêtok hingê navenda qeza şarbajar bûye. Ebdal beg, li wêderê serokê taxbûrê bûye, jêra digotin "Tabur Axa-sî". Dayka Bêkes ji mala axelerên Sulemaniyê bûye. Zarutî ya Bêkes ne bextewarî bûye, li biçûktîyêda du-sê sal bûye, ku mala bavê wî çûye Sulemaniyê, ku hinekî mezin bûye bavê ew daye ser xwendinê li hucra feqîtîyê. Li sala 1911 hukmet bavê wî dişîne Xaneqînê û Bexdadê ser îş. Çend sal paşê bavê wî dimire. Bêkes di gel birê xwe givrik Sehîd û birê wî biçûk Tahar û dayka xweva dikevne halê belengazîyê û hejarîyê. Sal û nîvek derbas nabin, dayka wî û birê wî Sehîd dimirin. Bêkes bi birê xwe biçûkva dimînin êtîm. Mamê wî Emîn axa wî û birê wî biçûk dişîne Bexdadê cem Ha cî Elî axa, mîrata bavê wan dide wî, ku ew wan xwedî bike. Ew jî wan dide ber destê Heme-xanê xizmê afîserekî xelqê Sulêmaniyê. Jina wî afîsêrî jineke rehm û qenebûye, guh dide ser wan, wan hînî xwendinê dike. Wusan ew li mala wî afîsêrîda dimînin heta sala 1914. Wî wextî dibe hêwirze, Bexdad dikeve halekî giran, mala Heme-xan jî dikeve halekî belengazîyê.

Sala 1918 Hacî-xan, Bêkes û birê wîva dibe Sulemanîyê. Li wê pismamên wan wana dikine ser xwendinê û ew hîn dibe he ta sala 1923, her sal rind dersê xwe temam dike. Li paşê wî dişîne Kerkûkê, ku li mekteba ulmda hîn bibe, lê rê nakevê, ku bikevê. Ew diçe Bexdadê, dikeve mekteba dar-ul ulm û heta sala 1925 hîn dibe, paşê ji ber xerab bûna hal û wext diçe Sulemanîyê, li wêderê dest bi kirîn- firotina cixaran û şixaltan dike, paşê dest ji wî îşî dikişîne, di keve ser xebata rê çêkirinê, dibe serperestê xebatçiyê ser rîya Erbîlê-Rewandizê, çend sal li Hewlêrê dijî û he- ma li wî wextî dest bi mamostayê dike, dibe hevkarê şerke rên pêşberî hukmetê, ji sala 1930 heta sala 1931 çend ca- ran tê girtinê, li paş azadbûnê sala 1933 dîsan li mekte- bêda ders dide û dibe hevkarê koma mamostayan û ji sala 1930 heta sala 1938 hevkarî li îşê wergirtina mafê xelqê kurd dikir. Li paşê dibe mamostayê gunda, çend sal li dû hev mamostayê li Qeredaxê, Sulemanîyê, Surdaşê û Helepçe heta sala 1948 dike.

Jîyîna Bêkes, li nav rojên reş, ne bi xêr û şerda derbas bûne, ewî bi çavê xwe zulma hukmetê li ser xelqê kurd dît- tibû, belengazî, hejarî û bêmafiyê xelqê kurd kar kirbûne ser wî. Bi xwe ew mîrekî şareza, aqilmend û fehmdar bû, baş zîmanê kurdî, erebî, farsî û inglîsî dizanibû, xwendî na kitebên bi wan zimanan jêra gelek bi feyda bûye, pê he siya bûye ji çi bûye hejarî, neserbestî, bindestîya xelqê kurd û bi çi teherî bixebitin, ku xelqê kurd bigihîje me- rem û mebestê xwe serbest û serbixwe bijî.

Ji ber ku Bêkes ev halê milletê xwe bi çavê xwe dîtibû, bi guhê xwe bistîbû, ku milletê wî dike-nake nikare ji zulmê azad be, Bêkes derdkêş dibe, xemgîn dibe, dibîne ku li şe rê serxwebûna kurdanda yekîtî li nav xelqêda tune, ku li hundurê welatda, ne jî li derva piştîvan, kes û karê kur- dan tune, ku bîna arîkarî wan bikin. Sebeb vê yekê ewî na- vê xwe Fayq guhastbû, kiribû Bêkes. Bêkes yan ew bi xwe bê kese, yan jî ew kurdê bîkese mîna milletê xwe bê kese

Zanyarê kurd bi navdar Mehemed mela Kerim, yê ku li sala 1981 dîwana Bêkes çapkir, li pêşgotina dîwanêda bi kurt serhatîya wî nivîsiye. Ez li vira sûdê jê werdigirim di

sirîya xweda wê serhatîyê hê bi kurt dinivîsim. Mehemed mela Kerîm bi kurteberî çend gilî jî derheqa naveroka şêrên Bêkesda nivîsîne. Ew şêrên wî parevedike ser van komên jêrin: Şêrên kurdîtîyê, şêrên komelatîyê (civakîyê yan cimatîyê), şêrên derd û xemên dil bo halê xelq, şêrên bo biçûkan, şêrên stranê. Mehemed mela Kerîm nivîsîye, ku bi tomerî şêrên Bêkes yên şurşgerîyêne, ku gelek şêrên wî bi naveroka xweva şêrên wetenperwerîyêne, şêrên neteweperestîyêne, yên rewşenbirîyêne, ku li gelek şêrên xweda Bêkes xort û keçên kurd, xelqê xwe kurd şîret dike hîn bin, bixûnin, xwe bi xwendinê bigirin, duberekîyê nekin, yek bin hevkar, hevdost bin, bi tevayî derkevne meydana şerê serxwebûna kurd û Kurdistanê. Ev gotina Mehemed mela Kerîm raste, ji bo nimûn min li jêrê çend şêrên wî vî cureyî û vê naverokê kirne kurmancî û bi herfên latînî çap dikim bona xwendevanên delal.

TU ÇIYÎ ?-EZ KURDIM

Tu çiyî? ez kurdîm, neteweyê kurdîm,
 Xwa tirsnoke nîn? Haşa, neberdîm,
 Çi tu jî nav birî? dudilî û nifaqî,
 Çawan rîzgar dibî? Her bi îtfaqî.
 Bêje, tu çi dixwezî? Berzî wetenê min,
 Bi xurayî na, bi ruh û canê min,
 Çi li ber teye? Xwe fîdayî kirin,
 Bo çi? Li rîya mîletda mirin,
 Kwa, çeka te çiye? Sewda welatê min,
 Lê piştîvanê te? ezem û sebata min,
 Rast bêjme te, kerem ke, guh bide min,
 Bi qîsa min biki, serê min li ser rîya te,
 Bi rastî û pakî hewl û têkuşîn,
 Ji kursî û kinê, derew çav puşîn,
 Evana yên te bin, karê te zor leqe,
 Para te hemîşe negbetî û şeqe.

(Helepçe, 1935 diwana Bêkes, rûyê 185)

EY MANG

Ey man! ez û tu herdu hevderdîn,
 Herdu giriftar li nav ahê sardîn,
 Tu wêl û reng zerî li esman,
 Ez jî der bi der li şeheran,
 Digerim, ey mang! qebila dildaran,
 Dermanê derdê dilê bêmaran,
 Şevêkê û îşev bigire p'êrê min
 Bê yar û herdem a'cîz û t'enême,
 Dilzar û bêzar, pest û xemgînîm,
 Gîroyê dawa yara şîrinîm,
 Dîlbendê eşqê wê belek çavîm,
 Şêt û şeydayê wan gurçîkê xavîm,
 Ji wê wusa ketîme nav xeyal,

Girine p'êşê min, bûme guhê zoxal,
 Ey mang! tu li şixulê eşqê pîrozî,
 Tu nese bexşî dil bi sozî,
 Ez sond dixum bi îşq û ciwanî,
 Bi nesima berê beyanî,
 Bi serhatî xwe bo min beyan ke,
 Derdê min giran hinekî asan ke,
 Tu carê çî bûyî wa peşîvavî?
 Ji ber çî pest û mat û damavî?
 Bêje min, tu xwedê çend ciwan te di?
 Çend kur te li bezma aşîqan di?
 Çend qewm û millet, çend şêher te di?
 Çend şer û şûr bê aman te di?
 Çend burdumanê Kurdistanê te di?
 Çend kefenê alî şehîdan te di?
 Çend bêkesanê perîşan te di?
 Çend der bi der û mal wêran te di?
 Çend çav sorî pir girin te di?
 Ey mang! ewqas te seyri dinya kir,
 Seyri nifaq û zulmê û rîya te kir,
 Bo wêye, ku te reng û rûyê xwe guhêriye,
 Reng û şu'ri temam birîye.

(Dîwana Bêkes, rûyê 151-152)

NESRÎN

Nesrîn! demeke daxa te li mine,
 Gîroyî, bendî, jîna te zulme,
 Ez wa dibêjme te, çimkî borcê mine
 Rabê, têkoşê heta xûna te germe.
 Serpoşa xwe bavêj, get meke şerme.
 Îro zemanê ulm û erfane,
 A'lem şev û roj li îş û kardane,
 Ferqa nêr û mê tune, bizane,
 Rabe, têkoşê, heta xûna te germe,
 Serpoşa xwe bavêj, get meke şerme,
 Mebêj ez keçim, tu jî wek minî,
 Motacê ulm, fen û xwendinî,
 Mecbûrî îşî û xizmet kirinî,
 Rabe, têkoşê, heta xûna te germe,

Serpoşa xwe bavêj, qet meke şerme,
 Çiqas rûniştî, piştî te xware,
 Zer û lavaz bûyî, hêza te ne maye,
 Keça bîganî va li ber çavê teye,
 Rabe, têkoşe, heta xûna te germe,
 Serpoşa xwe bavêj, qet meke şerme,
 Xişir û ciwaniya te heya fêr bûne,
 Paşroja te her bi wan rone,
 Keça bê ûlm dîl û zebûne,
 Rabe, têkoşe heta xûna te germe,
 Serpoşa xwe bavêj, qet meke şerme,
 Wek xûşk û bira divêt em herdû,
 Qolê hev bigrin, herne meydan,
 Kurda bibin nav rêza mîletan,
 Rabe, têkoşe, heta xûna te germe,
 Serpoşa xwe bavêj, qet meke şerme.

(Dîwana Bêkes, M. M, 102)

TIMAKAR

Du pişikê cot û rêkî,
 Rabûn, çûne ber cîkî,
 Ku bidizîn penerê selekî
 Kirin pilan û tivdîrek,
 Tivdîra xwe kirin yek,
 Şûn û rê kirin yek,
 Çûne ser dû bi dû,
 Penêr li wan berpa bû.
 Bo timayê û para pir
 Li hev kirin şer û zor,
 Têr û pir li hev dan
 Heta qewat lê ne man.
 Çaxê temam westîyan
 Rabûn çûne cem meymûn
 Gotin: "Em te dîkin qazî,
 Me herduyan bîkî razî"
 Meymûn rabû zû bi zû,
 Pêşda anî terazû,
 Bi dev pêner ker kir,
 Parîk hindik, parîk pir

Kire vî serî, wî serî,
 Û terazû hil berî,
 Dest pê kir kêşanî,
 Alik der ket giranî,
 Meymûn parîk jê kir,
 Hilda, dañî ser yê din,
 Yê sivik giran bû,
 Yê giran sivik bû.
 Ji vî parîk, ji wî parîk
 Penêr temam xwer çû.
 Pişik bê par man
 Rû reş bûn, mat man.
 Xulesa van qisana
 Tîmakar pojmane,
 Ewê bed û nerêke
 Bi dil nifira lê ke.

(Dîwana Bêkes, rûyê 190).

STÊRA GEŞ

Stêra geş li hewa,
 Serê min ketiye gerava,
 Hey serî te dikim, tê naqihê,
 Kê tu li wî ciyî danî?
 Bi şev ku tême ser banî,
 Seyrî te dikim li esmanî,
 Li nav hewa şîn û ciwanî,
 Cîrîva te tê heta beyanî.
 Bo çi wa şad û mesrûrî,
 Serbest û berz û rûsorî,
 Daym dil ron û pir nûrî,
 Çimkî ji vê dinê dûrî,
 Xwezla min tu niha
 Bihatayî li vira
 Dest bi gotubêj bikira,
 Ji minra şîro bikira
 Bo min hejarê dest vala.
 Tu berdî, dirextî ya beşerî?
 Elmasî, zivî, ya guherî?

Gîroyê teme, pir kedêr,
 Bêje min zû bi muhbeteser,
 min cab daye Kewa,
 K'urokim li nav hewa,
 Bi e'mir û qudreta xweva
 Rawestame li rû sema. (155-156)

XWEDÊ ÇIYA NEBÎNE BERFÊ LÊ WER NAKE

Bêjim çi di gel çerxa felekê,
 Seyr ke, çawan çûne naxa xakê,
 Wa başe, îsan jî vê başê bireve,
 Keko, xwedê îşê ne bi cî nake,
 Heta çiya nebîne, berfê lê wer nake,
 Eger em qewmekî torin,
 Lê daxam çewt û xwexurin,
 Lema wa li bin çepok û zorin,
 Keko, xwedê îşê ne bi cî nake,
 Heta çiya nebîne, berfê lê wer nake.
 Bo kuştina hev gurc û bi k'arin,
 Roj dest me be, em bi lih û zordarin,
 Li pêvîstîda mîna jin hejarin,
 Keko, xwedê îşê ne bi cî nake,
 Heta çiya nebîne, berfê lê wer nake.
 Dizanî bo çi kurd wa zelûle?
 Bê nav û nîşan herdem dile,
 Çimkî du dil û xam û bexîle,
 Keko, xwedê îşê ne bi cî nake,
 Heta çiya nebîne, berfê lê wer nake,
 Li vê esrê keva esra bîsteme,
 Hemû millet xudanê hikume,
 Her kurdê negbet wa li ber xeme,
 Keko, xwedê îşê ne bi cî nake,
 Heta çiya nebîne, berfê lê wer nake,
 Munewer zorê her li ber nane,
 Weten difroşe bi yek tarane,
 Dike nav bê dîn û îmane
 Keko, xwedê îşê ne bi cî nake,
 Heta çiya nebîne, berfê lê wer nake,

Eşrefê me hemû bê ruh û sistin,
 Dexilê pişta wan qet ne bestin,
 Hemû nakok û pere perêstin,
 Keko, xwedê îşê ne bi cî nake,
 Heta çîya nebîne, berfê lê wer nake.
 Qewmê sêwî eger wa be,
 Mehala xakê berz awa be,
 Bo mirin başe tefr û tuna be,
 Îro bê şik li nav a'lema,
 Qet qewmek mîna kurd nema,
 Navê wî wa li nav xana adema.
 Keko, xwedê îşê ne bi cî nake,
 Heta çîya nebîne, berfê lê wer nake.
 Em kuştîyê destê bê tifaqin,
 Mohtaca pere, ulm û exlaqin,
 Lema wa pestin, bê itfaqin.
 Keko, xwedê îşê ne bi cî nake,
 Heta çîya nebîne, berfê lê wer nake.

BO WETEN

Dil ji derdê weten pest û giroye,
 Wek kewa nav qefes şewq lê nemaye,
 Eger dizanî ez çiqas perîşanim,
 Şev û roj ey weten, her li girînim,
 Dil fîday axa te be, gişk gewhere,
 Bi fîday ava te be, kaniya kewsera,
 Menzera Kurdistan berê beyane,
 Paris û Lubnan lê bin qurbane,
 Ji cirîva çivîkan, avazê gumrî
 Ji lêdana bayê nesim, ji xew radibî,
 Ey kurd bese, îda çî te ji nifaqe,
 Wesyeta pêşketên te her itfaqe,
 Qewmo, rabe mîna şêr, îro firsete,
 Bo rîya qewmê kurd roja hêmete.

LAWANÊ WETEN

Lawên weten, xîret bikin,
 De rabin ji xewê, bi ser çû şev,
 Nema zemanê cehil û nezanî,
 Îro firsete, roja hêmete,
 Bi ulm û sene't berz dibe mîlet,
 A'lem hemîşe xerêqî îşe,
 Îş kin bi merdî, bi dest û birdî,
 Yek dil û dev bin, heta roja mirdin,
 Lawanê weten, xîret bikin.

REMZÎ MELA MARIF (1902-

Navê wî rastî Mehemed Remzî kurê mela Marifê kurê Seyd Re sûle, li sala 1902 li Sulemanîyê ji daykê bûye. Li heft salîyêda dane ber xwendnê, li cem mela Sehîd quran xwendî ye, paşê kitêbêd farsî ya Saadî "Gulistan", "Bostan" û dî wana Xafiz Şîrazî xwendne. Demekê çûye mekteba eskerîyê "Ruşdîyê", paşê li mekteba "Edadê milkîyê" hîn bûye, li dû wê li mekteba "Madresa ehlîyê" li cem melan xerêqî xwendna ulmê dîn bûye. Xên ji zimanê kurdî baş hînî zimanê erebî, farsî û tirkî bûye. Bî farsî û tirkî şêr nivîsî ne.

Sala 1927 bûye memurê hukmetê, sala 1945 bûye serekê ni-hêrvanê Sulemanîyê û hingê gelek car çûye nav civata xwendina şêrêd Bêhûd û Pîremêrd, bûye nasê Pîremêrd û ketîye bin bandûra wî û dest pê kirîye şêr bî kurdî nivîsîne. Edebeyetnasê kurd Refîq Hilmî dinivîse, ku Remzî gelek şêr bî kurdî nenîvîsîne, lê her bi tenê çend şêrêd niştîmanî û komelatî nivîsîne.

Çawan nimûn ew wan li kitêba xweda "şêrê edebê kurd" da çap dike, ez jî wan ji ber kitêba wî digrim û bi zaravê me li vira çap dikim.

DEMEKE PIR TÊ XEYALIM

Demeke pir tê xeyalim, bi belav difikirim,
 Demeke lale zimanê dilê pir azarim,
 Demeke baysî pestime, îzetê nefesim,
 Demeke mane'y berzîme, bextê bedkarim,
 Demeke şewqê li aso ne daye roja ûmûd,
 Demeke subhî merem min ne dîtîye, şevgarim,
 Li dewra nuqtaya navên dayra xemêda
 Li ser sehîfaya vê dewrê mîna p'ergarim,
 Bi şev stêrjimêrîyê dikim, heta dibe roj,
 Bi roj heta dibe şev pasevanê bazarim,
 Ji derd û daxê carna til dixum, bêhişim,
 Ji of û axîne carna axê dixum û hişyarim,
 Bi şûrê cewr û cefa sîng birînim,
 Bi tîra derd û bela cerg û dil birîndarim,
 Feleka min çep lê da, bê neva, dibê çi bikim,
 Di gel zemanê bedkar û bextê bedsarim,
 Ne xudanê pez û dewar, cot û amelîm,
 Ne sahibê revok, garan, gund û zevî û zarim,
 Ne şêxê dest birî, aynê dîn, bi dinya bê darim,
 Ne bîr û murşîde bê çav û rûyê riyakarim,
 Ne xudanê kes û karekî dewlemendê bi cengim,
 Ne sahibê kur û kalekî zor û destdarim,
 Ne şareza bi belat û ne hev demê sofera,
 Ne yawerê wezîr û emîr û xunkarim,
 Ne katibekî dînî, xudpesendê nefamim,
 Ne şayreki hawa berzî herze gotarim,
 Ne ji wê muwezze be şermokêd bed exlaq,
 Ne ji wê mudegge bed navêd bê a'rim,
 Ez ew biçûkim, ku ji fezlê xwe heta nika,
 Bedî min nekiriye derheq beyar û exyar,
 Min ew wezîfe perast nika bîst û sê sale,
 Li ser wezîfê ez ne kirme zecir û înzar,
 Demeke çimkî bi mêzîna îhtîram û qar
 Mucewheratî sêdaqet firoş û kiryarim,
 Demeke, çimkî li bazarê eyffet û e'daye,
 Bi nexdî kirîye, sermayedar û ticcarim,
 Gula bişkaftî ya baxê kesêkî pak nijad

*Nemamî gulşenî zatîkî rast reftarim,
 Di gel vê jî dizanim, ku Remzî ez hergêz
 Ji wê ne hêziya petyarê ne bûm rizgar.*

(R. Hilmi, 34-36)

ÎRO ZEMANÊ BÊ EDEB Û BÊ WEFA YE

*Îro zemanê bê edeb û bê wefaye,
 Roja xirabî kirnêye, esra rîyaye,
 Bawî ne maye, basa wefa qet meke dexil,
 Li vê esrêda çimkî wefa bê wefaye,
 Her ew kesê kemal serê xwe fida dike,
 Yê bo mehwiya xwe, mal û zaruwêd xwe fidaye,
 A'lem ewqas sivike, ku ji bêqedrî ya dibêje
 A'lem hemû zîv û zêrin, ew qelaye
 Wa fehm dîkin ewanêd ku serxweşê dewletin,
 Vê neşe kêr dome, heta bê zibaye
 Remzî ku extyarî terfîkî dike li xelq
 Fikra wî ji qeyd û benda esaret rehayê.*

(R. Hilmi, 27-28)

WETEN

*Ey weten ji ber çî hinde dilxemgînî tu?
 Bo çî herdem wa melûlî, dîde pîr esrînî tu?
(R. Hilmi, 31)*

TA KENGÊ

Kurdno, ta kengê eva nifaqe li nav weda bimine?
 Her wa dom dike, di nav weda herdem girmîne?
 Ta kengê ewqas hûn mêla çewt û xirabê bin?
 Ta kengê ewqas talibê nerastî û derewê bin?
 Ta kengê gezende qîl û qacê hev bigezin?
 Ta kengê mîna dirindan dil û cerga hev bixun?
 Ta kengê li behra hişkaya hewada p'el biminin?
 Ta kengê li deşta arezûda bê delîl herin?
 Ta kengê xereqî kuştin û fewatina hev bin?
 Ta kengê dest vala û mal xerab bin?
 Xelq bi zorê ya sikî fen gehîşte esman,
 Hûn li xerêqî bezma helakin û helmegun,
 Carna ji rûyê cahilîyê dibne ecnebî,
 Carna ji rûyê nezanîn dibne fermeson,
 Wa tê digihîjin, ku hêçe bi tîr dibin filôsof,
 Ya başe şebqe kirne serê, dibne Êdîson.
 Bo çi heyrî girêdan kemera nokerîyêne, ji bo çi?
 Bo mervê dewlemend çiye ewqas ser qîrîn?
 Bo çi fitne û xerabî ne bin, îctîmayî ji bo çiye?
 Ger basa yek û du nebe, kengê hînî gotubêjê bin
 Her xeybetîye ev û ew, her meclîs diçe,
 Her kirna Şeno û Kewo, her komela kevn,
 Rûvî û pezin li ber devê beyanan,
 Mîna gurê har û şêrê dir li nav xwe e'yanin,
 Parîyê xwarî û kotira ber cenga ecnebnîn,
 Her çend ji cinsê baz bi helmet eylonin.

(R. Hilmi, rûpelê 28-30)

HEJAR (1902)

Navê wî bi rastî Evdulrehman Şerefqendîye, di sala 1920 da li bajarê Mehabadêda ji daykê bûye. Bi gotin û gilîkirina Hejar malbavê wî ne dewlemend bûye, lê bavê wî mele bûye, di biçûktîya xweda li cem bavê xwe hînî xwendinê bû ye. Di serhatîya xweda Hejar dinivîse: "Bavê min mele bû, ez hîn dikirim, gelek xwedênas bû, ji minra digot, eger dilê te tiştêkî dixweze, du'a li xwedê bike, wê bide te".

Jîyîna Hejar, nivisandin şêr û helbestên wî bi jîyîn û halê neteweyê kurdva girêdayîne. Li nav salên 1941-1947 da eskerê Sovêtîstanê bi wedetî ketibû welatên bakura Îranê. Hingê pîranîya Kurdistanê li bin hukmê eskerê Sovêtêda bû. Bi rastî gotî, hingê tîrêjên roja azadîyê dabû ser welatê kurdan, zordarî û zulma şahê Îranê li ser gund û bajarên kurdan hatibû hildanê, biçûk û mezin hişyar bûbûn, merivên xwendewer, hozan û şûreşgerên kurd kom û komelêyê aza dî û serxwebûna kurd û Kurdistanê saz kiribûn. Li Mehabadêda komara kurdan ya serxwebûn hatibû sazîkirinê. Hema di wî wextîda bîr û bawara kurdewerî û wetenperwerî di serê Ebdurehman Şerefqendîda rûdinê, ew dest bi nivisandina şêr û helbestên kurdewerî û wetenperwerî dike. Wî wextî ne dayka wî, ne bavê wî ma bûn, ew çûbûne rehmetê, kesekî wî, ne bira, ne jî pismamê wî hebûn, ew di halekî belengaz û hejarîda dijîya. Wextê ew bi xwe dihesa, ew halê he

jarîda dijî, li dor berê xwe dibîne, ku merivên mîna wî, kurdên belengaz mîna wî li welatê wîda bi hezaran derodero bûne, bê extyar, bê maf di bin zulma şahê Îranêda wêran mal bûne, dizêrin, di halê nemir ne jîdanin. Sebeb belengaziya xwe û sebeb bindestî û bêmafîya neteweyê xwe ew wî navê xwe guhriye, navê Hejar li xwe kirîye û gelek cara ji xwera dibêje " Hejarî kurdê hejar".

Li pêşîyê bi arîkarîya rewşenbîrkerên komara Mehabadê pertoka şêr û helbestên Hejar li Mehabadêda tê çapkirinê. Navê wê pertokê "Alekoke". Hema li wî wextî nav û dengê wî li welatê muqriyanda belav dibe, xelqê kurd pê dihesê, ku Hejar dengbêjê şerê serxwebûna neteweyê kurde, ku ew di şêr û helbestê xweda derheqa jîyîn, ayîn û halê kurdên belengaze, hejare, bindeste û bêmafda dinivise, bûye xemxurê neteweyê xwe.

Li paşî rûxandina komara Mehabadê Hejar mecbûr dibe welatê xwe bihêle, ji ber zordarî û zulma şahê Îranê direvê û bi arîkariya serokê serxwebûna kurdan û bi arîkarîya mêrên xîretkêş û şureşgirên kurd berê xwe dide Sovetistanê. Çend sala li welatê Sovêtêda dimîne. Her çend jîyîna wî berê li belengazî û hejarîyêda bûye, nexweşa wî giran ya pişika hebûye, ew du-sên sala li nexweşxana û sanatoriyan da dimîne, bere-bere qencdibe û paşê di gel barzanîyan ve digere diçe Îraqê, li wêderê dibe heval û hevkarên şervan û şureşgirên kurdên Îraqê û tev wan dixebite, şer dike pêşberî hukmeta dîktatorî bo xatirê azadî û serxwebûna Kurdîstana Îraqê. Li Îraqêda bi arîkarîya serokê şerê serxwebûna kurda û bi arîkarîya rewşenbîrkerên kurd destnîvî sara Hejar ya "Mem û Zîna" Ahmedê Xanî bi zaravê muqrî tê çapkirinê. Wextek derbas dibe ew diwana şêr û helbestên wî bi sernavê "Bo Kurdîstan" çap dîkin.

Wextê şerê azadî û serxwebûna kurdên Îraqê gur dibe, hukmeta basîstan dest pê dike esker bi top, reşas, tank û fi rokanva dajo ser gund û bajarên kurdan. Hingê Hejar tevî serok û sereskerên peşmergan diçe serê çîyan, şer gelek dikişîne. Li şkevt û mixaranda bi arîkarî û xwesteka hozan û pîsporên kurd Hejar dest bi wergerina nivîsara Şerrefxan Bîtlîsî " Tarîxa Kurdan" dike û li nav du-sê sa-

landa li nav agir û alavêda li ber top û bombên basîstan, wê xebatê werdigerine ser zimanê kurdî, zaravê soranî.

peşmengan û xwendevanan pesnê wî dîdan. Hejar di pêşgotina xweda ya dîwana wî seyeminda dinivise "Ez aşiqê Kurdistanim, ne gelme gelme, ne farsî, ne erebî nizanîm"... Her kes bi rastî bo kurd û Kurdistan şer bike, behra wî di berhevîyêda hebe, herkes û her milletê dijî kurd û Kurdistan şer bike yan ji arîkarê dijminê kurd bike eger ew hezar car sor be, kî dibe bira bibe, ezê pêşberî wî şer bikim. Mêrê baş bin, werin kurd bin, eger komunistin, komunistê kurd bin, em dixwezin her di vê rêda kurdan azad bikin... Nabêjim dostî û hevkarî di gel neteweyê cîranê xwe mekin, dibêjim we nanê xwe li ser sifra tirk, tacik û ereb xweriye, medne mêvanan.

Li paşî şkestina kurdên Îraqê, piranîya serok û pêşmengan mecbûr bûn li Îranê li bin şahê xayînê milletê kurd û Îranê biminin. Li vira, nizanîm bi arîkarîya kê dîwana Hejar "Bo Kurdistan" çapa seyemin hatiye çapkirinê. Di wê dîwanêda hemû şêr û helbestên wî çap bûne. Têda metelok, qeli botk, serhatî, çîrok û şerên berengarî (Demeteqî yên mîna Demeteqîya Pîrût û bapîr", Demeteqîya bapîr û Pîrût), şêr û helbestên bajarvanîyê. Di wan nivisaranda kurdperwerî û wetenperwerîya Hejar baş têne ber çavan. Bona nimûn min li jêrê hinek bi kurmanciya jorîn bona xwendevanê delal çap kirine.

Bi dil daxwaza serbixwebûna tene, tola wanin,
 Kurdistan...
 Biryarê me eve; yan azad jîyîn, yan bêtirs mi-
 rin,

(Dîwana Hejar, 101-102)

STRANA PÊŞMERGAN

Hatim, heta ma bim bê westan,
 Bibim pêşmergê Kurdistan,
 Qedirê şûrşê li ser mine,
 Şerê dijmin paraztine,
 Mebêjin pîr bûyî, genc bûme,
 Li serda tê hel çûme,
 Wa şerta, şertê mêran,
 Navê xwe bixme nav navan,
 Tişteki li ser dijmin binim,
 Çermê wan li dar bialînim
 Gunê min bi dijmin nayê,
 Nakim agirê bin kayê,
 Heta dijmin berba nebe,
 Kurdistan azad nabe.

(Dîwana Hejar, 161)

Divêt ala Xanî bilind kim,
 Di gel hevalan rê kevim,
 Şêrên Hacı bixûnim,
 Tolê ji dijmin bistînim,
 Goran û Bêkes bir binim,
 Canê pîremêr şad kim,
 Di gera navroza rizgarîya min
 Bê sotin barê hejarîya min.

(Dîwana Hejar "Bo Kurdistan, çapa seyemin, Ta-
 ran)

QEL Û BILBIL

Carekê bilbil di gel qelereş,
 Li nav rêke bine hevbeş,
 Bilbil digerîya bî bang û hewar,
 Çawan bûme yarê cîranê nalebar,
 Bilbil di gel qel çawan li hev tîn,
 Ez gul perestim, ew lak xure,
 Ciyê min divêt li nav çîman be,
 Ber çavê min cew û dîmen be,
 Di gel bilbilan, li ser çîlan,
 Me bixwenda li ber xweş gulan,
 Çav birkî kim di gel gula al,
 Ne dihate bîra min ev jiyîna tal,
 Çavê xwe ve dikim rûreş dîmene,
 Çi bêjim vî zemanê pir gune.

(Diwana Hejar "Bo Kurdistan, çapa Seyemin, Ta
 ran)

Ala sê rengî rengîni,
 Li çiyaê barzan dibîni,
 Dîpirpire, diweş-wîşe,
 Ji kurdanra rengî xweşe,
 Derdê me sarêj dike,
 Birîna can qenc dike.

EFERIM BO CANBAZARAN

Pê û çek zirîn û xerme,
 Kom bûn komê cenderme,
 Rîq li dil, hize li dest,
 Li nav gerekê danîn darbest,
 Diyarbekir xemgîn û mate,
 Çav niherî ki bedbexte,
 Şevêkê li ber diwar,
 Hel kirin pet û dar,
 Şêx Şehîdê Pîranî pîr,
 Di gel çend mêrê merd û jîr,
 Bûne qurbana Kurdistan
 Bûne rîya kurd perestan,
 Enqerê emirê kuştar der xistin,
 Şêx kuştin, bê pişt Kurdistan hiştin,
 Lê dirok jîr û bi bire,
 Kurdê bikin tivdîre,
 Bi xeta sor mîna xîne
 Wê binivîsin diyarê şînê.
 Ew namirin, zêndîne,
 Hezar car wê bêne bire,
 Mirin her bo gel xurane,
 Nîfir bo xudan zorane,
 Sed eferim bo canbazan
 Bo cane azadxwezan,
 Şêx şehîd get car namire,
 Navê wî dinya bigere,
 Xûna kurdan ku rîjiya,
 Navê tirka pê pijîya,
 Her dilopeke wê xûne,
 Bo tolê standin havêne
 Heyfa şehîdan bistînin,
 Perê dirokê birengînin.

(Diwana Hejâr, 99-100)

NEŞMÎL

Neşmîl, keça kurd, ey wefayar,
 Çav kal, xûnşîrin, nazik û nazdar,
 Perwerda av û hewa Kurdistan,
 Gula ser çîl û şemama bostan,
 Ciwanîya te wêne bû li nav hevalan,
 Kenê te sed dil dibirin bi talan,
 Wa heft sale tu hêsira dirêjî,
 Li dor wetenê min sûrê dipêçî,
 Gulmê sûretê te bûne belgê payz,
 Zivêrî û şivavî, tu durî ezîz,
 Neşmîl, derdê tu têda, derdê mine jî,
 Darê sebûrê hate der ji rêşî,
 Ez ji wek te henesan sarim,
 Jîyîna min herdem hevraza derde,
 Dil xûn û çavên min hêsra dirêjin,
 Bîndestî û hejarî cerga min dipêjin,
 Neşmîl sebebkar roj lê reş be,
 Îstîmar wek min wêran mal be,
 Tu kirî jînebî, kurê te kire êtim,
 Ez jî derodero, bê cî û bê jîn,
 Lê divêt bijîm, bijîm bi emel,
 Hê bê der roja kurd gel,
 Bi kurdi dibêjin: "Berê tengane kurte",
 Mesela kurdane, ciwane,
 Gelek ne maye, tu jî bibînî Şadî,
 Kurdê jî bilind kin ala azadî.

(Ji diwana Hejar, çapa sewem, lapere 30)

DILXWEZÎ

Nîna, dipirsin kêye di gel te,
 Bêje, Hejarê kurdê Hejarê,
 Ji bo niştiman bê niştimane,
 Li rîya welat wêl û eware,
 Ji yîna wî cahilî çû, negihîşte miraz,
 Li du dermanê dil birîndare,
 Ji derdê Kurdistanê natevite,
 Cerga xwe sotiye, dev bi heware,
 Çavê wî li yalê Sovêtîstane,
 Her ewe çar bo kurdê bêçare,
 Gelek dilxweze rojekê bibîne,
 Kurd û Kurdistan rizgar bûne.

(Ji Dîwana Hejar "Bo Kurdistan," çapa seyemîn
 Taran)

Li hezar hezar salda
 Bi rencber ma bûn li jina talda
 Li me dixistin kot û zîncîr,
 Mîr û xan û qeral û beg û pîr,
 Yek kurê wî hebû, yekî ferxî mange bû,
 Yek bihiştî bû, li destda şeş deng bû,

Mizgîn bo gelê bê beş,
 Tîrêja Lenîn gelaşt şeva reş,
 Roja me jî wê der bê ji nav ewr û tema,
 Rewşa faşîstên gelxurî nema,
 Kurd di gelî fars, tirk û ereb,
 Serbixwe dibin bira û pişt û teb,
 Cejna Oktober li gelek ci û westan
 Govend digirin li çîyayê Kurdistan.

(Dîwana Hejar "Bo Kurdistan, çapê Seyemîn
 82-83)

TU JI KÊDERÊYÎ

*Ji Ezîz, Bitlîs û Merdînê,
 Zaza û Mekis û Kilîs û Efrînê,
 Dersim, Erzerum, Erzencanê,
 Bazîd û sêêrd û Wanê,
 Malatîya, Dorinde û Bostan,
 Diyarbekir û Cizîra Botan,
 Baş-qela û Xozat û Palû,
 Muş û Culamerk û Maku,
 Genc û Keyf û Sarîqamîş,
 Sîverek û Eyntab û Merîş,
 Amûdê û Derbasî û Jengar,
 Ta Qamişlî û ereb pînar,
 Eskenderûn, Urfa, Xarpût,
 Akra, Musul, Emare û Kot,
 Mîdiad, Amid, Dehok û Zaxo,
 Kifrî, Kerkûk, Hewlêr û Ko,
 Revandîz, Helepçe, Mendelî, Toz û Xaneqîn,
 Şehrê kurd, Sinne, Hemedan,
 Kermansan, Seqîz, Hewreman,
 Serdeşt û Banê ta Eşno,
 Ta Wurmi û Dileman û Xo,
 Negede û Şapur û Silmas,
 Li herdu bere ava Aras
 Miyandav û Sahîndîj, Bokan
 Mihabad û Suleman
 Evin cî-warên me kurdan
 Evin welatê me û kal bavan.*

(Dîwan çapa seyemin, 61-62)

STRANA ŞAGIRTAN

Em lawên kurdin, bo niştimana xwe
 Serê xwe em datînin, dibaxşînin canê xwe,
 Li rîya şûrşê emê xûnê birêjînin,
 Ala azadî pê birengînin,
 Şerme ji mera kurd azad ne bin,
 Gelê me wek gelan dil şad nebin,
 Xûna mamê me li Agrî rîjîya,
 Hişê xûşka me li Dersimê pijîya,
 Bavpîrê me li çîyayê Şîrin çalkîrine,
 Li bîniya Mexabadê bavkê me kuştine,
 Birayê me li Bexdadê darda kîrine,
 Gelek malê xizme me dan ber bomban
 Gelek pêviste zanist û xwendin,
 Bo serxwebûn, bo tole standin,
 Gelê xwendewer be, qet bin dest nabe,
 Li ber bigana serî qûz nabe.
 Çînê teze yê kurd bi xwendewerî,
 Wê bilind ke ala rizgarî.
 Em çînê xwendewrin
 Pêşrevê rîya rizgarin,
 Remz û karê newestanin,
 Fidakarê Kurdistanin.

(Ji diwana Hejar "Bo Kurdistan, rûpelê 100)

CÎ-WARÊN MÊRXASAN

*Kurdistan cî-warê mêrxasên kurdane,
 Mêşê şêr dir û neberdane,
 Landika Zerdeşt û Mehabade,
 Paytextê şahên mêrê Made,
 Cî-warê tacê Keyxosrovî
 Bûye birca hemû zevî,
 Meydana Guderz û Rosteme,
 Koşka eviniya "Zîn û Meme",
 Rêbaza Baramê Çobine,
 Ciyê rezê Ferhad û Şirine.
 Hezar Ferûdin û Kawe,
 Serê xwe danîn li nave.
 Ji rojhilata kevn û teze,
 Li dirokê binêre û bêje
 Ji kurdan kê sax, bê birin maye.*

(Dîwana Hejar "Bo Kurdistan, çapa 3, rûpêlê 26)

HINEK JI PELEWANAN

*Qazî, Mustefa Berzanî,
 Şêx Qadir û Xewsê sanî,
 Îhsan, Şêx Sehid Welî,
 Şêx Mahmudê darê Kelfî,
 Simko, xanê Erdelanî,
 Şore swaranê Babanî,
 Paşaye Soran, mîrê Botan,
 Xudan zoran, kelfî kotan,
 Baz û mîr Elî, can polad
 Xanim û deysim û Qubad.*

KÊ DIBÊJE KURD BÊKESIN

Kê dibêje kurd bêkesin,
 Hemû aştixwezê dinya dostin,
 Xêrxwezê Kurdistanin, xêrxwezê kurdin,
 Hind û çin û Korêya bo kurd şer dikin,
 Krêmlîn û hêza çin pawan û piştivanê kurdin,
 Lawên hemû dinya cejna azadî dikin,
 Kotira Pikaso mizgînan himna azadî anî, got:
 "Mir û çû roja zulmkar û istimarê kurd
 Lerizin hiş, dil û canê zor lê kerê kurd,
 Gihîştin, rişîyê xwe berdan darê azadî kurd,
 Pir dibin, hesinger, hejar û cotkarê kurd,
 Wê bişkênin, dest û milê xêrnexwezê kurd,
 Nahêlin faşîstên wehşê Emêrika şerxwez
 Bidne ber bomba zar, gund û şeherê kurd.
 Kê dibêje kurd bê kesin,
 Hemû aştixwezê dinya dostin,
 Xêrxwezê Kurdistanin, xêrxwezê kurdin,
 Hind û çin û Korêya bo kurd şer dikin,
 Kiremlîn û hêza çin pawan û piştivanê kurdin,
 Lawên hemû dinya cejna azadî dikin.

SELAM

Nesîm, ger diçî Rojhilata Dûr,
 Selam ke, Korêya renga sor,
 Bibîne leşên jin û mindalan,
 Erdê sorkirî bi xwîna palan,
 Selam ke gund û şêherê wêran,
 Hêlîna mêr û çêjkê şêran,
 Guh bide nalîna dayk û bavan,
 Jinên bê mêr, mêrê bê keban,
 Gelo çawane halê birçî û feqîran,
 Hov çawan wan didin ber nîkê nizan,
 Xêzên wan bê mal, malê bê xêzan,
 Selam ke lawên Şemala delêr,
 Help û ne'rîna wê mîna ya bewr û şêran,
 Lawê Korêya bi kotek û dardest,
 Bi mêranî welatê xwe parast,
 Piştî zorkar şikand,
 Kela Emêrika xeybet rûxand,
 Bi xûnê nivîsî navê azadî,
 Hilgetand kok û rîşiyê bê dadî,
 Hincirand serê marê îstîmar,
 Rûxand firotina şeref bi dolar,
 Selam Korêya, selam beyan ron,
 Selam azadî, selam azad bûn,
 Merivê hemû dinya piştgirê tene,
 Hemû mêr heval û hevkarê tene,
 Selam ey hêza selama çîn,
 Selam, ey lawê Vêtnamîn,
 Selam, ey Moskov, kela azadî,
 Pawana hejaran, serkaniya şadî. (28-29)

SONDA ME

Ey selmiyandarê pîs, pere zor,
 Sipi leş, dil reş, zikdir, xûnxûr,
 Tembel, tevezel, tirsonek û bê xêr,
 Li ber bankê nivistî ser qûça zêr.
 Ta kengê bibirî, bimijî, bikujî?
 Me bi pera bikirî, bifiroşî?
 Em şev û roj xûdanê dirêjin,
 Qet rengê rojê nabinin, nagîjin,
 Tam nakin çiqas genim bavêjin,
 Roj bi roj, sal bi sal,
 Em dimînin bê par û bê mal,
 Ta kengê tu bikî tersî,
 Em cotkar bin, tî û birsi.
 Ta kengê jin û zarê me hêsir bin,
 Xûdanê birêjin, bê parî nan bin
 Ta kengê araqê vexwî, xwe bêhiş bikî,
 Me hejar, bê war û nexweş bikî,
 Ey zalim dinya dor bi dore,
 Yek li jêre, yek li jore.
 Sonda me bi Akyabira Sor be,
 Bi pelewaneş eskerê Sor be,
 Bi parezgerên Stalingrad be,
 Bi canfidanên Sovêta azad be,
 Em ra nawestî get carekê,
 Yan heq bistînin, yan bimirin wê deqê.
 Bombe mîqrob, hîdrojên û atom,
 Emê hildin, bavêjin nav gom,
 Bikin aştî û hev dostî,
 Milet bijîn serbestî,
 Hemû dinya xebatkar
 Bibin hevkar û bextewar.

NAV Û NIŞANÊN KITÊB Û PERTOKÊN JÊ HILÇANDÎ

- Aleksandr Jaba, Recueil de Notices et recits kourdes, Peterburg, 1860(bi kurdî û fransîzî).
- Dittel, Puteşestviye po Vostoku, Jurnal ministersvo prosvetşeniya, Peterburg, 1848(bi rûsî).
- M. B. Rudenko, Ahmed Xanî, Mam i Zin, Moskva, 1960(bi kurdî û rûsî).
- M. B. Rudenko, Faqî Teyran, Şêx Senan, Moskva, 1965 (bi kurdî û rûsî).
- M. B. Rudenko, Opisanîye kurdîkîx rukopisey Leningradsix sobranii, Moskva, 1961(Nav û nişanên destnîvisarên kurdî).
- M. B. Rudenko, Xaris Bitlîsî, Leyl û Mecnun, Moskva(bi kurdî û rûsî).
- M. Xaznadar, K. Istorii kurdskey literaturi (period XIX-per vava polovina XX vv. Leningrad, 1963(bi rûsî).
- M. Xaznadar, Oçerki istorii sovremennoy kurdskey literaturi, Moskva, 1965(bi rûsî û kurdî).
- K. K. Kurdoev, Izûçeniye kurdskey literaturi v Irake-Naro dî Azîi û Afrîkî, Moskva(bi rûsî).
- Cegerxwin, Diwana Cegerxwin, Şam, 1945.
- Cegerxwin, Sewra Azadî, Şam, 1954.
- Aladin Secadin, Mejûy Edebiy kurdi, Bexdad, 1952.
- Givî Mukriyani, Diwanî Wefayî, Hewler, 1962.
- Givî Mukriyani, Diwanî Dildar, Hewler, 1962.
- Mehemed Mela Kerîm, Hacî Qadîr Koyî, Bexdad, 1960.
- Givî Mukriyani, Diwanî Mehemed Mela Koyî, Hewler, 1969.
- Mehemed Xakî, Diwanî Xerîq, Kerkuk, 1969.
- Givî Mukriyani, Diwanî Edeb, Hewler, 1968.
- Celadet Elî Bedîrxan, Klasîkên me, Hewar, 33.
- M. Xeznedar, Diwanî Nalî, Bexdad, 1977.

- Ihsan Fuad, Tvorçestvo Xaci-Kadir Koya i ego mēsto v kurdskoy literature, Moskva, 1960 (Avtoreferata kandidatŷyē).
- M. B. Rudenko, Yusuf i Zulexa, Kurdska literaturnaya ŷ folklor'naya versii, Moskva, 1973 (Avtoreferata disert doktoriye).
- O. Calilov, Kurdskiy geroïcrskiy ēpos "Zlatorukiĭ Xan" (Dimdim) Leningrad, 1961.
- Al Xaydari Cîmşit Xaydar, Istoriya razvitiya sovremennoy kurdskey xudojestvennoy prozi v Irakē(1925-1960), Moskva, 1979. (Avtoreferat kandidatskoy dissertasii).
- Musaelyan J. S, Kurdskeya poema "Zembilfiroş" i yeyo folklor'niye versii, m. 1978 (Avtoreferata kandidatiye).
- Şafiyeva Z. M, Jaŋr poemi v sovremennoy kurdskey literature, Baku, 1967 (Avtoreferata kandidatiye).
- İzzedin Mustefa Resul, Ahmed Xani, kurdskiy poet mislitel Moskva, 1977 (Avtoreferata doktoriye).
- J. S. Musaelyan, Poema Fake Teyrana " Stixi, obraşēnniyē, k'vodē pismenniē pamyatniki i problemi istorii, kul'turi narodov Vostoka, XV nauchnaya godicnaya sessiya LO IV AN SSSR, Cast I(2), Moskva, 1981.
- Refiq Hilmi, Edebi kurd, Bexdad, 1960.
- Eli Kemal Bapir axa, Piremêrdê nemir, Bexdad, 1960.
- Emin Zeki, Tarixi kurd ŷ Kurdistan, 1935.
- Mehemed mele Kerim, Diwani Bêkes, Bexdad, 1981.
- Şeref xan Bitlisi, Şeref-name (bi rûsî, tercîma E. İ. Vasilova).
- Evliya Çelebi, Kurd ŷ Hevsayên wi, Bexdad (bi kurdi).
- Sadiq Behedin Amedi, Hozanê kurd, Bexdad. 1980.



Yayınları...

Mirzali Çimen: **DÜNÜ VE BUGÜNÜYLE GERİ KALMIŞLIK SORUNU**
(Kürdistan'ın Sosyo-Ekonomik Durumu), **Toplatıldı.**

120 s. 15.000 TL

Arşak Poladyan: **VII.-X. YÜZYILLARDA KÜRTLER** (7, 8, 9, 10. yüzyıllar Kürt tarihinin en boyutlu ve en ilginç incelemesi)

112 s. 15.000 TL

Haz: Mehmet Bayrak: **KÜRT HALK TÜRKÜLERİ** "Kılam û Stranen Kurd"
(Türkiye'de ilk kez yayımlanan Kürt Halk Türküleri inceleme-antolojisi), **Toplatıldı.**

Büyük boy 300 s. 40.000 TL

Çeşitli Yazarlar: **KÜRTLER ÜZERİNE** (Tarih ve Folklor Yazıları)

184 s. 15.000 TL

Kadri Cemil Paşa (Zinar Silopi): **DOZA KURDISTAN**
(Kürt Milletinin 60 Yıllık Esaretten Kurtuluş Savaşı Hatıraları)

320 s. 35.000 TL, **Toplatıldı.**

Martin van Bruinessen: **Ağa, Şeyh ve Devlet**
(Kürdistan'ın Sosyal ve Politik Örgütlenmesi)

Büyük boy 506 s. 60.000 TL

Dr. Celilê Celil: **OSMANLI İMPARATORLUĞU'NDA KÜRTLER**
(XIX. Yüzyıl Kürdistan Tarihi)

264 s. 25.000 TL

Der: Mehmet Bayrak Red ve İnkârdan Kabullemeye...

KÜRT KİMLİĞİ MÜCADELESİ

(Özgür Gelecek, Dava Dosyası)

320 s. 25.000 TL

ÖZGÜR GELECEK Dergisi, (30 Davaya konu olduktan sonra aklanan derginin sınırlı sayıda hazırlanan cildi 30.000 TL'den satılmaktadır.)

İsteme Adresi: Meşrutiyet Caddesi 17/19 Kızılay-Ankara
Tel. (4) 418 22 96

PROF. QANATÉ KURDO (1909-1985)

Profesör Qanaté Kurdo, Sovyetler Birliğinde yetişmiş en büyük Kürdologlardan birisi sayılmaktadır. Dilbilim alanında yaptığı çalışmalar dışında Kürdolojye bir bütün olarak sayısız katkıları oldu. Aynı şekilde Kürt edebiyatı, folkloru ve etnolojisi alanında birçok çalışmalar yaptı. Yaklaşık 100'ün üzerinde eser yazdı. Ayrıca onun denetiminde birçok çalışmalar yapıldı veya o, bu çalışmalara önsözler yazdı.

Diğer yandan, Qanaté Kurdo'nun Kürdoloj Eđitimi'ne büyük katkıları oldu. Birçok Kürdolog onun yanında yetişti ve doktora çalışmalarını onunla birlikte hazırladı.

Çağımızda yetişmiş en büyük Kürdologlardan birisi olan Qanaté Kurdo, 1961-1985 yılları arasında yaklaşık 25 yıl Leningrad Kürdoloji Bölümü'nün başkanlığını yaptı. Ünlü Kürdolog, ayrıca Irak Bilimler Akademisi öğretim üyeliğine seçilmiş ve Paris'teki Kürt Enstitüsü'nün şeref üyesi olmuştur.

Prof. Qanaté Kurdo'nun, iki ciltlik elinizdeki "Tarixa Edebyeta Kurdi (Kürt Edebiyatı Tarihi)" adlı eseri dışında, bazı çalışmaları şunlardır: Kürt Dilinin Grameri / Kurmanci (1957), Kürtçe-Rusça Sözlük (1960), Kurmanci ve Sorani Materyallerine Göre Kürtçe Dilbilgisi (1965), Kürtçe'de Özel İsimler (1985).

(Rohat: Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi / 1787 - 1987'deki tanıtımdan)